

# WATE

Kovareke Rewşenbîrî ya Giştî ye  
Tîrmeh 2011, Hejmar

12

هه‌و‌نا‌مه‌ی ک‌ت‌ی‌ب

Kovara Wate  
bi hevbeşiya  
Dezgeha şefeq ya li Kerkûkê û  
Dezgeha Aras ya li Hewlêrê  
derdikeve.

Email: [aras@araspres.com](mailto:aras@araspres.com)  
Malper: [www.araspublishers.com](http://www.araspublishers.com)  
Tel: 00 964 (0) 66 224 49 35 – Hewlêr

***Wate bo wan kesan e ku  
dixwazin wateyekê bidin jiyanê.***

Xwediye Îmtiyaz: Bedran Ehmed Hebîb  
şewirmend: Ehmed Taqane  
Sernivîskar: Yusif Letîf  
Cîgirê Sernivîskar: Sebah Îsmâil  
Rêveberê Karê Nivîsaran: Çinûr Namîq  
Nexşandin: Aras Ekrem  
Serperîştîyarê wergera mijarên vê jimarê bo kurmancî:  
Mehmet Oguz

## Naverok

<b>Sergotar</b>	
Bedran Ehmed Hebîb .....	3
<b>Dijminatîya Îranê li hemberî Herêma Kurdistanê- Iraq.</b>	
Dr. Munzur El-Fezl .....	5
<b>Kurd li Iraqê di navbera Federaliyet û Konfederaliyetê De.</b>	
Dr. Marif Omer Gul .....	8
<b>Bila li ser Kurdistanê nebe qayîşkêşan.</b>	
Henri C.Barkey. <i>Wergêrandin ji inglîzî: Tahir Teyib Ehmed "Mamkak"</i> .....	11
<b>Cudahiya navbera êlên Ereb û êlên Kurdan di warê siyasî de.</b>	
Hemefêrîq Hesên .....	54
<b>Salên dawî yê Mistefa Barzanî.</b>	
Sefîr David Korn. <i>Wergêrandin ji inglîzî: Tahir Teyib Ehmed "Mamkak"</i> .....	59
<b>Komara Kurdan li Mehabadê.</b>	
Erkê Rozvêltê Biçûk. <i>Wergêrandin ji inglîzî: Ewif Ebdilrehman "Meala Şaxewan"</i> .....	78
<b>Hacî Qadirê Koyî û dildarî.</b>	
Mesûd Mihemed .....	97
<b>Destpêkek bo venasîna Elî Herîrî.</b>	
Bedran Ehmed Hebîb .....	122
<b>Kurd û Ola Behaî.</b>	
Behîye Ferecula Zekiyî Merîwanî. <i>Wergêrandin ji inglîzî: Enwer Sultanî</i> .....	155
<b>Cilê Kurdî hem kelepûr e hem jî nasname ye.</b>	
Mihemed Ferîq Hesên .....	177
<b>Ziman çawa dimrin?</b>	
Tore Janson. <i>Wergêrandin ji swêdî: Rizgar şêxanî</i> .....	199
<b>Li ser şerefa Fadîmeyê kuştin û şerm.</b>	
Unni Wikan. <i>Wergêrandin ji inglîzî: Ehmed Eskender</i> .....	211
<b>Nesir Hamid Ebuzeyd.</b>	
Hevpeyvîn: Nazim Eseyid. <i>Wergêrandin ji Erebî: Sebah Îsmail</i> .....	230

# Sergotar

**Bedran Ehmed Hebîb**

Di çend jimarên berê yê Kovara Wateyê de bi sedan mijarên girîng û balkş hatin belavkirin. Me pûte bi gelek mijaran da ku di dora çemkên (têgeh) serdemiyane de dizivirin. Digel wê çendê jî me çendîn mijarên lêkolînê li ser edeb, dîrok, ziman û civaka kurdî belav kirine.

Wate, karî di maweyeke pir kurt de cihê xwe di dilê xwendevanan de veke. Gelek kesan digotin Kovara Wateyê nikare bi vê qewareya xwe ya mezin û van mijarên cur bi xur, maweyeke dirêj dom bike. Digotin qey emê zû biwestin û piştî çend jimareyan rawestin. Xweşbextane em bi ser ketin û waye Wate ghişt jimara 12ê ye.

Ev jimar jî çend mijaran pêk tê ku bi ya me bo xwendevanên zaraveyê kurmançiya jorîn girîng in. Me jî jimarên cihê cihê yê Wateyê wergirtine û wergerandine kurmançiya jorîn. Çêdibe hin kes bêjin ev muameleyeke balkêş e lê ne wiha ye. Berî me jî kesên din, berî dehan salan di navbera du zaravayên kurdî de mijar wergerandine. Ev rastî û rewşa zimanê kurdî ye û em nikarin xwe jê veşêrin. Arîşeya kurdî tenê cudahiya zaravayên wê nîne jî ber ku rewşa hemû zimanên xwedî devok û zaravayên cuda, bi vî rengî ye. Di arîşeya kurdî de arîşe zêdetir aloztir bûye. Ya yekê, jî ber dabeşbûna Kurdistanê bi ser çend welatên din de, têkeliya di navbera van beşdan de pir kêmbûye yan her nebûye. Jixwe têkelbûn nebe, ziman jî hev vediqete. Ya duyê, bikaranîna alfêbeyên cuda sedemêke karîgertir e jî cudahiya zaraveyan û nebûna têkeliya civakî. Van sedeman wiha lê kiriye ku xelkê başûr û bakurê Kurdistanê, bi qise û axavtin heta radeyek jî hev fêmbikin lê di nivîsandinê de nikarin sûdê ji kultur û edebiyata hev werbigirin.

Ev rewşa ku min behs kir wiha li dîke ku hindê car pena bibin wergerê, çi wergera jî zaraveyê bo zaraveyê din çi guhastina jî alfêbeyê bo alfêbeyê din.

Ez hêvîdar im bi derxistina vê jimareya Wateyê bi zaraveyê kurmançiya jorîn, me karîbe xizmetek pêşkêşî kulturê giştî yê neteweyê kurd bikin.

.....  
*Ji Kurmançiya Jêrîn: Eşref Sîdar Doxan*

# Dijminatiya Îranê li hemberî Herêma Kurdistanê- Iraq

Dr. Munzur El-Fezl

## 1. Mafê millet û çareseriya aştiyane

Ezmûnên dîrokî nîşan didin, mafên neteweyî yê milletan nayên înkarkirin; her wiha nabe ew bi avê de biçin. Pîvanên nû di civaka navneteweyî de - di dema hilweşandina rejîmên totalîter ên wekî Yugoslavya û Yekîtiya Sovyetê de - li ser bingeha rêzgirtina mafên mirovan hatine danîn. Mafên neteweyî, siyasî, çandî û dîrokî yê gelan hatine parastin û dewlet nikarin li gorî xwe nêzîkiyê di wan bidin. Êdî civaka navneteweyî dikare ji bo parastina mafên mirovan û rêzgirtina li hemberî çewisandina gelan mudaxleyên pêwîst bike û ev yek di gelek deverên cîhanê de pêk hatiye.

Ji aliyekî din tecrube û bûyerên dîrokî îspat kirin ku pîrsgirêkên navbera welat û milletan bi rêya bikaranîna hêzê nayên çareserkirin, bêhtir bi rêya diyalog û rêzgirtina li mafên mirovan têne çareserkirin û ev yek di Peymanameya Navneteweyî ya Mafên Mirovan de jî hatiye destnîşankirin. Divê hemû welat bi vê peymanameyê ve girêdayî bin da ku mirov di aramî û tenahiyê de bijîn. Ji ber ku mirovahiyê ji şer gelek zirar dît û rastî êş û azarên dijwar hat.

Lê heta niha jî hinêk welat pîvanên navneteweyî yê mafên milletan pêpes dikin û sûcên dijî mafên mirovan dikin. Yek ji wan welatan Îran e ku di bin siya deshilateke totalîter a neteweyî-olî de tê birêvebirin. Hemû bûyer nîşan didin ku Îran mafên mirov û pîvanên navneteweyî li dijî welatên cîran bi taybet li Iraqê pêpes dike. Şerê navbera Îran û Iraqê kir ku bi mîlyonan mirov bibin qurbanî û birînen pir kûr di pêwendî û têkiliyên wan welatan de vebin; heta niha jî ew birîn necebirîne. Gelo Îran ji

*\* Wergêrandin ji erebî: Sebah Îsmail \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Sasan Kendal*

bûyerên dîrokî aqil digire? Gelo hinek welatên cîran aqil ji van ezmûnan digirin?

## 2. Îran ji arîşeyên hundirîn ve ber bi şerxwaziya li hemberf derve

Beriya vê bi çend mehan Komara Îslamî ya Îranê hêzên xwe yê çekdar birin ser bîra petrolê ya hejmar 4 a li Kêlgeha Fêke ku li parêzgeha Îmarê li başûrê Iraqê ye û ala xwe li wir daçikand. Ev reftara Hikûmeta Îranê nîşan dide ku ew welat çî qas şerxwaz e.

Piştî ku ew rastî nerazîbûneke dijwar hat wê hêzên xwe vekişandin. Îran, heta vê gavê jî, ji diyarkirina sînorê navbera xwe û Iraqê xwe dide alî. Ev jî ji ber biryara Desteya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) bû ku di sala 1988 de di navbera her du welatan de hatibû îmzekirin. Sînorê Îran û Iraqê yê niha, li gorî rêkeftina sala 1975an e ku di navbera serokomarê berê yê Iraqê Seddam Hisên û Şahê Îranê Mihemed Riza Pehlewî hatibû îmzekirin.

Sedema ku Îran ji diyarkirina sînoran xwe dide alî, zêdexwazî û Şerûdiya vê rejîmê ye. Zêdebarî hilweşandina rejîma Ba'as, dîsa Îranê ne rêz li qanûnên navneteweyî girt ne jî rêz li binemayên cîrantiyê girt. Ev jî dide xuyakirin ku Komara Îslamî ya Îranê niyeta wê paqij nîn e û dixwaze aloziyê derbixe. Dosyaya Îranê tijî pêpêskirina mafên mirovan, pîvanên navneteweyî û dadweriyê ne.

Digel vê yekê Îranê ava Çemê Karûnê xistiye bin kontrola xwe û ew qas karên nerewa kirine ku zirarê gihandiyê akinciyên başûrê vî welatî ku piştî xwe bi ava çem ve girêdane û bi wê avê çandinê dikan. Îranê ava Çemê Karûn, ku çavkaniya jiyana mirovan e, wekî çekekê li dijî wan bi kar tîne. Sala 1969ê zanîngeha bajarê Besre ket binê avê û tê de ma. Îranê, ev yek bi zanebûn kiribû û di encamê de xwendin rawestiya û zirareke mezin gihîştê zanîngehê. Piştî van hemû xerabkariyên li dijî gelê Iraq û Kurdistanê, gelo dibe em bêjin niyeta Îranê paqij e?

Haya me ji vê heye ku Îran û Tirkiye dixwazin bi alfkariya hev li dijî tevgerên azadiyê ên li parçeyên din ên Kurdistanê şer bikin. Şewazên serbazî ne ku tenê pirs-girêkan çareser nakin, tew aloztir jî dikan. Lewra şewazên serbazî, tu carî ji bo çareserîya pirs-girêka kurdî nabin çare û bêencam in.

Heke ev rewşa başûrê Iraqê be, wê demê, hikûmeta Îranê dê heman siyasetê li hember Bakûrê Iraqê jî bimeşîne. Hêzên çekdar ên Îranê carina bi hincêta hebûna endamên Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) li bintara Çiyayê Qendîl deverên sînorî yê Herêma Kurdistanê didin ber topan.

Çendekê bi beriya niha hêzên Îranê hem deverên sînorî yê Herêma Kurdistanê dan ber topan hem sînor derbas kirin, hinek dever dagîr kirin û 3 kîlometre ketin nav sînorê fermî û navneteweyî yê Iraqê û pêgeheke serbazî ava kirin. Ev yek jî tê wateya pêpêskirina serweriya Iraqê û destdirêjiya bo ser Herêma Kurdistanê. Di en-

cama vê yekê de gelek welatîyên Kurdistanê ji mal û erdên xwe reviyên û aware bûn û zirareke mezin gihîşte gund û zevî û jiyana wan. Gelo Îran ji van êriş û kuştina mirovên sîvil û awarekirina wan çi mifa û fêdeyê dibîne?

Hikûmeta Federal a Iraqê, Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Parlamentoya Herêma Kurdistanê li dijî vê yekê nerazîbûneke tund nîşan dan. Parlamentoya Herêma Kurdistanê, roja 8ê hezîrana 2010ê li hev rûnişt û parlamentera bi tundî êrişa Îranê ya bo ser deverên sînorî û derbaskirina sînor şermezar kirin. Parlamentera ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê xwest ku bêhtir alîkariya wan aware û gundiyan bike ku ji ber topbarankirina Îranê zirar gihîştîyê.

Wezîrê Derve yê Iraqê Hoşyar Zêbarî, roja 8ê cotmeha 2010ê, bi telefonê digel Wezîrê Derve yê Îranê Menûçehr Muttekî axivî û dilgiranî û nerazîbûna Hikûmeta Federal a Iraqê li hember êrişa Îranê ya bo ser gundên nêzîkî sînor da xuyakirin. Zêbarî ji Îranê xwest ku li ser binemaya biratî û cîrantiyê êriş bêne rawestî û liv û tevgera hêzên Îranê ya li ser sînor bê kêmkirin û rêz li serweriya Iraqê bê girtin.

### 3. Nerazîbûna li hember dijîmkariya Îranê

Dijîmkariya Îranê karekî nerewa ye û divê ew kesên ku baweriya wan bi aştî û mafên mirovan û qanûnên navneteweyî heye, li dijî vê dijîmkariyê nerazîbûna xwe nîşan bidin û li hemberî wê rawestî. Em bang li hêzên Îranê dikin ku ji wê beşa axa Herêma Kurdistanê ku dagîr kirine vekîşin û ew zirara ku gihîştîye akinciyên deverên sînorî bê qerebûkirin. Her wiha divê Îran dest ji pêpeskirina mafên mirovan û qanûnên navneteweyî yê cîrantiyê berde û em hêvîdar in ku Tehran pirsgirêkên xwe yê hundirîn, bi rêya derxistîna aloziyan, neke bela serê cîranên xwe. Em dixwazin nakokî û alozî bi rêya diyalogê bêne çareserkirin, mafên wan millet û kêmeteweyan bêne dayîn ku ji dest vederkirin û zordestiya ji ber egerên neteweyî, dînan jî mezhebî tengav bûne.

Her wiha hêviya me ew e ku civaka navneteweyî jî, erka xwe bi cî bîne û pêşîya vê dijîmkariya Îranê bigire. Ji ber ku berdewambûna topbarankirina deverên sînorî yê Herêma Kurdistanê ji aliyê artêşa Îranê ve dibe sedema têkdayîna aramî û ewlehiya deverê.

Di vir de, ez pêwîst dibînim, ji ber helwesta wî ya li dijî dijîmkariyên Îranê yê bo ser Herêma Kurdistan û Iraqê, ji rewşenbîrê ereb Dr. Şakir Nabolsî re spas bikim. Dr. Nabolsî berî hemû rewşenbîrên ereb nerazîbûna xwe nîşan da. Hêviya me ew bû ku Sekreterê Yekîtiya Welatên Erebiyê Emr Mûsa, Yekîtiya Parêzerên Erebiyê, Yekîtiya Rojnamevanên Erebiyê gelek welatên ku xwe dilxwaz û tagirên mafên mirovan û aştîyê dibînin, li dijî reftarên şerxwazane yê Îranê nerazîbûna xwe nîşan bidin. Ji ber ku ev dijîmkarî dibin sedema êş û azarê û li pêşîya aştîyê û aramiyê dibin asteng.

# Kurd li Iraqê di navbera Federaliyet û Konfederaliyetê de

**Dr. Marif Omer Gul**

Dîroka Iraqê, ji avabûna wê ve li piştî Şerê yekem ê cîhanî, mişt e ji neadaletî û zordariyê. Bi taybetî hikumeta Iraqê li hemberî kurdan zordest bû û bi berdewamî kurd wekî metirsyekê li ser Iraq û paşeroja wê daye zanîn.

Piştî sala 2003an ku rejîma Ba's hilweşiya, edî Iraq derbasî qonaxeke din bû. Ji bîra me neçe, Hikumeta Herêma Kurdistanê, her ji cara yekê ya hilibijartina Parlamentoya Kurdistanê di sala 1992an de çarenivîsa Kurdistanê di Iraqê de, li ser sîstema federalî destnîşan kir. Ji ber ku federalî ji bo welatên pirnetewe yek ji çareseriyên guncan û serkeftî ye da ku rêz li mafên wan kesên bê girtin di nava wî welatî de tahde û zordestî lê tê kirin.

Destûra nû ya Iraqê, çî qanûna qonaxa veguhastinê (întiqalî) ya sala 2004 yan jî destûra herdemî ya sala 2005, her du Iraqê wek welatekî federal diyar dikin û di makedeya 1ê ya destûrê de wiha hatiye: "Komara Iraqê, welatekî federal ê serbixwe ye, serweriya wê ya temamî heye û sîstema desthilatdariya wê komarî, parlementerî û demokrasî ye û ev destûr yekîtiya Iraqê misoger dike".

Niha va ye nîveka sala 2010 e û li Iraqê tenê her Herêma Kurdistanê heye. Hin kes di vî warî de pê didin erdê û daxwaza guhartina destûrê dikin, bi taybetî ew ên mebesta wan ew e destûrê bi awayekî biguherin ku sîstema federalî nemîne; bizav û hewldanên wan di vê derbarê de pir in. Ji bo Iraq bi yekcarî bibe welatekî federalî, pêdivî ye hem herêmên din û hem parlamento jî bibe du encûmen(meclis); heta niha tenê encûmena nûneran heye. Benda 48ê ya destûra sala 2005 wiha dide xuyakirin ku parlamentoya federal ji encûmena nûneran û encûmena federal pêk tê. Her wiha

.....  
*Ji Kurmanciya Jêrîn: Hoşî Mûrad*

di benda 65ê ya destûrê de wiha hatiye ku "encûmeneke qanundanînê tê danîn bi navê "encûmena federal" ku nûnerên wan parêzgehên tevî herêmekê nebûne bi xwe ve digre. Danîn û mercên endametiya wê û pisporên wê û her tiştekî ku pê ve girêdayî be, bi qanûnekê tê rêxistin ku bi piraniya 2/3 dengên endamên civata nûneran tê danîn" û divê em bêjin ku ev qanûn heta niha derneketiye.

Wate, ev xula (heyam) nû ya parlamentoyê divê wê qanûnê derxîne û ji hêlaka din ve di warê xebatê de hewl bê dayîn ji bo damezrandina herêmên din li Iraqê.

Lê pirsek li vir tê pêşiya me: Gelo Iraq her tenê bi Herêma Kurdistanê û komek parêzgehê din dê bibe welatekî federal? Eger wiha be, pêdivî ye sînorê Herêma Kurdistanê bê diyarkirin û ev jî bi dest nayê heta ku çarenivîsa madeya 140 ya destûrê diyar nebe. Ger li Iraqê jî bêtir ji herêmekê hebe, divê sînorê herêman bê diyarkirin. Kesê ku rewşa Iraqê û destêwerdanên derve û nakokiyên hundirîn ji nêz ve bixwîne, rastî pirsekê tê: Iraqê çî bi serê wê tê? Di vê yekê de 3 eger hene:

Yekem: Egera pêkanîna sîstema federalî.

Duyem: Egera vegeyriyana bo sîstema navendî. Kurd bi vê yekê ne qayil in û dê helwesteke wan ya din hebe. Sêyem: 2 rê li pêş in:

- 1- Kurdistan bikeve bin çavdêriya NY (Nêteweyên Yekgirtî) wekî qonaxa veguhastinê (întîqal), mîna Kosovayê.
- 2- Kurdistan bibe welatekî û digel Iraqê yekîtiyeye konfederalî pêk bîne.

Ji bo ku em yekîtiya konfederalî fehm bikin, divê em her du sîstemên federalî û konfederalî fehm bikin.

Sîstema federalî: Dewleta federal li gorî destûra parlamentoya federal tê danîn ku ji çend beşan pêk tê; yan herêm yan jî wîlayet yan her navekî dîtir. Bo nimûne, li DYA ji pêkhateyên welatê federal re dibêjin wîlayet, li Swîsra dibêjin Kanton. Li Iraqê, li gorî destûrê navê herêm û parêzgehên ku tevî herêman nebûne lê hatiye kirin.

Di sîstemê federalî de, hikumeta federal û hikumetên herêman hene û her yek ji wan her sê desthilatên wan hene; qanûndanîn, bicihanîn û dadwerî. Her hikûmetekê destûra xwe heye. Têkiliyên derve bi riya hikûmeta federal tene organîzekirin û li gorî taybetmendiyan wan desthilat bo herêman tene destnîşankirin. Li seranserê welat yek nasname û yek pare heye û her yek ji wan ji bo hikumeta federal dest ji hinek desthilatan berdide.

Sîstema Konfederalî: Ev sîstem li gorî peymanekê ya di navbera 2 welatên serbixwe de tê organîzekirin. Ev yekîtiyê ku jê re dibêjin "yekîtiya konfederal", nabe welatekî raser li ser welat din ên endamên vê yekîtiyê. Ev sîstem bi tenê komek welatên ku berjewendiyên wan hevpar in li hev dicivîne. Her welatekî serxwebûn, sîstem, serok û hikumeta xwe ya taybet heye û yek ji wan nakeve bin kontrola ya din; her welatekî nasname û pare û alaya xwe heye.

Kurd niha li Iraqê di tecrubeke federalî de ne; ji sala 2003ê heta 2010ê, ev heft sal in ne Iraq aram dibe û ne jî Pirsê Kurdî li Iraqê bi yekcarî hatiye çareserkirin. Her ew arîşeyên berê yê ku ji dema avabûna Iraqê hene berdewam in, lê şert û mercên îroyîn xebata qanûnî, dîplomasî, gotûbêj û berxwedana aştiyane dixwazin ne ku xebata çekdarî.

Wate, kurd li Iraqê ji bo çareserkirina arîşe û kêşeyên xwe bizav û hewlên xwe didomînin û pêdivî ye Iraq jî li ber her deng û hawareke şovenîst rabe û digel kurdan arîşeyên xwe çareser bike.

Pirsê Kurdî, niha li ser 3 astan di qonaxê girîng û serketî de ye:

- 1- Li ser asta hundirîn, tu vegeyriyan yan vekêşanek nayê qebûlkin. Niha nîşek li Kurdistanê gihaye ku eger ji sala 1980î heta sala 1991ê ku dike 11 sal, temenê wî 11 sal be, hîn tevî şert û mercên siyasî nebûye û ji wê demê ve Hikumeta Kurdistanê pêk hatiye û desthilata Iraqî li ser nebûye. Piştê heta 2010ê ku dike 30 sal, ev nîş bi paş de vegeyriyanê ne razî ye û serkirdetiya kurd jî bi tevahî hest bi vê yekê kiriye.
- 2- Li ser asta herêmê: Welatên dever û derdorê nikarin carek din wekî berê digel Pirsê Kurdî de rabin û rûnin. Ji ber ku cîhana nû ya piştî şerê sar ê rojhilat û rojava û serdema teknoloji û cîhangerî û aboriya azad, hemû sînor derbas kirine, lewma ew welat nikarin bi siyaseta û zihniyeta berê digel pirsê gihayî rabin û rûnin.
- 3- Li ser asta cîhanî û navdewletî: Vê astê, rolê Amerîka û NY di arîşe û bûyerên cîhanî de gelek daye pêş, bi taybetî ew guhartinên ku çêbûne û rolekî wan yê girîng tê de hebû, di warê mafên mirov, teknoloji, aborî û pêşxistin, hewldana ji bo binecîkirina aşî û ewlehiyê, tevî komek berjewendiyên nû yê navdewletî û Pirsê Kurdî jî pareke diyar û berçav li Iraq û herêm û cîhanê de li ber ketiye, bi taybetî piştî hilweşandina rejîma Ba's û têkiliyên kurdan bi hundir, derdor û welatên cîhanê re.

Nabe li vir 2 xal ji bîra me biçin:

- 1- Rewşa aşiyê li Kurdistanê
- 2- Pêşketina aborî û têkiliyên aborî û bazirganî yê kurdan û derve

Van her du faktorên, NY, rêxistinên civaka sîvîl û komek welat ber bi xwe ve kişandine, bi taybetî şirketên mezin û giran. Têkiliya herî dawîn jî di vê derbarê de, roja 15.6.2010 Serokê Herêma Kurdistanê yadaşteke (protokol) hevkarîyê navbera Herêma Kurdistanê û Fransayê digel wezîrê derve yê wî welatî îmze kir.

Ji niha pê de, eger Iraq bi xwe re negihê û sîstema federalî bi temamî danemezrîne, dê bikeve qonaxê ku Pirsê Kurdî dê bibe mijara sereke ya vê qonaxê.

# Bila li ser Kurdistanê nebe qayîşkêşan

Henri C.Barkey

## Kurteyek

Bêguman berencamên dagîrkirina Iraqê di sala 2003ê de ji aliyê Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYA) ve, dê heta çend salên bê jî gotûbêj li ser bê kirin. Digel vê çendê jî yek ji encamên wê her ji niha ve askere bûye, ew jî ew e ku armancên neteweyî yên tepeserkirî yên gelê kurd niha di firehiya çar welatiyan de li Iraq, Tirkiye, Îran û Sûriyeyê belav bûne û ji ber wan şeran serî hildane û dibe ku reaksiyon jî li dijî wan pêk neyê. Niha jî kurdên li Iraqê ku sûd ji rûxandina Sedam Husên wergirtiye û herêmeke federal damezrandiye li herêmên xwe statûya xwe xurt kiriye. Hikumeta Herêma Kurdistanê bûye heqîqet û ji ber wan hewlên ku ji bo derverên piraniya wan kurd in nemaze Kerkûka bi petrolê zengîn vegerin ser axa wê dide, dike palpişteke bihêztir bo kurdan peyda bike.

Hebûn û daxwaziyên hikumeta Herêma Kurdistanê hemû cîranên Iraqê û Bexda bi xwe jî, tûşî tirsê kiriye. Arîşe hêj dûr in ji çareseriyê. Vêca eger bêne piştguhaxistin yan bi xirabî destkarî tê de bêkirin, egera wê çendê heye ku armancên kurdan, nemaze di vê dema nazik de, li nava Iraqê û derveyî wê jî bibin sedema netenahî û tundûtîjiyê.

Tiştê tatkiliya wî DYAê ve heye ew e ku Arîşeya Kurdî bi gelek aliyên xwe yên girîng ve asê bûye; her wekî yekîtiya paşeroja Iraqê, aramiya wî welatî, şiyana hêzên şerker yên DYAyê bo desthilgirtina ji berpirsiyariyên xwe yên li wir û tatkiliyên wê

*\* Wergêrandin ji inglîzî: Tahir Teyib Ehmed "Mamkak" \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Eşref Sîdar Doxan*

yên digel Tirkiyeyê - ku yek ji hevalbendên mezin ên NATOyê ye - armanca Tirkiyeyê ya ji bo bidestxistina endamtiya Yekîtiya Ewropayê û aramî û îstîqrara herêmeke tijepetrol e di vê serdema ku bidestveanîna enerjîyê ne misoger e.

Ev rapor qala wê çendê dike ku Washington divê hemû aliyên Arîşeya Kurdî li ber çav bigire, nemaze pûte bi egera qayîşkêşan û destêwerdana derekî bide. Pêwîst e Washington çareseriyê wiha pêş bixe ku îtîrafê bi wan têkiliyan bike û bibe sedema paşerojêke aram û geşedar. Ev rapor behsa wê çendê nake ku mirov dikare aliyên biçûk yê Arîşeya Kurdî hemûyan pêkve çareser bike. Tew ji dêvla wê ve, divê Washington wê çendê fêhm bike dibe ku pêşketineke kêmtir yan têkçûneke bizroke di warekî de, heye ku tesîrê li bizaveke cihekî din bike. Ji ber girîngiyê wê, divê arîşeya paşeroja Kerkûkê bê diyarkirin û bingeha qanûna Iraqêke federal jî bê ferzkirin. Pêwendiyê xurt ya di navbera Enqere û Hikumeta Herêma Kurdistanê de ji nêzîk ve têkilî bi wê çendê re heye.

### **Pêşekî**

Sê çavkaniyên egera qayîşkêşaneke dijwar di herêma kurdan de hene ku têkiliya wan bi hev ve heye. Ya yekem, taybet e bi rola kurdan û Hikumeta Herêma Kurdistanê ku li Iraqê dilîzin, nemaze jî qewariya wê axa ku - tevî devera Kerkûkê ya bi petrol - wek beşek ji dewleteke federal kontrol dikan. Eger hikumeta navendî û hevalbendên wê hindêk ji daxwazên wan ên bingehîn bi cih neynin, egera wê çendê gelek e ku kurd ji Iraqê cuda bibin. Çudabûna kurdan û bicihneanîna daxwazên wan ku taybet in bi Kerkûkê û hindêk seraryoyên din, heye ku Iraqê tûşî şerekî navxweyî yê sertaserî bikin.

Çavkaniya veşartî ya duyem, zêdebûna aloziya nava Tirkiyeyê ya di navbera dewlet û kêmtîneya kurdan de ye. Enqere hay ji hemû serkeftinên Hikumeta Herêma Kurdistanê û kurdên bakûrê Iraqê heye û bi ya Tirkiyeyê ev çend gefan li yekîtiya axa wê dike. Tirkiye ji bihêzbûna bizava siyasî ya kurdên xwe ditirse, ji bihêzbûna Partiya Karkerên Kurdistanê ditirse. PKK grûbeke yaxî ye û di nav Tirkiyeyê de peyda bûye û nêzîkî nivê çekdarên wê di nava axa Bakûrê Iraqê de bi cih û war bûne û bingehên xwe danîne. Tirk her dem lêxebitîne nehêlin dewleteke kurdî ya bihêz û serbixwe li Bakûrê Iraqê de ava bibe. Vê çendê niha di têkiliyên di navbera DYA û Tirkiyeya hevpeymanê wê yê NATOyê nakokiyêke gelekî dijwar peyda kiriye. Par Washingtonê ji ber fişarên dijwar yê Enqereyê rê da Tirkiyeyê da ku bi operasyoneke leşkerî sînorê Herêma Kurdistanê derbas bike û êrîş bibe ser PKKê. Ji kanûna sala 2008ê ve firokeyên şerî yê Tirkiyeyê bi awayekî berdewamî êrîş biriyê ser PKKê û carekê jî wê operasyoneke bejayî pêk anî. Ji ber wan êrîşan metirsiya peydabûna qayîşkêşana di navbera kurdên Iraq û tirkan heye. Her weha metirsiya wê

çendê heye tirk bêne nav axa Herêma Kurdistanê. Dibe ku ew jî bêne nav axa Herêma Kurdistanê.

Çavkaniya sêyem ya qayîşkêşanê, helwesta kurdên Îran û Sûriyeyê ya li hember rûdanên li cîranên wan e. Tehran û şam ji mêj ve li dijî armancên kurdên Iraqê ne, lewma di nava xwe de û digel Tirkiyeyê jî hevkarî kirine da ku rê li ber pêşveçûna kurdên Iraqê bê girtin. Her çend e ne kurdên Îranê ne yên Sûriyeyê wekî birayên xwe yên li Iraq û Tirkiyeyê yaxî nebûne, lê guherînên li herêmê tesîr li wan kiriye. Bizava fireh a kurdewarî û zêdebûna tundûtîjîyê li Sûriye û Îranê, her du rejîm bi ger û tevgerê xistine. Eger guherînên heyî gef li yekîtiya axa wan welatan bikin, dibe ku ew jî bêne meydanê.

Ev her sê sedemên veşartî yên qayîşkêşanê ne ku dê ji bo DYAyê gelek arîşeyên kuşinde bînin holê. Bêguman nearamî, tundûtîjî û şerê sertaserî yê navxweyî dê tesîrê li planê vekêşana hêzên DYAyê bike û bi heman awayî hatina welatên cîran bo nav axa Iraqê jî dê tesîrê lê bike. Şerê navxweyî dê tesîreke kuşinde li berjewendiyên DYAyê di herêmê de bike. Eger Tirkiye nekarî vê arîşeya xwe ya navxweyî bi aştîyê çareser bike, dibe ku nikare ne roleke çêker di Rojhilata Navîn de bilfze û ne ji bibe endamê Yekîtiya Ewrûpayê ku ew nêzîkî 20 sal in Washington di van meseleyan de piştgiriya Tirkiyeyê dike. Ji ber van sedeman divê birêveberiya Obama pûte bi Arîşeya Kurdî bide û wek mijara derçûneke serkeftî ya berpirsane ji Iraqê û bi serkeftineke mezin a siyasî a DYAyê di Rojhilata Navîn de bizane.

Niha helwesta DYAyê li herêmê her çî be, ew hêj take hêz e ku tesîra wê ya pêwîst li ser piraniya aliyan heye û dikare dest bi çareserkirina vê qayîşkêşanê bike. Ji ya hemûyan bitesîrtir ew e, derçûna wê ji Iraqê dê bi giştî çawa kar di guherînên nav Kurdistanê bike. Ev rapor ji bo ku birêveberiya DYAyê rêgirên li ber Arîşeya Kurdî nehêle û DYAyê di siyasatên xwe yên di herêmê de, nemaze li Iraqê neşkê, pêşniyaza rê û çareyekê dike.

Di raporê de amaje bi wê çendê tê kirin ku Arîşeya Kurdî li Iraq, Tirkiye û Sûriyeyê bi awayeyî xurt bi hev ve hatiye girêdan û di encamê de divê Washington rê û çareyeke guncan rêk bixe û gava ku pêwîst bû divê wan têkiliyan bihêztir bike da ku armancên wê yên siyasî pêk bên. Ev pêşniyaza wê çendê nîn e ku hemû arîşeyên kurdan, bi hev re, bi gaveke mezin bêne çareserkirin û Washington divê hay ji wê çendê hebe ku her pêşketineke çaverênkirî yan her vekêşaneke di herêmê de heye ku tesîrê li ser herêmên din jî bike. Diyarkirina paşeroja Kerkûkê û sepandina meşrûyeta hîmê Iraqê federal, erka wê ya girîng a yekem e. Pêşvebirina têkiliyên di navbera Enqere û Hikumeta Herêma Kurdistanê, ji nêz ve têkilî bi vê meseleyê ve heye. Ji ber sedemên girîng divê her du alî jî hevkarîyê bikin û têkiliyên bi vî awayî dê tesîreke mezin bike û aloziya navxweyî ya Tirkiyeyê a digel kurdan da nerm bike.

Her çend e dibe ku arîşeyên kurdan li Îran û Sûriyeyê zêde bibin, lê rola van her du welatan dê lawekî (talî) be.

Rapor bi pêdaçûneke Arîşeya Kurdî li sertaserî Rojhilata Navîn û amajeyeke bilez ji bo rewşa kurdan li Iraq, Tirkiye û Sûriyeyê dest pê dike û paşê plan û armancên DYAYê rave dike û di dawiyê de jî ji bo siyaseta DYAYê çend pêşniyazan pêşkêş dike.

### **Paşxane û Çarçove**

Ev nêzikî du hezar sal in kurd di Rojhilata Navîn de grûbeke etnîkî ya xuyanî ne. Carina bûne beşeke Împaratoriyezî mezî û carina jî li dijî wan şoreş kirine. Carina jî serkirdayetiya leşkerî ya hêzên mezî kirine. Her kurdek bi şanazyê ve behsa wê çendê dike ku Selahedînê rizgarkarê Qudis û dijminê serhişkê Richardê Dilşêr, kurd bûye.

Di rojên lawaziya Împaratoriya Osmaniyan de çaxê ku şeran dest pê kir, xema mezin a kurdan ew bû ku çawa xwe ji bacwergiran û pëdiviyên bêdawî yên Sultan biparêzin. Kurd endamê yeksan ên civakeke misilman bûne, lê Sublîm Porte (dadgeha osmanî) guh nedaye vê xalê. Hewlên destpêkê yên bo peydabûna hişyariya neteweyî tenê di encama wê bizava neteweyî de hatin ku li Ewrûpa, Stenbol û cihên din rabû. Bi heman awayî hewlên Tirkên Gene (Jon Tirk) yên bo komkirina paşmayiyên Împaratoriyezî bi awayê qewareyê tirkî, kurd dilteng kirin.<sup>1</sup>

Rêkeftina Sykes–Picot di sala 1916ê de û parçekirina Împaratoriya Osmanî, kurd duçarî karesat û bêtarê kirin. Bêriya wê sînorên navdewletî yên di navbera Osmaniyan û Îranê de kurd kiribûn du parçe, lê hêzên kolonyalîst desthilata du dewletên din li kurdan ferz kirin. Kemal Ataturk û tirkên neteweperest şer dane destpêkirin. Tiştê ecêb di wê çendê de ew e ku ji bo qewitandina yewnanê gawir û ew ên din ku hewla jinavbirina Împaratoriya Osmaniyan da, kurd hevalbendê Ataturk bûn, lê Ataturk ew hêviya kurdan ku ji Çarde Xalên Wilson kiribûn, wekî Peymana Sevrê ku hukmeke otonomî li Rojhilata Anatoliyê dabû kurdan, kir hilm û nehişt. Kurd paşê bêhêvîtir bûn, ji ber ku rejîma tirkî biryar da du hêmanên sereke yên nasnameya wan nehêle: Ya yekem, cudabûna wan a etnîkî û ya din jî tagirî û pêgiriya wan a xurt a bo dîn.

Her piştî şerê Yekem a Cihanî û piştî wê jî nasnameya kurdî li her çar welatan ket ber zordestî û fişareke dijwar. Kurd bi giştî li nêzikî sînorên wan welatan de akincî ne, lewra her gava ku arîşeyê siyasî yan tundûtîjî durist dikirin, xwe li deverên dûredest û dûrî navendên bajar û paytextan digirtin. Di piraniya sedsala bîstê de, welatên ku kêmineyên kurd ên şoreşger li nêzikî sînorê wan dijîn, karîne wan kotrol

bikin. Kontrolkirina wan jî zêdetir bi têkelkirina tepeserkarî – kuştina ji adetê der û raguhasîn - û lihevhatinê bûye. Ji bilî wan sînorên navdewletî ku kurd neçarî parçebûnê kirine, kurd di nav xwe de jî dabeş bûbûn û gelek caran nekarîne li derdora serokekî kom bibin yan di nav bizaveke mezin de hev bigirin<sup>2</sup>. Di navbera salên 1980-1990an de bi berevajî vê yekê, serokekî ji çîna navend bi hêminê derket û xelkê ji eşîr, taîfeperestî û deverperestî bêtir girîngî da nasnemaya xwe ya kurdewarî.

Naxwe tecrubeyên her yek ji wan welatan di sedsala bîstê de çi bû?

### Iraq

Ji aliyê têkoşîna li dijî hikumetên navendî ve, kurdên Iraqê selmand ku ji hemû kurdên din şoreşgertir in. Wan hest bi wê çendê kir ku hêzên mezin, nemaze jî Brîtanîyaya Mezin, xiyamet li wan kiriye, ji ber ku bi wî çavî li kurdan nêrîn ku ew dikarin di nav çarçoveya Iraqêke pir-taîffeyî û pir-etnîkî de, wan bi rê ve bibin. Her çend e rejîma Iraqê tu carî peymanên xwe bi cih neanîne, lê bi berevajîya Tirkiyeyê selmand ku carinan hewl daye digel grûbên mezin yê kurdî bijî. Bo nimûne, di sala 1970ê de, rêkeftineke otonomiyê digel Bexdayê hate îmzekirin, lê ew tu carî nehate pêkanîn. Di serdema Iraqa Sedam Husên de çendin derfetên nû ji bo kurdan hatin dayîn da ku mil bidin rejîmê; wî, bi vê yekê jî metirsiyeke mezin ya navneteweyî durist kir. Kurdan di wê demê de sûd ji şerê Îran û Iraqê (1980-1988) wergirt û peyra jî derfeta şerê Yekem ya Kendavê (1991) bi kar anî û ji bo otonomî yan dibe ku ji bo serxwebûnê jî be, wan dîsa dest bi têkoşîna çekdarî kir. Îranê wekî salên destpêka 1970ê alîkariya wan kir da ku rejîma Sedam wergerfîn. Di van her du nimûneyan de ji bo kurdan vekêşan û komkujiyên tirsnak li pey serkeftinên destpêkê yê leşkerî hatin pêş. Operasyonên kuşînde yê Sedam ên bo ser Kurdistanê Iraqê, ji bo ku civata navdewletî bi wan bihesin, alîkariya kurdan kir. Li bihara sala 1991ê bû, bêtir ji mîlyonek penaberên kurd ji bo ku xwe ji leşkerên Iraqê veşêrin, berê xwe dan sînorên Îran û Tirkiyeyê. Bi vê jî Emerîka û hevpeymaniyên wan neçar kirin ku devera li dijefirînê li bakûrê hêla 36ê ava bikin. Tiştê seyr ew bû ku destêwerdana mirovî hêz da kurdan ku nîvdewleteke serbixwe ava bikin.

Bi şerê Iraqê yê di sala 2003ê de, kurd li hemû dinyayê zêdetir derketin pêş. Piştî ku Emerîkayê nekarî qayîlbenda parlamentoya Tirkiyeyê bi dest bixe da ku di şerê li dijî Sedam Husên de eniyêke din veke, neçar bû ji bo bicihkirina aramiya li bakur, piştî xwe bi şervanên kurd girêbide. Kurd tekane alî bûn ku dagîrkirina Iraqê ji aliyê Emerîkayê ve wekî azadkirin da zanî. Ew herêmen ku kurdan xistin bin kontrola xwe bûne aramtirîn û geşedartirîn herêmen Iraqê. Kurdan li Bexdayê roleke aktîv jî lîst. Di sala 2005ê de serkirdeyê kurd Sekreterê Yekîtiya Niştmanî ya Kurdistanê (KYB) Celal Talebanî posta serokomariya Iraqê wergirt û selmand jî siya-

setmedarekî jêhatî û zîrek e û karî li Bexdayê yekhelwestiyekê çêbike. Yê din Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ye û wek sîwanê Hikumeta Herêma Kurdistanê tê hesabandin. Kurdên Iraqê li dijî neyarên xwe bi ser ketin di warê ji nû ve diyarkirina sînorên parêzgehan da ku paşmayiya dehan salên nijadkujiyê dubare nebe û di hilbijartinan de bi ser neyarên xwe de zal bin. Her weha Bexdayê daxwaza wan a ji bo pêkanîna referandûma ji bo diyarkirina çarenivîsa Kerkûkê qebûl kir. Ew dibêjin Kerkûk Qudisa kurdan e.

Madeya 140ê ya destûra Iraqê di sala 2005ê de derçû. Ev made dibêje, divê heta 31ê kanûna 2007ê referandûm li ser Kerkûkê bê kirin. Lê ew mesele ji ber biser-nexistina amakekariyên pêwîst hate paşxistin. Erebb û turkmen û welatên cîran jî, nemaze Tirkiye, rikeberiya hikumeta Herêma Kurdistanê dikan. Qayîşkêşanê têkilî bi egera serxwebûna kurdan û kontrola petrola Kerkûkê ve heye. Gelek iraqî û welatên cîran jî naxwazin bajarê Kerkûkê û bîrên petrolê, ku devera duyem a herî mezin a petrolê ye di Iraqê de, bikeve destê hikumeta Herêma Kurdistanê. Tîrsa wan ew e ku dahata petrolê û otonomiya wan a niha, kurdan hê bêhtir li serxwebûna germ bike. Digel hemû ew hewlên navbeynkariyê, ku Neteweyên Yekgirtî bi serkirdayetiya Nûnerê Taybet yê Sekreterê Giştî yê Iraqê Steffan De Mistura dide, hêj rewşa Kerkûkê nearam e û her aloz e. Tirkiyeyê çend çaran dupat kir ku kontrolkirina Kerkûkê ji aliyê kurdan ve xeta sor e ku dibe ku bike Tirkiye mayê tê bike.

## Tirkiye

Di salên destpêkê yê cumhuriyete de mezintirîn hêviya Tirkiyeyê ew bû ku kurd asîmîle bibin û nasnameya kurdewarî jî bi giştî ji nav biçe. Raguhasîna akinciyên û qanûna qedexekirina zimane kurdî û înkarkirina hebûna kurdan bi hinceta ku ew her tirkên çiyayî ne û ne tiştêkî din in. Piştî raperînên xwînavî ên destpêkê, ku di dawiya 1930an de hatine şkenandin, kurd li pey amûrên alternatîf geriyan da ku berjewendiyên wan pêş ve bibin. Dewleta Tirkiyeyê piştgiriya hindêk ji wan kir, lê yê din bi taybet ên ku piştî ew aramiya piştî 1930an de hatin, xwe li bizava siyasî ya aram girtin, lê berdewam bûn û venemirîn. Di salên 1950an de Partî Demokrat a Kurdistanê nû bû û di salên 1960an de jî hindêkan xwe li bizava çepgir girt. Bizava tundûtîj a PKKê di sala 1984ê de rabû û heta destgîrkirina serokê wê bi alîkariya Emerîkayê li Kenyayê di sala 1999ê de, xew li desthilatdarên Tirkiyeyê herimandibû.

Niha jî Enqere li arîşeyeke aloz qewimiye; dewleta Tirkiyeyê lêdixebite ku biçe nav Yekîtiya Ewrûpayê û pêşketinê û dest bixe. Vêca dê çawa bikare reftarê digel bizava neteweyî ya nav kurdan bike. Ji bo ku biçe Yekîtiya Ewrûpayê divê di warê demokrasî, mafên mirovan û azadiyên siyasî de reforman bike. Heta niha bi tenê

hêza leşkerî ji bo berhingarbûna PKKê bi kar hatiye û reformên siyasî jî bi bêmane û her ji bo ciwankariyê hatine kirin. Her tenê rê li ber mafên zimanî û pirtûk û kovar belavkirinê hatiye vekirin. Vê yekê bala kurdên Tirkîyeyê û nûnerên wan rakêşaye. Di heman demê de jî desthilatdaran bi hinceta dilxwazî û tagiriya PKKê, partiyên kurdî yek bi yek qedexa kirine.

Li gorî Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) ya desthilatdar, piştî ku sala 2004ê PKK ji nû ve zîndî bû ji ber acizbûna wê ji kêmiya gavên ku ji bo çareserkirina Arîşeya Kurdî hatine avêtin, wê reformên ku bi armanca çûna nav Yekîtiya Ewropayê kirine piştguh xistine. Hebûna PKKê li herêmên dûr ên li ser sînorê Iraq-Tirkîyeyê, al-ozîyeke mezin di navbera DYA û Tirkîyeyê durist kiriye. Tirk amaje bi wê yekê di-kin ku DYA hêzeke dagîrker a Iraqê ye, lewra erka wê ye ku nehêle PKKê li wir bimîne ku Wezaretê Derve ya DYAyê PKKê wek rêxistineke terorîst nasandiye. DYA naxwaze kurdên Iraqê dilteng bike. Her weha rewşa nazik a aramiya bakûrê Iraqê di sala 2007ê de li ber çav hate girtin. Washingtonê paşê helwesta xwe guherî û hişt ku cara yekem artêşa Tirkîyeyê êrîşên asmanî bike û dûre jî hişt ku operasyoneke bejayî ya sînardar li dijî baregehên PKKê bê kirin. Operasyonên leşkerî rewşa aloz ya di navbera DYA û Tirkîyeyê aram kir, lê ev gavên demî ne, arîşeya PKKê û arîşeya mezintir a kurdan her maye.

## Îran

Kurdan li Îranê yekem komara xwe ya temenkurt a serbixwe damezrand. Komara Mehabadê, destpêka sala 1947ê li ber siya Yekîtiya Sovyetan ava bû û Mela Mistefa Barzanî bavê serokê niha yê Herêma Kurdistanê, yek ji serkirdeyên herî diyar yê wê bû. Lê leşkerên Sovyetê vekêşiyên û di dawiya salê de Îranê de vera Mehabadê dagîr kir. Şahê Îranê çendîn operasyonên zalimane pêk anîn û serkirdeyên neteweyî yên Mehabadê bi dar ve kir û Mehabadê rasterast bi merkezê ve girêda<sup>3</sup>. Barzanî xwe radest nekir û di nav xelkê Mehabadê de ji bo hemû kurdan bû qahremanekî rastîn. Şahê Îranê wek Tirkîyeyê nekir û derfeta derbirîna nasnameya kulturî da, da ku kurd ji awayên neteweperestiyê dûr bikevin. Rê li ber bikaranîna zimanê kurdî vekir. Rêxistina sîxûriyê ya Îranê SAVAKê çavdêriya tekane radyoya kurdî dikir<sup>4</sup>. Lê vê yekê rê li ber ku kurdên Îranê negirt ku rêxistinên xwe ên nehênî xurt û geş nekin.

Piştî şoreşa Îslamî ya di sala 1979ê de ji nû ve alozî peyda bû. Rejîma nû li hem-ber daxwazên neteweyî yên kurdan, ji ya berî xwe baştir ranewesta. Rejîma Îslamî jî hewl da kurdan nêzîkî xwe bike û bal dikişand ser wê çendê ku binyada bav û bapîrên fars û kurdan yek e. Her çend e cudayîyeke fireh di navbera kurdên sunî û îraniyên şîe de heye, lê Îranê her tim dab û nerîtên kurdewarî qebûl kirine. Ew rab-oriya şahane ya Îranê hiştiye ku Îran wêneyekî mezin ê etnîkî çêbike ku tê de hemû

alî reng vedin<sup>5</sup>.

Du partiyên kurdî yên Îranê, Partiya Demokrata Kurdîstana Îranê û Komele, ji xwe re di Kurdîstana Iraqê de penagehek peyda kirine û li beranberî wê jî kurdên Iraqê nahêlin ku ew çalakiyên leşkerî li dijî Îranê pêk bînin. Di van salên dawîn de grûbeke nû ya bi navê Partiya Jiyana Azad (PJAK), ku şaxeke PKKê ye, rabû û li dijî rejîma Îranê têdikoşe. Her çend PJAK li dijî Îranê ne gefeke mezin e, lê digel wê çendê jî kariye artêşa Îranê bêzar bike û gelek leşkerên wê jî bikuje. Hebûna PJAKê li herêmên asê yên Iraqê hincet daye destê Îranê ku erîşên leşkerî pêk bîne û li ser hesabê DYAyê li dijî PKK û PJAKê digel Tirkiyeyê hevkarîya sîxûrî bike.

### Sûriye

Her çend e kurdên Sûriyeyê, di warê çalakiyên siyasî de di nav her çar parçeyan de kêmtir çalak in, lê hêj ji ber zordestiya domdar a dewletê û qebûlnekirina mafên wan, têne çewsandin. Lêkolerek, liv û tevgerên wan dişibîne kesekî çalak ku daxwazên xwe vedişêre<sup>6</sup>. Ji ber pênasekirina Sûriyeyê wek erebî û îslamî, kurdên di nav wê de hatine piştguhaxistin. Di sala 1962ê de, bi dînîtiya ku Rejîma Ba'sê kir, nêzîkî 200 hezar kurdî nasnameya xwe ya sûrî ji dest da û êdî ji hemû xizmetguzariyên dewletê yên wek fermanberî, perwerde û beşdariya siyasî bêpar man.

Dewleta Sûriyeyê da ser rêya siyasî Sedam Husên û bi hezaran ereb di herêmên kurdnişîn yên Sûriyeyê de akincî kirin da ku bendekê di navbera kurdên dewletên cîran û kurdên Sûriyeyê de çêbike<sup>7</sup>. Hikumeta Sûriyeyê jî bi karta kurdî list û li dijî welatên cîran bi kar anî. PKK û serkirdayetîya wê nêzîkî 20 salan (1980-1998) li şamê û li Geliyê Bekayê ye li Lûbnana di bin kotrola Sûriyeyê de man.

Her çawa be bila bibe, rûdanên ku piştî sala 2003ê li Iraqê qewimîn, bi awayekî diyar tesîra xwe li kurdên Sûriyeyê kir<sup>8</sup>. Bêzariya ku kurdan li dijî hikumetê derbirî û yaxîbûna sîvîl ya wek xwenîşandanên 2004ê yên li Qamişloyê, rejîma Esed ew qas tirsand ku xwenîşandan bi dijwarî hatin tepeserkirin. Girtin, şkence û kuştina şexekî zîrek û jêhatî di sala 2005ê de bû ciyê nerazîbûneke zêdetir<sup>9</sup>. Navdarên kurd ji wê çendê ditirsîn ku xwenîşandaneke cemawerî a kontrola wê zehmet bê, rû bide, lewra li pey rê û çareyekê digerin da ku bikarin digel rejîma Esed aştiyê bikin<sup>10</sup>. Digel wê çendê de jî nearamî her dom dike; ahenga Newroza 2009ê bi tundûtîjîyê dawî lê hat. Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî bi dijwarî rexne li hêzên îstîxbarata Sûriyeyê girt ji ber ku xwenîşanderên kurd kuştin<sup>11</sup>.

DYA derbarê Arîşeya Kurdî de 5 armancên siyasî û planekî serekî heye:

1. Hêzeke kurdî ya federal, demokratîk, aram û meşrû li bakurê Iraqê ava bike.

2. Rewşa Kerkûkê bi aşiyê çareser bike.
3. Têkiliyeke bihêz di navbera hikumeta Herêma Kurdistan û Tirkiyeyê de çêbike.
4. Arîşeya navxweyî ya di navbera tirk û kurdan bi aşiyê çareser bike û nehêle.
5. Rê û çareyeke guncan jî ji bo Arîşeya Kurdî ya li Îran û Sûriyeyê peyda bike

**Armancên planî û siyaseta DYAyê: Avakirina hêzeke kurdî ya federal, demokratîk, aram û meşrû li bakurê Iraqê**

Armanca herî mezin ya DYAyê ew e ku yekîtiya axa Iraqê di çarçoveya dewleteke federal a demokratîk de biparêze. Yekparçeyiya axa Iraqê jî girêdayî Iraqê ye. Eger Iraq bikare kurdan di çarçoveya federaliyeke serkeftî de bihêle dê yekparçeyiya xwe biparêze. Fermanên nû û qayîşkêşanên bi awayê kevin yê akincîkirinê, selmand ku ew digel Iraqê naguncin. Dariştina pêkhateyeke federal a serkeftî bo Iraqê, pêdivî bi têkoşîna domdar a iraqîyan û pûtepêdana DYAyê jî heye.

Di rêxistin û pêşvebirina herêma xwe de, kurd destpêşxerê bêrikaber bûn. Bi rastî jî piştî şerê Kendavê (1991) vir ve, kurd xwe bi xwe rê ve dibin. Ew seqamgîrî û aramiya ku niha heye, pêbend e bi bearişê birêveçûna Hikumeta Herêma Kurdistanê, kêmbûna qayîşkêşana di navbera her du partiyên mezin yê kurdan û hevkarîya digel hikumeta navendî li Bexdayê û geşbûna rewşa aborî û kêmbûna destêwardana derêkî. Wê yekê jî ku kurd li Iraqê wekî neteweyekê cuda hatine qebûlîkirin, ev aramî bêtir sepandîye. Ev yek jî li gor madeya 117ê ya destûra 2005ê, wek pîrozî hatiye parastin. Vê destûrê Hikumeta Herêma Kurdistanê, wek pêkhateyeke sereke ya dewleta Iraqa federal bi her du zimanên erebî û kurdî nasandîye.

Dibe ku kurdên Iraqê wê çendê bizanin ku ev dem di mêjûyê de baştirîn derfet e ji bo wan da ku herêmeke otonomî a aram û bihêz ji xwe re misoger bikin. Her ji ber vê çendê jî kurd mijûlî avadankirina dewletê ne û bêtir pûte bi warê jêrxan û anîna sermayeya biyanî didin û prosesê têkuztir û bihêztir dikin.

Her çawa be bila bibe, li Rojhilata Navîn federalîzm bîr û boçûneke nû û biyanî ye, ji ber ku navendên bihêz û otorîter rejîman bi rê ve dibin. Di çarçoveya destûra 2005ê de Hevbendîya Ereban bi dijwarî rexne li hizra federalîzmê digirt û qala wê çendê dikir ku ev dê nasnameya erebî ji ber Iraqê bigre. Endamên Hevbendîya Ereban tu cureyên federalîzmê qebûl nakin. Li ba cîhana erebî, her çend misilman be jî, peydabûna welatekî din yê ne-ereb di nav dilê wan de, wek peydabûna Îsraîleke din e, lewra wek hewleke din a ji bo parçekirina axa ereban bi nav dikin.

Piraniya liberhevdana ku niha li Iraqê li dar e, li ser wê çendê ye ku gelo di Iraqê federal de biryara awayê lihevparhêzîna petrolê dê ji aliyê kî ve bê dayîn, bêyî ku qala lihevparhêzîna dahata wê bikin. Federalî jî hêj her gotûbêj li ser tê kirin, ji ber ku gelek iraqî, nemaze sunne wiha difikirin ku xelat ji bo kurdan hatiye dayîn, lê kurd hêjayê wê çendê nîn in, ji ber ku di dirêjîya mêjûyê de kurd tu carî nebûne dilsozê welêt.

Bi heman awayî Tirkiye û Îran, ku cîranên ne-ereb ên Iraqê ne, bênavber li dijî Iraqê federal rabûne, ji ber ku ditirsin kurdên li ba wan jî heman tiştî bixwazin.

Digel vê çendê jî federalîzm şîyan daye kurdên Iraqê ku digel hikumeta Bexdayê kar bikin û alîkariya wê jî bikin û hindêk caran jî bibin parsengê pêwîst û karê hikumetê bi cih bin. Di vê mijarê de Joost Hiltermann dibêje, "Ji ber ku siyasatên parlamentoya Iraqê ji sala 2005ê heta niha li gorî destûrê, girîngî bi qanûnsaziya bi rizadilîyê didin, kurdan her tim û bi dijwarî cihê tiliya xwe li ser wan bi cih hiştiye. Ew hevberdiya ku di nav kurdan de heye, xweamadekirina wan - bi taybet jî eger em bidin ber yê din hemûyan - û yekbûna stratejiya wan, gelekî alîkariya wan kiriyê<sup>12</sup>.

Sê berpîrsên mezin ên kurd ku li Bexdayê kar dikin, Serok Celal Talebanî, Cîgirê Serokwezîrê Iraqê Berhem Salih, Wezîrê Derve yê Iraqê Hoşyar Zêbarî bi awayekî serkeftî berjewendiyên iraqîyan parastine û navbeynkariya qayîşkêşana di navbera aliyên sunne û şîe kirine. Digel wê jî ew ne nêrîneke realîst e, eger em pêşbîniya wê bikin ku ev alîkarî bes e ji bo ku hîzra dilsoznebûna kurdan ji serê iraqîyan derkeve. Her weha çalakiyên wan wê çendê diselmînin ku Hikumeta Herêma Kurdistanê para xwe werdigire. Pêşmerge jî wek mîlîsên din nekiriye û li dijî hikumeta navendî şer nekiriye û dikare di nav Iraqê de roleke pozîtîf jî, wek parêzvanê niştîmanî bilîze û bibe nimûneyeke ji bo guherîna mîlîsên din. Serokwezîrê Iraqê Malîkî daxwaz ji artêşa Mehdî kir ku çekên xwe deyne û ji Muqteda Sadr jî xwest ku dest ji siyasatê berde, di heman demê de kesayetîya taybet û hebûna pêşmerge bi resmî nasand.

### **Herêmên veqetandî; Hikumeta Herêma Kurdistanê dixwaze wan vegeîne**

Seqamgîriya li bakur bi buhayê giran hate bidestxistin. 17 sal hukmê otonomî yê di nav Iraqê nearam de kurdên Iraqê ji hemû civata Iraqê cuda kiriyê. Her du partiyên rikaber PDK û YNKê ew dahata ku cara yekem di sala 1996ê de li gorî biryara "petrol bi xurekê" ji Bexdayê ji wan re dihat, bi riya toreke têkiliyê ya kiryanan ji bo bihêzkirina statûya xwe li bakur bi kar anîn û pare û kontrakt bi ser alîkar û hevberîyên xwe de dabeş kirin ku bawerîya xwe pê dianîn û neyarên xwe jî dixeniqandin. Her du partiyên hana peydabûna partiyokan (partiyên biçûk) û rojnamegeriya ku gora wan dike dida. Her çend e Hikumeta Herêma Kurdistanê gelek gav avêtine û

çûye pêş, lê hêj hikumeteke bi yekcarî ne demokrat e. Di encam de hergav xeter heye. Niha tê gotin ku nişane û belgeyên metirsiya yaxîbûnê li bakurê Iraqê hene, ev yek dibe ku bi awayê îslamî yan neteweperestî û bi awayê cudaxwazî peyda bibe.

Her çawa dibe bila bibe, rijdiya kurdan ya li ser federaliyê, hana Civata Bilind a Îslamî ya Iraqê daye, ku mezintirîn aliyê şîe yê di nav hikumetê de ye, hewla pêkanîna herêmeke mezin a federal bide ku ji 9 parêzgehan pêk bê û bajarê Besre jî tê de be. Pêşniyaza Civata Bilind a Îslamî ya Iraqê qedehêk e ku tê de jahrên cur bi cur hene. Civata Bilind a Îslamî piraniya cewawera xwe ji dest daye, niha lêdixebite ku ji nû ve kontrola herêmekê bike ku mezintirîn gencîneya petrola Iraqê tê de ye. Partiya Fezîle, ku Besre di destê wê de ye, digel artêşa Mehdî û tagirên Partiya Dawayê, Tirkmen û Suneyan dijberiya Civata Bilind a Îslamî dîke<sup>13</sup>. Dibe ku Civata Bilind bi vê pêşniyazê bixwaze federalîzmê têkbide û rê li ber daxwazên kurdan bigire.

Federalîzm an di encama xebatekê de tê holê ku bo pevgirêdana çend grûbên nakkok tê kirin ku bêyî destpêşxeriya xwe dewleteke yekgirtî ava dikin an jî ji wan grûbên siyasî pêk tê ku bi destpêşxeriya xwe digihêjin hev<sup>14</sup>. Xuya ye ku arîşeya kurdî di bira yekem de, di rêza pevgirêdanê de ye. Sê parêzgehên Herêma Kurdistanê, bila herêmen vebirî yên parêzgeha Kerkûkê digel nebin, hêj herêmeke homojen (takregez) nîn e û tirkmen û aşûrî tê de ne. Di bersiva vê çendê de jî kurdên Iraqê hewl daye nasnameyê sertaserî ya Kurdistanê peyda bikin ku cihê nasnameyê her tenê etnîkî yê kurdî bigire.

Hebûna hesteke bihêz a cudabûnê, wek pêbendiya tund a bi rêkeftina federalî, dibe ku bêtir aloziyê biêxe navbeyna navend û herêman. Daxwaza cudabûnê li Kurdistanê Iraqê her dem bihêz bûye. Di sala 2005ê de nêzîkî jî sedî 95ê akinciyên wê piştgiya serbixwebûnê kir<sup>15</sup>. Cihê matmayîna nîn e ku heye ku herêmeke federal, jî bo demeke kurt û sînordar, bi dijwarî li dijî helwesta navendeke nerm bi gerê bikeve.

Belgeya vê destpêka nerm di çarçoveya danûstandina destûrî li ser madeya 140ê û arîşeya Kerkûkê û paşê jî arîşeya petrolê de dibe ku hebe. Berencama lihevnekirina Bexda û hikumeta Herêma Kurdistanê li ser wê qanûna pêşniyazkirî ye ku bo rêxistina dozîn û lihevparkirina petrolê li dar bû heta radeyekê wê şêlîbûna zelaal dîke ku derbarê desthilatên federalî de heye. Di mêjûyê de Sedam bi zanabûn budceyêke kêm bo dîtina petrolê li Kurdistanê terxan kir û niha jî bawerî di navbera hikumeta navend û berpirsên kurdan de kêm e, lewra kar di ser pesendkirina qanûna petrolê dîke. Her çend e wan li ser çûna dahata hinartina petrolê bo hikumeta navend li hev kir, lê hêj kurd rijdiyê li ser mafê morkirina girêbestên dîtina petrolê dikin da ku nehêlin nedadperweriya berê dubare bibe. Hikumeta navendî jî berevajî vê yekê rijd e li ser wê çendê ku divê yek siyaseta petrolê ya niştîmanî hebe da ku rê li ser ber egera veberhênana bêkontrol bê girtin. Vê yekê jî hikumeta Herêma Kurdistanê leng

nekiriye, tew ew her dem tédixebite ku şîrketên navdewletî qayîl bike da werin li herêmê li petrolê bigerin ku di nav wan de yên şîrketên Tîrkiye, Norwêc û Koreya Başûr hene.

Desthilatdayîna bi herêman her dem nabe sedema wê çendê ku navend êdî dest ji desthilatê berde. Li Spanyayê binêre, li wir herêmên Bask û Katalonyayê, ku xwedî otonomiya xwe ne, her dem bênavber têkoşîna û kar kirina da ku desthilatên xwe li ser hesabê navendê firehtir bikin. Damezrandîna federaliyê li Iraqê, ku herêmeke ji Ewrûpayê gelekî cuda ye, hesta namoyî (biyanî) ya ku berê di navbera akinciyên ereb û kurd de hebû hêj her maye. Erebi ji kurdan re dibêjin, "We xiyaret li Iraqê kiriye û alîkariya DYAyê kiriye."<sup>16</sup>

Egera cudabûna kurdan jî hêj rastî ye û her maye. Bexda û cîranên wê dikarin bi bikaranîna zorê rê lê bigirin û Kurdistanê bi gefa dorpêça aborî û midaxeleya leşkerî di nav Iraqê de bihêlin yan jî bi qayîlkirina kurdan û bi rêya xistina nav çarçoveya Iraqê federal wan ji bo mayîne teşwîq bikin. Her çend mastav sarkirin alternatîfekî çêtir e, lê wê yekê jî xetereya xwe heye. "Heman ew merc wiha lê dikin ku federalîzm ji bo Iraqê pêwîst be, her ew merc bi xwe federalîzmê dikin metirsiyekê li ser yekîtiya axa Iraqê."<sup>17</sup>

DYA bila dîsa xiştaya vekêşîna hebe, dê alîkariya xwe bike eger alîkariya kurdan û hemû Iraqê bike. DYA wiha tédigihê ku Kurdistanê Iraqê aram e û bi awayekî tirsnak jî pareyekî kêr ji bo programên avakirina dezgehên wê terxan kiriye. Berfirehkirina desthilata qanûnî li bakur, yek ji pêwîstiyên herî aktûel e. Her çend e her du partiyên kurd di çarçoveya desthilata xwe de pêşketin bi dest ve aniye, lê gelek nakokiyên wan hene ku heta niha jî her nivîsarên ser qaxizê ne, dibe ku di rojên teng de derkevin holê.

### **Çareserkirina arîşeya Kerkûkê bi aştiyê**

Eger hikumeta Iraqê bi hevkarîya DYAyê û Neteweyên Yekgirtî (NY), çareseriyê rewa peyda neke, qayîşkêşana nav pêkahteyên li Kerkûkê amade ye bi-teqe û dibe ku ev şidet herêmên din yê Iraqê jî vegire ku li ser axa wan qayîşkêşan heye<sup>18</sup>. Lewra Kerkûk navenda berjewendîya DYAyê ye li Iraqê. Ya ku arîşeya Kerkûkê bi vî awayî dijwar kiriye, ku xwe ferz dike bê çareserkirin, dijmintiya ji mêj ve (hukma dijwar a Sedam bi zanabûn pêk dianî) û cudahiya neteweyan, gencîneya petrola pir û destdirêjiya hêzên dereke ye.

Di çarçoveya dijberiya li hemberî Hikumeta Herêma Kurdistanê de da ku nehêlin kurd Kerkûkê ji xwe re bibin, hinceta sereke ya Tîrkiye, Îran û Sûriyeyê ew e ku dibe ku çavkaniyên petrola Kerkûkê ji bo hikumeta Herêma Kurdistanê pareyê

pêwîst ê bo serbixwebûnê misoger bikin. Ji sedî 12ê petrola Iraqê li Kerkûkê ye û devera duyem a herî mezin a petrolê ye li Iraqê. Her ji ber vê yekê jî piraniya nak-okiye li ser bajarê Kerkûkê û parêzgeha wê hene, têkilî bi wê çendê re heye ku gelo kontrolkirina vê çavkaniyê dê encameke çawa jê bikeve<sup>19</sup>.

Kurd ku dibêjin me pêdivî bi Kerkûkê ye. Ew daxwaza xwe li ser wê bingehê dikan, berî ku Sedam bi armanca erebkirina Kerkûkê, dest bi prosesa raguhastinê bike û sînorên parêzgehê biguherîne, piraniya akinciyên wê kurd bûne. Her du aliyê kurd û tirkmen pişt bi encama îstatîstîkan dibestin da ku daxwazên xwe piştrast bikin. Tirkmen bi piştgiriya Tirkiyeyê gotûbêjê li ser wê çendê dikan ku Kerkûkê ji aliyê mêjûyî ve bajarekî tirkmen e. Bo nimûne, tirkmen amaje bi îstatîstîkên serjimêra sala 1957 dikan, ji ber ku tê de wekî piraniya Kerkûkê têne nîşandan. Lê ji aliyê hemû parêzgeha Kerkûkê ve, her heman serjimêrê, piraniyeke berçav a kurdan li hemberî ereb û tirkmenan diyar kiriye ku tê de kurd ji sedî 67.47ê ne.

Ji roja ku DYAyê Kerkûkê dagîr kiriye, ew bajar bûye meydana pêşbirkê ye. Her du partiyên kurdan bi lez leşkerên xwe şandin Kerkûkê û hana kurdên ku di serdema Sedam de hatibûn raguhastin dan ku dîsa vegerin Kerkûkê. Ereba û tirkmenan jî helwesta kurdan wiha şrove kir ku dê erdê wan dagîr bikin. Daxwaza kurdan ya ji bo asayîkirina rewşa parêzgeha Kerkûkê (dubare diyarkirina sînoran, bi cih û warkirina akinciyên wê yên berê), li gorî mercên madeya 140ê ku divê piştê jî serjimêrî û referandûma ser paşeroja bajêr bê pêkanîn navenda qayîşkêşana îro pêk tîne. Tirkmenan bi piştgiriya erebên neteweperest yên sune û şîe, bi dijwarî dijberiya hêviyên kurdan kiriye. Serkirdeyên kurdan jî ketine ber fişareke dijwar a qanûnsaz û welatparêzên Kurdistanê ku ji wan dixwazin ku li Kerkûkê pêşketineke bêhtir bikin. Her çend e gelek tohmet li dijî kurdan li hev hatine anîn, lê raporteke Grûba Krîzê ya Navdewletî gihîşt wê encamê ku kurd bi giştî ji wê hînga ku ji nîsana 2003an vegeryane bi muqeydî (sînorkar) tevgeriyane<sup>21</sup>.

Di dawiyê de ji aliyê hikumeta Iraqê ve ji ber rewşa nazik a nav Iraqê, ku ber bi dubare kişandina sînorê parêzgehan ve diçû, asayîkirina Kerkûkê bi paş de hate xistin. Dudiliya hikumeta Iraqê tenê ji ber bêdesthilatîyê nebû, tew bi wî awayê ku kurdan pêşbînî kir, ji ber ku wê bi xwe nedixwest pêbendê madeya 140ê be. Xwe li hev rakêşanek digel pêşniyaza paşdexistina prosesê ji bo şeş mehan ji aliyê Nûnerê Taybet yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Stîvan De Mistora ve bi paş de hate xistin. Di rastiye de jî vê carê ji bo demeke nediyar bi paş de hate xistin<sup>23</sup>.

Navenda dijberiya dereke ya ji bo armancên kurdan yên ji bo asayîkirina Kerkûkê, bi awayekî sereke li Tirkiyeyê ye. Îran û Sûriyeyê ew qas behsa vê mijarê nekiriye. Wan pê xweş bûye ku barê giran Tirkiye hilgire. Enqere, ji ber têkiliya wê ya nêzîk a digel DYAyê, di vê mijarê de xwedî giraniyeke zêdetir e û wê karta taybet a etnîkî jî

heye ji bo ku li Bakurê Iraqê pê bilîze. Di sala 1995ê de Tirkiyeyê alîkariya pêkanîna Eniya Tirkmen kir da ku li dijî hêviyên kurdên Iraqê têbikoşe. Serkirdeyên tirkan gefa wê çendê dixwarin, heke Kerkûkê bixin ser Herêma Kurdistanê ew dê bi armanca parastina tirkmenan dest di karûbarê herêmê de werbidin. Her destêwerdaneke leşkerî li dijî hikumeta herêma Kurdistanê dibe ku bibe sedeme nerazîbûneke navdewletî û şansê serkeftina wê jî kêm be. Tirkiye dikare dorpêça aborî li ser Herêma Kurdistanê deyne û rêyên bazirganiyê yên kurdan yên bo derve bigire.

Gelo karta tirkmenan çiqas binirx e? Eniya Tirkmenên Iraqê di bin kontrola Tirkiyeyê de ye û piştgiriya jê hiltîne û wek aktorekî karîger li hesabata siyaseta hundir û derve ya Tirkiyeyê derket holê. Hêj piştgiriya Eniya Tirkmenên Iraqê di nav Iraqê de selmand ku sînordar e. Wê tenê ji sedî 0.78ê dengên di hilibijartinên 2005ê ya Iraqê de bi dest xistin û tenê 3 parlamenter gihandin Parlamentoya Iraqê.

Tirkmenên bi ser listeyên şe û yên kurdan, ji yên bi ser Eniya Tirkmenên Iraqê bêtir deng dest bi dest xistin. Sedema wê çendê jî ew bû ku nêzikî ji sedî 50ê tirkmenan şe ne û bi pey partiyên şe dikevin. Her weha tirkmenên ku li Herêma Kurdistanê dijîn jî, jixwe ji mêj ve têkiliyeke baş digel kurdan hebûye<sup>25</sup>. Tesîra Eniya Tirkmenên Iraqê zêdetir li bajarê Kerkûkê heye û wan li wir hevalbendî digel erebên herêmê kiriye, tew hevalbendî digel Grûba Sedr jî kiriye<sup>26</sup>.

Ji ber encama xirab a ku Eniya Tirkmenên Iraqê di hilibijartinan de bi dest xist, hikumeta Tirkiyeyê xwe jê dûr xist. Ji aliyekî din ve artêşa tirk ku tesîreke wê ya berçav li ser siyaseta Tirkiye ya li bakurê Iraqê heye, heta niha jî dudil e bê dest ji Eniya Tirkmenan berde an na. Ji şalên nodî ve, 1200-1500 leşkerên tirk, bi razîbûna DYA û kurdan, li herêmên di bin kontrola desthilata kurdî de xwedî baregehên leşkerî ne<sup>27</sup>. Armanca wan jî ew e ku çavdêriya PKKê bikin û dibe ku ji wê jî girîngtir, mazmazka Eniya Tirkmenên Iraqê pêk bînin. Artêşa tirkî û hikumeta wê heta niha jî li ser mijara siyaseta kurdên li welatê xwe û Iraqê jî her nakok in<sup>28</sup>. Tê gotin ku Eniya Tirkmenên Iraqê hêj dikare ziyanê bigihîne û kiryarên wiha bike ku yên li hemberê xwe aciz û tengav bike<sup>29</sup>. Bikaranîna rêbazên tund li Kerkûkê yan piştgirîkirina Eniya Tirkmenan, gelek arîşeyan ji bo Enqereyê çêdike. Tirkiye bi tawana destêwerdana li ser karûbarê navxwe yê welatekî din, di ber kêmnîneyekê de tê tohmetbarkirin. Gelo Tirkiye dê bihêle Iraq jî bi heman awayî, bi hinceta kurdên Tirkiye, dest di karûbarê wê de werbide? Pêşbîniya nerealîst ya şîyanên wê bo destêwerdana li ser karûbarê Kerkûkê jî mijareke din nîşan dide.

Meseleya rapirsiya li ser Kerkûkê metirsiya pevçûneke etnîkî heye ku dibe bi hêsanî bi Kerkûkê wê de jî biçê<sup>30</sup>. Bêguman dê derbasî Mûsilê jî bibe. Li bajarê Mûsilê jî qayîşkêşanek heye; ew bajarekî pirkêmine ye û kêmnîneyeke diyar a kurdan tê de dijî. Her weha gelek fişarên cîranên Iraqê jî li ser wê ne. Peydabûna qayîşkêşanek

bi vî rengî, tîrsa DYA û hikumeta Iraqê ye jî. Kurdan qebûl kir ku derfetekê bi planê sêqonaxî yê nûnerê NYyê Stîvan De Mistora bidin da ku bê pêkanîn, da ku guherînek pêk bê û piraniya kurdan serwest bike ku pêşveçûnek hatiye pêş<sup>31</sup>. Bi heman awayî, guherîna sînoran bi kêmtirîn geremolê dest pê dike li her cihê ku berî her tiştî berjewendiya akinciyên wê di guherîna rewşê de hebe<sup>32</sup>. Guherîna wan sînoran ji bo wê çendê nîn e ku daxwaza kurdan bihêz bike, ji ber ku dê bibe sedema wê çendê jî ku ereb ji herêmên di bin kontrola kurdan de bêne dûrxistin. Divê guherîna sînoran, digel çêkirina baweriyê be da ku guherînen paşerojê hêsan bike<sup>33</sup>. Ji wê rêçareyeka ku diyar kiribû pê ve, pêşniyazên De Mistora di berjewendiya hemû aliyên de bûn.

Arîşeya Kurdî, rengvedana arîşeyên hemû Iraqê ye, kurd jî di nav de. Yanê kurd dikarin yan têbixebitin daxwaza xwe bi ser Kerkûkê de ferz bikin yan jî bi qayîlkirin û bawerîpêdan û handanê wê bi Herêma Kurdistanê ve girêbidin. Eger wê çendê li ber çav bigirin ku herêma kurdan di wê rewşa nexweş de karî karên berbiçav pêk bîne, dê fêm bikin ku daxwaza wan pêşniyazeke ku neyê bicihanîn nîn e. Her çend e di nav serkirdayetiya kurdan de xizmpereştî heye, lê hikumeta Herêma Kurdistanê ji hemû deverên din yê Iraqê zêdetir ji bo welatîyên xwe hevîrtin û aramiyê pêşkêş dike. Hêj maye ku kurd nisxeya dawîn a destûra Herêma Kurdistanê pesend bikin û bawerî bidin kêminiyên ku li ser axa wan dijîn.

DYA li Kerkûkê tengav bûye. Armanca wê ya demkurt ew e ku nehêle li bajêr tundûtîjî dest pê bike. Ya demdirêj jî ew e, divê ji arîşeyê re çareseriyê rewa peyda bike. Eger Iraqê parçe bibe, gelo dê bê qebûl kirin ku kurd - ku hevalbendê sirûştî yê DYAyê ne lewra hevalbendê Tirkîyeyê ye - kontrola petrolê bikin? Her weha pêshateyên aktûel çî ne ku divê DYA xwe ji wan re amade bike?

Bersivên van pirsan yekser nayên dayîn. Divê DYA alîkariya bicihanîneke rewa ya prosesa sêgavî ya Kerkûkê bike. Ji bo vê yekê jî divê karmendên xwe bişîne da ku rasterast aliyên têkildar beşdarî planê NYê bikin û navbeynkariyê bikin. Divê xwe ji çewtîyên nû, wek rêkeftina nehênî yan lawekî (talî) digel hemû aliyên û di bin fişara pêdiviyên niha de, dûr bixe.

DYA dikare alîkariya Iraqê û cîranên wê yê têgihîştî bike ku bi berencaman qayîl bin yan fişar bixe ser NYê da ku planekî hêvîbexstir wek yê li Yugoslavyaya berê hate bicihanîn, ji bo vir jî darêje. Piştî ku diyar bû li wir çareseriyê mamnavendî (vasat) ji daxwazên hirwat û sirbên dijminên wan pêk nayê, devereke taybet ya rêvêbirinê hate duristkirin.

Di rewşa niha de divê Washington bi hişyarî gavan biavêje, ji ber ku nabe ji ber nakokiya li ser Kerkûkê bê neçarkirin aliyek hilbijêre. Hindek kurd wê yekê dizanin

ku helwesta DYA bi zerweret wan li Kerkûkê pesend nake û lewra ji hemû aliyên hatiye xwestin ku bi çareseriyê maqûl qayîl bin. Her çend e pêşniyazên Stîvan De Mistora bûn ciyê gengeşiyê, lê li şûna wan qala çend alternatîfên din jî tê kirin. Arîşeya hilbijartina li parêzgehê hêj maye. Tirkên di çarçoveya piştgiriya tirkmenan de, pêşniyaz kir ku jimareya berpîrsên li Kerkûkê bi yeksanî bi ser ereb, tirkmen û kurdan de bê dabeşkirin û her aliyek jî sedî 32ê kursiyan werbigire û ji sedî 4ê ku dimîne jî ji bo kêminiyên biçûk bê dayîn<sup>35</sup>. Kurd naxwazin bi pêşniyazên bi vî rengî qayîl bibin ji ber ku xuya ye ew li parêzgehê piraniyê pêk tînin; di rastiyê de eger sînoren parêzgehê jî nû ve bînin kişandin dibe ku ew bibin pîranî. Gelek parlamentaran dema ku kêmineya endamên parlamentoyê deng li ser qanûna hilbijartina Kerkûkê da û awayê dabeşkirina 32-32-32-4ê ferz kir, hevrûniştina Parlamentoya Iraqê boykot kir. Paşî jî kurdan û hevalbendên wan piştgiriya Civata Serokatîya Iraqê bi dest xist û qanûn veto kir û di dawiyê de dengdana li ser qanûnê ji bo kanûna 2009ê hate taloqkirin.

Rêçareyêke din a Grûba Krîzê ya Navdewletî pêşniyaz kir, ku navê wê kir "muamelaya petrol bi axê", li gor vê pêşniyazê kurd dê qayîl bibin ku dest ji kontrola Kerkûkê berdin û cureyekî hevbeşiyê demî ya desthilatê pêk bînin û li beranberî vê yekê jî wan dê serbixwebûna bêtir di birêvebirina mijarên aborî de hebe û bi awayekî sereke dê derfeta pêşvebirin û kontrolkirina çavkaniyên petrolê li xwe bigire<sup>36</sup>.

Ev hilbijartin eger bêne kirin di berjewendiyên DYAYê de ne, îca bila hevalbendên wê kursiyên wan jê biçin û herêmen xwe jî ji dest bidin. Lewra ew qanûna ku Parlamentoya Iraqê derxist da ku hilbijartin bêyî Kerkûk û Herêma Kurdistanê bê kirin, pêşketineke dilxweşker e<sup>37</sup>. Çaxê ku di herêmen têkel de tundûtîjî rû bide, DYA nikare heta hetayê prosesê bi rê ve bibe. Tiştê ecêb di wê çendê de ye ku yên ku baştirîn destekê di hilbijartinan de bi dest xistin ku têkeliyêke partiyên sune û şîe ye, her ew bûn ku arîşe durist dikirin<sup>38</sup>.

### **Pêşvebirina têkeliyêke aktîv di navbera Tirkiye û Hikumeta Herêma Kurdistanê de**

Ji bo DYAYê pir girîng e, eger ji bo ku hevkarîyê bikin, alîkariya Tirkiye û hikumeta Herêma Kurdistanê bike. Her du alî, du hevalbendên nêzîk yê DYAYê ne û berjewendiyên wan yên jeo-polîtîk yên hevbeş û tiştên din ên hevbeş hene.

Washington û Enqere armanca hevbeş di Iraqê de heye. Her du alî jî dixwazin welatê yekgirtî yê pêşketî û demokratîk hebe û bikaribe li hember rejîma Îranê raweste. Di maweya demdirêj de jî ji bo aramkirina Herêma Kendava Farsî, tewera Enqere-Bexdayê dikare tesîra Îranê kêmbike. Ji bo vê çendê jî tirk neçar in di Hewlêra paytexta kurdan re derbas bibin. Hikumeta Herêma Kurdistanê ji bo ku hê-

sankariyê ji bo vê nêrînê bike xwediyê çend desthilatan e. Her weha dikare aloz jî bike. Bi heman awayî pêwîst e Washington hewl bide ku tirk di Iraqê de roleke avaker bilîzin, ji ber ku dê tirs a welatên kendavê ya ji rola Îranê li herêmê sivik bike û dibe ku tirs a wan ji cudabûna kurdan nemîne. Ya ku Tirkiye dikare di vê mijarê de ji bo kurdên Iraqê bike, ew e ku peymanêke parastinê digel wan bike ku tirs a wan a li hemberî cîranên xwe ya di warê ewlekariyê de sivik bike.

Ji roja ku DYAyê Iraqê dagîr kiriye, her dem gengeşiya digel tirkan li ser wê çendê bûye ku ew bi siyasetên wan qayîl nebûne. Gelek caran ev arîşe digel karûbarê rojane yê hêzên hevpeymanan têkel bûye û nakokî di navbera Enqere û Washingtonê de peyda kiriye û rêz û baweriya DYAyê di nav welatî û siyasetmedarên Tirkiyeyê de kêmkirîye<sup>39</sup>. Bi awayekî sade, tê gotin Tirkiye ditirse ku ew pêşhatyên li Herêma Kurdistanê, tesîr li kurdên wê bike. Serokerkanê artêşa Tirkiye di çarçoveya pêdaçûna gefên li Tirkiyeyê têne xwarin, gefên li ser Tirkiyeyê hêlsengandin û rêz kirin. Egera avakirina dewleteke serbixwe ya kurdî wek girîngtirîn gefa li ser Tirkiyeyê bi nav kir û paşê jî rêxistina rewşa Kerkûkê û peyra jî navê PKKê hilda<sup>40</sup>. Tirk dixwazîn bêtir li ser egera serbixwebûna Kurdistanê biaxivin: "Eger dewleteke kurdî bibe heqîqet jî, gefa wê ya li ser yekîtiya axa Tirkiyeyê kêmkirî e, ji ber ku bizavên bi vî rengî yê rizgarîxwaz û yekgirtî û serkeftî pir kêmkirî in<sup>41</sup>." Ji ber wê çendê rehê nearamiya di sêgoşeya Tirkiye-Hikumeta Herêma Kurdistanê-DYAyê de, arîşeya kurdên Tirkiyeyê û tirs a Tirkiyeyê ya ji wê çendê ye ku dewleta federal a kurdên Iraqê, serbixwe be.

Her çend e ji mêj e PKKê gefeke rasteqîne li asayîşa Tirkiyeyê dixwe, lê DYAyê û kurdên Iraqê dereng têgihîştin ku arîşeya hebûna PKKê ya li bakurê Iraqê çî tesîrekê li têkiliyên wan yê digel Tirkiyeyê heye. Piştî kontrolkirina hemû jêderên heyî, hêj bi başî diyar e ku Enqere li hember PKKê bi ser neketiye. Li her derê sînorê Tirkiye-Iraqê nêzîkî 2-2.5 hezar şervanên PKKê hene. Çî axake li hundirê Tirkiyeyê li ber destê wê nemaye. Lê bê navber jî leşkerên Tirkiyeyê bêzar dîke û wan dîkuje. Kuştina leşkerên tirk wek çawa di hemû civakê de tesîra wê hebûye, li Tirkiyeyê jî reaksiyoneke dijwar li dijî dezgehên dewlet û siyasetmedaran hebûye û ji ber dijmindariya di navber kurd û tirkan de aloziyêke civakî peyda bûye. Bi ya xelk û serkirdayetiya wî welatî jî, êrîşên çekdarî ji axake cîran derdîçin; ew jî rewşa heyî aloztir dîke.

PKK kariye di dirêjîya sînorê Tirkiye û herêmên asê yê Çiyayê Qendîlê li nêzîkî Îranê, cihê xwe veke û tê texmînkirin ku gelek ji serkirdayên wê li wir dijîn. Her jî roja ku DYAyê Iraqê dagîr kiriye, Enqere ji hêzên DYAyê yê li Iraqê û ji pêşmergeyên Hikumeta Herêma Kurdistanê dixwaze, PKKê ji Qendîlê derxe. Ji sala 2003ê û heta niha DYAyê wek pêwîst pûte bi arîşeya PKKê neda. Hikumeta Herêma

Kurdistanê jî ji aliyê xwe ve hevî kir arîşeya heyî hinek kê m bibe. Ji ber dijwariya helwesta Tirkiyeyê ya li hember hebûna hikumeteke kurdî li Iraqueke federal û ji ber dijmindariya hizra siyasî ya navxwe ya ku li şerê li dijî PKKê dimeşîne, Hikumeta Herêma Kurdistanê dudil bûye ku gelo gotina Enqereyê bike an na? Di salên 1990î de bû ku PDK û YNKê li ser daxwaza Tirkiyeyê, şerê PKKê kirin û bi dest şervanên şerdîdane yê n PKKê gelek ji wan hatin kuştin. Artêşa Tirkiyeyê bi hemû jêderên xwe yê n heyî nekarî wan bi yekcarî di nav Tirkiyeyê de ji nav bibe. PDK û YNKê jî dudil in ku wek salên nodî kurd dîsa şerê hev du bikin. Cihê matmayî nê nî n e ku partiyên kurdî yê n Iraqê naxwazin êdî peyayê n xwe di şerê digel PKKê de bikin qurbanî.

Tirk gişt û serkirdeyê n wan hebûna PKK li ser axa Herêma Kurdistanê wekî bê nan û xwê bûna li hemberî wê piştevaniyê dizanin ku Tirkiyeyê li devera dije-firîn kir û stratejiyeye xiyanetkarî ye ku PKK wekî hêzeke amade li dijî Enqere dihêle. Ew rewanbêjiya Enqereyê ya li beranberî kurdan her dem gelek dijwar bûye û gelek caran jî bûye ciyê navreşkirinê. Kurdên Iraqê jî wer dizanin ku ev hewl in da ku Tirkiya bi wê mebestê dîsa wan vege rîne ber fermana navendî ya Bexdayê. Payîza 2007ê xaleke werçerxan bû, piştî ku di şerê li dijî PKKê artêşa tirk tûşî fişareke mezin bû, hikumeta Tirkiyeyê jî ji bo ku êrîşî aliyê dî n ê sînor bike tûşî fişareke mezin bû. Ji ber egera pevçûna di navbera artêşa tirk û kurdên Iraqê de û belavbûna wî şerî di nav axa Tirkiyeyê de, DYAyê hevkarîya sixûriyê pêşkêşî Enqereyê kir û berê êrîşên Tirkiyeyê jî da baregehê n PKKê. Kurdên Iraqê fê m kir ku hikumeta Tirkiyeyê pêdivî bi kê mkirina fişara li ser artêş û gelê xwe ye. Her weha haya wê ji tengasiya hevalbendê n xwe yê n emerîkî hebû, lewra rexneyê n xwe yê n li ser êrîşa tirkan kê m kirin. Hevkarîya sixûrî ya DYAyê ziyana her du aliyan gelekî kê m kir.

Ji bo kurdên Iraqê, PKK sedemeke veşartî ya nearamiyê ye, ji ber ku hana wê çendê dide ku tirk her req bimînin û êrîşên leşkerî pê k bînin. Ew helwesta PKK ku bi rijd li dû serokê xwe yê zîndanî diçe, ku Ebdullah Ocalan e, wiha lê kiriye ku pêşbîniya tevger û reftara wê ya bê neyê kirin; dibe ku ew berê lûleya tifengê n xwe bide birayê n xwe yê n kurd. Hebûna çekdarê n PKKê, gotinê n ku hikumeta Herêma Kurdistanê dike pûçe dike ku dibêje hêja ye wek hêzeke otonomî reftar digel wê bê kirin û desthilata wê bi ser hêzê n nav herêma wê de hebe. Êrîşên PKKê, DYAyê û Tirkiye nêzî hev kiriye ku bi awayekî li ser hesabê Hikumeta Herêma Kurdistanê bû. Di encamê de serkirdeyê n kurd yê n Iraqê bêtir li dijî PKKê derketin û Serokomarê Iraqê Celal Talebanî, bi aşkereyî, rexne li PKKê girtin û ji wan xwest ku axa Iraqê bi cih bihêlin<sup>42</sup>.

Karekî dijwar bû heta ku tirkan û kurdên Iraqê fê m kir ku pêdiviya wan bi hev heye. Kurdistana Iraqê nikare bê aborî û piştgiriya siyasî ya Tirkiyeyê bijî. Tirkiye

wek cîraneke din a Iraqê nîn e û ji wan demokratîktir e. Meseleya Arîşeya Kurdî ya li wî welatî pêş ve çûye, hevalbendê rojavayê ye, wê derfetên bazirganiyê yên rasterast digel Ewrûpayê û dûrtir jî hene. Niha du boriyên petrolê ji Kerkûkê bo Bendera Ceyhanê ya li Tirkîyeyê petrol dibin. Desthilatdarên Hikumeta Herêma Kurdistanê pê xweş e gaza xwe ya siruştî yan bo Projeya Nabûkoyê an projeyêke din bişînin ku enerjîyê ji rojhilat û rojavayê dabîn dikin.

Kurdên Iraqê rê li ber şîrketên tirkan vekiriye da ku werin li Herêma Kurdistanê kar bikin. Di sala 2007ê de qebareya bazirganiyê ya salane ya Tirkîyeyê digel bakurê Iraqê gihîşt 5 mîlyon dolarî. Di navbera sala 2003 û 2007ê de tirkan bi buhayê 2 mîlyar dolarî karê avahîsaziyê qedandin. Wan bêhtir projeyên wek dibistan, navendên kulturî, zanîngeh û rê û piran bi cih anîne<sup>43</sup>. Di encama veguhastina bazirganiyê ya di Dergehê Xabûrê re, derfeta karkirinê ji bo herêmên başûrê rojhilata Tirkîyeyê peyda kir. Çaxê ku aloziya di navbera tirkan û Herêma Kurdistanê heta bêjî bes dijwar bû, Enqereyê fêhm kir ku nikare bazirganiyê ji bo aliyê din ê sînor rawestîne<sup>44</sup>.

Ji aliyê xwe ve kurdên Iraqê wek tirkan, paşeroja xwe di Rojavayê de dibînin. Ew jî sekûler in û li dijî fişara grûbên radîkal rawestiyane ku çavkaniya xwe ji herêmên sunc û şîenişîn yên Iraqê wergirtine. Ji wê jî zêdetir ev dehan sal in hikumetên Iraqê zulm li wan dikir û wê jî wiha li kurdan kiriye ku baweriya xwe bi welatîyên iraqî neynin. Ji bo hikumeta Iraqê bi rê ve biçê, Hikumeta Herêma Kurdistanê roleke girîng di nav Iraqêke Yekgirtî de hoye. Hikumeta Iraqê bûye parseng û sengera li dijî tevgerên radîkal yên nav Iraqê. Hikumeta Herêma Kurdistanê çî qas bihêztir be û têkiliyên Tirkîye û Herêma Kurdistanê çî qas bihêztir bin, tesîra wê ya li ser Bexdayê jî dê bihêztir be.

Di dawiyê de divê bê gotin ku Tirkîye dikare qezencek din li bakurê Iraqê bike. Ew jî ew e ku başbûna têkiliyên Tirkîyeyê yên digel Herêma Kurdistanê dibe ku heta radeyeke baş, aloziya di herêmên kurdnişîn yên li Tirkîyeyê de nehêle, dibe ku gelek kesên li Tirkîyeyê ji vê çendê bawer nekin<sup>45</sup>. Piştî êrîşên Tirkîyeyê yên bo nav bakurê Iraqê kurdên Tirkîyeyê helwesteke dijwar nîşand da û dîsa bihêziya têkiliya navbera kurdên her du herêman selmand. Kurdên Tirkîyeyê şanazî bi destkeftên ku Hikumeta Herêma Kurdistanê bi dest xistine dikin û bi dijwarî têkoşînê li hemberî fişarên ku Enqere dixê ser Hewlêrê dike. Digel vê çendê jî, divê hikumeta Tirkîyeyê têkiliyên xwe digel Hikumeta Herêma Kurdistanê baş bike bi awayê ku serok Turgut Ozal xwest di destpêka salên nodî de bike.

Ji sala 2003ê vir ve Washingtonê ji bo ku tirkan û Hikumeta Herêma Kurdistanê nêzî hev bike kêmkar kiriye. Sala 2007ê bû, nûnerekî taybet damezrand, ku ew jî generalê xanenişîn Joseph Ralstin bû. Ralstin bi karekî hate wezîfedarkirin ku digel

hevkarê xwe yê tirk bi hev re programa karekî hevbeş rêk bixin ku armanca wê PKKê be û mebesta wê jî ew bû hişyarî bide tirkan û nehêle êrîş bibe ser kampên PKKê yên li bakurê Iraqê.

Ji ber ku Birêveberiya Bush bi tundûtîjiya nav Bexdayê û herêmên sunenişîn yên din ve aloz bû, ew nîşane nedîtîn ku hindêk aliyên Tirkiye û piraniya aliyên kurdên Iraqê dişandin da ku li şûna zêdetir alozbûna têkiliyan, li pey hindêk siyasetên alternatîf bikevin. Rêveberê Rêxistina Sîxûriya Neteweyî ya Tirkîyeyê (MIT) Emre Taner, çend caran û bi qayîlbûna serokwezîrê wî welatî, têkiliyên nehênî bi serkirdayetiya Hikumeta Herêma Kurdistanê re danîn. Her du aliyên jî dixwest danûstandina rasterast bi rê ve bibin, lê artêşa Tirkîyeyê û çalakiyên PKKê rê li ber wan digirt<sup>46</sup>. Hikumeta Herêma Kurdistanê amaje bi wê çendê jî kir, eger hindêk tiştên diyarkirî ji wê re li hev bînin, ew dikare mayîna PKKê li Iraqê zehmet bike<sup>47</sup>.

Alternatîfa rêkeftina Tirkiye û Hikumeta Herêma Kurdistanê geremol û alozî ye, ji ber ku her rûbirûbûneke di navbera Tirkiye û kurdên Iraqê de yan ji ber encama biryara Enqere tê ku bi tena serê xwe li dijî PKKê midaxeleya Bakurê Iraqê bike yan jî nehêle dewleteke serbixwe ya kurdî li ber deriyê wê ava bibe û ev jî wek wê çendê ye bang li hemû cîranên xwe bike ku her yek ji wan ji bo berjewendî û qezenca xwe dest di meseleyê werbide. Rêgirê din yê karê DYAyê tesîra Arîşeya Kurdî ye li ser dabeşbûna sîvîl û leşkeran di nav Tirkîyeyê de ku berê qet ne bi wî rengî bû. Hikumeta Partiya Dad û Geşepêdanê (AKP) jî berê zêdetir dixwaze reformên niştîmanî û siyaseta derve pêk bînin. Di vê dawiyê de diyar e ku Hikumeta Tirkîyeyê difikire ku têkiliyên xwe yên digel Hikumeta Herêma Kurdistanê çawa sererast bike. Danûstankarê taybet yê Tirkîyeyê li Iraqê Murat Özçelik çend caran digel Serok Barzanî rûnişt û Nêçîrvan Barzanî jî dît ku ev yek werçerxaneke pir girîng e, ji ber ku berê karbidestên resmî û serkirdyên artêşê her tim digotin heta PKKê li Bakurê Iraqê çalakiyên xwe bike, ew digel karbidestên Hikumeta Herêma Kurdistanê rûnanin. Hilbijartina şaredariyan li Tirkîyeyê, vê gava ewilîn anî holê, ji ber ku hikumeta AKPê kurdên başûrê rojhilatê û bajarên herî girîng kirin armanç, ji ber vê çendê vê dawiyê çalakiyên kurdeyatîyê pêş ve çûne. Serok Barzanî jî bi taybet digel guherîna rewşa siyasî li Washington û hilbijartina Barack Obama, rêbaza xwe guherî û biryar da êdî rexne li Enqere negire û hewla alîkariya wê da. Di vê dawiyê de nîşane hene artêşa Tirkîyeyê, ku di şerên li dijî PKKê de gelek jê hatine kuştin, berebere taktîkên xwe diguhere.

Ev, her gavên demî ne û eger nebin rastî, dibe ku bi hêsanî bêne ragirtin. DYA take hêz e ku desthilata wê li ser kurdên Iraqê û Tirkîyeyê heye. DYAyê hevpişkiya têkiliyên nû yên di navbera tirkan û Herêma Kurdistanê kir û lampa kesk ji bo tirkan pêxist da ku li derveyî sînor operasyoneke sînardar bikin. Vê destûra hanê jî jix-

webawerbûnek da hikumeta Enqereyê ku pêwîst bû ji bo di tîkiliyên xwe yê digel Hikumeta Herêma Kurdistanê de dest bi siyaseteke nû bike. Ev jî ji bo Washingtonê derfetek bû. Birêveberiya Obama divê hana Tirkîye û Herêma Kurdistanê bide ku nêzî hev bibin. Her tim xeteriya wê di holê de ye ku êrîşên PKKê û aloziya li Kerkûkê rê li ber hewlên bi vî rengî bigire. Tîkiliyên rasterast yê di navbera her du aliyên, ku DYAYê hêsankarî ji wan kiriye, dikarin egera qayîşkêşanê xav bikin û mekanîzmeyê jehvbawerîyê di navbera wan de durist bike. Tirk û kurd ji hev bawer nakin ku bikaribe bi jîr û jêhatîbûnê wan ji qayîşkêşanê rizgar bike an çareseriyekê ji wan re peyda bike.

### **Fişarlêkirina ji bo çareseriyê aştîyane ya arîşeya navxwe ya di navbera Tirkîye û kurdan de**

Seqamgîrî û aramiya domdirêj ya Tirkîyeyê berjewendiyê neguher ya DYAYê ye. Tirkîye ev 50 sal in hevpeyman e û ji aliyê stratejîk ve jî dewletekî girîng e û li ser çar-riyana çendîn herêman e. Çi arîşeyekê ew qasî paşeroja Kurdistana Iraqê û Tirkîyeyê ji DYAYê dûr nexistiye. Tirsê Tirkîyeyê ya ji ber avabûna Kurdistaneke serbixwe tarî li ser boçûna Tirkîyeyê ya li hember DYAYê û erka wê ya li Iraqê durist kiriye. Hebûna PKKê di hindêk deverên Iraqê de, ku di bin desthilata DYAYê de ye, ev yek piştrast kiriye. Tirkîye biçe nav bakurê Iraqê jî nikare PKKê ji nav bibe, lewra heta ku rêçareyek ji bo destjêçekberdana vê rêxistinê neyê peyda kirin, arîşe dê her bimîne.

Divê rêberên siyaseta DYAYê vê yekê bizanin ku Arîşeya Kurdî ya li Tirkîyeyê, çendîn sal in ewlehiya Tirkîyeyê nehiştiye û siyaseta hundir û derve ya Tirkîyeyê asê kiriye. Ne mimkun e arîşe di van nêzîkan de bê çareserkirin. Berevajî vê yekê, berde-wambûna wê dibe ku tundûtîjîyê bêtir jê bikeve û grûbên terorîstî yê din derxîne<sup>49</sup> û her tim tîkiliyên Tirkîye û Ewropayê xirab bike û Enqereyê qayîl bike ku li Iraqê bi karê aloziyê rabe. Dibe ku sedema piraniya rêgirên navxweyî yê Tirkîyeyê rijdiya wê bi xwe be. Tirk dibêjin 40 hezar kes di dema têkoşîna li dijî PKKê de hatine kuştin. Mayîna Arîşeya Kurdî jî wiha li hikumeta Tirkîyeyê kiriye ku hin karên nedemokratîk bimeşîne. Ji bo vê jî desthilata qanûnê bi awayekî normal ji bo bêzarkirin û cezadana çalakarên kurd û rêgirtin li gotinên azad û bikaranîna çalakiyên li dijî qanûnê wek çawa di salên nodî dijberên xwe ji nav dibirin; vê yekê jî dam û dezgehên wê tîkdan, ji hemûyan jî girîngtir, rola qanûnê nehişt. Kurdên Tirkîyeyê bi rijdî dixwazin Tirkîye tîkiliyên xwe digel hikumeta Herêma Kurdistanê baş bike. Li ba wan, îtîrafpêkirina dewleta Tirkîyeyê bi hikumeta Herêma Kurdistanê, nasîna wan e jî. Ev arîşe di serdema cîhangeriyê (global) de ji nav naçe û egera wê çendê jî di holê de nîn e ku tu kêmteweyek zû bi zû dest ji nasname û kulturê xwe yê pêwîst berde, nemaze eger bê neçarkirin.

Eger em wê maweya kurt li ber çavan negirin ku Turgut Ozal serok bû - bi be-revajîya serdema ku serokwezîr bû - ku lêxebitî dest bi reformên hêvîbexş bike<sup>50</sup>, gelek ji gavên demotratîzekirina Tirkiyeyê yan ji ber guherîna sîstema navdewletî û yan jî ji ber fişara rasterast ya hêzên mezintir bûye. Lê eger em rast bêjin, karîna û şiyana Washingtonê ji bo ku rasterast kar di sîstema navxwe ya Tirkiyeyê bike, karîneke sînordar e. Desteya siyasî ya Tirkiyeyê heta bêjî bes hay ji destêwerdana dereke heye û bi guman li DYAyê dinêre.

Digel vê çendê jî DYAyê her wekî çavdêrekî bêkar e û li hember çîroka Tirkiye û kurdan dest li çok ranewestiyaye. Ew di meseleya PKKyê de bi germî digel Tirkiyeyê ye. Fişar xistiye ser ewrûpiyan ku kar li dijî çalakiyên PKK û torên wê yên darayî bikin. Her weha gelek fişar xistine ser wan da ku PKKyê bixin nav Lîsteya Rêxistinên Terorîst. Ji hemûyan girîngtir jî ew bû ku di sala 1999ê de Washingtonê serkirdeyê PKKyê Ebdullah Ocalan li Kenyayê girt û radestî Tirkiyeyê kir û ev jî şikestek bû ku li PKKyê qewimî. Her di heman demê de wê zext li desthilatdarên Tirkiyeyê kir ji bo ku zordestiya li ser kurdan siviktir bikin û bi taybetî jî di salên nodî de bû, rexne li wan karên dijwar girt ku tirkên li dijî serhildêrên kurd meşandibûn.

Ev du tesîrên lawekî (talî) yê arîşeya di navbera Tirkiye û kurdan de ku ji bo DYAyê girîng in ev in; têkiliyên di navbera sivilan û artêşa Tirkiyeyê de û prosesa endamtiya Tirkiyeyê di YEyê de. Artêşa Tirkiyeyê ku xwe wek parêzerê Komara Tirkiyeyê dibîne, bi tu awayekî ne bi hebûna kêmnîyaya kurdan qayîl e<sup>51</sup> û ne jî piştgiriya wan reformên ku rê dide zîmanê kurdî di dibistanan û medyayê de bêne bikaranîn, dike. Artêşa Tirkiyeyê di meseleya Arîşeya Kurdî de li navxwe û derve jî her tim take aktorê herî karîger bûye.

Desteyeke leşkerî di salên 1960î de biryara raguhastina bikomel a akinciyan da da ku nehêlin kurd bibin xwediyê cografyayêke diyar 52 û heta îro jî dam û dezgehên tirkên kemalîst, ku di bin banê artêş de li hev vehewiyane, digel desthilata qanûnî û bürokrasiya partiyên sivil û medyayê jî, karîne statûkoya li dijî Arîşeya Kurdî li welêt bihêlin. Digel vê çendê jî partiyên siyasî yê zindî yê kurdan û AKP li dijî wan rabûn. Di hîlbijartinên tîrmeha 2007ê de, her çend e AKPyê wek partiyêke îslamî tê nasîn, lê li wan deverên ku zêdetir kurdnişîn in, encameke baş bi dest xist û hêza Partiya Civaka Demokratîk (DTP) kêmkir. (Lê DTPyê ji ber bigerxistina namzedên bêalî, karî 20 ji namzedên xwe bide hîlbijartin û ev jî bes e ji bo ku di nav parlamentoyê de grûba xwe pêk bîne.) Di Arîşeya Kurdî de dam û dezgehên sivil-artêşê baweriya xwe bi AKPyê naynin. Her çend e AKP bi dijwarî piştgiriya rewanbêjîya neteweperest a Tirkiyeyê dike, lê hêj gelek endamên wê yê li parlamentoyê kurd in û hindek ji wan şanazî bi nasnameya xwe ya kurdî dikin. Ji wê çendê jî zêdetir, tenê

bi gotin jî be, serokwezîr Recep Tayyîp Erdogan bi xwe jî pûte bi hindek giliyên kurdan daye. Her çend e sedema rasterast a tawanbarkirina AKPyê di sala 2008ê de bo wê çendê bû wê qedexa bikin, lê siyaseta ku AKPê li hember kurdan dimeşîne, ku kemalîst jî pê hesiyane, sedemeke din a meseleyê bû. Rast e di dawiyê de AKPyê di vê dozê de bi ser ket, lê bêguman zengilê xeterê ji bo wê lêda.

DYA, dixwaze AKP ber bi Hikumeta Herêma Kurdistanê û kurdên Tirkiyeyê ve gavên azatir biavêje. Ji bo ku bawerî di navbera wan de çêbibe, wek gavêk, AKP di-kare ferman bide ji bo ku pêdaçûn û lêvegeran di hukmên ku li Dadgehên Ewlekariyê yên Dewletê ji bo zîndanîkirinê hatine derxistin de bê kirin ku ew dadgeh bi biryarên Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewrûpayê de hatin hilweşandin. DYA bi heman awayî dikare digel kurdên Iraqê kar bike ku fişarê bixin ser serkirdeyên PKKê yên li Iraqê da ku kirasê leşkerî ji xwe bikin. Êrîşên asmanî yên Tirkiyeyê wiha li PKKyê kiriye ku her berevaniya xwe bike. Eger stratejiyêke siyasî ya bihêz bê meşandin, ku cureyekî lêborînê pê re be, da ku hana endamên PKKyê bide ku dakewin û bi serperîştî û bi hêsankariya DYAyê teslîmî desthilatdarên kurdên Iraqê bibin, dibe ku ev yekem gava girîng be.

Sedema din a girîng jî endamtiya Tirkiyeyê ya di YEyê de ye. Ji bo ku li YEyê bê wergirtin DYA her tim piştî Tirkiyeyê girtiye û ji bo wê çendê jî di hemû boneyên guncan de fişar xistiye ser hikumetên ewrûpî da ku di mijara wergirtina Tirkiyeyê de lezê bikin. Dema ku têkiliyên Tirkiyeyê yên digel YEyê ketin aloziyê, Washingtonê karîna tesîra xwe bi kar anî da ku ewrûpiyan qayîl bike ku derfeteke din bidin Enqereyê. Ev kar û xebat û reformên ku derheqê mafên demokratîk û siyaseta derve hatine kirin her wekî Arîşeya Qubrîsê, di dawiyê de hiştin ku Ewrûpa di sala 2005ê de digel Enqereyê dest bi danûstandinên wergirtina Tirkiyeyê bo YEyê bike.

Ew rêgirên ku li ber Tirkiyeyê mane gelek in, lê tu ji wan bi qasî tesîra bê endaze ya artêşa Tirkiyeyê ya li ser siyaseta Tirkiyeyê û arîşeya çaresernekirî ya kurdan mezin nîn e. Çimkî gelek tirk û kurdên Tirkiyeyê li welatên endamên Yeyê, nemaze li Elmanyayê dijîn, lewra Arîşeya Kurdî bi awayekî karîger hinardeyî Ewrûpayê hatiye kirin. Lewra Ewrûpa nikare xwe jê xilas bike. Ew ne girîng e gelo gumankar li ser wan xalan çawa difikirin ku welatekî misilman ê bihêz, bi 75 mîlyon an 80 mîlyon misilman ve dê çawa bê wergirtin? Gelek zehmet e YEyê bikaribe bi wê çendê qayîl bibe ku Tirkiye bêyî çareserkirina Arîşeya Kurdî bibe endamê wê. Berencamên stratejîk yên goşegîrî û nearamiya welatekî girîng e wek Tirkiyeyê li ba DYAyê pir girîng in. Arîşeyên wê dê bi ser welatên herêmê de belav bibin.

Gelek çînen tirk ên neteweperest, her ji dilxwazên Partiya Tevgera Neteweperest (MHP) ya zînofobî (tîrsa ji biyaniyan) û rastgir, heta digihê endamên artêş û neteweperestên herî çepgir jî, qet ne xema wan e, eger hêviyên Tirkiyeyê yên ji bo ke-

tina YEyê ji ber Arîşeya Kurdî neçin serî. Vê dawiyê desteyeke nehênî ku ji generalên xanenişîn, rojnameger, siyasetmedar û akademîsyanan pêk hatibû, xwestibû bi rêya kuştin û tundûtîjîyê darbeyeke leşkerî bide pêkanîn. Cihê amajepêkirinê ye pêşketinên ku di nav civaka kurdî ya li Tirkîyeyê hatine bidestxistin, ew jî nîşaneyê stratejiyeye azayanetir û siyasetsaztir in û rûdanên nav Iraqê jî tesîr li wê çendê kirîye. Ew hevpeyvînen nû 43 yê digel gelek kurdên bi ser boçûna siyasî yê cuda hatine kirin, wê çendê nîşan didin ku 3 daxwazên wan yê sereke hene; dewleta Tirkîyeyê îfratê bi wê çendê bike ku Tirkîye welatekî pîretnîkî ye - bêyî ku rasterast kurdan wek qebareyeye siyasî binase - û mukirbûn li mafên wan yê siyasî, bi taybet jî bikaribin bi azadane zimanê kurdî bi kar bînin û desthilat jî bi bajarên Tirkîyeyê bê dayîn. Her çend e çêdibe ev daxwaz bi riya lêvegeran û pêdaçûneke girîng di destûra 1982ê de, ku ji aliyê desteyeke leşkerî ve hatiye dariştin, bêne bicihanîn, lê reform erkeke dijwar e û zehmet e di van nêzîkan de bê pêkanîn.

Kurdên Tirkîyeyê ji têkoşînê westiyane, piraniya wan dixwazin zarokên wan ji çiyê bînin xwarê û êdî li kampên PKKê û di zîndanê de nemînin. Ji bo bidestxistina vê armançê jî pêwîst e berî her tiştî ew rêxistin dest ji çekê berde û paşê bihele. Lê hêj PKKê, nemaze Ocalan, piştgiriyeye zêde lê tê kirin. Vêca eger rast an jî çewt be, piraniya wan PKK wekî tekane çavkanî dibînin ku zor û zexta wê li ser dewleta Tirkîyeyê heye. Ev yek bi tenê di nav DTPê de reng venade, tew di dema hîlbijartinên dawîn de li ba wan kurdan jî reng vedayê ku dilxwazên AKPê ne, ji ber ku her çend sozên wê vekirî nebûbin jî, lê wê her soz da ku pêwendiyên xwe digel hikumeta Herêma Kurdistanê baş bike û berdewamiyê bide reformên xwe yê naxweyî. Dengderan zanî Partiya Dad û Geşepêdanê çima ku desthilata wê heye, wekî DTPê nabe, derfeta rastîn a bicihanîna soz û peymanên xwe heye.

Guherînen nav dînamîka siyasî ya kurdî, derfetên biçûk pêşkêş kirin, lê ew nikarin bi hêsanî bibin çiyê baweriyê. Metirsiya wê çendê hebû ku ji ber Arîşeya Kurdî rû bi rûbûneke zêdetir bê holê. Di keş û hewayekî bi vî awayî de berhingarbûna li dijî hîzra neteweyî û ew çav li hevsorkirina pir etnîkî ku li dar e, gelek diwartir dibe. Nîşaneyên wiha li dar in ku ev niha wiha rû dide; ji hîlbijartinên 2007 heta niha hikumeta AKP nekarî wan sozên xwe bibe serî ku dane kurdan.

Li deverên başûrê rojhilat ku piraniya akinciyên wan kurd in alozî zêdetir bûye û ber bi bajarên mezin yê rojavayê ve diçe ku li wir komên kurdên ciwan bi rotînî diçin ser cade û kolanan û karê tundûtîjî û tirsandinê dikin. Hikumeta Tirkîyeyê hemû giraniya xwe xist ser hîlbijartinên şaredariyan yê sala 2009ê, çimkî bi awayekî berfireh wekî referandûmeke li ser siyasatên AKPê dihate zanîn. Her ji ber wê çendê jî dudil e ku xwe bixe ber metirsiyên navxweyî, di wê dema ku dike ber bi Hikumeta Herêma Kurdistanê ve gavan biavêje.

## **Birêxistina Rêçareya Arîşeyeyên Kurdan li Îran û Sûriyeyê**

Kurdên Îran û Sûriyeyê dê çawa bibin faktorê berjewendiyên DYAYê? Arîşeya wan li ba DYAYê arîşeyeke mirovayetî ye, çimkî têkiliyên wê digel her du welatan xirab in, lewra tesîra DYAYê li ser wan gelek sînordar e.

Tesîra DYAYê li ser Tirkiye û Iraqê zêdetir e, çimkî DYAYê di wan her du welatan de dikare roleke pozîtîf di warê dariştina çareseriyêke sererast û têkuz bo wan arîşeyan bilîze ku gef li kurdan dixwin. Çawa ku ew arîşe ji hev cuda ne, bi heman awayî jî di Sûriye û Îranê de jî cuda ne. Piştgiriya DYAYê bo rêkeftineke baştir bo kurdan li Iraq û Tirkiyeyê – ji hevtayên wan bo kurdên Îran û Sûriyeyê – nabe wiha bê ravekirin ku Washington hana zindîbûna etnîkî ya kurdan yan dewleteke cuda ya kurdan dide. Nuha têkilî, karîgerî û derfeta karkirinê li her du aliyê sînoran tê zanîn, ji bo DYAYê gelekî baştir e eger arîşeya heyfî li Tirkiye û Iraqê ji hev cuda bike.

Her ji destpêka dagîrkirina Iraqê ve, Îran û Sûriyeyê tîrsa wê çendê lê nîştîye dibe ku ew jî bikevin ber siyasetên rejîmguhêr yê DYAYê. Îca eger DYA li Iraqê serketîtir bûya dibû ku welatîyên kurdnijad bibûna amûreke diyar bo seqamgîrkirina wan. Arîşeyên ku li Iraqê tûşî DYAYê bûn, egera tîrbîqkirina stratejiya DYAYê ya bo rûxandina her du rejîman, her çend ji nav nebîrîbe jî, bêguman kêr kirîye. Digel vê çendê jî wê rastiye wiha li wan welatan kir, biçin sengerê berevaniyêke dijwar û bêtirs û çalakane dest di karûbarê navxweyê Iraqê werbidin û prosesa pêkhatina wê jî dereng bixin.

Dewleta Îranê peydabûna PJAKê ji PKKê wek belgeya wê çendê dizane ku DYA kurdan li dijî wê bi kar tîne. Her weha Îranê nakokiyên di navbera DYA û tirkan de wek derfetekê bi kar anîye û dibêje, DYAYê li dijî binkeyên PKKê yê li Iraqê tu tişt nekiriye û bi van gotinan jî xwe li ber dilê gelê tirk delal dike. Bi berevajîya wê çendê jî Tehran her tim binkeyên PKKê û PJAKê yê li deverên asê yê li Çiyayê Qendîl dide ber topan. Serkirdeyê hêzên bejayî yê artêşa Tirkiyeyê general Başbug bi aşkerekî daxwaz ji Îranê kir ku artêşên Îran û Tirkiyeyê di dema topbaranê de hevkarîya leşkerî û danûstandina îstîxbaratî bikin 55. Di dema serdana xwe ya dawîn ya Tirkiyeyê de Serokê Îranê Mehmedînejad piştgiriya bêtir a welatê xwe bo Tirkiyeyê nîşan da ku di wê demê de artêşa Îranê zîncîreçiyayê Qendîlê bi dijwarî dida ber topan. Jê pê ve jî, Ehmedînejad bal kişand ser girîngiya lêktêgihîştina di navbera Îran, Tirkiye, Sûriye û Iraqê de ya ji bo çareserkirina arîşeyên bi vî awayî yê li herême 56.

Kurdîstana Iraqê girîngiya yekem ya îraniyan nîn e li Iraqê. Çavê Tehranê zêdetir li siyaseta şîeyên Bexdayê ye, çimkî li wir gelek dar û destik û parsengên wê hene ji bo ku lê bimîne. Ew hê lêdixebite ku tesîra wê di Kurdistanê de bimîne û çendîn kar-

tên wê hene ji bo ku li wir pê bilîze. Wê, di salên borî de dest di bakurê Iraqê werda û di çarçoveya şerê navxweyî ya di salên nodî de, li dijî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) piştî Yekîtiya Niştmanî ya Kurdistanê (YNK) girt. Îran jî wek Tirkiyeyê pira têkiliyên kurdan a bi hemû dinyayê re ye, lê ne ji aliyê qebare û ne ji aliyê bazirganiyê ve nikare qayîşê bi aboriya gelek pêşkeftîr a Tirkiyeyê re bikêşe

Her çend e Îran jî wek cîranên wê yê din têkilî bi geşekirina Herêma Kurdistanê re heye, lê Îranê pê xweştir e ku di rêlibergirtina hêviyên kurdên Iraqê de Tirkiye pêşeng be. Eger rojekê Îran dûçarî geşekirina hest û dilsoziya kurdên neteweperest be, ku heta niha tiştêkî wiha neqewimiye, dibe ku ew jî hewla wê çendê bide ku jiyane li kurdên Iraqê biherimîne. Dibe ku ev encameke karîger a tesîra şerê Iraqê be ku kar di bakurê Iraqê kiriye û nikare xwe jê biparêze.

Bêyî ku guman li Iraq, Iraq û cihên din yê herêmê de çêbike, DYA nikare hest û dilsoziya cudaxwaziya kurdî li Îran û Sûriyeyê geş bike. Yek tişt heye ji bo DYAyê da ku bikaribe hevpeymanên xwe, ku Iraq û Tirkiye ne, di Arîşeya Kurdî de pişkdar bike, ew jî ew e ku divê hest û dilsoziya neteweyî di nava cîranên wan de geş bike. Dema ku hestên neteweyî geş bûn êdî zehmet e vemirîn û lîstina bi vê kartê li Îran û Sûriyeyê jî dibe ku xala werçerxanê be. Dibe ku ew jî ji wê sedemê be ku welatên herêmê her tim guman ji wê çendê heye, di dilê DYAyê de niyazên bi vî rengî hebin, heke na, nabe delîlan bide destê wan. Arezîya xirabkirina rejîmên dijminîkar bi rêya kêmnîyên tûrebûyî mandel lê nayê dayin. Hin welatan gelek caran bo vê yekê kurd bi kar anîbûn û DYAyê jî wiha kiriye. Di piraniya van nimûneyan de kurdên sade ziyaneke tirsnaq lê ketiye. Pêwîst e DYA çewtiyên xwe yê borî dubare neke û bi taybetî jî bi temamî piştî bizavên bi vî rengî negire. Ev nayê wê maneyê ku divê DYA li hember zêdegaviyên dijwar ên li dijî mafên mirovan ên kurdan yan yan her kesî din ê di wan her du welatan de deng nebe xwe. Divê heya ji destê wê tê fişar bixe ser wan aliyan, nemaze di meseleyeke wek arîşeya bidarvekirina rojnamegerên kurd ku bêyî liberçavgiyê prosesa guncan hatin bidarvekirin.

### **Çend rasparde ji bo siyasetsazên DYAyê**

Ji bo tetbîqkirina siyaseta xwe ji Iraqê xelaskirinê, pêwîst e birêveberiya wî welatî, heta jê tê, pûte bi arîşeyên kurdan bide û divê her ji niha ve hay ji wan hebe. DYA pêdivî bi siyaseteke piralî û xurt heye. Ev raspardeyên li xwarê zehmet in û pêdiviya wan bi rêxistinê heye. Birêveberiya Obama pêwîst e di zûtirîn demê guncan de destbikar be. Her çend e hêzên DYAyê digel kêmkirina hêzên DYAyê li Iraqê kêmbin, lê birêveberiya Obama hêj gelek wext li ber wê maye. Divê bi zîrekane rewşê bi rê ve bibe û nabe di siyaseta xwe de wextê heder bike.

Hindek arîşe mirov kêmtir diwestînin. Bêguman zehmetirîn armanc ew e ku di

qayîşkêşana navxweyî ya Tirkiyeyê ya di navbera kurdan û wê dewletê de guherînek bê kirin. Dibe ku jî ev arîşe ji hemû arîşeyên din aktûeltir nebe. Dibe ku pêşvebirina têkiliyên di navbera Tirkiye û Hikumeta Herêma Kurdistanê de hêsantirîn mijar be û Arîşeya Kerkûkê jî, ku navenda wê têkiliyê ye, pêwîst e ji hemûyan zêdetir lê bê lezandin. Berencamên şîdeta li Kerkûkê dê ber bi Bexdayê ve jî biçin û dê li bakur jî ber bi Tirkiyeyê ve biçin, lewra çareserkirina rewşa paşeroja Kerkûkê dê piştgiriya siyaseta vekêşana DYAyê bike.

Divê DYAyê pêşeng be, çimkî her wê bi xwe, çewtiyên wê jî hebin, take hêz e ku dikare wan qayîl bike û fişar bixe ser wan da ku kar bikin. Çaxê ku tena bi serê xwe man, bîr û boçûna rast û çareserî jî diyar be, hêzên siyasî tu carî nîşan nedaye ku ew dikarin bi pêş ve biçin. Her weha ew çend jî nîşan nedane ku dikarin pêşkeftinên heyî biparêzin. DYA dikare bi nêrîneke firehtir nêzîkî wan arîşeyan bibe. Ev nêrîn li ba piraniya partiyên herêmî nîn e. Desthilata nû dixwaze li pey piştgiriya aktorên li derveyî herêmê jî bigere. Tetbîqkirina siyasatên bi vî rengî pêwîstî bi wê çendê ye ku divê Neteweyên Yekgirtî, Yekîtiya Ewrûpayê, Yekîtiya Welatên Erebbî û yên din jî bi awayekî aktîv beşdar bibin. Ev aktor dikarin di Meseleya Kerkûkê, destjêçekberdana PKKê, pîşesaziya petrolê û sistema perwerdeyê de alîkariya Neteweyên Yekgirtî bikin.

Ev proseseke bilez e û dubare dibe, li vir pêşkeftinên mezin bi dest ve nayên. Pêwîst e pûte bi dariştina gavên siyaseteke bihêzkerinê bê dayîn. Kerkûk serdefterê hemû arîşeyan e. Di heman demê de jî divê DYA kar li ser pêşvebirina têkiliyên di navbera Enqere û Hikumeta Herêma Kurdistanê bike, çimkî ev her du alî hevdu bihêz dikin û têkilî li vir diyardin e. DYA dikare çareseriyê bi ser wan de ferz bike, ji ber ku hemû aktor xwedî tagirên xwe ne. Pêwîst e DYA xwe ji xetên sor yê aktorên biparêze û hemû desthilatên xwe yê diplomatîk bi kar bîne.

### **Pêşîneya Yekê: Kerkûk biparêzin bila nebe berdest**

Bi nêzîkbûna dema vekêşana hêzên DYAyê ji Iraqê tesîra Amerîkayê jî dê kêmtir bibe. Lewra dem girîng e û divê li prosesa lihevanîne li Kerkûk û deverên biarîşe yê li nêzîkî wê bê lezandin da ku nehêle agirê mezin pê bikeve ku dibe ku di navbera kurdan û ereban de bibe sedema şerekî mezintir û wiha lê bike ku cîranên Iraqê jî xwe bixin nav arîşeyan. Washingtonê rê daye Nûnerê Taybet ê Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Stîvan de Mistura ku digel aliyên têkildar kar bike. Di vê rewşa niha de ev ne bes e. Mistura piştgiriya DYAyê divê û pêwîst e DYA zêdetir girîngî bi Kerkûkê bide, çimkî nabe Washington xwe nîşan bide ku dest ji erkên xwe berdaye û ya duyê jî ji ber wê çendê ye ku tesîra NYyê bêyî DYAyê dê gelekî sînoydar be. Beşdarbûna DYAyê wê çendê bi hemû aliyên nîşan dide - kurd jî tê de - ku

Washington pêbendê prosesa De Mistura û pişta rola sibêrojê ya NYyê jî di herêmê de digre. Ev jî aliyên iraqî yê cuda û hêzên hevpeyman yê li herêmê neçar dike ku beşdarî prosesê bin û bi çareseriyên mamnavend (wasat) jî qayîl bibin.

Digel damezrandina rêxistinkarekî li wezaretê derve, pêwîst e Washington alîkariya reşnivîskirina wan pêşniyazan bike ku bi armanca şkandina qeşayê û guherîna wan digel De Mistura têne kirin. Her wiha digel vê çendê de divê Washinton dest bi serjîmêreke bi kitekit a kesên ku di serdema Sedam de hatine raguhastin bike da ku alîkariya prosesa akincîkirina wan bike. Her çend e ji bo çareserkirina arîşeyan jimareke bêalî a bikitekit pêwîst e û hikumeta Washingtonê çî datayek di dest de nîn e, pêwîst e ew pê da biçê.

Ew dema ku plana vekêşîna DYAYê bê bi cih anîn, kêmiya baweriyê û aloziya di navbera aliyên de dê rewşa heyî têk bide. Ji bo ku desthilatê bîne û kevîran bînin ser rê, hemû alî lêdixebitin ku bi rêya fişarxistina ser Bexdayê, NY, welatên cîran û Washingtonê yarî (lîstik) bi vekêşîna DYAYê bikin. Ji bo nehêle ew serêşî tûşî wê bibin, divê DYAYê du rêyên aktîv ji bo çêkirina baweriyê damezrîne. Rêya yekê divê ji bilî xizmetên ku balyozxaneyê DYAYê pêşkêş dike, grûbek were digel Hikumeta Herêma Kurdistanê û hikumeta Iraqê kar bike. Ev grûb jî endamên îstîxbaratî, wezaretên berevaniyê û derve pêk tî. Erka wê grûbê divê ew be ku karê bilez bike û baweriyê bide aliyên têkildar û aliyê din qayîl bike. Wêca ji bo hêsankirina hilberîna petrolê û çêkirina jêrxaneke nû ya veguhastîne, ji bilî Kerkûkê, qanûna petrolê ku bû girêka siyasî ya navxweyî ya Parlamentoya Iraqê û Wezaretê Petrolê jî, pêwîstiya wan bi çareseriyêke maqul heye. Karên bawerî duristkirinê piştrastiyek dide Hikumeta Herêma Kurdistanê ku hikumeta DYAYê dê piştgiriya xwe bidomîne û ji bo Arîşeya Kerkûkê jî dê ji Hikumeta Herêma Kurdistanê rêçareyêke rewa bibîne û dê awayekî hikumeteke demokrat jî bê holê.

Rêya duyê ya ji bo duristkirina baweriyê, divê DYA ber bi endamên civatên cuda cuda yê li deverên biarîşe ve biçê. Ji bilî vê çendê divê Washington alîkariyê ji YEYê werbigire. Çimkî li ser hebûna DYAYê li Iraqê gelek nîqaş têne kirin û hin alî nerazî ne, lewra hêzên ewrûpî çî qas bêalî bin destkeftê dê bêtir bin. Çêdibe di darîştina dawîn a destûra Herêma Kurdistanê de ewrûpî alîkariyêke taybet bikin û destûr çî qas demokratîktir û mafên kêmineyan tê de bêtir diyar bin, dê hêsantir be da ku raspardeyên (tewsiye) De Mistura yê taybet bi rastkirina sînoran bi cih bîne.

Kerkûk bi giştî ji aliyê hikumeta Bexdayê ve hatiye piştguhaxistin û bajêr çî sûdek ji geşeya aborî ya bakur ya kurdî wernegirtiye. DYA divê fişarên zêdetir bixê ser hikumeta Iraqê da ku ji bo jêrxana bajêr û xizmetguzariya giştî budce terxan bike û mûçeya karmendên hikumetê zêde bike.

Pêwîst e ji bo hêskirina çareserîya Arîşeya Kerkûkê gavên bêtir bêne avêtin û ji bo vê armancê jî divê pareyên pêwîst ji bo xaniçêkirinê bêne diyarkirin û alîkariya teknîkî ya pêwîst jî hebe da ku li prosesa akincîkirina penaberên ku dixwazin vegehin Kerkûkê û cihê din, bê lezandin. Heta heta nuha gelek wext ji dest çûye û di vî warî de çî karekî berçav jî nehatiye kirin.

### **Têkiliyên Tirkiye û Hikumeta Herêma Kurdistanê baş bikin**

Di vê dawiyê de têkiliyên di navbera Enqere û Hikumeta Herêma Kurdistanê bi awayekî berçav baş bûne. Nûnerê Taybet yê Tirkiyeyê yê li Iraqê cara yekê li Bexdayê hevdiînek digel Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî pêk anî. Her çend e her du alî soza gotûbêjên berdeham didin, lê ev hewlên ku tene dayîn hêj her nazik in û dibe ku her rûdaneke dereke encamên wan ji nav bibe, bi taybet jî eger tundûtîjî peyda bibe. Destpêxerîya berfireh a DYAyê ya ji bo xweşkirina têkiliyên di navbera Herêma Kurdistan û Tirkiyeyê ji bo demê maqûl, karekî baş e û başiya wê jî tenê ne ew e ku dê rê li ber vekêşîna dawîn a leşkerên DYAyê ji Iraqê xweş bike, ji bo aramî û seqamgîriya seranserî ya herêma kurdan û aliyê din jî dê baş be.

Yekem noqteya destpêxerîya DYAyê ya ji bo bihêzkirina gotûbêjên nû yê di navbera Hikumeta Herêma Kurdistan û Wezaretê Derve ya Tirkiyeyê de divê bi rêya rêxistina kanaleke sêqolî ya Tirkiye, Hikumeta Herêma Kurdistan û DYAyê ya bo diyalogê be. Di heman demê de jî divê hestiyarên hikumeta Iraqê cidî bêne wergirtin û divê ev mekanîzmeya sêqolî, rêya asayîkirina têkiliyên di navbera Hikumeta Herêma Kurdistan û Enqereyê xweş bike. Yek ji armancên diyar jî ew e ku divê hem aliyê tirkan hem jî aliyê kurdên Iraqê hay ji gotinên xwe hebin û hestiyariyên hev li ber çavan bigirin. Ji bilî wê çendê jî ev mekanîzma dikare alîkariya wan aliyên jî bike da ku plana têkiliya aborîyê ya bo paşerojê rêk bixin û plana hinardeya petrol û gazê û jêrxana veguhastinê û rêya bazirganiya nav Tirkiyeyê heta Ewrûpayê tê de hebe. Hebûna berjewendîya Tirkiyeyê di hinardekirina petrol û gazê de rastî ye, çimkî berî her tiştî tê pêşbînîkirin ku ji sala 2011ê ve enerjîya Tirkiyeyê têra wê namîne. Bihêzkirina têkiliyên bazirganiyê bi rêya veberhênanê di warê jêrxana petrolê de, dê têkiliyên din jî bihêztir bike.

Beşdarîkirina DYAyê dê gelekî sûdmend be; dê aliyên têkildar li ser rêya rast bihêle û prosesa lihevkerinê bileztir bike û bike ku aliyên têkildar ji prosesê dernaçin û her weha li hemberî wan hêzên muxalîf ên Tirkiyeyê ku biryar daye li dijî van hewlan rawestîna dê piştî hikumeta Tirkiyeyê bigrin û bi rêya bawerîpeydakirinê jî dê çareserîya qayîşkêşanê hêsantir bike û nahêle qayîşkêşan gur be û dezgehên bilind yê siyasî jî werin nav arîşeyê û bi taybet jî nahêle bikeve ber destê medyayê.

Mekanîzmaya hanê dikare alîkariya tesrîhkirina PKKyê bike (li beşa bê binêre) û

ev jî di wî warî de heta bêjî gaveke gelekî girîng ya serkeftinê ye. Divê armanc ev be ku bi ser Enqereyê zal bin da ku îtîrafê bi Hikumeta Herêma Kurdistanê bike. Wiha li Enqereyê bikin ku konsolxaneyê xwe li Hewlêrê veke – çawa ku Tehranê vekiriyê - da ku kanaleke tîkiliyê rasterast ya domdar di navbera Tîrkiye û Herêma Kurdistanê de deynin. Konsolxane dê hebûna Tîrkiyeyê li bakurê Iraqê bike resmî û alîkariya bihêzkirina tîkiliyên Tîrkiye û kurdên Iraqê bike û bibe rêgirek li ber egera her destêwerdaneke Îranê.

Dema ku dest bi van hewlan bê kirin, divê DYA dest bi karê wekî destpêxeriyê rêbaza 2ê bike da ku derbarê hebûna iraqêke federal de piştrastiyêke bêtir bide Tîrkiyeyê ji bo ku bibe sedema tîkiliyêke nêzîktir a di navbera Herêma Kurdistan û Enqereyê de. Ev gav dê destkeftên dîplomatîk bihêztir bike. Nabe em pêşveçûna tîkiliyên di navbera Tîrkiye û kurdên Iraqê de û qebûlkirina iraqêke federal bi cidî wernegirin. Neteweperestên rastgir û neteweperestên çepgir û artêşa Tîrkiyeyê dijberiya başbûna tîkiliyan digel Herêma Kurdistan û kurdan bi gîştî dikin. Ev hêz li hember bilindbûna daxwazên kurdên Tîrkiyeyê hestiyar in. Hewlên General Başbug yê bo peydakirina rêçareyêke alternatîf dibe ku zêde dom nekin, ji ber ku erka wî dê tebaxa sala 2010ê biqede û kesê ku dê were çîhe wî dibe ku biryar bide vegere berî statûkoyê.

Tiştê seyr ew e ku ev destpêşxeriyê rêya 2ê, tenê ji bo başkirina tîkiliyên di navbera Tîrkiye û Herêma Kurdistanê de nîn e, tew ji bo DYA û Tîrkiyeyê jî pir girîng e, çimkî beşeke mezin a gelê Tîrkiye, medya û artêşa Tîrkiyeyê gihîştîyê wê baweriyê ku DYA dixwaze dewleteke kurdî ya serbixwe li bakurê Iraqê ava bike. Tîkiliyên dêrîn yê di navbera artêşên DYA û Tîrkiyeyê de dibe ku hindêk ji wan dil-tengiyên sar bike, lê di dariştina siyaseta derve ya welatên wan de gelê tirk bûye faktoreke girîng.

Pêwîst e Washingtonê ji bo tîkiliyên baş yê di navbera Tîrkiye û Herêma Kurdistanê de piştgiriya ewrûpiyan bi dest bixe. Ewrûpî dikarin alîkariya baştirkirina tîkiliyên bazirganî û aboriyê bikin. Ji wan yekxistina bankayên taybet û telefon û sîstemên din yê tîkiliyê û têkoşîna li dijî madeyên bêhişker (hişber) û piştgiriya li dijî qaçaxiyê, nehiştina çavdêriya li ser sînor da ku bigihê radeya standartên Yeyê; ev yek dê tîkiliyên Tîrkiye û Yeyê xweştir bike.

### **PKK tesrîh bikin**

Ev pêkhateyêke girîng e ku di dawiyê de tîkiliyên Hikumeta Herêma Kurdistan û Tîrkiyeyê bihêz dike. Her pêşkeftinek di vê mijarê de bê kirin, çawa dibe bila bibe, pêbendê xweşbûna danûstandinên di navbera Tîrkiye û kurdan de ye. Armanc li vir ew e ku fişara ser PKKê ji her aliyekî ku bigunce, bêtir bê kirin da ku di encamê de

payedarên PKKê li bakurê Iraqê paş de vekêşin. Rêçareyeke siyasî û leşkerî bi hev-beşî û hevkarîya DYA, Hikumeta Herêma Kurdistan û Tirkiyeyê pêwîst e. Em bêjin pêşkeftin di têkiliyên tirk û kurdan hate pêş. Hîngê Washington dê fişar li Serokê Herêma Kurdistanê Barzanî û Serkomarê Iraqê Talebanî bike da ku PKKê şermezar bikin û jiyana çekdarên wê zehmetir bikin. Talebanî dibêje, dema wê xebata çekdarî ku PKKê dike boriye. Barzanî û Hikumeta Herêma Kurdistanê bi dengê bilind kiryarên PKKê yê li cotmeha 2008ê şermezar kirin ku tê de gelek leşkerên tirk hatin kuştin.

Prosesa kontrolkirineke bi hêz ya li ser PKKê, pêdivî bi plan û alîkariyeke bihêz a di navbera kurdên Iraqê, tirkan û DYAyê heye. Başbûna têkiliyên di navbera Enqere û Hewlêrê de - li jorê hate nixandin - gava pêşî ye. Piştî divê tirk dubare qanûneke lêborînê derbixin ku tê de ji bo piraniya şervanên PKKê rênexşeyek hebe da ku vegerin Tirkiyeyê bêyî ku ji cezaxwarinê bitirsin yan li bakurê Iraqê bimînin û têkilî bi pêşmergeyan re deynin. Heke payedarên PKKê dest bi dabirînê kir, lêborîn dê yekser karîger bibe. Ya sêyê, pêwîst e berpîrsên kurdên Iraqê û artêşa DYAyê payedarên çekdar yê PKKê piştrast bikin û paşerojekê bo wan saz bikin. Divê berpîrsên DYAyê li Iraqê mekanîzmeyeke birêvebirina prosesê bêçêkkirinê darêjin; çekdarên PKKê sengerên xwe bi cih dihêlin û çekên xwe jî bi çavdêriya tirkan radestî ofîsên DYAyê dikin - dibe ku PKK zêdetir bixwaze dest ji çekên xwe berde eger bizane DYAyê beşeke prosesê ye. Bila proses aşkeretir be - bo nimûne bi televîzyon be - wê demê dê cemawera Tirkiye bêtir bawer bike ku ev rast e. Dibe ku efûya Tirkiyeyê sînordar be, yanê serkirdeyên PKKê li xwe negire, dibe ku pêşniyaza parastin û selameta wan pêwîst be da ku hênder bihêztir bin.

Heke ew gav hatin avêtin divê kurdên Iraqê soza wê çendê bidin ku êdî li hember hebûna PKKê di herêmê de çavê xwe nagirin. Yanê çêdibe hêzên leşkerî yê Hikumeta Herêma Kurdistanê li deverên Xakûrk, Zab û Qendîlê xalên kontrolê deynin da ku PKKê nikare bilive û lojîstîk negihê wê.

Leşkerên DYAyê çawa ku bi rêya zanyariyên îstîxbaratî alîkariya Tirkiyeyê kir, ew dikarin bi heman awayî alîkariya Hikumeta Herêma Kurdistanê jî bikin da ku nehêle çekdarên PKKê li gundên kurdan liv û lebatê bikin. Komîteyeke sêqolî ya alîkariya leşkerî ya bi serokatiya DYAyê dikare heta radeyeke baş bi vî karî rabe. Dema ku têkoşîna li dijî PKKê pêdivî bi çek bû, dibe ku DYAyê li ser egera bikaranîna hêza asmanî li dijî her pamayiyeye radîkal, bifikire. Divê DYA alîkariya berpîrsên hukmî yê Herêma Kurdistanê bike ku ji bo qayîlkirina kurdên bakurê Iraqê ku dilxwazên PKKê ne, dest bi hewildaneke têkiliyên giştî bikin da ku xwe ji wê rêxistinê dûr bixin. Her bi vê rêyê jî dê baş be ku wiha lê bê kirin, PKKê dest ji PJA-Kê berde ku ew jî bi giştî rêxistineke wek wê ye. Her çiqas armanca wê Îran be jî, lê

hebûna PJAKê dibe ku gef li Tirkîye û kurdê Iraqê jî bixwe.

Pêwîst e DYAyê di birêveberina vê prosesê de alîkariyê ji ewrûpiyan werbigire. Heke prosesa bêçekkirinê dest pê kir, hikumetên ewrûpî dikarin li dijî jêrxana pêşketî ya piştgiriya PKKê li Ewrûpayê, ku wek pîşeya civat û şirkatî ne, çend pê-abûnên diwartir pêk bînin. Bi taybetî ji di warê prosesa wergirtina Tirkîyeyê bo YEYê de, ew dikarin tesîra xwe ji bo qayîlkirina Tirkîyeyê bi kar bînin da ku pêdaçûnê di dosyayên tagirên PKKê de bike ku li gor qanûnên ku Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewrûpayê wek nerewa bi nav dike, hatine girtin. Dibe ku Ewrûpa ji bo serkirdayetiya PKKê bibe qonaxa dawîn jî. Welatên malxwê divê karekî wiha bikin da ku nehêlin êdî ew kes bêne tengav kirin ku çalakiyên siyasî dikin.

### **Federaliya di Iraqê de bihêztir bikin**

Pêwîst e birêveberiya Obama li gor planên domdirêj li paşeroja Iraqê binêre. Divê piştgiriya xwe ya bêendaze ya ji bo yekîtiya axa Iraqêke federal dubare bike û bawerîya xwe jî pê bîne. Divê bawerîya xwe bi Iraqê bîne ku dikare dubare sînorên xwe yên navxweyî bi rêya demokratîk destnîşan bike. Her weha divê helwesta xwe dubare bike ku ne ku her berjewendiya wê di danîna binkeyên leşkerî di Iraqê de nîn e, tew tenê dê wê demê vê alternatîfê li ber çavan bigire, eger hikumeta Iraqê bi taybet jê bixwaze wiha bike. Ne wek awayê rewşa hêzên DYAyê li Iraqê, divê DYA girîngiyeke mezin û domdirêj bide yekîtiya axa Iraqê û pêkanîna federaliyê. Yanê wek dibêjin, nabe çî pêşniyazek ji bo binermî dabeşkirina Iraqê bo sê herêmên cuda bike û ji dêvla wê ve divê tekezî li ser wê rêçareya nav destûra Iraqê bike ku rê ji bo parêzgehên Iraqê xweş kiriye da ku di nav çend qebareyên federal ên cuda de hev bigirin.

Birêveberiya Obama pêwîst e, bi aşkereyî, dijberîya xwe li hemberî dubare kişandina sînorên vê herêma dinyayê xuya bike. Pêwîst e jî bi hêz wê çendê nîşan bide ku DYA tu carî li hember çî hewleke cîranan nermî nîşan nade eger dest di karûbarê navxweyî ya Hikumeta Herêma Kurdistanê yan Iraqê werbidin. Dibe ku jî DYA hewl û xebata xwe berfirehtir bike da ku wê dudiliya endamên Yekîtiya Erebîyan ya ji ber tîrsa zêdebûna tesîra îraniyan li başûrê Iraqê û peydabûna dewleteke serbixwe ya kurdî li bakur bibîne û Iraqêke federal di vê navê de peyda bibe. Ev metirsî rastî ne û hêja ye ku bêne belavkirin. Digel vê çendê de jî dewletên ereb tesîreke kêr di hundirê Iraqê de heye û lêdixebitin nehêlin Iraqêke federal arîşeyên bêtir bo wan û bo Iraqê jî durist bike. Siûdiyan û misirîyan bînin da ku bi taybetî piştgiriya Iraqêke federal bikin, ew jî wê çendê nîşanî suneyên Iraqê dide ku dema wê hatiye ku di welatê xwe de bi asûdeyî bijîn û êdî pêşbîniya nerealîst a vegera Iraqê bo berî 2003ê nekin.

Egera wê çendê zêde ye vekêşana DYAyê ji Iraqê aloziyên navxweyî zêdetir bike û wiha li hindêk ji grûbên wek kurd bike ku ji paşeroja xwe dilteng û biguman bin. Dibe ku girîngtirîn takegarantiya ji bo hevgerîmayîn û seqamgîriya axa Iraqê, nehiştina tirs û gumana kurdan e di çarçoveya Iraqêke federal de. Lewra divê Birêveberiya Obama bi lez konsolxaneya welatê xwe li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê veke û wek îşaretek jî ji bo pêbendbûna Washingtonê bi bakura federal a kurdî, pêwîst e çend çavkaniyên girîng jî ji balyozxaneya xwe li Bexdayê bo wir veguhêze. Diviya ev gav ji mêj de bihatana avêtin. Konsolxaneyê DYAyê li Hewlêrê eger aktîf kar bike dê alîkariya Hikumeta Herêma Kurdistanê bike da ku sîstema desthilatê, jêrxana civaka sîvîl û sîstema perwerdeyê bi alîkariya ajansên DYAyê bê baştirkirin wek Ajansa Geşekariyê ya Navdewletî û DYAyê û rêxistinên navdewletî yê nehukmî.

### **Alîkariya Tirkiyeyê bikin da ku arîşeya kurdên xwe çareser bike**

Arîşeya Tirkiyeyê ya digel kurdên xwe, hêj her di maweya domdirêj de diwartirîn, zehmettirîn û girîngtirîn arîşeya wî welatî ye. Ev jî ji ber wê çendê ye ku ke-tiye nav welatekî endamê NATOyê û seqamgîriya wî welatî û rola wê de herêmede ji bo DYA û ji bo Rojavayê jî girîng e. Ew arîşe ya destpêka sedsala borî ye ku dewleta Tirkiyeyê ava bûye. Dibe ku ji bo DYA karekî hêvîbend be, eger lê bifikire têkilî vê arîşeyê bibe, lê rastî ew e ku eger di vê eniyê de jî serkeftin neyê bidestxistin hemû gavên ku li jorê hatine pêşniyazkirin têrê nakin.

Dibe ku pêşkeftinên digel pêşniyazên ku li jorê hatin destnîşankirin tesîreke baş li ser Arîşeya Kurdî ya li Tirkiyeyê hebe. Lê hêvî û daxwazên kurdên Tirkiyeyê bi wan pêşveçûnan neyê bicihanîn ku bi tenê di Iraqê de hatine kirin. Eger arîşeya heyî bê piştguhixistin, bêguman dê li bakurê Iraqê zindî bibe. Beşdarbûna DYAyê di vê arîşeyê de dikare bi çend rêyên cuda be. Yek ji wan ew e ku birêveberiya Obama dikare çend bingeşên diyarkirî saz bike. Pêwîst e di piştgiriya hewlên li dijî terorê yê Enqereyê de û daxwaza têkilîdanîne ya wê bi YEyê re xwe nede paş. Divê tekeziyê li ser wê çendê bike ku çareserîya Arîşeya Kurdî dê bi rêbazên demokratîk bê pêkanîn. Çimkî qebûlkirina Tirkiyeyê ji aliyê ewrûpayîyan ve, pêbendê wê çendê ye ku Tirkiye Arîşeya Kurdî ya li nava xwe çareser bike, lewra DYAyê dibe ku piştgiriya xwe ya bo wergerîna Tirkiyeyê bo YEyê bi wê yekê girêbide ku divê Tirkiye ji bo çareserkirina Arîşeya Kurdî hewleke rasteqîne bide, bêyî ku yekîtiya axa Tirkiyeyê bixe metirsiyê.

DYAyê wek hevkarên xwe yê ewrûpî nekiriye û di dirêjîya mêjûyê de ji tirsê ku Enqere tinazê xwe pê neke, xwe ji rabûn û rûniştina digel serkirdeyên kurd yê Tirkiyeyê parastîye. Divê ev yek biguhere, çimkî Enqereyê selmandiye ku di warê

danûstandinên digel aliyên siyasî yên vê arîşeyê de heta îro tu tesîra wê nebûye. Di encamê de kurdên Tirkiyeyê dest ji wê çendê berdaye ku rojek bê dewleta Tirkiyeyê hindek ji daxwazên wan bi cih bîne. Eger têkilbûna duqolî ya DYA û YEYê di vê arîşeyê bikin, dibe ku bişkojeke hêviyê bibiştir û sebr bide heta ku hikumetên tirk hest bi aramiyê dikin û hinek bihêztir dibin ku bikaribin bi ser dijberên neteweperest yên navxweyî de zal bibin. Washington û paytextên ewrûpiyan dikarin rasterast serkirdeyên kurdên Tirkiyeyê ku dijberiya rêbaza tundûtîjiyê dikin, bixin nav prosesê û vexwînin DYAYê û rê bidin ku biçin nav civaka sîvîl ya DYAYê û di warê tevgera sîvîl de alîkariya wan bikin, wan perwerde bikin. Washington dikare hana serkirdeyên kurdên Iraqê jî bide ku dilê kurdên Tirkiyeyê ji têkoşîna çekdarî sar bike, ji ber ku ev têkoşîn ne ku tenê bêencam e tewê ezmûna kurdên Iraqê jî tûşî metirsiyê bike.

Di dawiyê de sîstema siyasî ya Tirkiyeyê pêdivî bi reforman heye. Reform tenê ji bo ku Tirkiye bikaribe baştir hukim bike pêwîst nîn e, her weha dê derfetên baştir jî bide ku Tirkiye bibe endamê YEYê. Eger DYA piştî wan reformên destûrî bigre ku rewşa mafên mirovan baştir û mafên demokratîk û hukumranyê firehtir dikin, dibe ku rewş biguhere û dijberên wan guherînan bêhêz bikevin. Birêveberiya Obama dikare daxwaza xwe ya bo alîkariya Tirkiyeyê bi her rêyê hêja xuya bike, bêyî ku wî welatî ji bîr bike. Wexta Washingtonê heye û selmandiyê ku DYA pêbendê serkeftin, demokrasî û seqamgîriya Tirkiyeyê ye û tu tiştê wê nîn e ku jê şerm bike û ji hevkarên xwe veşêre.

### Îşaret bo Sûriye û Îranê bikin

Têkiliyên DYAYê yên digel Sûriye û Îranê di vê demê de, ew qas ne hêja ne ku di Arîşeya Kurdî de rasterast sûd jê bê wergirtin. Her du welat ji wê çendê ditirsin, dibe ku DYA bixwaze welatîyên kurd ên her du dewletan han bide bi armanca fişarxistina ser rejîmê û pêkanîna şoreşê yan bixwaze aramiya wê têk bide ya ji wê jî xirabtir rejîmê birûxîne. Washington pêşwaziyê li rabûna bizaveke neteweyî ya sertaserî di herêma de nake. Bi kurtî çimkî dê wan hemû pêşkeftinan bixe xeterê ku dibe li gorî rasperdeyên li jorê hatine pêşniyazkirin pêk bînin. Birêveberiya Obama divê amaje bi wê çendê bike ku ne bi aşkere û ne bi nehênî hana kurdên Sûriye û Îranê nade ku şoreşê bikin.

Çaxê ku Hikumeta Herêma Kurdistanê lêdixebite ku coşa kurdên Îran û Sûriyeyê xav bike, Birêveberiya Obama dikare piştî Hikumeta Herêma Kurdistanê bigre da ku digel Îran û Sûriyeyê bibe navbeykar û ji bo ku rewşa jiyana kurdên xwe çak bikin alîkariya wan bike. Ji aliyekî din ve pêwîst e Washington wiha li Enqereyê bike ku bi şam û Tehranê re bêje, Washington dixwaze êdî piştgîriya wan alîkariyan neke

ku Enqere digel her du welatan li dijî kurdên Iraqê dike.

Di dawiyê de eger têkilîdanîna digel Îran û Sûriyeyê bibe siyaseteke birêveberiya Obama, pêwîst e Arîşeya Kurdî bike mijara sereke ya ajandaya xwe.

### **Bicihanîn**

Ji bo ku siyaset têk neçe, pêwîst e tevahiya ajans û wezaretan bi hemû karînan zanîna xwe bi hev re kar bikin. Berpirsiyariya wan nêrînên siyasî yê di vê raporê de hatine pêşkêşkirin, bêguman dikevin stûyê ajans û bûroyên cuda û ya li dijî hev yê ku qayîşê bi hev re dikêşin û kar li ser asayîşa neteweyî dikin. Wê dema ku Fermandarê Navendî yê DYAYê şerê Iraqê bi rê ve dibe, fermandarê Dewletên Yekbûyî yê Ewrûpayê ye ku bi Tirkiyeyê re radibe û rûdine.

Bi lez damezrandina rêxistinkarekî asta bilind, pêdiviyê girîng e. Çar sedemên girîng hene ku vê çendê dikin gaweke pêwîst. Ya yekê, erk mezin û aloz e. Eger Birêveberiya Obama tekezî li ser têkiliyên xwe yê digel Bexdayê bike û erkê hanê bide alîkaran neza û nejhêhatî dê ev arîşeya girîng di nav geremola mijarê de winda bibe. Ya duyê, ev karekî pratîkî ye, pêwîst e tu li ser kar bi û arîşeyên heyî diyar bikî û ji bo erka heyî gelek seferan jî bikî. Wezîrê derve û cîgirên wan ên rasterast û tew cîgirên wezaretê jî gelek caran ji ber erkên di çavê xwe jê re digrin. Ya sêyê, dibe ku damezrandina rêxistinkarekî wê mesaja aşkere arasteyî hemû aliyan bike ku arîşeya girîng e û DYAYê jî dixwaze bi dûv de biçê. Gelek zehmetir jî dibe bo aliyan eger dudiliyê jê bikin an jî bi paş bixin di wê dema ku kesek hebe di ser milê wan re li wan temaşe bike. Ya çarê, ji bo ku ev kar û xebat bi ser bikeve divê proses aşkere be. Heta niha jî di vê herêmê de bawerî û hêvî ji hemû tiştêkî din pêwîstir e. Hemû aliyan ku têkilî bi Arîşeya Kurdî re heye ji hev bawer nakin û piştî xwe bi DYAYê jî girêdin. Eger tenê kesek ji vê erkê berpirsiyar be, aliyan têkildar jî dê derbarê dil-tengî, pêşniyaz û dijberiyên xwe de mesajeke yekcure werbigirin.

Ew rasperdeyên ku li vir hatine kirin, wek erka berê ya Ralstin nîn e, ev ji yê berê tûkuztir in. Her çend e pêwîst e nûner ji wezaretê derve be û raporê xwe bide wezîrê derve û digel prosesa ajansa navxweyî hev bigire û pileya wî wek komîteya alîkaran be, lê hêj her divê Serok Obama bi xwe wî nûnerê deyne. Pêdiviya vî nûnerê bi wê yekê heye ku tedbîrên aşkere li Washingtonê hebe. Arîşeya zehmet bo wî kesê ew e ku dê çawa bikare digel hemû bûrokrasiya li Iraqê ya li Wezaretê Derve û cihên din peyda bûye kar bike. Ev nûner nabe wek yê din be ku heta niha piştgiriyeke kêmbi dest xistine, tew divê bibe ferman da ku vî nûnerî tîmeke berfireh hebe, çimkî dibe ku wext faktoreke sereke be, çunke heye ku Birêveberiya Obama ew qas wext nebe ku bikaribe ji bo çend mehên nediyar lêkolîn bike û li pey ras-

tiyan bikeve. Divê tîm ji çend beşên cihê yê bûrokrasiya asayîşa neteweyî bên da ku bi hêsanî têkilî digel ajansên din deynin û kar bikin.

### **Berencam**

Hemû arîşeyan çareseriyê zelal û aşkere nîn e. Xuya ye ku girîngtirîn armanca DYAyê ew e, xwe ji wî agirê mezin biparêze ku eger li ser Kerkûkê berpê bibe, dê bibe sedema şerê navxweyî yan encameke xirabtir jî. Di vê raporê de hewlek hate dayîn ku bêje ji bo gihiştina vê armançê pêdivî bi kar û hewleke bêwestan heye ne ku ew kar tenê li Kerkûkê bê kirin. Berî her tiştî û ji hemûyan jî girîngtir ew e ku Arîşeya Kurdî ji dema împaratoriyan ku ji mêj ve nemane, maye. Li her cihê din-yayê împaratoran hukm kirine û li gelek deverên dinyayê împaratoran li pey xwe arîşeyên cografîk û jeo-siyasî wek mîrat hiştine û divê ew bîne çareserkerin.

Arîşeyên kurdên Iraq, Tirkiye, Îran û Sûriyeyê, di piraniya salên sedeya bîstê de ji hev hatibûn dabiran. Şert û mercên îro heta radeyê berçav ji yê salên 1980î û destpêka 1990î cuda ne, çimkî têkiliyên civaka kurdewarî û şax û tayên wê yê li derveyî Kurdistanê, niha gur û geştir bûne. Kurdên ku li welatên biyanî bi cih û war bûne, bûne sedemêke alîkar a pêşveçûna têkiliyên nav civaka kurdewarî. Dema ku tu li Elmanyayê têkilî bi rêxistinên kurdên Tirkiyeyê dikî û dikevî çalakiyan û li dijî hikumeta Tirkiyeyê xwenîşandan dikî, bizroke ciyawazî heye eger tu kurdekî iraqî bî an ji Îranê ve hatibî. Bi heman awayî karîgertirîn çeka ku PKKê bi kar anîbe "şekirên" wê nebûne, tew wê televîzyona satalaytî heye ku ji Ewrûpayê weşanê dike û li hemû Kurdistan û Tirkiyeyê jî tê temaşekirin.

Heke kurdên Iraqê ji te re bêjin ku ew xewna serxwebûnê dibînin, lê em têdigchin ku ev yek nikare bibe rastî û lewra stratejiya wan ew e ku wek beşekê di Iraqêke Federal de bimînin. Her weha tê gotin ku kurdên Tirkiyeyê jî meyla serxwebûnê nîn e. Erê wê demê çima divê lêbixebitin serbixwe bin an têkilî bi kurdên Iraqê re deynin ku hindêk maye Enqere bibe endamê YEyê? Lê kî dikare bizane gelo piştî 15 an 20 salên din, ew têkilî û bawerî dê çî lê bê? Tiştê ku çêdibe aşkere be ew e ku DYA dikare bihêz pêşkeftinên wan rawestîne, lê divê nirxeke pir giran bide. Ya ku ew dikarin bikin ew e ku wan bi rê ve bibin da ku wiha geşekirina têkiliyên bê kirin ji bo nebin gef. Eger prosesek nebe ku mizginiya geşekirinê ji bo hemû aliyên têkildar bîne, dibe ku DYA, welatên herêmê tûşî aloziyêke wiha bibin ku tu carî nehatiye bîra wan jî.

## PÊVEK

Nifûsa Kurdan

### Tirkiye

CIA Pirtûka Rastiyên Cîhanê (Li 7ê tebaxa 2008ê hatiye nûkirin, li 14ê tebaxê lê vegeriyane.)

Akincî: 71.892.807 (tîrmeha 2008ê)

Grûbên etnîkî: Tirk % 80, kurd ji 20

Kurd 14.378.51

Têbîniyên Backgrounda Dos ( li 26ê îlona 2008ê lê vegeriyane.)

Akincî (2007): 70.5 mîlyon

Grûbên etnîkî: (Rêjeya sedî nehate dayîn) Tirk, kurd û yê din

Paşê di raporê de wiha hatiye: Welatîyên Tirkiyeyê ku xwe bi nasnameya kurdî dinasînin, grûbeke etnîkî û zimanevanî pêk tînin ku jimara wan nêzîkî 12 mîlyon e.

### Sûriye

CIA Pirtûka Rastiyên Cîhanê ( li 7ê tebaxa 2008ê hatiye nûkirin, li 14ê tebaxê lê vegeriyane)

Akincî: 19.747.586 (Têbîniyên: ji bilî van nêzîkî 40 hezar kes li girên Golana bin destê Îsraîlê dijî / 60 hezar ereb in (18 hezar durzî û 6 hezar elewî ne) û 60 hezar akinciyên îsraîlî ne.

Grûbên etnîkî: Erebe % 90.3, erebe, kurd û ermenî û yê din %9.7

Kurd 1.777.686

Têbîniyên Backgrounda Dos (li adara 2007 hatiye nûkirin)

Akincî (2005): 18.6 mîlyon

Grûbên sereke: Erebe (%90) Kurd (%9) Ermenî, sîrkasî û tirkmen

Kurd 1.674.000

Mijareke Xêroşelîm Postê ya li adara 2008ê dibêje ku di navbera ji %8-10ê akinciyên Sûriyeyê kurd in.

[http://www.jpost.com/servlet\\_Satellite?cid=1206446115815&pagename=JPost%2FJPostArticle%2FPrinter](http://www.jpost.com/servlet_Satellite?cid=1206446115815&pagename=JPost%2FJPostArticle%2FPrinter)

Raporeke Dengê Amerîka di nîsana 2008ê de dibêje, kurd ji %9ê akinciyên Sûriyeyê ne.

<http://www.voanews.com/uspolicy/Ontheline/2008-04-03-voa3.cfm>.

## Îran

CIA Pirtûka Rastiyên Cîhanê (li 7ê tebaxa 2008ê hatiye nûkirin û li 14ê tebaxê de lê vegeyriyane.)

Akincî: 65.785.223

Grûbên etnîkî: Fars %51, Azerî %24, Gîlakî û Mazenderanî %8, kurd %7, ereb %3, lor %2, Belûc %2, Turkmen %2 û yê din %1

Kurd: 4.611.265

Têbîniyên Backgrounda Dos (li 26ê îlonê pê de çûne)

Akincî: 70.5 mîlyon

Grûbên etnîkî: Fars % 51, Azerî %24, Gîlakî û Mazenderanî %8, Kurd % 7, Erebe %3, Lor %2, Belûc %2, Turkmen %2 û yê din %1

Kurd: 4.935.000

## Iraq

CIA Pirtûka Rastiyên Cîhanê (li 7ê tebaxa 2008ê hatiye nûkirin, li 14ê tebaxê de lê vegeyriyane.)

Akincî: 28.221.181

Grûbên Etnîkî: Erebe %75-80, Kurd %15-20, Turkmen û Aşûrî û yê din %5

Kurd 4.233.177 - 5.644.236

Têbîniyên Backgrounda Dos (li 26ê îlona 2008ê de lê vegeyriyane.)

Akincî: 27.499.638

Grûbên Etnîkî: Erebe %75-80, Kurd %15-20, Turkmen û Kildanî û Aşûrî û yê din kêmtir ji %5.

Kurd: 4.124.945 – 5.499.927

### **Derbarê danerê vê nivîsarê de:**

Henri C. Barkey hevkarê mezîniyê neniştêcih e li Programa Middle East Karnêj û Bernard L. û Berta F. Cohen profesora û serokê beşê tîkiliyên navdewletî yê Zanîngeha Lêhay e. Ji sala 1998 heta 2000, endamê Desteya Plandanê a Siyaseta Wezareta Derve bûye û bi awayekî sereke bi arîşeyên Rojhilata Navîn, Rojhilata Deryaya Spî û îstîxbarî mijûl bûye. Li Prînstîn, Kolombîya û Sineyt University of New York û Zanîngeha Pensîlvanya ders gotine.

Barkey 5 pirtûk nivîsandine yan jî hevbeşê nivîsandina wan bûya an jî lê vegeyriyaye. Ji wan Arîşeya Kurdî li Tirkîyeyê digel Graham Fuller nivîsiye û pirtûka Reaksiyona Ewrûpiyan ya bo Globalîzmê: Bergirî, Lêrahatî û Alternatîf. Her weha

sergotarên wî li Newsweek, Washington Post, The Wall Street Journal û Deal Star, Los Angeles Times belav bûne û gelek caran jî digel Jim Lêrer û BPR bûye mêvanê News Awer.

- 1- Janet Klein, "Kurdish Nationalists and Non – Nationalist Kurdistans: Rethinking Minority Nationalism and the Dissolution of the Ottoman Empire, 1908 – 1909.
- 2- Gareth Stansfield and Hshem Ahmazadeh, Kurdish or Kurdistanis? Conceptualizing regionalism in the North of Iraq, "in Reidar Visser and Gareth Stansfield, eds..., *And Iraq of Its Regions: Cornerstones of a Federal Democracy* (New York: Columbia University press, 2008), pp. 123-150.
- 3- Denise Natali Tehe Kurd and the State: Evolving National Identity in Iraq, Turkey, and Iran (Syracuse: Syracuse University press, 2005), p. 130.
- 4- Ibid., p. 133.
- 5- Hamit Bozarslan, *La Question Kurde* (Paris: Presses de sciences po, 1997), p. 188.
- 6- Jordi Tejel Gorgas, "Les Kurdes de Syrie, de la 'dissimulation' a la 'visibilite'," *Revue du Monde Musulman et de la Mediterranée*, vol. 115-116. 2007. pp. 117-119.
- 7- Hassan Fattah, "Kurds, Emboldened by Lebanon, Rise Up in Tense Syria," *New York Times*, July 2, 2005.
- 8- As Bozarslan points out, Syrian Kurds (as well as Lebanese Kurds) had similarly been influenced earlier by Barzani's 1961 rebellion in Iraq. *La Question kurde*, p. 310.
- 9- The killing of tehe populer sheikh has hardened attitudes among Syrian Kurds, according to some reports. Fattah, op, cit. 10. Gorgas, pp. 127. 128.
- 10- Gorgas, pp. 127-128.
- 11- The United States was also critical of these killings and called for an independent probe. See *Agence France Presse*, March 30, 2008.
- 12- Joost Hilterman, "To Protect or to Project? Iraqi Kurds and Their Future," *Middle East Report*, June 4, 2008, p. 3.
- 13- Reidar Visser, "Iraq's Provincial Elections: Another D-Day Approaching," <http://historiae.org/provincial.asp>, p.2.
- 14- Alfred Stepan, "Federalism and Democracy: Beyond the U.S. Model", *Journal of Democracy*, vol. 10, no. 4 (1999) and Lawrence M. Anderson, "Theorizing Federalism in Iraq," *Regional and Federal Studies*, vol. 17, no. 2 (June 2007).
- 15- Henri Barkey and Ellen Laipson, "Iraqi Kurds and the Future of Iraq", *Middle*

East policy, vol. 12, no. 4 (December 2005), pp. 69-70.

- 16- Ofra Bengio, "Autonomy in Kurdistan in Historical Perspective," in Brendan o'Leary, John McGarry, and Khaled Salih, eds., *The Future of Kurdistan in Iraq* (Philadelphia: University of Pennsylvania Press, 2005), p. 183.
- 17- Anderson, p. 169.
- 18- Tensions have flared up in localities such as Khanaqin in the northeast, where majority kurds have resisted central government efforts at evicting peshmarga units, amit R. Paley, "Strip of Iraq On tehe Verge of Exploding" Washington Post, September 13, 2008, p. A01.
- 19- The current three-province Kurdish region has "five oil fields, including the khurmala dome, which is the northern extension of Kirkuk field. These fields contain about 3.1 billion barrels, with daily production capacity estimated at 375,000 barrels a day...Kurdistan's currently known oil reserves represent about 3 percent of Iraq's total," Kamil al-Mehaidi, Iraq Revenue Watch, [http:// www.iraqrevenuewatch.org/reports/052706.pdf](http://www.iraqrevenuewatch.org/reports/052706.pdf), p.4.
- 20- Martin van Bruinessen, "Iraq: Kurdish Challenges," in Walter posch, ed. *Looking into Iraq*, Chaillot paper no. 79 (Paris: Institute for security studies, European Union, 2005), pp. 45-72.
- 21- International Crisis Group, *Iraq and the Kurds; Resolving the Kirkuk Crisis*, Middle East Report no.64, April 19, 2007, p.3
- 22- Ibid., PP. 57-
- 23- The necessity to postpone a referendum and the difficulties associated with implementing one were sufficiently obvious that even president Talabani, during his first visit to Ankara, indicated that the referendum was not his top priority- Cengiz Çandar, "Talabani'yle Asilan Esik, "Referans, March 10, 2008.
- 24- Gareth Jenkins argues, "(T)he Turkish rediscovery of the Turkmen accelerated as the U.S. invasion of Iraq and thus the probable end of the Saddam regime, moved closer, A growing number of academic studies and newspaper articles began to appear which stressed not only that the Turkmen were an inseparable part of the Turkish nation but that they formed what appeared to be an ever increasing proportion of the Iraqi population. "Turkey and Northem Iraq: An Overview, "Occasional paper, james town foundation, February, 2008, pp. 14-15.
- 25- For a dispassionate analysis of Turkmen:Kurdish relations, see Semiz Idiz's series of reports from the region for the Turkish daily, Milliyet, February 2007.
- 26- Moqtada al-Sadr, however, has the facility of assuming a bewildering array of positions, As an opponent of federalism, he has supported the Turkmen against

the Kurds: he then aligned himself with the Kurds against Turkey following Ankara's incursion into northern Iraq. By June 2008, a Sadrist delegation visiting Ankara assured Turkish parliamentarians that they fully supported Turkey on Kirkuk. Private communication, Ankara, July 13, 2008.

- 27- The presence of Turkish troops in Kurdish areas remains a controversial issue among Kurds, but Kurdish leaders have understood that unilaterally requesting their departure would severely undermine their relations with the Turks, especially the military. Still, there were reports at the end of 2007 and early 2008 of Iraqi Kurdish civilians surrounding Turkish armored columns that attempted to leave their encampments in support of Turkish military actions.
- 28- The Turkish military and the foreign ministry are currently locked in a struggle over the control of the ITF and Iraq policy in general interviews, Ankara July 7-13, 2008. Only last April did the government succeed in getting the national security council, a military-civilian coordinating committee, to give its approval to "Talk to all Iraqi groups". Radikal April 25, 2008.
- 29- In July 2003, U.S. forces detained a number of ITF personnel with Turkish special forces members suspected of plotting to assassinate a leading member of the Kirkuk governorate. The incident caused a major crisis in U.S. Turkish relations, because the Turkish soldiers were arrested, bundled, and hooded in the manner that al-Qaeda detainees are handled. The Turkish press and public have been indignant over this treatment, while downplaying the reason for their detainment in the first place.
- 30- Kirkuk experienced some of these tensions recently when a suicide bomber caused mass casualties during a Kurdish demonstration. Rumors that the Turkmen had a hand in this bombing caused demonstrators to march on ITF buildings where Turkmen guards responded with a barrage of fire, often at point blank range, resulting in more fatalities. New York Times July 29, 2008.
- 31- Private conversation with a senior KRG official, May 18, 2008.
- 32- Private conversation with a senior KRG official, May 18, 2008.
- 33- For details see, "UNAMI (UN Assistance Mission in Iraq) presents first analysis to GOI (Government of Iraq) to help resolve disputed internal territories", <http://www.uniraw.org/newsroom/getarticle.asp?ArticleID=702>.
- 34- Barham Salih, the Iraqi vice premier, articulated the Kurds' quandary: "the U.S. stance regarding the Kirkuk issue is not the same as that of the Kurds, because they take into consideration the concerns and interests of Arab countries and Turkey as well as their own and the whole of Iraq's interests. The USA believes that all the sides must compromise on the status of Kirkuk.....However, as regards

whether the official U. S stance is the same as that of the Kurdish leadership;the answer is negative." "Iraqi Deputy premier Discusses Kurdish-U.S. Ties, "BBC Monitoring Middle East, July 31, 2008.

- 35- This is an idea that had been proposed earlier by the different communities in Kirkuk to the Kurdish leadership. See International Crisis Group, Iraq and the Kurds: Resolving the Kirkuk Crisis, p. 14. What is different this time is that Turkey has told both the Kurds and the United States that in the event of an agreement on the 32-32-32-4 distribution, Ankara would guarantee the Turkmen minority would vote with the Kurds (Interview, Ankara, July 7, 2008) The offer itself is problematic; at one level it confirms Turkish influence in that region and on another, it raises the fear that separate deals with the Turkmen would need to be cleared with Ankara.
- 36- International Crisis Group, Oil for soil: Toward a Grand bargain on Iraq and the Kurds, Middle East Report no. 80, October 2008.
- 37- The ICG points out that this compromise on delaying the provincial elections in Kirkuk and the KRG was a Turkish proposal indicating the level of involvement of Turkey and the internationalization of the Kirkuk issues, *ibid*.
- 38- Reider Visses, "The Kirkuk Issue Exposes Weaknesses in Iraq's Ruling Coalition", August 7, 2008, <http://historiae.org/Kirkuk.asp>.
- 39- An Emblematic depiction of this deep unease with the United States is articulated by the former commander of the Turkish Land Forces, Aytaç Yalman, who argued that when in 1998, the United States summoned the leaders of the two Kurdish factions to sign a peace agreement, it was to prepare the 2003 Iraq invasion. See Fikret Bila, "Emekli Orgeneral Aytaç Yalman Anlatıyor: Kürt sorunu Sosyal Aşamada Çözülmeliydi", *Milliyet*, November 3, 2007.
- 40- Fikret Bila, "İlker Paşa'nın Tehdit Algılaması", *Milliyet* August 6, 2008. Başbuğ, in a speech a year earlier, outlined his worries that by providing Kurdistan with unprecedented sway, the Kurdistan state in northern Iraq was influencing Turkey's Kurdish citizens.
- 41- Murat Somer, Turkey's Kurdish conflict: Changing context, and Domestic and Regional Implications, *Middle East Journal*, vol. 58, no 2 (Spring 2004), p. 252.
- 42- "Türkiye'de Kandil'den daha çok da- var." *Milliyet*, July 17, 2008. However, Iraqi Kurdish messages are not always coherent. KRG president Barzani often offends Turkey with comments on the PKK that are designed to be retorts to slights against him or the KRG. Such statements make it impossible for Turkish officials to contemplate talking to Barzani: Interviews, Ankara July 7 and 8, 2008.
- 43- See series on northern Iraq by Serpil Yılmaz in the Turkish Daily News, April

- 12-19. 2007. Originally appeared in Milliyet, April 5-11. 2007.
- 44- Interview with a high-ranking AKP member, Ankara July 10, 2008.
- 45- For a more detailed exposition of this argument, see, Henri Barkey, "Kurdistan-off," National Interest, no. 90 (July/August 2007).
- 46- ON at least one occasion, then chief of the Turkish General Staff Yaşar Büyükanıt prevented a meeting between then foreign Minister Gül and KRG prime minister Nechriwan Barzani in Istanbul by publicly admonishing the government against it. See Barkey, "Kurdistanoff".
- 47- Iraqi Kurdish leaders were also signaling that, provided Ankara offered them some positive and real incentives, they would even engage the PKK militarily.
- 48- Interview with a senior Iraqi government official, May 7, 2007. Interview with a Turkish Journalist, Washington D.C., October 31, 2008.
- 49- Anecdotal and journalistic reporting already indicates that the makings of a virulent Islamic Kurdish movement, entitled Hezbollah (no relation to the Lebanese group), is reemerging in Turkey's southeast.
- 50- Omer Taspınar, Turkey's Middle East Policies: Between Neo-Ottomanism and Kemalism, Carnegie Endowment for International Peace, Carnegie Middle East Center paper no. 10 (September 2008), p. 11.
- 51- Even among the senior military leadership, there are signs that some, including many retired four-star generals, recognize that existing Kurdish policy has made matters worse and that a new approach is necessary, Kemal Kirişçi, "Revisiting Turkey's Kurdish problem," Discussion paper (Istanbul: Center for Economic and foreign policy studies) February, 2008.
- 52- Belma Akçura, Devletin Kürt Filmi (Ankara: Ayraç Kitabevi Yayınları, 2008, pp. 79-83.
- 53- I conducted these interviews in Turkey in summer 2008.
- 54- DTP has not been immune to power struggles between hard-liners and more accommodationist elements. Ahmet Turk its president, admitted that the PKK was hurting the Kurdish cause, Taraf, May 15, 2008. A new political party created to replace DTP in the event it is banned, the Peace and Democracy party, has so far sought to distance itself from the hard-line PKK sympathizers. It remains to be seen whether it will succeed. Interview, Ankara, July 13, 2008.
- 55- CNN – Türk, June 5, 2008. Basburg's public admission was intended to be a message to the United States in view of the low regard the Turkish military has for Iran.
- 56- Taran, August 16, 2008 and CNN-Türk interview with Phadinejad, August 14, 2008.

# Cudahiya navbera êlên Ereb û êlên Kurdan di warê siyasî de

Hemeferîq Hesên

Êlên ereb û êlên kurdan di warê jiyana rojane de, şer û berberiya di navbera êlan de, gora serokê êlê kirinê, nêrîna wan ya li ser jinan û terş û talanbirinê heta radeyekê nêzîkî hev in, lê di warê siyasî de gelek ji hev cuda ne. Bi hatina ola Îslamê, werçerxanêke dîrokî û bingehîn di erka êlên ereban de hat holê. Ya rast ew e ku ew êlên koçer ên çolnîşîn, nêzîkî 15 sedsala berî niha ola Îslamê gihandine Kurdistanê û em jî pêgîr kirin. Heman ew êl jî bûn ku bi hêza hespên xweşbez û şûrên zirav Îslam gihandine Asyaya Biçûk û Îranê û piştê ber bi rojava ve birin heta gihandine bakûrê Afrîkayê. Ew êlên koçer heta berî peydabûna Îslamê di perawêza dîrokê de bûn û piştê her ew bi xwe bûn ku ola xwe ji bakûrê Afrîkayê derbasî Ewrûpayê kirin û li Spanyayê bi cih û war bûn. Nivîskarê Denmarkê Polsin di pertûka xwe ya bi navê "Koçera" dibêje:

"Ji sala 632ê zayînê û pey re, Îslam ber bi rojavayê Nîvçe Girav a Erebî kişiya û koçerên ereb karîn êlên berber ji cihê wan yanê ji çolistanên Afrîkayê derxînin û li şûna wan bi cih û war bibin...*(Binêre: Koçera, Filiming Madsen Polsin..r/5)*"

Ji ber çî û ji bo çî êlên ereb rû ji bitperistiyê badan û çûne xizmeta vê ola nû? Polsin kêmbê bersiva vê pirsê nedaye yan her nexwestiyê binivîse. Rastî ew e: Wek çawa Îslamê, bi mebesta ku zêde bê belavkirin sûd ji siruştê êlan wergirt û êlan jî du caran sûd ji wê olê wergirt, ji ber ku ew ola nû bi awayekî berfireh deriyê şerê vekirî (xezû) bi rûyê dinyayê de bo wan vekir û li wan helal kir. Wek xuya ye êlên de-

.....  
*Ji Kurmanciya Jêrîn: Hoşî Mûrad*

margîr her dem tundûtûjîyê berhem tînin, lê Îslamê karî wan êlan bixe bin kontrola xwe û êdî ew tundî bi awayekî nû û bo sûda xwe henarte derveyî Nîvçe Girav a Erebi û heta demekê jî ew ji xwe dûr xist.

Berî hatina Îslamê, êlên ereban êrîş nedikirine ser deverên Faris, Kurd, Romiyên hwd. û ters û talanê wan û jin û keçê wan jî ji xwe re nedibirin. Tew wan bi tene rêya karwanên ku di nav Nîvçe Girav a Erebi re derbas dibûn digirt. Êlan bi tene êrîşê hev dikirin. Di wê demê de jî destkeftên kêr jî bi dest dixistin, ji ber ku rewşa Nîvçe Girava a Ereban bi xwe gelek dijwar e û gelek cihê ye ji rewşa welatên fars, kurd û roman.

Berî hatina Ola Îslamê, şervanên êlan dikarî wan keç û jinên ereban ji xwe re bikin kenîze (cariye) ku di "xezû"yê dîl hatine girtin. Lê bi hatina Îslamê, bi sedan êlên ereb bi hev re û di bin banê pîroz û rûmeta ola Îslamê de berê xwe daye derveyî Nîvçe Girav a Erebi û karî êrîşê welat û gelên derdorê bikin û bi vî awayî jî jêrxana xwe ya aborî bihêztir û dewlemendtir kirin.

Wan karî li derveyî rê û resmên mahrîrîn û zewacê, bi dehan keçên kurd, fars û qibtî... bikin kenîze (cariye) û di bazarên koleyan de bifroşin û bazirganiyê bi wan bikin. Ji wê dîrokê û pê ve êdî bi dehan hezar keçên ji neteweyên din jî bûne kenîze û nêçîra wan. Yê ku zêdeyî bûn, bi taybet ji Bakûrê Afrîkayê ew bi karwanan digel samanên din ber bi biyabanên Nîvçe Girav a Erebi wekî destkeftên şer dişandin.

El-Cabirî di wê baweriyê de ye: "Dewleta erebi li ser du binaxên nakok hatiye avakirin: Ol, ku xelkê dixê yek, demargirî ku dubendiyê tîne holê. Olê, wê rojên demargiriyên xwe yek xistin dema ku bi sedema şer (fitûhat) destkeft pir bûn. Demargîran jî wê rojê dubendî derxistin dema ku helmetên "fitûhat"ê rawestiyên. ... Yekîtiya ol û dewletê li ser binaxê aboriya dagirkirinê çêbûbû ku piştî xwe bi dagirkirinên berfireh û destkeftên gelek girêdida ku her ji sere serî de gelek jêrxan û serxanên nû bi hev re afirandin..." (*Binêre: Mihemed Abd el-Cabirî, Badiye Navneda Giraniyê di Dîroka Erebi de, 9/12/2008.*)

Ez li vir ne digel nêrîna El-Cabirî de me, dema ew tevahiya wan şeran wek Fitûhatan dide zanîn. Dibe el-Cabirî vê têgehê bo gelekî bitperist bikar bîne, lê derbarê gelê kurd de ev têgeh nerewa ye, ji ber ku berî hatina Îslamê kurd ne gelekî bitperist bûn, tew xwedanê oleke pîroz û xwedaperist û yektaperist bûn. Li vir divê em bêjin ku Dr. Mihemed Abd el-Cabirî ew bi xwe jî berber e ku xwedanê rastîn yê bakûrê Afrîkaya ne. Amazîx (berber) jî berî hatina Îslamê xirîstiyên bûn ne ku bitperist!

Derbarê rola metirsîdar ya êlên erebi, El-Cabirî di heman gotarê de nivîsandiye:

"Dema fitûhat rawestiya wate dema destkeftên şer rawestiyên û bac û xerac neman, êdî xezwa dereke (cîhad) bû xezwa hundirîn û qayîşkêşan bû

qayışkêşana li ser demargîrî/aboriyê..."

Beriya wê jî merivên pêxemberê Îslamê Muhemed zarok şandibûn nav êlên çolistanê da ku ji nêzîk ve kultûrê wan êlan binasin. Piştê di serdema fitûhatan de her ew êlên koçeran bûn ku Îslam gihandine binê dinyayê; her ew koçer bûn ku çendîn welat ava kirin.

Îslam, destpêkê wek oleke bo tevahiya mirovayetiye hate rojevê; cudahiya di navbera êl û neteweyan de nedikir, di bin banê "Umeta Îslamê" bi yek çavî temaşeyî hemûyan dikir. Serê pêşîn, Îslamê karî heta heyamekê demargîriya êlan berbend bike, lê ola Îslamê nikarî êl û sistema eşîretî ji holê rake. Yarên (sehabe) Muhemed ku bi sedan kadirên şareza û qedirgiran bûn, welat bi awayekî yeksan û dadperwerane bi rê ve dibir.

Her ew jî mazmazka desthilatdariya Xelfeyên Raşîdî bûn, lê bi windabûna wê nîfşê, ji nû ve demargîr û berberiya veşartî ya di navbera êlan de serî hilda. Vê berberiyê jî kir gelek şerên xwînawî rû bidin. Piştê çendîn dewletên êl û bavikan di wê qad û deverê de çêbûn û gelek mezheb û tayifeyên olî jî li ser hesabê Îslamê peyda bûn. Carek din êl bi hemû karî û zanîna xwe hatin nav ceng û qayışkêşanê û serê meydanê girtin.

D. Îmadedîn Xelîl, di pertûka xwe de dibêje:

"Di nava cenga bûyeran de, di warê berhengariya dijwar a dewleta Îslamê li hemberî îmratoriyên mezin ên hevçerx li welatên faris û rom, êlên ereb, ku di nav cehalet û demargîriyê de bûn, derfet jê re peyda bû ku bi awayekî berfireh bîne nav rêzên artêşa fitûhat ku hevdem bû digel tengbûna rola Yarên Muhemed ji ber pîrbûn û şehîdbûna wan..." (*Binêrin li: Dergehek Bo şaristaniya Îslamî, r164*.)

Bi veşeriyana rola êlên ereb ên çolistanî, ku nexwendewar û demargîr bûn û jiyara wan jî li ser dahatê dagirkirinê bû - wek dîroknasên ereb bi xwe nav lêkirine û behsê dikin - êdî wan karî çendîn dewletan ava bikin ku piraniya wan bi navê êl û malbatên wan bûn ne ku navê bi Îslamê. Dr. Îmadedîn Xelîl dibêje:

"... Ji ber van sedeman, her divê dubendî û berberî rû bide û xîlafet hilweşe û di şûna wê de desthilata êlan û demargîrî, xweperistî û bédadiyê bê holê..." (*Binêre li: Dergehek Bo şaristaniya Îslamî, r165*.)

Al Siûd, malbateke desthilatdar a çolistanana Neced bû. Wê, bi hevkarîya êlên koçerên wan çolistanan û piştgiriya rêbaza Wehabî karî beşeke fireh û mezin ya Nîvçe Girav a Erebi di qebareke siyasî de bixe yek û lê bibe desthilatdar û dewleta êlan li wê derê ava bike. Wek em dibînin, îro wê qraliyetê hem bi hukmê olê û hem jî bi aboriya bihêz, çî li nav ereban û çî li ser asta navneteweyî de rolekî berçav heye.

Belê ew qraliyeta xwedan rol ku serperîştîya navenda herî pîroz ya musulmanên dinyayê dike, li ser destê êlên koçer yê eraban hate avakirin. Her çî qas wê herêmê di rastiyê de navê lê welatê eraban yan jî niştimana eraban lê hatibû kirin, lê belê Al Siûd hatin navê malbata xwe pê ve kirin û kirine Erebstana Siûdî.

Bala xwe bide ser alîkariya di navbera rêbaza Mihemed Bin Ebdilwehab rêberê olî û êla Al Siûd, bizane çawa ol bûye piştgirê êlê ji bo ava kirin û bihêz dariştina binaxê dewletê! Pölsin, wehabiyetê wekî îdeolojiya wê qraliyetê dide zanîn ku êlên koçer ava kiriye û di dinyayê de her bi navê qraliyeta Al Siûd navdar e.

Her ew êlên çolistanî bûn jî ku mîrnişînên erebî yê wekî "Ras el-Xême, Om el-Qeywîn, Ecman, Ficêre, şarîqe û Abo Dehbî ava kirin... Piştî di salên heftêyî yê sedsala 20mîn de, mîrekî dûrbîn û dînyadîtî bi navê şêx Zayid Bin Sultan Al Niheyân ku ji bernavê wî Al Niheyân diyar e ku ji bavikeke xuyanî ye, karî tevahiya wan mîrnişînên biçûk û belav di nav yek qebareya siyasî de bi navê Mîrnişînên Erebî yê Hevgirtî (Îmarta Erebî) kom bike û bibe navenda bazirganî û geştîyariya girîng ku îro li herêmê wek wê tunene. Tu her wiha bala xwe bide ser alîkariya di navbera êl û serêlên erebî de, bizane çawa karîne federasyona navbera êlan ava bikin!

şerê Cîhanê yê Yekemîn bi ketina Împratoriya Osmaniyan bi dawî hat. Di vê bûyera mezin de jî, dîsan êlên erebî rolekî girîng di derxistina paşmayên artêşa osmanî û avakirina çend mîrnişînên erebî de lîst. Efserekî Îngilîz bi navê Tomas Idoard Lorans (1888-1935) di artêşa Îngilîstanê de pileya Lefîtant Kolonêl/Moqedem hebû, ku piştî bi navê Loransê Erebî hate naskirin, rolekî girîng hebû di serkirdayetî û rêkxistina wan hêzên erebî ku di sala 1916ê de şoreşa eraban li dijî desthilata Osmaniyan pêxist. Lorans karî xwe digel wan hêzan ku piraniya wan ji kurên koçeran bûn, biguncîne û bi hezaran koçeran bo Îngilîstan û mîrên eraban bi kar bîne.

Nivîskarê Danîmarkê Pölsin bi awayekî jîr amaje dike ku her êlên erebî bûn di çolistanan de bi pey malbata Haşimî ketin û li rojhilatê rûbara Urdun Qraliyeta Urdunî ya Haşimiyan ava kir. Bala xwe bidê, wan jî qraliyeta xwe bi nave êl yan malbata xwe ava kir û navê wê kir Haşimî, ji ber vê gelek ji wan fermanrewayiyên ku di dîrokê de êlan ava kirin navê heman bavikî hilgirtine, wekî, "Dewleta Benî (Kurên) Omeye".

Pölsin amaje bi wê dide û dibêje: "Niha jî ew êlên koçer wê qraliyetê diparêzin. Tew badîgardên Melik Hisênê rehmetî bi xwe jî koçer bûn, wate cihê baweriya padîşah bûn. Ew her bi cilê gelerî yê koçeran, bi cemedana sor, padîşah û koşka wan ya şahane diparêzin. Tew li ser cemedana xwe ya sor sembola taca padîşahiye danîne.

Diyar e her ew êl bûn ku ziman û kultura eraban gihandine van herêman û kirine kultura gelek gelên ku misilman bûn. Her ew êl jî bûne sedema ku zimanê erebî, ku

zimanê Quranê ye, bibe zimanekî berbelav li dinyayê ku berî niha zimanê êleke biçûk a Nîvçe Girava Erebî bû. Wan piştê bi derbasbûna wextê karî rûberêkî mezin yê Kîşwera Afrîkayê bikine ereb.

Gelo ew rola girîng ya êlên ereban, bi wê hemû demargîrî û nexwendewariyê, ew hemû çalakiyên di warê îstîka siyasî de, her ji destpêka belavkirina ola Îslamê û heta niha, digel rola nerênî ya êlên kurdên nexwendewar û demargîrî tê rûberîhevkirin? Me berê xuya kiriye ku rola êlên kurdan di asta avakirina qraliyet yan her qeb-areyeke din a dewletê de çawa bû û çend nerêk û pêk muamele kiriye, ji ber vê li vir pêwîstî bi anîna belge û gotinên zêde nake.

Ji aliyê din ve, beşdarîpêkirina wan sedan êlên "Cahiliye" yê çolistanî di Fitûhatan de ji nû ve qebûlkirina pêdiviya êlan û girîngiya rola wan derdixe.

Yek ji taybetmendiyên êlan ew e ku ew saziyeke "Iamil" in û bi hêsanî gora rêz û qanûnan nakin, tew ku pîroz bin û ji ezmên jî dahatibin. Her wiha pêgirê baweriyên nû nabin, her dem gora êla xwe dikin û heta serokêl û kultûrê wan yê kevin li ser pêyan be guh nadin tu merce'ayeke din. Çavê wan her dem li talana mal û jinên dij-minan e.

Digel van hemû fakteran em dibînin ku êlên ereb di dirêjahiya dîroka piştî pey-dabûna Îslamê de çi rolekî siyasî yê girîng îst, berevajî êlên kurdan ku ne tu wel-atekî serbixwe ava kirin û nekarîn federasyonê êlan ava bikin, lê belê di her devereke de eger serokêlekî niştimanî li dijî dagîrkeran rabûbe, di serê pêşî de êlên cîranê xwe li dijî wî rabûne û mil dane dagîrkeran.

Niha jî, di vê rewşa piştî hilweşana rejîma Baes de, êlên erebî bi taybet li deverên sunemezheb, rolekî girîng dibînin. Wan kariye nêzîkî sed hezar şervanên êlan dilçoş bikin û aramiya devera xwe biparêzin. Di her arîşeyeke siyasî de ku rû dide, raya wan heye û li wan tê guhdarkirin; her ji serokwezîran heta tevahiya partiyên hesab bo wan dikin û alîkariyê û girêdana hevalbendiyê ji wan dixwazin. Her wiha Serokê Amerîkayê George Bush jî di dema serokatiya xwe de, wek aliyekî di pêkhatiya siyasî de, hesab bo wan kir û serdana mîrên êlên Parêzgeha Enbarê kir.

Lê em bêne ser rewşa xwe. Hin êlên kurdan hene, rejîma navendî her çawa be, bêyî ku li naveroka wê rejîmê bipirsin ya bo wan girîng be, amade ne xizmeta wê bi-kin û çekan bo wê hilgirin; serbarî wê yekê amade ne li dijî xak û miletê xwe şer bi-kin, her kesê rêber be û her partiyêke kurdî ya baladest be. Rejîma Baes ji sala 2003ê ve hilweşaye, lê hin ji wan êlan hêvî dikin ew ji nû ve vegere. Her nebe kîjan bend û deste nêzîkî hizra Baes bin, diçin digel wan hevalbendiyê dikin. Ev e cudahiya di navbera êlên ereb û êlên kurdan de di qada siyasî de; cudahiya wan asman û rês-manê.

## Salên dawî yên Mistefa Barzanî

### Sefîr David Korn

David Korn: Sefîrê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) ye; ji sala 1957ê heta 1988ê di Hikumeta Amerîkayê di gelek warên rêveberiyê de kar kiriye û piraniya karê wî jî li Rojhilata Navîn bûye. Wî li Lubnan, Morîtanya û Îsraîlê sefîrtiya DYAYê kiriye. Ji sala 1972ê heta 1975ê rêveberê Ofîsa Karên Welatên Ereb, ji sala 1978ê heta 1981ê rêveberê karûbarên Îsraîlê û nûnerê taybet ê Wezareta Dêrve ya DYAYê bûye.

David Korn, piştgirî daye gotûbêjên Camp David, Bereya Rojava û hêzên hevpeymanan ên Senatoya Amerîkayê. Ji sala 1982ê heta 1985ê li paytexta Etiyopya Adîsababa Sefîrê DYAYê bûye, ji sala 1986ê heta 1988ê Sefîrê DYAYê li Togo bûye. Korn, pênc pirtûk nivîsandine: "Etiyopya û DYA û Yekîtiya Sovyetan li Krom Hel" (sala 1986ê ji aliyê Weşanxaneya Îlnoya Başûr ve hatiya çapkirin), "Mafên Mirovan li Iraqê" (bi alîkariya Middle East Watch û saziyên mafên mirovan li Rojhilata Navîn- ji aliyê weşanxaneya Yîl sala 1990î hatiye çapkirin), "Alozî: Îsraîl, Misir û Dîplomasiya Girschêzan li Rojhilata Navîn 1967-1970" (sala 1992ê ji aliyê Weşanxaneya Wêsviyo ve hatiye çapkirin) "Kuşînek li Xartûmê" (ji aliyê weşanxaneya Zanîngeha Îndiana û peymangeha Zanîngeha George Town ve li sala 1993 hatiye çapkirin). Pirtûka wî ya dawî jî, pirtûka bi navê "Du Kesên ku Kurd bi Iraqê ve Girêdan" (ev pirtûk bo erebî hatiye wergerandin).

\*\*\*

.....  
\* Wergêrandin ji inglîzî: Tahir Teyib Ehmed "Mamkak" \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Sasan Kendal

Yên ku pare û çekên DYayê werdigirtin grûbeke etnîkî ya serhildêr (yaxî) bûn û li welatî wiha ji bo otonomiyê şer dikirin ku li ser sînorê welatekî hevpeymanê me bû. Ew belgeyên ku digel komîteyê ne, aşkere nîşan didin ku hêviya serok û Dr. Kisesenger û serokê dewleteke biyanî ew bû ku dostên me bi ser nekevin. Ji dêvla vê yekê ve dixwestin ev grûbên serhildêr her tim bi awayekî êriş bibin ser hevpeymanê me ku çavkaniyên wan biçikînin. Helbet, di nav karên nihênî jî de, ew karê ku me dikir, karekî tinazwer bû.

Raporek nihênî ya Komîteya Îstixbaratê ya Parlamentoyê 16ê sibata 1976ê ji aliyê radyoya "Voice of Village" ve hate weşandin.

Roja 6ê cotmeha 1993, ji bo kurdan ji hemû rojên din zêdetir wekî cejneke neteweyî bû. Cejneke wisa bû ku heta niha li wê dewleta xwe ya heyî ku nehatiye ragihandin û bi tiştekî ne-mumkin hatiye nasîn, hesteke wiha nekiribûn. Hikumeta Baas ya li Bexdayê ew dorpêç kiribûn, cîranên wan ên tirk xwe li koriyê datanîn, hemû cîhanê ambargo li ser wan danîbû, tew Amerîka û Ewrûpayê jî ku ew diparastin, xwe ji wan dûr digirtin. Xurek, derman û sotemeniya wan kêmbû û hemû cureyên nexweşî û tengaviyê li wan qewimîbûn. Tevî vê yekê jî, di wê rojê de ji hemû bajar û gundan kurd ji bo lidarxistina merasîmê gihîştibûn hev. Termê Mela Mistefa Barzanî, ku çendîn salan pêşengiya têkoşana wan kiribû, digel karwaneke serkeftiyane ji gora wî ya li Îranê ber bi wê xaka ku ji bo azadiya wê şer kiribû, bi rê ket.

Barzanî, di nav kurdan de xwediyê pile û payeyê efsaneyî ye; jiyana wî bûye mijareke efsaneyî. Her çend jê re digotin Mela Mistefa, lê ew ne mele bû, tew mirovekî wisa bû ku te digot ji bo wê hatiye xuliqandin ku her dem di şer de be û pêşengiya xelkê bike. Têkoşan, şoreşgêrî, ciwamêriya wî ya li meydana şer û têkoşanê, 12 salên ku li Yekîtiya Sovyetan desteser ma bû û vegera wî ya şikomend û lehengiya wî demdirêj ya ji bo bidestxistina mafên kurdan, bû sedema wê ku kurdên hemû cîhanê, li Tirkîye, Îran, Sûriye û Yekîtiya Sovyetan û li henderanê li rojavayê Ewrûpayê û Amerîkayê jî hest bi serbilindî û neteweyîbûneke wiha bikin ku beriya wê tu carî hest pê nekiribûn. Barzanî, gihîşt pileya herî bilind, lê ji ber ku bi başî pêgeha xwe hilnesengandibû, şikest xwar û ew tevgera ku ji 40 salan zêdetir xebat kiribû, hilweşiya û hemû tiştê xwe ji dest dan.

Vegera wî ya şikomend a piştî koça xwe ya dawî bo Kurdistana Iraqê, taca qonaxa dawî ya gera Mistefa Barzanî bû ku piştî nivroyeke zû ya tebaxa 1975ê li balafîrxaneya navneteweyî ya John F. Kenedy ya New Yorkê dest pê kiribû. Çûyîna wî bo Amerîkayê heta bêjî nihênî bû ku bi balafîreke Îranê ji Tehranê bi rê ketibû. Ew û sê hevalên xwe bi balafîreke Boîng 747 gihîştibûn cihê xwe. Piştî ku gihîştinê, di viya du hevalên wî ji aliyê karmendên asayîş û gumrukê ve bihatana dîrxistin. Dema li balafîrê peya bûn, ji aliyê du kesên ku cilên spî li ber kiribûn, bo otomobîlên reş

hatin birin. Li otomobîlê siwar bûn û bi lez ber bi New Yorkê ve bi rê ketin.

Her çî qas Barzanî di wî temenê xwe de jî westana ji ber rêyê pê ve diyar nebû, lê dema dimeşîya dikulîya. Ew cilê ku li ber xwe kiribû baş lê nedihat, kravata wî jî xerab hatibû girêdan. Van egeran nîşan dida ku ew cil ne cilên wî ne û ev jî ne derdora wî ya adetî bûn. Digel ku 72 salî û aware jî bû, lê kesayetîya wî her tim bala mirov dikişand. Bejn û bala wî, ew ji xelkê din cuda nedikir, ji ber ku bejna wî ji pênc pê û şeş încan bilindtir nebû. Lê navmilê wî pan bû, hestiyên wî gir bûn û masûlkên wî hişk bûn, vê yekê ew pir bi hêz kiribû. Serê wî mezin, porê wî kurt û spî û hinek tayên reş tê de bûn û stûkara wî vegirtibû. Ya rastî gava kesekî cara pêşîn çav bi çavên wî diket, ew ronahiya ji adetê der ya wan di dilê wî de diçikiya. Çendîn sal bû rojnamevanan ji bo ku biçin ba wî û pê re hevpeyvînan bikin, berê xwe didan çîyan û mecbûr dibûn di rêyên dijwar re biçin baregeha Barzanî ya li ser çîyan.

Hevalên wî di vê geştê de, hevaleyê wî yê kevin û du zilamên genctir bûn. Temenê wan dora sî salî bû. Yek kurdekî alîkarê Barzanî bû û yê din jî yekî îranî bû. Şevkê li New Yorkê man, sibêtirê bi balafirekê derbasî Mînyapolîs bûn û ji wir jî balafira xwe guhartin û ber bi Roçistira Mînesotayê bi rê ketin. Mayo Klînik li wir bû. Barzanî nexweş bû, dibe ku nexweşîyeke wî ya kujek hebû. Lê dîsa jî ew bi hêvî bû û her wê hêviyê ew anîbû Amerîkayê.

## ŞOREŞA KURDÎ 1974-1975

Tenê pênc mehan beriya niha, adara 1975ê hêzên çekdar ên kurd ji nişka ve sepîrîze bûn û hilweşîyan. Salekê beriya wê yanê adara 1974ê bû ku Barzanî bang li kurdên Iraqê kiribû çekan hildin. Bi kêmanî deh caran xwestine wî bikujin. Du carên ku ji aliyê Hikumeta Bexdayê ve hatibûn plankirin, hew mabû bi ser kevin. Bawer nedikir ku Hikumeta Iraqê wê rêketina otonomiyê bi cî bîne ku sala 1970î de digel cîgirê serokê Iraqê Seddam Hisên îmze kiribû. Her çî qas di destpêka salên 70î de bû, lê dîsa wî biryar dabû dest bi têkoşan û xebatê bike. Taktîkek jîrane bû. Ji ber ku wê demê, Barzanî bûbû serokekî bêhempa yê kurdên Iraqê û Muhammed Riza şahê Îranê jî piştî wî digirt. Ji vê yekê jî girîngtir, hest kir DYA bi nihênî piştî wî digre. Ji ber ku serok Richard Nickson û şewirmendê Ewlehiya Neteweyî Henry Kissinger, ku piştî bû wezîrê derve, piştgiriya xwe ji bo wî zêde kiribûn.

Kurdên Iraqê, bê dudilî li xwesteka Barzanî vegerandin. Kurdên eşîrî, komlo li dijî gerandin. Efserên kurd dev ji artêşa Iraqê berdan. Karsaz û xwedan pişeyan li Bexda, Kerkûk û Mûsilê dev ji karê xwe berda. Xwendekarên lîse û zanîngehan neçûn dersê. Hemûyan digel pêşmergeyên Barzanî têkilî danîn yan bi her awayekî ketin xizmeta dozê. Wan malbatên xwe digel xwe birin. Bi sedan hezar jin û zarok û pîr li "deverên rizgarkirî" kom bûn û ber bi Îranê ve çûn. Bi hêviyêke pir mezin ha-

tin. Ew qasî baweriya wan bi serokatiya Mela Mistefa Barzanî yê zana û şervanê pîr dihat ku digotin, bi kêmanî dê di şeş mehan de dewletek serbixwe li çiyayên bakurê Iraqê bê avakirin. Barzanî, piştî 15 salan ji Sovyetan vegeriya bû welatê xwe û roj bi roj bihêz dibû. Di şer de, digel pêşmergeyan êrişî artêşa Iraqê dikir û têk dibir. Li beramber jî, hikumetên Iraqê li dû hev hildiweşandin û danûstan digel wan dikir. Lê çima vê carê wiha cuda bû?

Vê carê cudahiyekek hebû. Wê dema ku Hikumeta Iraqê dikir bi kurdan re li hev were, ji aliyekî ve xwe ji bo şer amade dikir. Artêşa Iraqê ji nû ve saz kir û mezintir kir. Ew piçek kir; tiştên top, tank û balafirên şer û bombbehavêjen ku ji Sovyetan hatibûn kir. Tiştên ku Barzanî ji hevalbendên xwe wergirtin, qasî wê nebû ku Sovyetê ji bo Iraqê dişand. Barzanî, pareyekî baş û hinek jî çek ji şahê Îranê wergirtin. Lê tu carî bi têra wî çek û teqemenî jê re nehat. Hêzên wî tenê bi tîfingan, ku hinek ji wan ên serdema şerê Cîhanê yê Yekem û hûn jî kevintir bûn, şer dikirin. Şah, ji wî re Reşênke (Reşas), hawana sivik û cara dawî jî hinek çekên antî-tank şand. Îsraîl jî, ku dostekî kevin yê Barzanî bû, tenê hêzê wî perwerde kirin û hinek çek jê re şandin. Amerîkayê, rasterast pare dane grûba Barzanî, lê ew pare ji yên ku Îranê dabûnê, pir kêmtir bû. Pareyê hinek çekên ku Îranê jê re şandibû, da. Lê li gorî Barzanî, sembola alîkariya Amerîkayê ji rêjeya alîkariyê girîngtir bû, ji ber ku wê baweriya wê yekê dabûyê ku şah rojekê ji nişke ve dest ji wî bernade.

Digel vê yekê jî, encama wê ew bû ku sed hezar pêşmerge bi hêzên sala 1975ê her dem bi awayekî xerab çek jê dihatê birin. Hêzên Iraqê, hemû deverên asimanî xistin bin kontrola xwe û her deverê ku zerîpoş biçûyanê, ew serdest bûn. Wan bi kêfa dilê xwe kurd bombebaran dikirin û ceza didanê. Ne tenê pêşmerge didan ber top û bombeyan, pê re gundên kurdan û zewiyên wan jî li ber diketin. Li ser erdê jî, kurdan sûd ji çiyayên asê û bilind werdigirt û baweriya wan bi parastina welatê xwe hebû. Şer giran bû û ji her du aliyên gelek kes hatin kuştin. Di şerê mezin de jî, Îranê car caran ew diparastin û topên xwe yê dîrhavêj nêzîkî sînorê xwe yê digel Iraqê dikirin û li êrişa hêzên Iraqê vedigerand. Lê bi piranî, diviya kurd li hember hêzên Iraqê vekêşin, ji ber ku artêşa Iraqê hem ji aliyê çek û cebîlxane û hem jî ji aliyê hejmarê leşkeran ve bihêztir bû.

Tevî vê yekê jî, hêştê kurdan serê xwe netewandin. Her çî qas pêşmergeyan derbara şerê modern de perwerdeyek kêmtir wergirtibû, lê xweragir û wêrek bûn ku nayê gotin. Generalên Îsraîlî yê ku serdana pêşmergeyan dikirin, ji ber wêrekî, xweragirî û fermanberbûna wan dimane hijmekar. Heta çek û teqemenî ji bo wan hatiba, wan şer dikir. Barzanî, pêşbîniya wê yekê nekir ku dê wî şerî qezenc bike, ji ber ku dijmin hem ji hêla çekan ve û hem jî ji hêla hejmarê ve serdest bû. Wî, wekî berê, piştî xwe bi hilweşandina rejîma Baas ve girêda û ji ber vê jî, derbeyên giran li artêşa Iraqê

xistin û gelek zirarên darayî gihandin hikumetê da ku Bexdayê neçar bike xwestekên kurdan qebûl bike û bihêle kurd xwe bi xwe bi rê ve bibin. Berê, ev yek kiribû: Di salên 1960î de, şoreş û xebata Barzanî hinek hikumetên Iraqê hilweşandibûn û bû sedema hilweşandina hinekên din. Tu hokar û sedem nebûn tu pêşbîniya wê yekê bikî ku ew dê di salên 1970î de jî wiha li wan neke.

Ji bilî wê yekê, Iraq û cîhan diguherîn; di salên 1960î de, petrola Iraqê, ku piştî Er-ebistana Siûdî di cîhanê de duyem e, pir kêr jê dihate deranîn û gelekî erzan dihate firotin. Her wiha şîrketên amerîkî, brîtanî, hollandî nîrx û hilberîna petrolê xistibûn bin kontrola xwe. Hikumetên Iraqê, her ji berê berê de bêpare bûn û jî zikmakî de lawaz û bêhêz bûn. Di rewşek wiha de, Partiya Baas di sala 1968ê de hate ser hukim. Serê pêşîn wekî derbeyên leşkerî yê din bû, lê gelek tê ve neçû aşkere bû ku ev tiştêkî cuda ye. Di nîveka salên 1970î de, hikumeta Partiya Baas, di Iraqê de rejîmek hişk da sepand ku heta hîngê gelên Iraqê sistemeke wisa nedîtibûn. Hikumetê sala 1972ê, şîrketên petrolê yê biyanî millî kirin û piştî şerê Îsraîl- Ereban bihayê petrolê ji nişka ve zêde bû û deh qasî salên 60î bû. Lewma pareyekî pir zêde ket destê hikumetê û têra wê dikir ku li hemberî kurdan şer bike û rewşa welat jî pêş bixe ku kesî hêvî nedikir.

Vê carê Barzanî, neyarekî ji yê berê cudatir hebû. Cudahî her tenê ne wê di grûbê de bû ku li Bexdayê hukim dikir û çavkanî di destê wê de bûn, lê cudahî di Seddam Hisên de bû. Ji ber ku Seddam lîderêkî nû bû. Ew zilamekî serreş bû û ji zû ve çavê xwe berdabû desthilatê. Xwesteka wî ya li ser girtina desthilatê bêhempa bû. Seddam, ne weke wan zilamên berê bû ku Barzanî bi wan re qayîş kêşabû. Mela Mistefa Barzanî, ku tenê dibistana seretayî xwendibû, di jiyana xwe de karî li hemberî hemû dek û dolabên hikumetên Iraqê li ber xwe bide ku li dû hev li dijî digêrandin. Kesên wekî wî pir pir kêr bûn. Lê beriya wê qet wiha nebû ku Barzanî bikeve dafika zilamekî heta bêjî fêlbaz û bêrehm ku stêrka genc a rejîma Baas bû.

### **Têkçûna Kurdan**

Xuya bû Barzanî ev xeyal nedikir ku dema Seddam Hisên di şerê leşkerî de ser nekeve, dê dest bi hewlên diplomatîk bike. Bîra wê yekê jî nebîribû ku heye ew zilam biçe şahê Îranê bikire yan jî şah wî û gelê wî bi awayekî bêşerefane beranberî parçeyek erd bifroşe. Ew nûçeya behs dikir ku Seddam Hisên û şahê Îranê li Cezayîrê di dema civîna serokên welatên ku petrolê difroşin de li hev rûniştine û di 5ê adara 1975ê de rêkeftinek îmze kiriye, weke birûskeke di asîmanê sayî de hat û li Barzanî û pêşmergeyên wî di nav senger de û seranserê cîhanê ket.

Ev bûyer, ji bo wezîrên şah bi xwe, sefirê DYAyê li Îranê Richard Hêlmiz û rêveberê berê yê CIA jî karekî ecêb û ji nişka ve bû. Hêlmiz, 6 adarê li balafirxaneyê

Tehranê bû wê dema ku karbidestên Îranê ji bo pêşwaziya şah hatibûn wir ku ji Cezayir vedigeriya. Hêlmiz, bala xwe daye alîkarên şah çî qas yekpoş bûn, ew qas jî serlêgeriyayî bûn. Hêlmiz, bi fikaran ve li wan dinêrî dema şah ew gişt şaş û metel hiştin, çunke çawa ku ji balafirê peya bû û hêştî neçûbû qesra xwe, ferman da, ew hemû alîkariyên leşkerî ku ji bo kurdan têne kirin, demildest bêne sekinandin û pê re jî hemû alîkariyên darayî û yê din bêne rawestandî û sînorê Îran- Iraqê jî piştî demeke kurt bê girtin.

Roja din, Hêlmiz, li ser gazîkirina şah çû serdana wî. Bala xwe dayê şah ji hergavê zêdetir xwe kar kiribû. Daxwaz ji DYAyê nekir da ku bi ya wî bike û alîkariya ku ji bo kurdan tê kirin bide sekinandin, ji ber ku sê sal berê, wî bi xwe ji Serokê Amerîka Nîkson xwestibû ku bêhtir alîkariya kurdan bike. Bi hêsanî ji Hêlmiz re got, ew alîkariyên ku bo şoreşgêrên kurd dihatin şandin, hatin qutkirin û bi vî awayî alîkariyên DYAyê dê bêne birîn. Ji ber vî karê xwe yê ji nişka ve lêborîn ji Hêlmiz nexwest, ji ber ku ew mirovekî wisa nebû ku lêborînê bixwaze. Digel vê yekê wî şiroveya xwe jî kir û wiha got: "Barzanî nedikarî li dijî iraqîyan şerekî baş bimeşîne, rûdinişt û ji yê din dixwest ji bo wî şer bikin." Efsêrên CIA yê ku sê sal bû digel Barzanî kar dikirin, dilgiran û bêzar bûn û ya rastî jî ber van nûçeyan tûre jî bûbûn. Lê Hêlmiz ji bo xwe, pêwîstî bi bawerîkirinê nebû. Rêkeftina navber Îran û Iraqê erênî nixand û di wê baweriyê de bû ku dibe ku ev yek herêma aram bike. Ev yeka jî baş û kêr fêr kir ku tu dewletek, çî li Bexdayê be û çî li Tehranê, nahêle xaka wê bikeve bin destê grûbên yaxî.

Dema Hêlmiz, rapora hevdişîna xwe ya digel şah bi brûskeyekê şand, hêviya wî ew bû ku serokê wî, wezîrê karên derve Henri Kissinger pêşwaziyê li normalbûna pêwendiyên navbera Îran û Iraqê bike. Lê dema Kissinger bi acizbûn bersiv da, Hêlmiz mat ma. Sedema acizbûn û dilgiraniya Kissinger kurdên mexdûr nebûn, lê ji ber wê bû ku dixwest kurd her tim li dijî Iraqê şer bikin û ji bo Bexdayê arîşeyan çêbikin da ku Iraq nekaribe Îsraîlê tengav bike. Ew bi biryara şah kêfxweş nebû, lê hewl jî neda wê biguherîne. Henri Kissinger nedixwest şerê Mihemed Riza şahê Pehlewî bike, ji ber ku şah li Rojhilata Navîn stûnê siyaseta DYAyê bû. Washingtonê ji bo parastina ewlehiya Kendava Fars, piştî xwe bi wî ve girêdabû.

şah, wisa kir Barzanî nêzîkî hefteyekî li hêviya wî bisekine heta 11 adarê berî ku pêşwaziya serokê kurd bike û bi fermî çarenûsa wî jê re bêje. Şefîq Qezaz, her çend nav û nîşana wî ya fermî nebû, nûnerê Barzanî yê li Tehranê bû û li ofisa wî sî karmend hebûn. Ew jî digel Barzanî çav li rê bû şah digel wan rûne. Qezaz, berpirsê her cure têkiliyên kurdan bû bi hikumeta şahê Pehlewî re. Ew, berpirsê veguhastina wan pare û çekan bû ji hikumeta kurdî ya bakurê Iraqê re dihatin şandin ku tenê navê wê hikumetê kêr bû. Wî bi xwe, serperîştîya nexweşxaneyên kurdan ên li Îranê dikir ku

nexweş û birîndarên kurd tê de dihatin dermankirin. Her wiha wî karûbarên penaberên kurd jî bi rê ve dibir ku hîngê hejmara penaberên kurd li Îranê nêzîkî 1 milyon kesî bûbû. Qezaz, digel Justin jî - navê nihênî yê ajanê CIA bû li Tehranê - têkilî hebû. Mirovekî bejinbilind û zirav û çeleng bû. Îngîlîziya wî pir baş bû. Wî, çar sal bû ku doktora ji Zanîngeha Amerîka li Washingtonê wergirtibû. Wî di teza xwe ya doktorayê de, rexne li Barzanî girtibû, ew jî beriya wê bû ku bi rastî serkirdeyê kurd binase. Niha jî kurek çend dilsozê bavê xwe be, ew hindî dilsozê Barzaniyê.

Bi hizra Qezaz, ew bendemana dûvedirêj ya reqekariyeke ji adetê der ya dîktatorekî rojhilatî bû, ji ber ku 11 adara 1975an pêncemîn salvegera wê rojê bû ku Barzanî rêkeftineke digel Sedam Hisên îmze kiribû ku şah di wê baweriyê da bû Barzanî soz daye wî ku rêkeftinê nebe serî. Di wê demê de Qezaz hest pê kir ku tam ji wê tolê werdigirin ku ji Barzanî hildidin û xencera xwe li wî zilamî vediweşandin çawa ku di nav laşê wan de çikandibe.

Qezaz, digel Barzanî û Dr. Mehmûd Osman, ku bijîşkê taybet ê Barzanî bû, çûn qesra şah. şah, bi puxtî gotina xwe kir û ji wan ra got ku rewş ji dema ku kurdan dest bi şer kirin diwartir bûye. Barê wî gelek giran bûye, Tewma neçar ma digel Iraqê rêkeftinê bike. şah got, ev rêkeftina digel Hikûmeta Baas rêkeftineke demî ye. Wî, ev yek jî nedizanî ku gelo Iraq dê bi rastî bi vê rêkeftinê ve girêdayî bimîne yan na. Wî ev rêkeftin weke ceribandinek ji bo pêwendiyên her du aliyan didît. Lê di heman demê de, hemû alîkarî ji ser kurdan dibirî. Hate ragihandin, sînorê Îranê tenê dê 3 rojan vekirî bimîne û piştê dê sînor bê girtin, di nav sê rojan de kî bixwaze were Îranê bila bi xêr bîn û ew piştrast jî kirin ku dê kar ji wan re bê peyda kirin û weke welatîyekî îranî digel wan reftar bê kirin. Osman, aciz bû û got: "Ma dibe xebata vî gelî bibe qurbana kêfa vî zilamî ku kengê xwest ew xebat bimeşe û kengê jî xwest raweste? Dengê xwe bilind kir û wiha got: "Dema te soza alîkariyê da me, qet behsa vekişandinê nehat kirin..." şah, gotina wî birî, "Ez biryara xwe ji we re dibêjim, tiştêk nîn e em li ser nîqaş bikin." Qezaz, digot, Barzanî wê demê bêdeng ma û bêdeng jî ji wir çû. Hem pir mat ma û hem jî pir dilgiran bû, tew ji şah nexwest li biryara xwe jî vegere.

Lê piştê, dema ku Barzanî digel alîkarên xwe yê sereke rûnişt, biryar da xebata çekdarî dê bidome. Her du kurên xwe Îdrîs û Mesûd şandin Kurdistana Iraqê da ku pêşmergeyan kom bikin û taktîka salên 60î 'lêde û bireve' bimeşînin. Ew bi xwe jî hat baregeha xwe li Gundê Navpirdanê. Piştê di civînekê din de ya ku li bintara çiyayekî pêk hat, Barzanî rêkeftina şah û Seddam Hisên weke şikestek demî ji bo kurdan nirxand. Her wiha got, "Ji sedî 90 piştrast e" ku xebat ber bi başbûnê ve diçe. Piştî ku Barzanî çû, hemûyan dora Qezaz girt, jê pirsîn ku gelo çî bûye ku Barzanî wiha geşbîn bûye? Qezaz nekarî tu tiştêkî bêje. Gelo Barzanî tiştêk dizanîbû ku yê

din pê nizanibûn? Yan jî tenê dixwest dilê gel xweş bike?

Piştî demeke kurt, ew geşbîniya Barzanî hate guhertin û dest ji kar berda. Di 18 adara 1975ê de, digel serkirdeyên xwe yê leşkerî ên sereke civiya û got ku êdî nikare pê da biçê û da zanîn ku Îran dê 18 gulanê sînorê xwe bigire. Wê demê Tirkiyeyê jî sînorê xwe girtibû; artêşa Iraqê jî, sînorên başûr û rojava girtibû. Tu hêviyek nemabû. Barzanî got: "Heke kesek bixwaze şer bike û bidomîne ez dê ji dil û can alîkariya wî bikim." Pêşniyaza wî zêdetir axaftin bû ne ku cidî. Yê ku li wî guhdarî dikirin, têgihîştin ku Barzanî dibêje: "Ev dawî ye û pêwîst e em li vir rawestin." Dema çavek li hola xwe gerand, zanî ku serkirdeyên wî li ser wê yekê rê ketibûn heke sînor bêne girtin û çek û pêdawîstî neyên, ew nikarin berdeham bikin. Lê Elî Eskerî, daxwaza mohleteke çend rojî kir da ku rewşa şervanan bizane. Yê din hemû di wê baweriyê de bûn ku êdî ew nikarin li ber xwe bidin. Piştî Elî Eskerî jî hat ser nêrîna wan.

Piraniya wan fermanarên ku di nav şer de mabûn, bi dilekî şikestî û bi çavê girîn ve ji civînê derketin. Dema ev nûçe hate weşandin, yekîneyên pêşmergeyan hêdî hêdî ji hev belav bûn. Hinek ji pêşmergeyan çekên xwe şikandin, hinekan jî çekên xwe avêtin nav geliyan û hinekan jî çekên xwe avêtin nav avê. Hinek jî kelogîrî bûbûn û qala xwekuştinê dikirin. Vê rewşê û bêhêvîtiyê gel tûşî tengaviyê kir. Hêvî neman, xewn û xeyal pûç bûn. Diviya yan biçin Îranê yan jî bi lêborîna Hikumeta Iraqê bawer bikin û vegerin Iraqê. Hemûyan dizanî ku yan dê werin sirgûnkirin yan jî werin girtin û bêne kuştin. Vê yekê bijîşkê taybet û alîkarê Barzanî Dr. Mehmûd Osman şoke kir û hişt ku ji Barzanî çuda bibe û rexne li wî bigire çima ku dest ji têkoşana çekdarî berdaye.

Gelo çî bûbû sedem ku helwesta Barzanî di navbera du civînan de ji binî ve guherî? Hate gotin ku beriya ku Barzanî daxuyaniya xwe bide, du caran ji Tehranê jê re telefon hate kirin. Gelo Hikumeta Îranê gef lê xwar? Gelo Amerîkayê destê xwe xist nav meseleyê û ew bê hêvî kir? Kes nikare van pirsan piştrast bike. Lê yê ku Barzanî nas dikirin, digotin ew mirovê ku ji salên 1940î ji vir ve serokatiya hemû şoreşên mezin ên kurdan kiriye, ji ber gefan danaxwe. Wî di temenê heftê û du saliyê de zanî ku êdî ne rewşa tenduristiya wî wekî berê ye û ne jî hêza wî heye careke din li ser çiyê serokatiya tevgerê bike. Di vî şerê de ku nû dawî lê hatibû, weke şerên berê nebû, bi zehmet li baregeha xwe vedihesiya. Wî nikaribû weke berê şev heta sibê di nav sengeran de bimîne û ferman bide û rê nîşanî şervanan bide û car caran jî beşdarî şer bibe û êrişî ser kozikên dijmin bike. Heke Mistefa Barzanî nikaribe serokatiya şoreşê bike, yekî din dê çawa bikaribe? Tê gotin ku baweriyaya wî bi kesên din nebû ku bikaribin tiştê ku ew ji mêj ve dike pêk bînin.

Jimareyeke kêr ji kurdan, helwestek ji vê jî hişktir li ser wî dan. Tenê Barzanî

wisa nebû ku baweriya wî bi kesekî nedihat ku cihê wî bigire, ya rastî ew bû ku ew jî pê hesiyana ku Barzanî jî naxwaze kesek cihê wî bigire. Wî nikarî li wê yekê bifikire ku mirovekî din were û ew mîrata ku wî ji mêj de bi dest xistibû, jê wergire. Îcar heke Barzanî êdî nedikarî rêbertiya doza kurdan bike, naxwe kesekî din jî nabe.

### Ew Mêvanê şah e

Piştî ku dawî li şoreşa kurdî hat, Barzanî bû mêvanê şahê Îranê Mihemed Riza ku bêbextî li wî kiribû. Barzanî û endamên malbata xwe derbasî maleke di bin kontrola Saziya Ittîlaat û Ewlehiya Welat ku piştî navê vê sazîyê bû SAVAK. Ev sazî, dezgeha polîsê nihênî yê şahê Îranê bû. Xaniyê ku Barzanî û malbata wî tê de bûn, xweş û paqij bû, her tiştek tê de hebû. Lê Barzanî dîsa hest dikir ku di zîndanê de ye. Têkiliyên wî digel tagir û hemû cîhanê qut bûbû. Şikesta ku dûçarî wî hatibû, ew bêzar, dilgiran û xembar kiribû. Ev yek bi wî giran hat û tesîr li tenduristiya wî jî kir. Di destpêka salên 1970î de, piyê wî yê çepê diêşîya û ji ber wê jî nikarîbû zêde bimeşe. Bijîşkan jê re gotibû demara piştî wî qetiyaye û xetera mirinê nîn e; her tenê nîşana pîrbûnê ye.

Lê niha, nîşaneyên zêdetir xuya bûn; aliyê rastê yê singê wî jan dida. Destpêka salên 1975ê, êşa wî venemirî. Îdrîsê kurê Mele Mistefa, ji Necmedîn Kerîm, ku doktorekî genc ê kerkûkî bû, xwest, bavê wî muayene bike. Kerîm, di destpêka xwendina xwe li Zanîngeha Mûsilê, ketibû nav karê xebat û şoreşê. Sala 1973ê dersa xwe qedand û çû nav refên xebata kurdî. Wî û Dr. Osman nexweşxaneyêke biçûk li baregeha Barzanî ava kirin. Dema Osman ket nav karê siyasî û şer meşand, Kerîm berpirsiyartiya nexweşxaneyê girt ser milê xwe û rojane serdana bi sedan nexweşî dikir. Ew qasî mijûlî karê xwe bû ku pê re nedigihand beşdarî karê siyasî bibe yan bala xwe bide ser rewşa şer. Hêdî hêdî cihê Osman girt û bû bijîşkê malbata Barzanî. Piştî tehlîlekê, diyar bû ku dilê Barzanî, mirovê mêrxas, silamet e û nexweşîya wî hate dîtin; girêyek li nêzîkî hestiyê stûyê wî de bû û jan dida. Kerîm digot dibe ku şêrpenceya pişkê be. Nîşaneyan ev yek diselmanandin û Barzanî jî pîr cigare dikêşa. Barzanî, tu carî cigareyên di paketan de nedikêşan, bi xwe cigareya xwe dipêça û titûna çiyayên Kurdistanê dikêşa. Rojê qasî du paketan cigare dikêşa û 60 sal bû cigarekêş bû. Tehlîla nexweşîya wî bêtîrî kîşandina wêneyê (tîşka X-rontgen) mumkin nebû. Barzanî, ev qebûl nedikir û nedixwest ev bijîşkên ku şahê Îranê şandine, wî muayene bikin. Ji Kerîm re got:

"Ez naxwazim tu tîşkekî li vir bigirim. Heke ez li vir bême dermankirin, êdî nahêlin ez ji vir derkevim, dê ji min re bêjin divê dermankirina te li vir temam bibe."

Wî xwest biçe DYAyê. Helbet ev tenê ji bo wê yekê nebû ku li wir bijîşkên baştir

hene, ji bo wê bû ku biçê digel Kissinger derbarê doza kurdî de baxive. Kissinger, du hefteyan beriya ku şah û Seddam Hisên rêkeftinê îmze bikin, ji Barzanî re wiha nivîsbû: "Ez dixwazim hûn bizanin ku em çî qasî rûmeta te û gelê te digirin ji bo wê xebata hêja ku hûn dikin." Barzanî, piştî xwe bi hevpeymaniya digel DYAYê ve girêdabû. Bi taybet, Senatorê Eyaleta Washingtonê yê Demokrat Henry Jackson û Serokê AFL- CIO George Mînî. Van her du siyasetmedarên amerîkî, pir piştgiriya mafên kurdan dikirin. Her wiha wî pêşbînî dikir ku gelê Amerîka jî bibin hevsoz û hevxiyê kurdan. Nexweşiya wî rê dayê ku ji girtîgeha Îranê derkeve û biçê Amerîkayê.

Ne şah û ne jî Kissinger dixwest Barzanî biçê Amerîkayê û li nav welat de bigere û nihêniya çîroka alîkariya pir bi êş û tiştên veşartî yê DYAYê ji kurdên Iraqê re aşkere bike û ji wan re behsa wê bike ku çawa ji nişka ve rû jê badane. Lê têkiliyê Mela Mistefa digel Jackson û Mînî gelekî baş bû. Heke çûyîna Barzanî ji bo Amerîka û dermankirina nexweşiyê hatiba astengkirin, dê Jackson û Mînî ew çîrok ji her kesî re bigotana. şah û Kissinger, bi dudilî destûr dan Barzanî biçê Amerîkayê û bihêlin nexweşiya xwe derman bike, lê nehêlin bi cihê de biçê û karekî bike û biryar hat dayîn ku CIA, hemû karên wî bi rê ve bibe û xercên wî bide. Di heman demê de, efserên CIA û SAVAKê, dê her tim çavdêriya Barzanî û endamên partiya wî bikin. Li ser vê bingeê rê dan Barzanî meha tebaxa 1975ê bigihîje DYAYê.

### **Dermankirina Nexweşiya Wî Li DYAYê**

Mihemed Doskî, kurdekî ji malbêteke naskirî ya bakurê Iraqê ye. Ew yekem kes bû ku li Mayo Klînîk îlona 1975ê serdana Barzanî kir. Doskî, mirovekî kurt û qelew bû û temenê wî nêzîkî 40 sal dibû, lê gava te lê dinêrî 10 salan mezintir xuya dikir. Wî her di zarokatiya xwe de Mela Mistefa wekî mezinê xwe zaniye, lê ji bo doza kurdî tu tiştek nekiriye. Heta sala 1970ê, dema ku Partiya Baas biryar da ku kesê ku hevjiha wî biyanî ye - ne ereb e û nemusilman e- divê berde, wî di warê dîplomasiyê de kar dikir. Doskî, piştî vê biryara Partiya Baas, dev ji karê dîplomasiyê berda û ji Iraqê çû û digel jina xwe ya amerîkî li Amerîkayê akincî bû. Destpêka 1950î de, dema li Amerîkayê dixwend, digel jineke amerîkî zewicîbû. Beriya ku biçê, pêşniyaz kir, ezmûna xwe ya dîplomasiyê bixwe xizmeta gelê kurd. Hat digel Barzanî axivî û Barzanî jî hurmet ji pisportiya wî re girt. Di wê demê de, hejmara kurdên ku li DYAYê dijyan, kême bû. Nûnerê Partiya Demokrata Kurdistanê li Washingtonê nebû. Barzanî, ji Doskî xwest, digel çend kesan hevdîtinê pêk bîne û encamê jî ji wî re bêje. Doskî, sala 1972ê hat Washingtonê û serdana Kongre û Wezareta Derve ya DYAYê kir û digel Senator Jackson û çîgirê wî Richard Pirel hevdîtinê pêk anî. Her wiha digel George Mînî û zavê wî Ernest Lie jî rûnişt. Ernest Lie, serokê beşa derve ya AFL-CIO bû.

Lê Doskî, dereng gihîşt bi xizmeta Barzanî. Ji ber wê jî, nekarî bi temamî baweriya wan bi dest ve bîne. Ji wî re nehatibû gotin ku wê salê Îdrîsê kurê Mela Mistefa û Dr. Mehmûd Osman, bi nihênî serdana Washingtonê kirine û digel rayedarên CIAyê civiyane. Piştî beşdarî hevdiştinên Barzanî digel CIA kir. Dema Barzanî di tebaxa 1975ê de hat Amerîkayê, îca Dost bi hindek parêzan bo sînoren navxweyî yê hevalên Barzanî hate wergirtin.

Dema Doskî, îlona 1975ê li Mayo Klînîk serdana Barzanî kir, ji rabûn û rûniştina pratîk ya li wir piştrast bû ku serkirdeyê kurd hedefa CIA û SAVAKa Îranê ye. Serdana duyem a Doskî ji bo klînîkê ya di destpêka meha mijdarê de bi dizî pêk hat. Rojekê, piştî nîvro gihîşte Rochesterê û bi navekî kod li hoteleke nêzîkî klînîka ku Barzanî tê de dihat dermankirin, navê xwe nivîsand. Telefonê wê reqema ku şefîq Qezaz dabû wî kir. Piştî 45 deqeyan, Qezaz û Mesûd Barzanî, ku hatibû serdana bavê xwe, li deriyê Doskî dan. Plan jê re şîrove kirin: Ew dê her du efserên CIA û SAVAKê, saet 8:30 êvarê dawetî xwarinekê bikin û mazûbaniyeke wek ya Rojhilat Navîn ji wan re bikin. Dê şerabê ji wan re bikirin û çend caran ji wan re bînin. Bi kêmanî divê du saetan mêvanên xwe li ser sifreyê giro bikin. Bi vî awayî, dê derfetê bidin Mela Mistefa ku digel Doskî şewira xwe bike û tiştên pêwîst jê bipirse.

Doskî dît Barzanî li ser qaryolayeke rûniştîye. Rewşa wî baş diyar bû, lê porê wî jî ber rongten û dermanên kîmyayî hilweriyabû. Doskî nameya Senator Jackson ji wî re xwend û wî jî baş guhê xwe dayê. George Mînî jî peyameke zarkî ji Barzanî re şandibû. Peyama Mînî serinca Barzanî kişand, ji ber ku Mînî pêşniyaz kiribû qampaniyeke propagandeyê ji bo berjewendiyên kurdan bê sazîkirin. Piştî ku Barzanî guhê xwe da her du peyaman, tiştê got Doskî şaş û metel ma.

Barzanî wiha jê pirsî, "Gelo, tu dibêjî wê AFL-CIO min ji vir birevîne?" Barzanî behsa wê dikir ku ji meha tebaxê vir ve li wir e. Çareseriya tîşkê xilas bûye û çareseriya kîmyayî jî ku niha dike dikare li cihekî din jî bike. Wî, her dem dixwest biçe Washingtonê, lê ew efserê CIA ku berpîrsê wî bû, her dem hincetek hildixist û nedihîşt ew biçe Washingtonê. Her tim jê re digot, heftiya bê, sibê yan dusibê. Barzanî pêşniyaz kir, heta ku Mesûd û Qezaz mazûbaniya endamên CIA û SAVAK di-kin, Doskî biçe balafirekê kirê bike da ku pê biçin derveyê hotelê û digel Doskî herin Washingtonê.

Doskî negot Barzanî ka ew pêşniyaza wî çi qasî ne di cî de ye. Ew der Amerîka bû, dewleteke polîsî ya Rojhilata Navîn nebû. Te bi xwe balafir kirê nekir, tu bi balafireke bazirganî hatî. Doskî nedixwest digel Barzanî gengeşe bike. Tenê ew yek jê re got ku ev kar naçe serî û biteqê. Barzanî, ji Doskî re got, planeke ji bo revê saz bike û êvara paştir were dîtina wî.

Dema Doskî hateve, şaş û metel ma ji ber ku pêşwaziyeke gelek sar lê hate kirin.

Barzanî, pir aciz bû û wiha got, "Ji duh ve, dema te ez dîtîm, tu qet digel kesekî axivî?" Doskî bersiv da: "Tenê digel Mesûd û şefîq." Çima Barzanî ev yek hanê pirsî?: "Ji ber ku îro zilamê CIA hat ba min û ji min re got ku rê dane min ez biçim Washingtonê. Min jî got qey te digel wî axiftiye." Doskî, piştrast kir ku digel kesekî neaxiviye. Doskî got, dibe ku amûrekî guhdarkirinê di odayê de hebe, divê em seh bikin. Barzanî bersiv da, "Xwe nerehet neke, heke em wê amûrê bibînin, dê yeke din daynin."

Barzanî, ji Doskî re got, biçe Washingtonê ne tenê digel Jackson û Mînî hevdtînê pêk bîne, lê digel Senator William Roksîmayer Wiskensen û yên din jî rûne. Doskî, roja paştir çû Washingtonê. Vêca ma li hêviya Barzanî. Du hefte borîn deng jê nehat. Piştî sê heftiyên telefona hotela wî ya li Rochesterê kir û jê re gotin: "Kom ji zû ve çûye û adresa wê ya nû jî em nizanin." Hew mabû Doskî dîn bibe. Gelo dibe ku CIAYê ew revandibe? Gelo dibe ku Barzanî şandibin Îranê? Yan jî di girtîgeheke veşartî de hatibe zîndanîkirin?

Piştî çar heftiyên, Qezaz telefona Doskî kir û jê re got, CIAYê, Barzanî û hevalên wî ji bo "bêhnvedanekê" biriye û heftiyekî li peravên Deryaçeya Tachoe li Kalîforniyayê mane û li hinek cihên din ên rojava geriyane. Sê rojan beriya niha, hatine Washingtonê û li wir CIAYê ew danîne malekê li taxa Virginia ku telefona wê kar nedikir. Karmendên CIAYê, Barzanî û hevalên wî ji bo "dîtîne" Washingtonê birine. CIAYê, bi otomobîlê ew birine dîtîna Koşka Spî û ji wan re gotine: "Ev der White House e." Di wê demê de, Barzanî jê xwestiye li wir rawestin, lê ew yek nehatiye qebûl kirin. Heman çîrok li Kapîtolê jî dubare bûye. Tenê Qezaz, bi hinceta ku dê biçe zirkeça xwe bibîne, xwe ji wir rizgar kiriye û xwe gihandiye jinekê amerîkî ku li devera Washingtonê dijî.

Roja paştirê, Doskî li Hotela Maryot li Roslîn ku dikeve aliyên din ê Georgetown, Qezaz dît. Qezaz got:

"CIA gotiye divê Barzanî vegere Îranê. Barzanî jî nexwest biçe û digot: 'Ez naçim heta nexweşiya min baş nebe.' Ji ber ku li Îranê ev çareser nebû. Heke bê neçarkirin ku DYAê biterkîne ew dixwaze biçe Swîsre yan Swêdê yan jî biçe cihekî ku bijîşkên baş li wir hebin. Di bersiva hemûyan de, wan gotineke gêj û gêlane dikir: 'şah dixwaze ew vegere.' "

Dema Barzanî, çûyîna bo Îranê red dikir, wan hey bersiveke gêjane dida û digot: "şah dixwaze ew vegere."

Barzanî, di dawiyê de razî bû. Li gorî Doskî, heke Barzanî li ser helwesta xwe rijd ba, reng bû malbata wî li Îranê ketiba xeterê. Beriya ku biçe, xwest sozekê bidinê. Barzanî her tim dixwest digel Kissinger hevdtîn bike, ji ber ku di wê baweriyê de bû

heke bikaribe arîşeya xwe bo Kissinger bêje, ku wê demê wezîrê derve yê DYAyê bû, dê ew her tiştî ji bo kurdan sererast bike. Wî şervanê mezin ê kurd, nizanîbû ku çî qas şaş di wî mirovî gihiştîye ku berê bi germî jê re dinivîsand. Dibêjin ku piştre, Kissinger bi nivîsa "divê kiryarên nihênî tevî karên mîsyonî neyên kirin" hemû alîkariyên DYAyê ji bo kurdan sekinand. Ev nivîsa wî gelekî bêrêzane bû. Wî qet nedixwest Barzanî bibîne. Aşkere bû ku dixwest guh nede Barzanî û ji bîr bike, ji ber hindê ji Berpirsê Karên Siyasî Josef Sîsko re got: "Li Barzanî guhdarî bike û bila her zîrnê lê bide û hew."

Sîsko, ji erka xwe bêzar bû. Dema Kissinger ji sala 1972ê ve dest pê kir, bi dizî, alîkarî ji kurdan re dişand, Josef Sîsko cîgirê wî yên karûbarên siyasî yên Rojhilata Nêzîk û Başûrê Asya bû, lê tu haya wî ji vî karî nebû. Heta dema ku bû cîgirê wezîr jî bû, haya wî ji kar û programê nebû. Her tenê di bin destê Kissinger de bû. Niha jî Kissinger jê re dibêje here wî zîlamî bibîne ku hest pê dîke ji ber sekinandina programê, bêbextî lê hatiye kirin.

Ku tarî ket erdê, Sîsko birin wê mala CIAYê ku Barzanî û hevalên wî tê de diman. Ji ber ku rewşa Barzanî baş nebû, mirov ditirsand, lê wî her gotina xwe got û li hember reftara ku digel wî hatibû kirin, nerazibûneke tund nîşan da. Barzanî, behsa dîroka pêwendiyên xwe digel DYAyê kir û jê re got ku çî qas baweriya wî bi amerîkayîyan dihat. Wî got, qet baweriya wî bi şahê Îranê nebû, lê dema amerîkî hatin holê, di wê baweriyê de bû ku êdî di ser guh re nayê avêtin. Heke ji alîkariya DYAyê bi qasî serê derziyê şikber bûya, qet digel Hikumeta Bexdayê şer nedikir.

Sîsko, jê re got ku DYAyê li ser daxwaza şah alîkarî daye kurdan, niha jî li ser daxwaza şah alîkariyê dide sekinandin. Sîsko erka xwe bi cî dianî û tu hêviyek neda ku careke din Amerîka li biryara xwe vegere. Tenê wiha got ku dê gotinên Barzanî ji bo yên ser xwe re bêje. Di dawîya mijdara 1975ê de, dawî li serdana Barzanî ya bo DYAyê hat. Roja ku dê ber bi Îranê ve bifiriya, pasevanên CIA, têra şeş mehan jê re derman anîn. Doskî û Qezaz, ev yek weke tiranekirinê nîrxandin. Ji ber ku bijîşkên ajansê ji wan re gotibûn Barzanî tenê şeş mehan dê bijî. Pêşbînî nedikirin ku carekî di wî bibînin û derman jî weke xatir xwestinê bû.

Heke bi rastî ev daxwaza wan bûya, wê demê ew şaş bûn. Bijîşkên Mayo Klînîkê jî tiştêkî wisa nekiribûn, piştî girtina tîşka eks û xwîna wî tehlîl kiribûn û jê re gotibûn, şêrpenceya pişkan girtiye û belavî aliyê rastê yê sînga wî jî bûye ku çareya wê nîn e. Doktorê genetîkê ji Qezaz re wiha got: "Nexweşî zû belav dibe, ew 8 mehan yan saleke din dê bijî." Heke laşê wî bihêz neba, dibe ku ewqasî nejiya, lê pêkhatiya xurt a Barzanî hişt ku ew sê sal û nîvê din jî bijî.

## Dîsa Zîndana Destê şah

Dema Barzanî vegeriya Tehranê, dîsa bû girtiyê şah û ji hemû kesên ku berê serokatiya wan dikir, qetiya. Piraniya wan bi dilê xwe çûne Iraqê, lê nêzîkî çend sed hezar kes li Îranê man, lê şah qet weke ku soz dabû wan, pêşwazî li wan nekir. Piraniya wan di kampan de, her di bin çavdêriyê de bûn û bêkar bûn. Hinek xwarin didan wan ji bo ku birçîna nemirin. Her gav, gef li wan dixwarin ku dê wan bişînin Iraqê yan jî cihên dûredest ên li Îranê. Piraniya penaberên kurd nifir li Barzanî dikir, ji ber ku Barzanî wekî sersebebê wê karesat û bêtarê dizanîn ku li wan qewimîbû.

Ji bo Barzanî dema tengaviyê bû. Şêx Babo, birayê wî û hevalê wî yê dêrîn, sibata 1976ê koça dawî kir. Dema nûçeya mirina şêx Babo gihîşt Barzanî, Qezaz û Kerîm digel wî bûn. Heta wê demê kesî nedîtibû Barzanî bigirî, lê niha wekî giyanewerekî birîndar digiriya. Mirina Babo, ew gelekî xemgîn kiribû, nexweşiya wî jî hiştibû ew diltengtir bibe. Mirovekî bi liv û lebat bû, nexweşiya wî jî ji ber ku bi şêwaza kîmyayî dihat dermankirin, her tê dixebitûn ku bi ser nexweşiya wî ve bibin, lê çareseriyê kîmyayî nexweşiya wî girantir kir. Dr. Kerîm hê jî bijîşkî mala Barzanî bû û li nexweşxaneyê Tehranê serperîştîya dermankirina wî dikir. Di dema verişandin, êş û azarê de jî digel Barzanî bû. Di riya demaran de xwarin dida wî da ku piçekî wî vehesîne.

Barzanî, aciz bû ji bo ku vegeriya Îranê. Ji Kerîm re got, hatina bo Îranê şaşîyê mezîn bû. Wî dixwest dîsa biçe Amerîkayê. Di fikra wê de bû ku dîsa biçe Amerîkayê û piştrast bû ku ew dikare Amerîkayê razî bike da ku alîkariya kurdan bike û şah jî mecbûr bike siyaseta xwe biguhere. Îranê daxwaza Barzanî ya li ser serdana bo Amerîkayê piştguh xist. Sefîrê Amerîkayê yê li Tehranî jî helwestek wiha nîşan dabû. Ji ber wê yekê, karên li Washingtonê spartin Doskî.

Dema Barzanî ji Washingtonê derket, Doskî xwe ji hevpeyvînên tomarkirî dûr xist, ji ber ku ditirsiya Barzanî li Tehranê rastî arîşeyekî bê, lê bi awayekî nerm, nûçeya nexweşiya Barzanî û çawaniya reftarên karmendên CIA di dema serdana wî ya bo Amerîkayê de weşand. Di cotmeha 1975ê de Doskî serdana rojnamevanê televizyona CBS Danyel şorî kir û her tişt jê re got. Şorî jî, ew tiştên ku Doskî gotibûn, di bultena êvarê ya nûçeyan de weşand. Di 16 sibata 1976ê de jî, radyoya "The Village Voice" ya Amerîkî, çend beş ji belgeyên nihênî weşand ku tê de alîkariya nihênî ya rêveberiya Nickson ya bo kurdan û çawaniya sekinandina alîkariyê nîşan dida.

Di despêka tîrmeha sala 1976ê de, Doskî telefonî Nûnerê Cîgirê Wezîrê Derve Sydney Sûber kir û jê xwest, vîze bidin Barzanî û bila Wezareta Derve ya Amerîkayê daxwazê ji Hikumeta Îranê bike da ku rê bide Barzanî ji Îranê derkeve. Sûber di bersiva Doskî de wiha got: "Em nikarin mudaxeleya karê hundirîn ê Îranê bikin, şah rê nade vê yekê."

Doskî, biryar da digel wî tund be û wiha jê re got, "Min par hinek tişt ji CBS re gotin û behsa wê kir ku Amerîkayê çawa digel Barzanî reftar kir. Lê gelek tiştên ku ez bêjim jî mane. Barzanî hew maye bimire. Heke rê neyê dayîn ku ew were Amerîkayê, ez dê her tişteki ji medyayê re bêjim."

Doskî, fêl dikir. Piştî 10 salan hevpeyvînek din digel wî hat kirin. Di hevpeyvîne de li xwe mukir hat ku her tişt ji şorî re gotibû. Ji wê yekê jî piştrast nebû gelo Barzanî ew desthilat dabûyê ku wiha bipeyive, lê fêla wî bi kêr hat.

Sûber, bi dilgiranî got: "Raweste carê, ez lê bifikirim û ez ê paşê bersiva te bidim." Piştî du rojan, Sûber ji Doskî re got ku wezaretê derve dê vîzeyê bide Barzanî, bila pasaporta xwe bişîne Sefareta DYAYê ya li Tehranê. Doskî jê pirsî, Îran dê çawa pasportê bide Barzanî? Sûber bersiv da û got: "Ev ne karê me ye."

Doskî pir aciz bû û wiha got:

"We ji hêla siyasî ve Barzanî kuşt, niha jî hûn dixwazin laşê wî jî bikujin? Ew mirovê han nexweş e û divê ji bo dermankirinê were vir. Heke hûn nehêlin ew bê vir, wê demê hûn wî dikujin. Pêwendiyên we digel Îranê pir baş in, heke hûn bihêlin Barzanî ji bo dermankirinê bê vir, ne zerer li we û ne jî Îranê dikeve."

Doskî zanî ku gotinên wî bi kêr tên. Sûber got: "Ez dê yek-du rojên din telefonî te bikim." Doskî piştî 48 saetan serdana Wezaretê Derve kir. Sûber got: "Gelek baş e, ji me re ragihandin ku Îranê rê daye General Barzanî biçê." Lê Sûber peyre got ku ji bo ku Barzanî li DYA bimîne, divê hinek mercan qebûl bike, divê bi xwe xercên xwe bide, divê digel medyayê jî pêwendî neke û bi siyasatmedaran re jî hevdîtinan pêk neyîne. Doskî razî bû, lê got, Barzanî jî mercên xwe hene. Vê carê Barzanî di bin kontrola CIA de nabe û azad e biçê her cihekî û ji bilî rojnamevanan, digel her kesî hevdîtinan pêk bîne.

### **Dîsa Vegera bo Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê**

Hezîrana sala 1976ê, cara duyem Mela Mistefa Barzanî, li Balafirxaneyê John F. Kenedy peya bû. Doskî li termînalê li benda Barzanî bû, çavê wî bi zilamekî amerîkî yê bejin bilind ket û di cî de ew nas kir û zanî ku efserekî CIA ye û ew jî li benda serkirdeyê kurd e. Efserekî CIA, diyar kir ku ew tenê ji bo pêşwazîkirina Barzanî hatiye, ji ber ku ew ji berê de Barzanî nas dike. Her çend ew Sober bi rijd bû, lê serê pêşîn ajans hey li dû wî bû û mesrefên wî dan. Dema Barzanî ji bo tehlîl û dermankirinê çû Mayo Klînikê, efserekî CIAYê jî li wir bû. Gava Barzanî çû Washingtonê ajansê swîteke ciwan li Hotela şorêham ji bo wî kirê kir. Ev ew swît bû ku pênc salan berê, Spêro Agniyo lê hatibû mêvankirin, ku hîngê cîgirê serokê

Amerîkayê bû. Serê meha tebaxê bû, ajansê şîveke bi rewş û giran ji bo Barzanî saz kir ku kesayetiyên mezin ên rêveberiya operasyonan û wezaretan karên derve jî lê jî amade bûn.

CIA û SAVAKê, car din xwest Barzanî razî bikin da vegere Îranê, lê Barzanî vê carê ji binê de red kir. Ji ber ku hizir dikir hêştê mecalek heye da ku nêrîna amerîkiyan biguhere û dizanî ew li Îranê nikare tiştêkî ji bo kurdan bike, her wiha derman û bijîşkên ku li Amerîkayê hebûn li Îranê tunebûn. Dema Barzanî çûyîna Îranê red kir, CIA pare jî ser wî birî.

Doskî, li taxeke laçep (xewle) a George Townê malek ji wî re dabîn kir. Salekê li wir ma û piştê ji Potomakê derbas bû û çû Maklînê. Barzanî di demên ku jê re hatibûn diyarkirî de, serdana Mayo Klînîk dikir û nexweşxaneyên George Town û Sîblî jî çareserîya radyolojî û kîmyayî bo wî hate kirin. Nexweşiya wî her wekî xwe ma û wî jî jiyaneke asûdetir bir serî. Digel Senator Jackson, Proksmayer û George Mînî û endamê kongreyê Stephan Solarzî û çend kesên hevdtîtin pêk anîn. Ji wê yekê pir aciz bû ku Wezaretê Derve ya Amerîkayê nahêle ew di nav civakê de azad bigere, rojnamevanan zor li wî dikirin ku digel wî hevpeyman saz bikin, lê ji ber qedexebûnê wî nikarîbû, lewma tûretir dibû.

Bihara 1977ê, Rêvebera Komeleya Navneteweyî ya Mafên Mirovan Roberta Kohén – ku wê demê take grûba mafên mirovan a Amerîkayê bû - Barzanî ji bo ofîsa xwe ya li New Yorkê vexwend. Kohén, ji ber bînpêkirina mafê Barzanî yê axaftinê, ji wezaretê derve aciz bû. Kohén, digot, Hikumeta DYA dikare devê mirovekî biyanî bigire û nehêle bipeyive, lê nikare devê wê bigre ew digel rojnamevanan bipeyive, ji ber ku welatîyekî Amerîkayê ye.

Kohén, ew têkoşerê pîr ê kurd bir danî pêşberî rojnamevanan û ji wan xwest, pirsan ji wê bikin û wê jî pirs arasteyî Barzanî dikirin û Barzanî jî bersiva wan dida. Ev yek bû sedema nerazîbûna wezaretê derve, lê hîngê Kissinger di posta wezaretê derve de nema bû, kesekî demokrat cihê wî girt ku piştgirîya doz û mafên mirovan dikirin. Êdî Barzanî tîrsa ji dersînorkirinê nema.

Ew zexta ku Barzanî li Kongreyê kir, hişt ku hezar kurdên Iraqê ji aliyê DYAyê ve wekî penaber bêne wergirtin, lê her ew bû. Barzanî her çend, ji wê yekê piştast bû ku ew dikare siyaseta Amerîkayê ya li hember kurdan biguherîne û wek berê lê bike, lê wî ne karî vê yekê bike û ne jî karî doza kurdî bixe nav plan û programa Wezaretê Derve ya DYAyê. Kurd her wekî berê hatin piştguhaxistin, Barzanî jî niha zêdetir hatibû piştguhaxistin. Berpîrsê Karên Bakurê Erebî li Wezaretê Derve Morîs Draper heta demêkê pêwendîya wî digel pêşewayê kurd hebû. Barzanî, ji Draper razî bû, lê sala 1978ê Draper bû alîkarê cîgirê wezîrê derve û pêwendiyên xwe yê digel Barzanî spartin Mêrî An Keysî. Keysî, karmendê gelekî ji wî nizimtir bû, lê jinbûna

Keysî ji pileya wê zêdetir Barzanî bêzar kir. Li gorî wî, êdî DYAYê tu bihayekî bi wî nake û qet wî girîng nahesibîne. Wî digel Draper, xwe radigirt û qet behsa şikest û arîşeyên xwe nedikir, ji ber sala 1975ê ji aliyê DYAYê ve hatibû piştguhxistin. Sala 1978ê, rojekê Barzanî teqiya û çî di dilê wî de hebû, hemû xerabiyên ku lê nayê lêborîn, bi rûyê wê jina cihêl de hilrijand.

Li gorî Doskî, Barzanî gelek caran axîn dikêşan ji ber ku baweriya xwe bi Amerîkayê aniye. Ji ber wê carekî wiha got: "Heke min zanîba gelê Aemrîka wiha têvel e û kesek nizane ka ji ku derê hatine, min tu carî wiha nedikir." Carekî jî wiha got, "Ma çawa dibû ez bizanim CIA beşek ji vî gelî nîn e û Kongre û gelê Amerîka zêde jê hez nakin."

Ji sala 1977 heta sala mirinê 1979ê, Barzanî ketibû bin psîkolojiya binketinê û hest dikir bi ser neketiye. Gelek caran gazinde ji xelkên din dikirin, hinek caran jî berpirsiyarî dixist stûyê xwe. Havîna 1977ê, carekê Barzanî, Qezaz, Doskî, Kerîm û Cemal Elemdar, ku nûnerê wî yê li Londonê bû, li restoraneke Rojhilata Navîn li Washington D.C. xwarin dixwar. Zilamek hat gel wan bi erebî axivî û ji wan pirsî: "Hûn kurd in, ne wisa? Min guhdarî kir hûn kurdî dipeyivîn." Zilam go, ew aşûrî ye ku gelek bûn ji ber şkestina şoreşa Barzanî bi qasî kurdan ketibûn tengasî û dijiwariyê. Wî, Barzanî nas nedikir, dengê xwe hilda û got: "Ka ji min re bêjin, Barzanî ku di viya gelekî zane ba, çawa ew nezaniya kir û baweriya xwe bi şahê Îranê anî?" Barzanî, mat ma. Yê din jî zilâm re got bi rîya xwe ve here. Lê dema ku ji restorane derketin, Elemdar hest kir ku Barzanî gelekî bêdeng bûye. Elemdar, xwest ber dilê wî ve were û hêvî xwest ku gotinên zilamê aşûrî ew bêzar nekiribin. Barzanî, di bersiva wî de wiha got, "Na, wî zilamî rast digot, ez nezan bûm. Ez bi xwe faşil bûm."

Hevalên wî yê amerîkî jî hewl da wî aram bikin û anîn bîra wî ku di jiyana xwe de gelek karên girîng kirine, ew piştrast kirin ku her dem weke mirovekî mezin di dîrokê de dimîne. Lê dema jê xwestin ku bîrhatiyên xwe binivîse, bi tundî red kir. Carekî wiha got: "Heke ez serketibama min dê ew nivîsandibana, lê ez di jiyana xwe de têkçûm. Tişteki wisa nîn e ku hêjayî gotinê be."

şêrpenceya Barzanî, heta 1978ê jî hatibû kontrolkirin û piştî hingî dest pê kir zû belav û. Tenduristiya wî xerab bû û kete nav nivînan. Piştê bi balafirekê ew birin Mayo Klînîk. Dema Barzanî çû, bijîşk ji Doskî re wiha got, "Ez wisa bawer dikim, êdî ez wî nabînim."

Barzanî, çû mala xwe ya li Maklînê. Serê meha sibatê bû, dema dît êdî bijîşk nikarin tişteki ji bo wî bikin, xwest biçe ser xaka Kurdistanê û li wir can bide, îca dibe ku ew xak, xaka Kurdistana Îranê jî be. Wî, Doskî erkdar kir geştê bi balefirê bo Tehranê saz bike. Lê plan rastî astengiyê hat. Dema şirketa riyên asmanî zanîn ku Barzanî di dema seferê de pêwîstî bi maska oksîjenê heye, daxwaza rapora bijîşkî ki-

rin ku nîşan bide tenduristiya Barzanî dest dide bi awayekî saxlem bigihê cihê xwe. Doskî, xwest balafireke taybet bo wî bigire, lê bihayê wê pir giran bû.

Barzanî, hêşta li mala xwe ya li Maklînê bû. Aliyê wî yê rastê bi awayekî tirsnak perçivî û weke defê lê hat. Îdrîs, Doskî û Muhsin Dizeyî ku dilsozê dêrîn ê Barzanî bû, zor lê kirin ku biçe nexweşxaneyê, lê Barzanî guh neda wan û got: "Ew nikarin tiştêkî ji bo min bikin." Lê gazî bijîşkekî kirin. Wî, Barzanî razî kir ku divê mil û aliyê wî yê rastê bê zuhakirin da ku perçivandina wir deyne. Barzanî çû Nexweşxaneya Zankoya George Towan. Doskî û neviyê Barzanî Ferhad, ji saet 7 sibê heta 7 êvarê gel Barzanî diman û Îdrîs û Muhsin Dizeyî jî bi şev gel wî diman. Destpêka meha adarê de, rewşa Barzanî ew qas baş bû ku bijîşkan soz dan rapora seferê ji bo wî amade bikin.

Dema Doskî û Ferhad Barzanî, sibeya 3 adara 1979ê gihîştin nexweşxaneyê, bala xwe dane ku rewşa Barzanî pir baş e. Hatibû ser xwe û daxivî û tu êşa wî jî nebû. Wê rojê, tu arîşe derneketin. Dora saet 5 êvarê, Barzanî xwest wî li ser textê wî rakin û bibin ser kursiya baskdar. Ne Doskî û ne jî Ferhan, rewşekî nenormal di vê yekê de nedîtin. Ji ber ku beriya wê jî çend caran wisa kiribûn. Doskî, kursiya baskdar pal da û bir nêzîkî qerewêla wî. Ferhad jî ku kurekî bihêz bû, bapîrê xwe da ser destê xwe, lê dema xwest Barzanî hilde, mat ma û dît rengê Barzanî tarî bû. Demildest, ew danî ser nivîna wî. Barzanî, demekê bêhna xwe veda û dîsa ji neviyê xwe xwest, carek din hewl bide. Ferhat hest kir divê vê yekê neke, lê guhê xwe da fermana bapîrê xwe, ji ber ku wisa hatibû perwerdekirin ku tu carî fermana bapîrê xwe neşkêne.

Dema Ferhad, bo cara duyem bilind kir, rengê Barzanî sor bû û serê wî hat û çû û ket ser kêlekê. Doskî, zû gazî perestarekê (hemşîre) kir û piştî bijîşkek jî hat û piştî ku rewşa dît, got Barzanî can daye.

Ferhad, telefona kêleka qerewêla bapîrê xwe hilda û xwest telefona mamê xwe Îdrîs bike. Jimareya telefonê baş dizanî, lê wê gave nedihat bîra wî. Telefon danî. Hewl da xwe kontrol bike, lê dîsa telefon kir, lê dîsa jimareya telefonê nehat bîra wî. Doskî jimare ji wî re got û telefon kir.

Termê Barzanî, bo morgêkê li Washingtonê hat veguhastin. Roja paşîn, bi sedan kurd li wir kom bûn da ku bo cara dawî rêz û xema xwe ji bo serokê xwe yê nemir nîşan bidin. 5 adara 1975ê, termê Barzanî, bi balafireke Boîng 747 a Îranê bo Îranê hate şandin. Îdrîs Barzanî, Ferhad Barzanî, Muhsin Dizeyî û Mihemed Doskî digel termê çûn Îranê.

Li Îranê jî, termê Barzanî û hevseferên wî bi helikoptereke serbazî ya Îranê bo bajarokêkî biçûk li rojavayê bajarê Mehabadê li Kurdîstana Îranî û nêzîkî sînorê Iraqê hate veguhastin. Girseyek qelebalix ku Ferhad Barzanî qet di jiyana xwe de nedîtibû,

bixêrhatina Barzanî dikir. Zilam, digiriyên û gule teqandin. Xemgîniya gelekî ku îtiraf pê nehatibû kirin, pêl veda û li deşt, dever û çiyayên kurdî de deng veda.

Dema Barzanî mir, çav ji kêmasiyên wî re hate girtin. Mistefa Barzanî, tu carî şikest nexwariye, tew her tim û di hemû qadên jiyana xwe de leheng bû û mezintirîn mezin bû ku kurdan tu carî nedîtiye.

Ew roja 6 adarê hate veşartin. 4 roj piştî wê, ew roj bû ku şahê Îranê dema vegera xwe de ji Cezayîrê, ferman da, Barzanî û gelê wî wêran kir û ew şandin ordugehan (wargeh). Lê şahê Îranê nizanibû ku piştî çend heftiyên dê tac û textê wî wergere û li rik û nefreta gelê xwe biqewime.

### **Nameya Kissinger bo Barzanî**

Di dosyaya taybet a Nûnerê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mihemed Doskî de, di salên 1970ê de, nameyek wiha ku tê de bêyî ku navek hatibe gotin û tenê tîpên destpêkê yê navê wî hatine nivîsandin, heye. Em wisa bawer dikin ku Wezîrê Derve yê DYAyê Henry Kissinger, ev name ji Mistefa Barzanî re nivîsandiye ku bi riya CIA hatiye şandin:

"22 sibata 1975,

Hêja General,

Ez gelekî kêfxweş bûm dema ku min peyama te ya 22 kanûna duyem a 1975ê wergirt. Ez dixwazim tu bizanî ku em gelekî hurmeta te û gelê te û ew xebata tu dikî, digirin. Ew arîşeyên ku li te qewimîne tirsnaq in. Dema min nirxandina te ya li ser rewşa siyasî û serbazî xwend, min gelekî hurmet nîşan da. Ez dikarim we piştrast bikim ku ji ber girîngiya ku em didin nameyên we, baştirîn nirx ji aliyê rayedarê herî payebilind ên DYAyê ve tê dayîn.

Heke we xwest nûnerê bawerpêkirî bişînin Washingtonê da ku agahiyên zêdetir derbarê rewşê de bide Hikumeta DYAyê, em dê şanaziyê pê dikin û kêfxweş jî bibin pêşwaziyê lê bikin. Ez wisa bawer dikim wezîr girîngiyeke taybet bi wê karîne (twanist) daye ku me kiriye û em niha jî dikin. Her tenê ji ber vê sedemê ve – serbarê wê yekê ku em pûte bi selametiya we didin – ku lewma ez dudil im pêşniyaza hevrûniştinekê li vir digel we bikim. Ez hêvî dikim halê we bizanim.

Bi hêviya başbûna we û rêz û hurmeta min jî qebûl bikin.

H.K

*Jêder: The Middle East Quarterly, June 1994. Volume 1: Number 2*

# Komara Kurdan li Mehabadê

## Erkê Rozvêltê Biçûk

Arkîbold Bulok Rozvêltê Biçûk (1918-1990) kurê Arkîbold Bulok Rozvêltê Mezin e û ji neviyên serokê Amerîkayê Tîdodor Rozvêlt e.

Arkî, di bareya rewşa Rojhilata Navîn de serbaz, wêjezan û zimanzan bû, her weha efserekî CIAYê bû ku li gelek cihan, weke Iraq û Îranê kar kiriye. Wekî din weke berpirsê nivîsîngeha CIA li Medrîd, Stenbol û li Londonê xebitiye. Arkî, bi kêmanî bi 20 zimanan dikarî baxive an jî bi wan bixwîne. Di şerê Cîhanê yê Duyem de Arkî bû efsere îstixbaratê. Dema leşkerên Amerîkayê li bakurê Efrîqeya peya bûn di salên 1942 de Arkî hevkarê wan bû, piştê weke paşgoyekî serbazî li Iraq û Îranê xebitî.

Di sala 1944 de li Bexdadê û piştê di sala 1946 de li Tehranê weke efserekî CIA kar kiriye û di wê demê de jî li nav komara Mihabadê geriyaye û agahdarê rojên dawî yê rûxana komarê bûye. Di wêneyekî de xuya dibe ku ew û Qazî Mihemed bi hev re ne.

Di sala 1988an de bîrhatiyên xwe di pirtûka bi navê `` Bo Hesreta Zanînê`` de weşandin ku tê da behsa hizrên efserekî îstixbaratê dike û gelek giringiyê dide sonda parastina nehênîyên CIAYê; tew jî bo parastina wan nehênîyan, navê wan welatên ku tê de kar kiriye jî hîlneda.

Li vir wêne heye ``Qazî Mihemed li gel rayedarên payebilind û efsere komarê`` .

.....  
*\*Wergêrandin ji inglîzî: Ewif Ebdilrehman Mela Şaxewan\*Ji Kurmanciya Jêrîn: Hoşî Mûrad*



*Qazî Mihemed digel navdarên Mihabadê û efsêrên komarê*

Xewna welatparêzên kurdan ya bo Kurdistanê serbixwe, bi şeweyekî biçûkirî be jî, li Îranê di navbera meha kanûna yekem a sala 1945 û kanûna yekem a sala 1946 de pêk hat. Bingeha komara biçûk a kurdan, dîroka wê ya kurt û tijî bûyer û hilweşana wê ya ji nişke ve rewşa hevdem a Rojhilata Navîn bêhtir ron û diyar dîke. Her wiha wan çemkên li dijî hev ku wê bi şeweyekî seyr li xwe girtibûn, her wekî eşîrtî, sistêmên li dijî hev emperyalîzm û sosyalîzm, siwarçakên sedeyên navîn û neteweperweriya îdeal, hemûyan aloziya wêneya kurdan nîşan dîda. Miletêkî bi vî rengî tu caran hev negirtiye û di nav pênc welatan de hatiye dabeşkirin ku tu ji wan welatan pê ne xweş e daxwazên kurdan bêne cî.

Meha îlona sala 1941an, hêzên Brîtaniya û Sovyetê êrîşî ser xaka Îranê kir û ew binyad rûxandin ku Riza şahê Pehlewî bi qayîmî dirust kiribû. Piştî hingî serbazên şah ji hev belav bûn; wan çekên xwe firotin yan jî dane wan hozan ku hîna li wan çiyayên rût ên Îranê bûn û li gorî rêz û destûra xwe dijîyan ku tevî ku şah lê xebitîbû bi ser wan de zal be. Ji vê rewşa aloz a Îranê yê ku jê sudmend bûn kurdên akinciyên çiyayên ku diketin sînorê di navbera Îran-Iraqê û Îran-Tirkiyeyê de; ji Mako û ji bin sîbera zincîreya Çiyayên Areratê heta digihê Qesra şêrîn ji başur ve diket ser rêya navbera Kirmaşan û Bexdadê.

Ji aliyê bakur ve kurdan xwe di nav wargehên serbazî yê xurt ên Sovyetê de dihesiband; li Rezayiye, şapûr, Xoy û Makoyê. Ji ber nebûna deshîlata karîger a Îranê sovyetîyan peywendiyên rasterast digel hozan danî: Celalî li bakur û şikakî li çiyayên rojavayê şapûr û Herkî li rojavayê Rezayîye. Serokên hozên wan deveran ji aliyê sovyetîyan ve rê ji bo wan hate vekirin ku karûbarên xwe bi rê ve bibin û li beramberî vê jî daxwaz ji wan kirin ku asayîşê biparêzin û bacên xwe bidine Artêşa

Sor. Li arasteya başûr ya deverên kurdan jî li nêzikî rêya Kirmaşan û Bexdayê, ku yek ji rehên serekî yê gihandina pêwîstiyên a di navbera Hevpeymanên Rojavayî û Yekîtiya Sovyet de bû, hêzên Brîtanya aramiya hozên wê deverê ragirt. Di vê devera fireh a di navbera hêzên Brîtanya û Sovyetê de û li wê valahiya ku îraniyên reviyayî li cî hiştibû, kurdan karî otonomiyekê ji bo xwe bi dest bixin. Di serî de, her du navendên serekî yê neseqamgîr Merîwan û çiyayên Hewraman bûn ku li wê derê Mehmûd Xanê Kanî Sênan deshilateke necîgirtî damezrand û li Baneyê jî Heme Reşîd Xan, ku jî zû de ew derkiribûn Iraqê, mîrmişnek ava kir ku Seqîz û Serdeşt jî tê de bû. Ev her du serokhoz heta demekê ji aliyê hikumeta Îranê ve hatin naskirin weke hakimên nîv fermî yê wan deveran, lê ji aliyê artêşa fermî ve ber bi Iraqê ve hatibûn dûrxistin. Bi hatina payîza sala 1945an, hemû Kurdistan başûr li xeta Seqîz -Bane- Serdeşt dîsa kete bin desthilata temam ya hikumetê. Bi vê yekê ew valahî hate biçûkkirin û tenê ew dever man ku di navbera vê xetê û deverên hêzên Sovyetê bûn ku li Rezayîye binecî bûn. Li wê deverê tenê bajarek hebû ku ciyê behskirinê be, ew jî Mihabad e ku berê wekî Sawciblax dihate nasîn û çend mîlan li başûrê Gola Urmîyeyê bû.

### Dirustbûna Komele

Di vî bajarê Mihabadê de bû, ku Hevpeyman jê geriyabûn, tevgera dawîn a neteweyî ya kurdî ji dayîk bû. Di 16 tebaxa 1943 de, komeka gencên kurd, ku piraniya wan di bajarê de bazirganên biçûk û fermanberên biçûk bûn, Komeleya Jiyanebeyî Kurd ava kir. Bi mebesta parastina nehênîyên kar jimareya endamên partiya nû li jêra sed endamî hiştin û partiya xwe dabêskirin bi ser çend xaneyan ve û kombûnên nîvhefteyî dubare li ser hev li cihêkî nedikirin. Peyrewa Komeleyê netewperestî bû û endamên wê diviyabû tenê ji wan kurd bûna ku ji dayîk û bavê ve xwe ve kurd bûn. Tenê dayîkeke Asûrî di vê yekê de awarte bû ku ew jî tê wateya pêwendiyên bi hêzên di navbera gelê asûrî û kurd.

Komele bi lez fireh bû û di nav xelkê de hate nasikirin; ne tenê li Îranê, gihîşte welatên dî jî, çunke ev grûba nû ji aliyê kurdan ve wiha dihat naskirin ku dê ji wan partiyên nerîtî (tradisyonel) çalaktir bê. Navend û nivîsîngehên Komele li bajarên Iraqê weke, Musil, Kerkûk, Hewlêr, Rewandîz, Silêmanî û şeqlawe hatin vekirin. Ne tenê li wir, li Turkiye jî nivîsîngeheke çalak vekiribûn ku li wê derê çalakiyên neteweyî yê kurdî tawaneke mezin bû û sezayê wê mirin bû. Serokên hozên dordera Mihabadê nûnerên xwe rê dikirin û alîkarîya xwe pêşan didan. Bersiva wan jî ew bû; ku ew di vê demê de ne pêwîst in, lê dibê ku di dema pêş de bang li wan bê kirin. Guman tê de nebû ku ew her du hêzên mezin ku giringî didaye herêmê saloxên Komele dibihîstin. Îngilîzan ku bîrên wan yê petrolê diketin Kerkûka bajarê kurdan, bi hûrbîni çavdêriya pêşatiyan dikir. Hindek caran rawêjkarê siyasî yê wan ji Musilê


xwe digihande nêzîkî bajarê Mihabadê, di demkê de ku berdest û pîberên wan bi Rewandiz, Kerkûk, Hewlêr û Silêmanîyê ve mabûn. Ji ber ku eger îngilîzan piştgiriya daxwazên kurdan kiribaya dê ereban nerazîbûna xwe dabûya diyarkirin, lewma wan xwe ji daxwazî û bangawaziya netewperwerên kurd re kerr kir.

### **Dizekirina Sovyetê**

Bo Sovyetê pirs bi cureyekî din bû. Berî her tiştî ew ne amade bûn bo karê bi bandor di nav kurdan de, her çend carekê di sala 1942 de wê bi bangkirina axayan bo Bakoyê ev kar kiribû. Li bihara wê salê de, dema kurdan êrîş birine ser çend gundekî rojavayê Gola Ormiye, Sovyetê, tew artêşa Îranê cendermeyên xwe şandin wê deverê (Her çend şîmaneya (ihtimal) çalakbûna wan kete jêr bandora destwerdana berdeyam). Lê bi awayekî zelal şîmaneya rewşa Sovyetê aşkere bû. Sala 1944 Azerbeycan û Kurdistan tijî karmendên siyasî û kirêgirtiyên Sovyetê bûn ku piraniya wan ji musulmanên Azerbeycana Sovyetê bûn. Kar li derdora Konsolxaneya Sovyet li Rezayîye gur û geş bûn û girêdayî wî kesî bûn ku yek ji sedhezar kurdên Sovyetê bû û bi Kaptin Cavrov dihat naskirin û bi azadî li nav hoz û gundên deverên kurdan digeriya.

Dîroka çalakiyên Sovyetê li Mihabadê vedigere wan rojên ku du zilamên wan, bi navê Abdulayov û Haciyov çûn wir ku qaşo bo artêşa sor hespina bikirin. Vê yekê jî kir ku dîdareke serpiyan rû bide ku cara pêşîn ew gihandin tevgera neteweyî ya kurdî. Çîroka wê jî ev e: Abdulayov li dîkaneka meyfiroş a ermeniyên li Mihabadê çav bi zilamekî dikeve ku cilên kurdî li ber bûn; girêdana wî ya destê cilên kurdî kêfa wî jê re hat û pesna wî da. Vê pesindayîne bala zilamê kurd kişand ku ew jî yek ji damezrînerê Rêxistina Komele bû. Di dawiyê de ew her dû zilam ketine giftûgoyê û yê kurd jê pirsyara vê kir: "Eger partiyêke netewperewerên kurd ava bibe, gelo Sovyet dê amade be ku wan bi çek bike?" Abdulayov xwe ji bersivdayîne da alî û pirsî: "Çima ma hûn ji kê ditirsin?", yê kurd jî got: "Em tenê ji xanên xwe ditirsin." Piştî vê yê kurd Abdulayov bira maleke taybet û li wê derê ew bi wan rêvebirên din yên Komele da nasandin. Piştî vê yekê peywendiya kurdan bêhtir digel deshilata Sovyetê pêk hat û yek ji damezrînerên Komele, ku zimanê rûsî dizanî, kirin berpîrsê peywendiyên partiyê. Di wê demê de, her çend di programê partiyê de hebû ku peywendiyê digel yek ji wan her sê hêzên mezin deyne, Komeleyê bi aşkerayî keta nav bazin û çerxa Sovyetê de.

Vokis, ku rêxistina navdewletî ya propagandayê ya Sovyet bû, dest bi dirustkirina jimareyek (Komeleya Dostaniya Kultura Îranê – Sovyet) li her derê Îranê kir. Ji aliyekî di ve Komele ew qas mezin bûbû ku êdî nedikarî kombûnên xwe li malan de pêk bîne. Lewma rêvebirên Komeleyê daxwaz ji Sovyetê kir ku navendeke li Mihabadê



*Qazî Mihemed û Rozvêltê*

veke û hêvîdar bûn ku bi vê bikaribin ji bo xwe cihekî peyda bikin bo kombûn û civînên xwe bêtir ku balê bi ser xwe de bixşînin. Sovyetê jî bê dudilî daxwaza wan bi cih anî û ji bo wan navendek damezrandin; lê ne weke navendeke Komeleya Dostaniya Kulturê Îranê – Sovyetê, lê belê weke Encûmena Ferhengê Kurdistan û şûrewî. Gelek derbas nebû baregeya Komeleyê ji qerebalixê dihate dagirtin, lewma ji bo destxweşiyê 10 sindoq cigare şandin ji serkeftiyên Lenîngradê re ku ji titûna kurdî hatibû dirustkirin.

Li rê û resmeke de ku li nîsana sala 1945 de li baregeya Komeleya Dostayetî hate rêvebirin, Komele bi fermî hate ragihandin. Konsolê Sovyetê yê Rezayîyê û serokê navenda Vokis li Azerbeycanê weke mêvan beşdar bûn.

Babeta serekî a ahenga ragihandina Komeleyê operayek bû ku tê de jinek bi navê ``Dayîkî Niştîman`` ji aliyê sê xirabkaran ve Iraq, Îran û Turkiye ve destdirêjî lê dihate kirin û di dawiyê de ji aliyê gencên aza ve dihate rizgar kirin. Temeşkar, ku ku hînê dîtina dîmenên wiha nebûn, bi yek carî bi kel û çosê ketin û ew kesên ku çendîn sal e dijminê hev bûn, dest bi girî kir, destên xwe li milên hev xistin û hemûyan sond xwar ku tola Kurdistanê hildin.

Li dawiya vê rê û resmê de bo razîkirina Sovyetê, ku ji rêxistina demokratxwaz a Komele razî nebû û li kesekî digeriya ku li gorî pêşniyazên wê kar bi rê ve bibe, serokê dewleta kurdî ya pêşerojê Qazî Mihemed anîne partiyê. Di serî de Sovyetê ku bi hêza eşîret û hozên kurdan hesiyabû, daxwaz ji serokên hozan kir ku pêşengtiya tevgera neteweyî bikin; lê tenê sê ji wan ji bo vê erkê guncan bûn: Qerenî Axa serokê birêz yê hoza Mameş û serkirdeyê wê federasiyona ku tê de beşdar bûne, Emer Xan şerîfî Serokê hoza şikakan û bi temenê Kurdistanê, Emîr Esedî Dîbukrî ku pa-

rêzgarekî dijwar bû û serkirdeyê fexrî yê cendirmeyan bû ku hikumeta Îranê ew kiribû berpîrsê parastina asayîşa deverê. Lê pêşniyaza Sovyet bo her yekî ji wan bi edebane hate retkirin.

Ji ber vê yekê Sovyetiyên di dawiyê de berê xwe da Qazî Mihemed, ku mîratgirê qaziyet û rêvebirayetiya ayînî bû li Mihabad û endamê qedirgirantirîn malbata bajarê Mihabadê bû. Wan bi aşkere serdana mala wî dikir û di dawiyê de alîkarî dan û piştgirya wî kirin ku zorê li hikumeta Îranê bike ji bo birayê wî Seyîfî Qazî weke nûnerê hikumetê li deverê bixe cihê Emîr Esed û bernavkê serkirdeyê cendirmeyan bi wî hate dayin.

Tê gotin ku Qazî Mihemed piştî derbasbûna salekê bi ser damezrandina Komele de, ji nû pê hesiya kû Komele hatiye avakirin. Piştê bi dizî nûnerê xwe rê kir û daxwaz kir ku bibe endamê Komeleyê. Serokatîya Komele biryar da ku Qazî Mihemed wernegirin. Ew jê ditirsiyan, çunke xwediyê kesayeteke bihêz û deshilatxwaz bû, her weha ji ber taybetiya wî ya ciyawaz ji zaroktiyê ve hest pê dikirin ku divê li hemberî wî û malbata wî bisekinin, dibe ku di dawiyê de dest biavêje partiyê û bixe bin kontrola xwe û karakterê wê yê demokratîk jê bibe. Lê di dawiyê de ji ber mikuriya Sovyetiyên Komele ew pejirand û wergirt nava xwe. Ew tiştê jê ditirsiya pêk hat: Partî kete bin kontirola take kesekî.

Wergirtina Qazî kir ku kurd bi lez biçîne ser xeta siyaseta Sovyetê ku bi hatina havîna sala 1945 dest pê kir bibe rengvedana pêpêskariyên zêdekirî yên Sovyetê li deverên din. Berî hingî Sovyetê bi riya Tudeh dize dikir nav Îranê ku eniyêke fireh a çepê Îranê bû. Ew digel ku li deverên din ên Îranê serkeftî bû, lê tu carî nikarî reh û rîşên xwe li Kurdistanê berde. Niha Sovyet hizra pîlaneke hêvîdêr a nû dikin; girêdana bakurê rojavayê Îranê bi Yekîtiya Sovyetê ve. Lewma partiyekî serbixwe li Azerbeycanê damezrandin da ku cihê Tudehê li wê derê bigre û piştê bêyî ku Tudeh li cihekî di yê Îranê şermezar bike, şoreşeke geş bike û serbixwebûna wê parêzgeyê rabigihîne û paşê jî daxwaz bike ku tevî Yekîtiya Sovyetê bibe. Li ser fermanên Sovyetê, Tudehê xwe xwe hilweşand û Firqeya Demokrat a Azerbeycan dirust kir û zimanê turkî-azerî kir zimanê xwe yê fermî û daxwaza cudabûnê ji Îranê kir.

Kurdên rojavayê Azerbeycanê, ku Mihabadê jî vedigere, hêvî jê nedihat kirin biçîne pişt partiyekê ku propagandaya netewperestiya tirkî-Azerbeycanê dike, lewma pêwîst bû ku partiyêke nû bête dirûstkirin da ku amade bibe bikeve bin çengê Sovyetê. Li 12 îlonê Kaptin Namazalyêv rayedarê Sovyet bû li Miyandû, serekên hozên kurdan yên giring digel Qazî Mihemed û Seyîfî Qazî bang kirin bo Tebrêzê ji bo dîtina Konsulê Sovyet. Lê belê dema ku ghiştin, yekser doz li kurdên sersam hate kirin ku biçîne istasyona trêne û li wê derê ew siwarî trêne kirin û rê kirin Bakoyê. Bi qasî sê rojan li wê derê li cihekî nêzîkî bajêr man û çend geşt û seyran ji bo wan

organîze kirin û ew birin şano û operayê. Roja çarem daxwaz ji wan hate kirin ku Baqîrov bibînin ku serokê komara Azerbeycana Sovyetê bû. Wî jî rexne li wan karên xirab girt ku Reza şah li dijî wan kiribû û ji bo wan ragihand ku hikumeta Sovyet alîkariya partiya demokrat a nû dike ku armanca wê rizgarkirina xelkên bindest e û bi germahî ji wan daxwaz kir ku piştî wê partiyê bigirin. Her weha gazin ji Partiya Tudeh kir û bi grûbeke bêbandor û teşqelebaz wesif kir û gazinc ji Komele jî kirin û got: "Li Iraqê ji bin çengê hewalgeriya (istixbarat) Birîtaniyayê derketiye holê û tenê destikê emperyalîzma Birîtaniyayê ye û ne tiştekî dî." Peyra piştî ku hatin agh-darkirin ku nabe tiştekî derbarê vê geştê de rabigihînin, yê kurd xistine nav trêne de û ber bi Tewrêzê bi rê kirin û li wê derê jî li otombêlên Artêşa Sor siwar kirin û birin malên wan.

### **Partiya Demokrat a Kurdistanê**

Gelek tê ve neçû, encamên wê geştê derketin. Her piştî vegerê, Qazî Mihemed bang li navdarên kurd kir da ku damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê rabighîne û daxwaz ji hemûyan kir ku werine nav partiyê. Navê partiyê weha nîşan dida ku dê armanca partiyê jî demokrasiyeke weke ya Amerîka be, lewma piraniya wan bi kêfxweşî û dilxweşî pêşwazî lê kir. Li wê derê beyannameyek ji aliyê Qazî Mihemed û 105 navdarên kurdan ve hate îmzekirin. Tê de diyar kiribûn ku gelê kurd niha dixwaze sûtê ji wê azadiyê werbigre ku bi rûxandina faşîzmê cîhan vegirtiye û para wî jî ji wan soz û qewlan hebe ku di destûra Peymana Etlentîk de hatine. Beyanname dibêje, kurd tenê mafên mirovan û ew mafên destûrî dixwazin ku Reza şah ji wan standîye û armancên xwe weha diyar kirine:

- 1- Divê gelê kurd li Îranê azad be û xwe bi xwe kar û barên navxweyî bi rê ve bibe û mafê wî yê otonomiyê di sînorên dewleta Îranê de hebe.
- 2- Divê zimanê kurdî di xwendinê de bi kar bê û bibe zimanê fermî û di nava karên rêvebiriyê de bê bikaranîn.
- 3- Encûmena navxweyî Kurdistanê divê rasterast bête helbijartin û li gorî qanûna destûrî divê rêvebiriya hemû kar û barê dewlet û xelkê bike û bixe bin çavdêriyê.
- 4- Divê hemû berpirsên dewletê xelkê deverê bin.
- 5- Divê qanûnek bi ser cotyar û begzadeyan de bête sepandin û ayîndeya her du aliyan bê misogerkirin.
- 6- Partiya Demokrat a Kurdistanê hewldaneke taybet dide bo pêkanîna yekîtiyê û birayetiya temam di navbera gelê Azerbeycan û hemû gelên ku li Azerbeycanê dijîn her wekî asurî û ermenî û yê din.

7- Partiya Demokrat a Kurdistanê têdikoşe da ku rewşa gelê kurd xweş bike û ji aliyê aboriya ve pêş bixe bi riya dîtina samanên pir yê nî siruştî ên Kurdistanê ku veşartî mane û pêşxistina çandiniyê, bazirganî, tendirustî û perwerdekirinê.

8- Em dixwazin ku xelkê Îranê bikaribin bi azadî ji bo şadî û pêşketina welêt bixebitin.

Beyanname bi şewazê Sovyetîyan, bi gotina `` Bijî Otonomiya Demokrat a Kurdî `` bi dawî bû.

Avakirina partiya nû bû sedema qelsketina Komeleyê û rakişandina endamên wê ber bi Demokratîtan ve. Lê her di serê serî de, serokên hozan ji partiya nû bi guman bûn û peymaneke piştgiriya îmzekirin û pêşkeşî wî efserê siyasiyê yê Sovyetê kirin ku li deverê digeriya. Ev berhingariya veşarî ya hozan dibû ku statûya Qazî Mihemed lawaz bike heke ne ji wê piştgiriya Mela Mistefa û Barzaniyan bûya.

Barzanî di serdema Osmanîyan de jî yek ji hozên herî zêde bi kêşe bûn li hember wan. Di sala 1920 de şêx Ehmedê Barzan, ku barzaniyan û hozên deverê navê "Xudan" li wî kiribûn, bi aşkere rûberûyî birîtaniyan dibû ku çendîn caran jî neçar man daxwaza alîkariya hêzên asmanî yê nî qraliyetê bikin. Dawiyê şêx Ehmed û birayê wî yê biçûk, Mela Mistefa, digel dilxwaz û peyajojên xwe yê nî sereke hatin nefîkirin; pêşî bo başûrê Îraqê û paşan jî bo Silêmaniyê. 11 Hezîrana sala 1942an, Mela Mis-



*Roja 2yê rêbendanê 22/1/1946  
Qazî Mihemed silava leşkerî li pêfîmêrgên komarê dike*

tefa ku ji aliyê birayê xwe ve hatibû arastekirin ber bi devera Barzan ve reviya.

Çîrokên şerên li dû hev ên di navbera Mela Mistefa û hikumeta Iraqê de û her wiha wî çawa karî di sala 1945 du caran revê bi artêşa Iraqê bixe û çawa wezaretê navxweyî karî bi rêya bikaranîna hêza pareyan hozên kurdan ên din li dijî wî kom bike û wan ji Barzan derbixe; pêwîst e demkê dî behsa vê yekê bê kirin. Ev qas jî bes e ku bê gotin ku li 11 cotmehê sala 1945 Mela Mistefa û şêx Ehmed û nêzîkî hezar çekdarên Barzanî bi malbatên xwe ve, di xaleke re ku dikeve bakurê şinoyê çûne nav xaka Îranê. Bi wan re komek fermanberên biçuk, mamostayên dibistanan ên reviyayî û çend reviyayiyên ji artêş û cendirmeyên jî hebûn ku 12 efser jî tevî wan bûn û piraniya wan li Îngiltere perwerde hildabûn û di desteya rêveberiya serfermandariya artêşê de xwedî pileyên bilind bûn.

Piştî ew gihiştin Îranê bi demeke kurt, Mele Mistefa bi çend rayedarên Sovyetê re hevdiîtin pêk anî ku di nav wan de berpirsê giştî yê hêzên Sovyetê yê rojhilatê Azerbeycanê jî hebû. Sovyetiyên daxwaz jê kir ku xwe bixe bin banê rêveberiya Qazî Mihemed û ferman da kurdên wê deverê ku cih û nan ji bo Barzaniyên bêstar peyda bikin. Bi hatina dawîya meha cotmehê, hêzên Barzaniyan tijî bû ji penaberên ku ji Iraqê koç dikirin. Hejmara wan bû sê hezar kesên çekdar bi tivingên îngilîzî û Reşas û topeke meydanî ku ya artêşa Iraqê bû û wan desteser kiribû.

### Hikumeta Gelê Kurd

Li meha mijdarê û serê meha kanûnê, pîber û tagirên Sovyetiyên li nav hozên kurdan de belav bûn û daxwaz ji wan kir ku bi gerê bikevin bo xebata serbixwebûnê. Her weha wan ferman da rêvebiran ku li Mihabadê kom bibin. Ew hemû, ji bilî Mameş, Mengûr û Dîbukran, bo vê bangewaziya Soveytê hatin. Di vê demê de rewşa hikumeta Îranê li cihên dî yê Azerbeycanê bi lez û bez aloz dibû. "Demokrat"ên çekdar ku piraniya wan xelkê Azerbeycana Sovyetê û Qewqazê bûn, li dijî serbaz û cendirmeyên Îranê dest bi êrîşan kir û wan bi bayê bezê baregayên xwe berdida direvîyan. Hemû parêzgeh tevî serhildaneke vekirî bûn, di wê demê de Artêşa Sor rê li hêzên destekê (teqwîye) girt ku ji aliyê hikumeta navendî ji bo xurtkirina bingehên leşkerî ên bakur hatibûn rêkirin. Dawiyê li roja 10 Kanûnê de Demokratîyan êrîşî Serbazgeha Tewrêz kir û ew neçar kirin ku xwe radestî wan bikin. Bi vî awayî hemû rojhilatê Azerbeycanê kete bin deshilatiya Hikumeta Milî ya Azerbeycanê ya ku تازه dirust bûbû.

Rûxana Tewrêz bû peyamek ku Qazî Mihemed jî serbixwetîya herêma xwe rabighînê ku di rastiyê de demeke dirêj bû serbixwe bû. Di roja 15 Kanûnê de di kombûnekê li Mihabadê de ku serokê hozan amade bûn digel rayedarên payeberz ên partiya demokrat a kurdî ya nû û Mele Mistefa û sê efserên Sovyetê bi çîpekê, wî bi

hurmetê ve hikumeta millî ya kurdî ragihand û alaya kurdan hilgirt. Parlemantoya niştîmanî ku ji 13 endaman pêk hat û di 22 çile sala 1946 Qazî Mihemed ji bo serokê komara nû hate hilbijartin. Wezîrê şer pîsmanê wî bû; Mehemed Husên Xan Seyîfî Qazî ku bazirganek bû û nav û dengiya serbazîya wî jî ji wê pileya kapîtanê dihat ku cendirmeyên Îranê dabûnê. Seyfî Qazî, Mele Mistefa, Emer Xanê şîkak û Heme Reşîd Xanê Bane ku nû bi zilamên hoza xwe ve ji Iraqê hatibû û Zêro Begê Herkî pileya mareşaliyê danê û cilûbergê taximê leşkeriyê yê Sovyetê bi cizmeya dirêj û berstûka hişk bi kumên xetsor dane wan.

Hikumeta nû, ku tenê deshilat bi ser wê de vera biçûk de hebû ku bajarê Mihabad, Bokan, Nexede û şîno vedigirt, çavdêrek rê kir ji bo ku tevî vekirina Parlemantoya Niştîmanî ya Azerbeycanê bibe û parlemantoyeke delal jî ji xwe re durist kir. Her weha hikumetê Mela Mistefa ber bi başur ve şand ji bo şerê serbazên Îranê li Seqiz, Bane û Serdeştê bike ku ji ber berfa pir ji hev qetiyabûn û têkiliya wan bi bingeha wan a serekî ya li Sine nemabû.

#### **Peywendiya Bi Tewrêz û Têhranê re**

Ji aliyekî din ve, vegirtina Rezayîye ji aliyê Demokratên Azerbeycanê ve problemê nû bo hikumeta kurdî durist kir. Her çend piraniya akinciyên deştên rojavayê Gola Urmîyê, ji Rezayîye ber bi bakur heta Makoyê, tirkên azerî ne, lê hozên li derdora wan deştan kurd in. Her weha akinciyên Miyandiwa ji başurê golê ve jî têkel in. Lewma hikumeta Tewrêz û Mihabadê daxwaza wan deveran dikir û di navbera wan de ev dibû jêderê berdeham ya nakokîyan. Omer Xan û hozan gelekî guhê xwe nedida demokratên Azerbeycanê û berdeham dest dirêj dikirin ser wan gund û bajarokan ku diviya di bin deshilata Tewrêzê de bin.

Nîsana sala 1946 de Sovyetîyan Qazî Mihemed birine Tewrêz bo kêşeyên di navbera kurd û azerîyan de çareser bikin. Di heman demê de, di destpêka vekirina deriyê diyalogê di navbera Demokratên û hikumeta Îranê de bo peydakirina çareseriyê berdeham ji bo rewşa parêzgehê, ev yek gelek girîng bû ku her du dewletên nû eniyekî hev girtî pêk bînin. Encama dawî a giftûgoya destpêkê a di navbera rêvebirên Demokratên azerî û Qazî Mihemed û Sovyetan de peymanek bû ku di 23 Nîsana sala 1964 de ku di navbera nûnerên kurd û azerîyan de hate îmzekirin. Belavkirina wê peymanê bû sedema tirsê li Tehranê, çunkî bendên wê û bêguman hebûna wê yekê nîşan dida ku her du Demokrat xwe wekî du dewletên serbixwe dibînin û mafên wan yê guhartina nûnertiyê û girêdana peymanan heye. Peyman jî bi vî awayî bû:

- 1- Her du aliyên ku îmzekar, her dema ku baş bibînin nûnertiya xwe diguherin.

- 2- Li wan beşên Azerbeycanê ku kurd tê de kêmnê ne, kurd li dezgehên hikumetê têne damezrandin û li wan beşên Kurdistanê ku azerî tê de kêmnê ne, azerî li dezgehên hikumetê têne damezrandin.
- 3- Komîteyê aboriyê ya hevbeş bo çareserkirina kêşeyên aborî di navbera her du aliyên îmzakar de dê bê danîn. Endamên wê komîteyê dê ji aliyê serokatîyên hikumetên niştîmanî ve bêne damezrandin.
- 4- Divê hêzên leşkerî yên her du dewletên îmzekar di dema pêwîst de alîkariya hev bikin.
- 5- Her giftûgoyek bi hikumeta Tehranê re divê berjewendiyên hevbeş yên her du hikumetên niştîmanî yên azerî û kurdî li berçav bigre.
- 6- Hikumeta Azerbeycanê ji bo pêşxistina bikaranîna zimanê kurdî dê girîngiyê bide çanda kurdên Azerbeycanê û gavên pêwîst biavêjê. Her weha hikumeta niştîmanî ya kurdan jî wê heman erkê pêk bîne di bareya ziman û kultûra azeriyên ku akinciyê Kurdistanê ne.
- 7- Her du dewletên îmzakar her kesekî yan grûbêke dê siza bikin ku hewl bidin dostaniya dîrokî û biratiya demokratîk a di navbera kurd û azeriyan têk bibin.

Demokratên Azerbeycanê bo giftûgoya digel serok wezîrê Îranê Ehmed Qewam, ji bo dîtina çareseriyekê çûne Tehranê. Li gorî mercên wê çareseriyê jî, Azerbeycan bi deverên kurdan ve dibe beşeke ji Îranê, di demekê de ku rêvebirên demokratîk ku posta wan ya hikumetê hebû, heman wê postê li parêzgeha Azerbeycanê werdigirin. Kurd bi vê rêkeftinê qayil nebûn. Her çend ew di beşekê giftûgoyan de ji aliyê Sedrî Qazî birayê Qazî Mihemed û endamê Parlamentaya Îranê ve hatin temsîlîkirin, lê wan hest pê kir daxwazên wan heta radeyekê di ser guh re têne avêtin. Di heman demê de demokratên azeriyan rewabûn dane wan postên ku wergirtine. Hikumeta Qazî Mihemed hîç bingeheke wê ya qanûnî nema. Kurd piştî ku li dewleta Îranê kêmnê bûn, vê carê di dewleta azeriyan ya zimantirk de bûne kêmnê.

Dawiyê Qazî Mihemed bo nîşandana nerazîbûna xwe neçar bû biçû Tehranê ji bo dîtina serok wezîr Qewam. Daxwaz jî kir ku bibe hakimê parêzgeheke nû ya kurdnişîn ku beşa kurdnişîn ya Azerbeycanê û deverên kurdnişîn yên din bi xwe ve digire ku hîna di bin deshîlata Îranê de bûn û ji sînore Rusyayê ve dest pê dikin heta digihêje nîva rêya navbera Kirmaşan û Sinc. Ev parêzgeha nû diviya curekî otonomiya navxweyî hebe, tevî berpîrsên navxweyî û leşkergeha wê ku leşkerên wê xelkên wan deveran bin. Serok wezîrê fêlzan ê Îranê bi pêşniyaza Qazî razî bû, bi mercekî ku rezamendiya Doktor Cawîd hakimê Demokratên Azerbeycanê jî bi dest ve bîne. Lê Doktor Cawîd bi hêrs ev plana hanê ret kir û nakokî di navbera kurd û demokratên Azerbeycanê de berdewam bû.

Digel ku di dema danûstandinan li Tehranê, agirbestek di navbera hikumeta navendî ji aliyekî ve û kurd û azeriyan ji aliyekî ve hatibû kirin, lê teqeteq her berdewam bû û carinan dibû şerê vekirî jî. Îraniyan, piştî ku Sovyetê ragihand dê di despêka meha Gulanê de hêzên xwe ji Îranê vekêşe, zêdetir dest bi karên leşkerî kir. Feyleqa çarem a Îranê bi femandariya General Humayunî ku ji Xozistanê hatibû veguhastin û li wir plana bi çekdarkirina hozên ereban pêk anîbû, eniya rûberûbûna li dijî kurdan girt. Di nîveka meha Nîsanê de, Humayunî rê vekirin û destek gihande Seqiz, Bane û Serdeşt.

Dihat gotin ku Sovyetê soz dabû kurdan ku balefir, tank û çekên giran bide wan û pêncî gencên kurdan bibe Bakûyê bo perwerdeya serbazî û siyasî. Digel wê yekê jî, hîngê diviya Qazî Mihemed piştî xwe bi çekdarên hozan girêbida ji bo ku hemberî Îraniyan şer bikin. Li wan girên ku li hêzên Humayunî dinêrîn hêzeke mezin lê belawela hebû ku bi giştî ji Barzaniyan pêk hatibû digel hindêk hozên biçûk ên kurd ku her bo şer û talanê amade ne û Heme Reşîd û tagirên wî yên siyasî.

Piştî ku General Humayunî berdewam piştgirî û destek bo deverê rê dikir, Qazî Mihemed û Sovyetan zor li Omer Xanê şikak û hevalbendê wî Herkiyan kir da ku ji bakur ve werine xwarê û alîkariya operasyonê bikin. Omer Axa di serî de hinceta wê yekê hilêxist ku hespên wan li zozanan in û dîr in û nikare wan bîne, lê di serê meha gulanê de peyayên hoza xwe rê kirin de vera şer.

Meha Gulanê sala 1946an gelek şerên giran qewimîn ku piraniya wan şeran bi hijmareke kêma xelkê hatin kirin û ne şerên safîkar bûn. Di serê mehê de, kurdan şerek bi ser xistin ku hetka artêşa Îranê pêçû: Kurdan di dema êrîşbirina ser hêzeke artêşê de li nêzîkî Seqizê 20 serbaz kuştin û 30 jî dîl girtin. Her weha dest bi ser 2 rişêne (reşşe) û 4 hezar şirîtên fişekan de girtin. Ew leşkerên kurd ên ku dîl hatin girtin digel xwe kirine serbaz di artêşa kurdan de û ew ên dî jî rêkirine Tewrêzê.

Digel vê yekê jî piştî êrîşekê ku li nêzîkî Derbenda Mehmudaweya nêzîkî Seqizê pêk hat û û mebesta wê birîna rêya Sine bû, kurd vekişyan. Paşê girên raserî Seqizê hatin vegirtin. Artêşa Îranê ew ji wir derxistin û burcên çavdêriyê ên ji heriyê li wir çêkirin û her yekê 30 heta 40 leşker jê re terxan kir. Dawiyê agirbestek hate kirin û her du alî li cihê xwe man û maf dan kurdan ku wan otombêlên ku ji Seqizê diçin Bane û Serdeştê saxtî bikin. Bi vî awayî wan dikarî rê li ber wan çek û teqemeniyan bigrin ku ji bo serbazgehên Îranê têne şandin. şikak û Herkî jî vegeriyan bakur.

### **Kesayeta Qazî Mihemed û Komara Kurdî**

Piştî van şer û pevçûnan, Qazî Mihemed perdeya polat da aliyekî û derfetek da çavdêrên nesovyetî da ku çavekî bi welatên wî bixin. Lê belê ew hesta li dijî brîtaniyan a ji ber derxistina Barzaniyan ji Iraqê û handana propagandeya li dijî



Pêşewa Qazî Mihemed di ofisa xwe de  
nexşeya Kurdistanê bi dîwar ve daleqandiye

brîtaniyan ji aliyê Sovyetê ve, her weha çend bûyerên borî ku kurdan xwe wekî qurbaniyê keysperestiya Brîtanayê dizanî, hokarên bi hêz bûn ji bo ku rê neyê dayîn da ew serdana komara kurdan ya biçuk bikin, lê çend carekê 4 emerîkî û yekî frensî bûne mêvanên Qazî Mihemed.

Li gorî van çavdêran dibû komar kara be. Her çend bêyî bingeheke qanûnî bû, hikumeta Qazî Mihemed weke berê berdewam bû; wî, tenê navnîşanê wezîrên hikumetê, ji wezîr kir reîs. Ew bi xwe jî her tenê bû serokê partiyê: Pêşewayê Partî Demokratî Kurd. Gund jî her bi alikariya wan cendirmeyên ku ji xelkên deverê pêk dihatin û cil û bergên kurdî lê bûn, ji aliyê xwediyê mulk û serokên hozan ve bi rê ve dihatin birin, lê ew jî ji aliyê komek efser ve bi rê ve dihatin birin ku li Mehabadê bûn û cilên sovyetî lê bûn. Mihabad jî, ji bajarekî jibîrkirî yê farsî, bû bajarekî dilrevîn û rengîn ên kurdî. Wê hîngê kûçe û kolanên wî bajarî tijî kurdên kurdîpoş ên azad û serbaz û cendirmeyên neyarê Êranê.

Ew ên ku derfeta dîtina Qazî Mihemed bi destê wan diket, diketin bin bandora kesayeta wî û têdigihiştin ku çawa li her derê bûye sembola neteweya kurd. Kesekî bejinkurt, pêncî salî, saqoyekî serbazî yê kevin lê bû, bi rihekî himbiz, devûrûyekî lawaz û hinekî zer ji ber nexweşiya gedeyê. Dengê wî nerm û lihevhatî û lê nîşaneyên wî henûn, lê karîger bû. Hindek navneteweyî; wî giringî dida hemû gelên cîhanê û bi çend zimanan dizanî, her wekî rûsî, hinekî îngilîzî û zimanê esperanto yê navdewletî. Maseya wî her dem tijî pirtûkên li ser rêziman û wêjeyî û yê bi zimanên biyanî bûn.

Ew kesatiyekî pir ji xwe bawer û azayekî kêmpayda û xwebexş, digel wê jî hêmin û xwedî mêjîyekî fireh û miyanrew bû. Di wê demê de ku hêjayî gotinê ye, bi kêmanî daxwazên wî gelek miyanrew bûn: Otonomî ji bo kurdan di sînore dewleta Îranê de. Ew wekî gelek kurdan di wê baweriyê de bû ku kurd û faris ji malbata regeza îranî ne, ji ber vê çendê jî tu hokarek nîn e ku rêgir be dubare her du pêkhate kom bibin wekî serdema Medya û Parsên Kevin. Li gorî Qazî, kurd neviyên Medyayê ne; meyla wî bi ser wê de diçû ku navê Mihabadê tê wateya ``Mala Medya``.

Digel vê yekê nabe ew yek bê înkarkirin ku ew û peyajoyên wî xwedî daxwazên kurdî yên giştî bûn û hêviya wan ew bû ku Mihabadê bikin navenda kultura kurdî û tevgera neteweyî ya kurdî; her wekî diyarkirina cîgîrekî bo Sûrya û Silêmanî ku di wê demê de navend bûn. Hewleke pir dihate dayin bo bilindkirina asta perwerdeya kurdî da bigihêje asteke hêja. Destpêkê diviyabû mamosteyên kurd di nava polê de bi zarkî babetên wanyê ji farisî wergerînin ser zimanê kurdî, lê bi demek kurt berî hilweşîna komarê pirtûkên kurdî ji bo qonaxên seretayî hatin çapkirin. Her weha rojname û mehnameyeke siyasî derdiket, ku her du jî bi navê Kurdistan bûn. Wekî din du kovarên edebî bi navê ``Hawar`` Helale`` derdiketin. Ev hemû belavok li çapxaneyekê dihatin çapkirin ku Artêşa Sor pêşkêşî Partiya Demokrat a Kurdistanê kiribû. Dibe ku girîngîdana Qazî Mihemed bi wêje û zimanê kurdî ji ber hebûna du helbestvanên kurd Hejar û Hêmin be ku şewirdarê wî bûn; serbarî kêmbûna kaxizê helbestên wan dihatin belavkirin.

Her çend van hewlan, di wê temenê kurt yê komarê de, bi tu awayî têra wê nekir ku ew bigihêja asta standardên her du navendên di yên ku kulturê kurdî ku tê de bi azadî 25 salan bi zimanê kurdî dihat nivîsîn û xwendin, lê Mihabad bi kêmanî bû ew rûgeh e ku hemû kurdan xwe lê digirt. Li navendên rewşenbîriyên kurdan li Berût, Stenbol û Bexdayê, her weha li çiyayên asê yên rojhilatê Asyayê çavê hemûyan li Qazî Mihemed bû ka dê bi ser bikeve yan têk biçe. Dengûbas ji grûbên kurdan di-gihanê, ne tenê ji Iraqê tew Surya û Tirkîye jî. Tevgera wî bi şeweyekî taybet cihê balpêdana gencan bû, ku hest pê dikirin partiyên kevin pir ne serkeftî bûn. Weke nimûne, li Iraqê, partiyeke nehênî ya nû, ku navê wê Rizgarî bû û çepgir bû, ji aliyê wan gencan ve hate damezrandin.

### **Hesta Dije-Sovyet**

Partiyên neteweyî yên kevn, Hîwa li Iraqê û Xoybûn li Sûriya, gelekî bi Qazî Mihemed dilxweş nebûn. Egera nerazîbûnê vedigere ser dostaniya Qazî Mihemed ya bi Sovyetê re. Tirs hetta nefreta ji Sovyetê ya kurdan ji ber çend egerên bi hêz bû:

Egera yekem: Piraniya gelê kurd olperwer bû û tîrsa wî ji hizrê Sovyetê ên beramberî olê hebû. Her weha piraniya wan, bi wan penaberan re axivîbûn ku nû ji

Sovyetê hatibûn û axaftin bi gelek misilmanên nav Artêşa Sor de kiribûn, ku kêma ji wan wêneyekî ciwan li ser rewşa gelên rojhilatê yê di bin bana Yekîtiyê Sovyetê de raber dikir.

Egera duyem: Nabe ku mirov wê yekê jî ji bîr bike ku rûsan di serdema sîzaran (çar) ve dujminê dîrokî yê kurdan bûn. Di şerê Yekem ê Cîhanê de rûsan li ser beşeke zor ya xaka Kurdistanê şer kiribû û li dû xwe çendîn wêran û kavil li gund û geliyên Kurdistanê hiştibûn. Her li Mihabadê bi xwe, serbazên rûsan çendîn rojan fermana kuştina wan kesan wergirtibû ku li ser cadeyan dihatin dîtin û bajar talan û wêran kirin; dawiye jî şewitandin. Qet yek ji van bûyeran ji bîra kurdan neçûbû; tew hîna jî ji bo bêdengkirina zarokên xwe, wan bi hatina rûsan ditirsînin.

Sovyetê gelek hewl da ji bo ku vê dîtinê berovajî bike. Lewma xwe li "Otonomiya Kurd" ya li Yekîtiya Sovyetê û karên aza yê kolonêlekî kurd ê li nav Artêşa Sor girt ku navê wî Semend Siyamendov û naznavê "Pehlewanê Lîningradê" wergirtibû. Pir zor e ku em bizanibin rûs di vê yekê de çend serkeftî bûn, lê xuya bû ku beşekî pir ji akincî û xwedî mulk, bazirgan û serwerên olî hê baweriya xwe bi wan naynin. Vê yekê Qazî Mihemed jî vedigirt ku peywendiyên wî yê digel Sovyetê ne veşartî bûn. Dîwarên baregeha hikumeta wî tijî posterên propagandaya Sovyetê bûn. Her weha beşek ji rûpelên rojname û kovaran ji bo babetên Sovyetê hatibûn terxan kirin ku riste bi riste ji rûsî wergerandibûn ser zimanê kurdî; di helbestên wan de jî pesna Stalîn û Artêşa Sor dihat dayîn.

Li Kurdistanê, berevajî beşên din yê Azerbeycanê, pîber û destikên Sovyetê xuya nedikirin, ji wan ajovanên otombêlên veguhastinê pê ve ku weke çavdêr bo Sovyet û hikumetên bi ser Sovyetê ve kar dikirin. Welatîyên Sovyetê li wê deverê xuya nedibûn û pîber û destikên wê jî bi dizî kar dikir. Digotin, xaniyekî nûnerayetiya Sovyetê li Mihabadê hebû, lê deshilata kurdî ev ret dikir. Carinan Haşimovê konsolê Sovyetê yê Rezayîye û Elî Ekberovê alîkarê wî serdana Mihabadê dikirin.

Dema ku teror li rojhelatê Azerbeycanê berbelav bû, zîndaniyên sîyasî li Kurdistanê eger hebûn jî pir kêma bûn û tenê yek yan du bûyerên kuştina sîyasî rû dabûn, tevî wê yekê jî hijmarek kurd ber bi Tehranê ve reviyên. Li kûçe û kolanên Mihabadê mirov dengê Radyoya Enqere û Londonê dibihîst, lê hîngê li Tewrêzê sezayê guhdarîkirina wan radyoyan mirin bû. Gelo hokara wê yekê nûxwazî û azadîxwaziya Qazî Mihemed û ya hikumeta wî bû yan hebûna wan hozan bû ku tu carî qayîl nedibûn ku kes destdirêjî endamên wan bike? Encama vê ev e ku rejîm, qet nebe li nav xelkê Mihabadê de dihat hezkirin ku sûdmend bûn ji rizgariya ji destên cudaker û zordestiya deshilata hikumeta navendî ya Îranê.

## Dijberiya Hozan

Eger Sovyetê dest-têwerdana xwe ya aşkere di asta herî nizim de hiştibe ji bo wê yekê bû ku hozan û rejîmê aş bike, lê bêguman serkeftî nebû. Çunkî, serbarê dijberiya dîrokî, komelayetî û ayînî ya hozan bo hikumeta ku Sovyetê piştgiriya wê dikir, sedemên gelek bi hêz yên aborî hebûn. Pîraniya hozên kurdan debar û jiyara wan li ser titûnê bû, niha jî ku rêya bazarên li nava beşên din yên Îranê li wan hatibû girtin, dûçarî astengiyên gelek dijwar bûbûn. Li hindek cihên din jî tevî ku wan nedikarî bi baş debara xwe bikin, neçar bûn ku tiştê xwe yê heyî bi Barzaniyên hejar ve jî par bikin.

Ev bêzariya hozan li başûr gelek bihêztir bû, çunkî li wê derê Mam Ezîzê kurê Qerenî Axa, rehma xwedê lê bê, serkirdeyê Mameşiyên bû û hevpeymanê wî, Bayezîd Axayê Mengûr bi aşkereyî dijberiya Qazî Mihemed dikirin, bi şeweyekî weha li cîgirê konsolê Sovyetê yê li Rezayîye kiribû ku gefa êrîşa Barzaniyan li wan bike. Dema ku Mam Ezîz li dijberiya xwe berdewam bû, Barzaniyan bi rastî jî êrîş birine ser wan û ew neçar kirin ku bi hinek zilamên hozên xwe re birevin Iraqê. Li bakurê Rezayîye çavên hozan li serokatiya Emer Xanê şikak bû ku dest ji posta wezîriya şer ya di hikumeta Qazî Mihemed berdabû. Wî li Zindeştê li paytexta xwe ya çiyayî li başûrê rojavayê şapûr, xwe mat kir. Li Mihabadê tekane hoz ku Qazî Mihemed dikarî pişt xwe pê girêbide hoza Gewriq bû û hejmara çekdarên wê ji hezar zilamî kêmîr bû, her wiha beşek ji hoza Zerza li devera şino ku hozêke biçûk bû. Tew Mela Mistefa û Barzanî jî digel Qazî Mihemed neman ku êdî nema karî nan bide wan.

Ji ber vê hindê Qazî Mihemed li hemberî dijinkariya zêdekirî ya hikumeta Tehranê, ta radeyekê xwe gelek bê pişt û bê pena didît. Her çend Sovyetê soza alîkarî û keresteyan jî dabûye wî, lê heta payîza sala 1946an Qazî bê çekên giran û bê leşkerên perwedekirî mabû, ya rastî mirov dikare bêje artêşa wî qet ne kara û bikêrhatî bû. Dema ku amadekariya Îranê bi temamî aşkere bû, Qazî nameyên lezgîn bo hozan şandin ku hêviya wî tenê ew bû û ji wan re got ku Sovyetê soz daye ku piştgiriya kurdan bike û daxwaz ji hozan kir ku werin eniya şer li dijî artêşa Îranê. Hoz bi wî ve neçûn.

## Vegera Deshilata Îranê

Di wan deman de, bûyer gelekî bi lezgîn derbas dibûn. Hikumeta Îranê zext li ser wê yekê dikir ku divê Demokrat devera Zencan radest bikin ku ne beşek e ji parêzgeha Azerbeycanê. Dema xuya bû ku Îran têdixebite da bi hêzê jî piştgiriya ve daxwaza xwe bike, Demokrat qayîl bûn wê deverê vala bikin û dawiya meha mijdarê

dever vala kirin û ew bi tamamî kete bin kontrola artêşa Îranê. Dawîya nivê şeva 10ê meha kanûnê Îraniyan êrîş bir ser hêzên Demokratîk li Derbendê Qaflanku li başûrê Miyane, piştî berevaniya 24 saetan, serkirdeyên Demokratîk, piştî saleke sax bi vegirtina Tewrêzê, siwarî balefirê bûn û ber bi Yekêtiya Sovyetê ve firiyan. Di nameya xweradestkirinê de ku arasteyî serok wezîr hatibû kirin, hakimê Demokratîk gotibû ku Seyfî Qazî fermandeyê kurd, ji vê biryarê agahdar e û jê re hatiye gotin ku weha tê çaverêkirin fermanê bide hêzên xwe û dijminatîyê rawestînin.

13ê meha kanûnê, Sedrî Qazî, ku mebûs bû li Parlemantoya Îranê û peyambirê di navbera birayê xwe û Îraniyan de bû, li Miyandiwawê derket. Li wê derê ji general Humayunî re got ku kurd amade ne bi şeweyekî aştiyane pêşwaziyê li artêşa Îranê bikin. General jî jê re got, çawa ku Barzanî ji Mihabadê derketin, ew dê hêzên xwe bi pêş de bîne. Hindek hêzên hozên girêdayî hikumetê ber bi pêş ve rê kirin ku pêk dihatin ji hejmarek zilamên hoza Dîbukrî, Mameş û Mengur ku ji Iraqê vegeyriyabûn û Emîd Xefarî serokatiya wan dikir. Ev li cihekî, ku pir ji Mihabadê dûr nebû, ji aliyê nûnerê Qazî Mihemed ve hatin sekinandin û ji wan re hate gotin ku li gorî rêkeftina bi Humayonî re divê hêzên nîzamî bêne nava Mihabadê ne çekdarên hozan ku dibê ku bibine sedema alozî û nexweşiyê. Dawiyê zilamên hozan bê şer vekişiyar û di 15 kanûnê de piştî vekêşana Barzaniyan bo Nexedeyê, artêşa Îranê derbasî nav Mihabadê bû û bi vî awayî jî dawî li komara yeksalî ya kurdan hat.

Pêşwazî li artêşa Îranê hate kirin û Qazî Mihemed û rayedarên artêşa Îranê serdana hev dikirin. Lê di roja 17ê Kanûnê de hejmarek kurd hatine girtin û dotira rojê jî Qazî Mihemed û Seyfî Qazî û gelek kesên din hatin girtin. Tenê endamekî hikumeta Qazî ku azad ma ew jî Hacî Babeşêx bû ku ji ber erka wî ya dîmî nehate girtin. Hinek kurd jî ber bi Iraqê ve reviyar, hinekan jî xwe li gundan veşart. Piştî girtina wan, serkirdeyên kurdan bi vî yekê jî hatin cezakirin: Malên wan kirin baregayên çekdarên eşîrî ku li ser hesabê wan dixwarin û radizan. Ev adeteke Îranê bû ku bê biryara dadgehê bo sepandina tawanê pêk dianî. Di 30 Kanûnê de, Sedrî Qazî ku ji Tehranê vegeyriyabû, hate girtin û ew rê kirine Mihabadê û digel birayê wî xistin zîndanê, her çend wî di dirêjiya wê salê de tenê wan deman Tehran li cih dihişt ku aliyên Îraniyan ve bi erka navçîtiyê bo deverê dihate şandin. Artêşa daxwaz ji hemû kesan kir yê ku gazindên wan ji girtiyan hene belgeyên xwe pêşkêş bikin û piştî lêkolînê ji aliyê dadgeha leşkerî ve hukmê bidardekirinê bo Qazî Mihemed û Seyfî Qazî û Sedrî Qazî derket. Serê sibeha 31ê adara sala 1947an her sê li meydana Mihabadê hatin dardekirin.

Piştî vî yekê, hikumeta serbazî ya Îranê bernameyek bi gerê xist ji bo ku hemû bermahiya rejîma Qazî Mihemed tune bike: Çapxaneyên kurdî hate girtin, xwendina bi zimanê kurdî hate qedexekirin û ew hemû pirtûkên kurdî li ber çavên xelkê hatin sewitandin. Ji bo ku nîşanê hozan bide ku ew ciddî ye, artêşê yazdeh kes ji ser-

kirdeyên ciwan ên hoza Feyzûla Begî û Gewrikî ên devera Seqizê bi dar de kirin.

Taybetiyeke dûbare dagirkirina Mihabadê pêwîst e bê xuyakirin, ew jî ev bû ku li hemû aliyekî Azerbeycanê, her bi xuyabûna nîşaneyên têkçûna Demokratîtan, cotyar, karker û dikandaran mil dane serbirîna Demokratîtan. Ev karvedana hanê bêguman jî ber rik û nefreta xelkê ya li hemberî rejîmê bû. Lê li Mihabadê bûyer bi aşîtyane derbas bûn. Tiştê balkêş, li hemû cihên din ên Azerbeycanê polîsên nehênî bi hêz û li kar bûn li hemberî her pêşhatiyekê, lê Qazî Mihemed pîber û hevkarên bi vî rengî nebûn. Ev rastî tenê wan raportan piştrast dike ku dibêjin rejîma Qazî Mihemed rejîmekî cemawerî bû- qet nebe li paytexta wê weha bû.

Li bakur, Omer Xan û ew hozên di bin desthilata wî de bûn, bi tu awayî di van bûyeran de beşdar nebûn. Artêşa Îranê jî ku diyar bû nedixwest qet erkekê hildê ser milê xwe, Emer Xan jî xwesteka xwe ya bo êrîşkirina ser Azerbeycanê agahdarî nekir, lewma dema ku wî çekdarên hoza xwe kom kirin dawî li şer hatibû. Emer Xan û serokê hozên din bi lez piştgiriya xwe jî bo artêşa Îranê ragihand. Hemû hatin wergirtin tenê ji Zêro Beg pê ve ku zilamên wî kemînek jî bo artêşa Îranê li Balanş li nêzîkî Rezaîye danîbû di wê dema ku wî bi General Humanyon re giftûgo dikir. Ji ber vê hindê Zêro neçar bû bireve. Wî hinek zilamên hoza xwe û asûrî bi xwe re birin û ber bi şîno ve revîyan û ji wir jî xwe gihandine Mele Mistefa û Barzaniyan ku di agirbesteke lertzok de bûn bi hikumeta navendî re. Mele Mistefa di dawiyê de ret kir milkeçê fermanên hikumetê be û zilamên wî bi çek bike yan vegeêrê Iraqê, lewma dîsa şer dest pê kir. Bi hatina meha hezîrana sala 1947, Barzaniyan bi şerkirinê ber bi bakur ve çûbûn û xwe gihandibûn Makoyê û gelek nemabû ku sînor derbas bikin û herin nav xaka Yekîtiye Sovyetê.

## Poxte

Bi dagirkirina Mihabadê ji aliyê Îranê ve dawî li hewildana paşîn a bo damezrandina dewleteke kurdî hat. Ev hewldan weke hewldanên berê, di pileya yekem de, jî ber hevnegirtina kurdan têk çû. Yek ji kêşeyên serekî yê tevgera neteweyî ya kurdan ew e ku pîraniya serkirde, rêvebir û kadroyên wê ronakbîr û şaristanî ne, lê hêzên wê yê leşkerî her dem jî hozan û serokeşîran pêk hatine ku tu carî nebûne xwendewar û bîra tiştêkî nebirine ji talanbirinê pê ve di dema lawazbûna deshilata hikumetê de. Bi tevahiya sala 1946an hozên kurdan, ku bi şeweyekî siruştî li dijî hikumetê bûn, hest bi wê yekê kir ku di bin deshilata Qazî Mihemed de jî weke deshilata hikumeta navendî nerehet in, her çend ku ev jî neteweya wan bi xwe ye jî. Ji ber vê yekê û gumana ji pêwendiya Qazî Mihemed ya digel Rusan, heta astekî pir, kir ku hoz biçin ba artêşa Îranê.

Hokara serekî ya rasterast a rûxana komarê têkçûna Sovyetê bû di bareya soza piştgiriya komarê de. Partiyeye neteweyî ya nû û bi hêza gencan ku dibû ku pîraniya

kurdên xwendevan gihandibûn hev, xelkên biyanî karîn bi dizî xwe bixine nav refên tevgerê de û bo xwe bi kar bînin û di dawiyê de jê geriyan da ku hilweşe. Dewleta xweşkok jî bi saya serê parastina Artêşa Sor hate duristkirin û piştî vekêşana artêşê jî ma li hêviya vegerana wê. Lê dema kurdan hêviya xwe jê birî, êdî tirsra îranîyan jî nema û tu rêyek bo mana tevgera Qazî Mihemedê nema.

Çîrokek bû ku hemû pêk dihat ji zerbekê bo bi hêz pêşketina netewperweriya kurdî. Vaye niha ne Komele maye û ne Partiya Demokrat a Kurdistanê. Gelek ji serkirdeyên kurd ku xelk bendewarê wan bû yan mirin yan ketine zîندانan û yan rehende ne. Lê ev wê yekê nîşan nade ku dawî li netewperweriya kurdî hat. Komara kurdan piştevaniya bir û bendên pêşketinxwaz ên civakê bi dest xistibû ku dibû ku hejmar û girîngiya wan zêde be ku wan birên civakê dijberiya wan dikir ku pêwîst bû ji nav biçin. Gelo netewpereriya kurdî bo wê herêmê guncan bû ku heta vê dawiyê jî xelkê wê gora serkirdeyên xwe yên dînî û eşîrî dike? Kurd tu carî di dewleteke cîgirtî de kom nebûne ku dewleta wan bi xwe hebe, lewma kultereke wan a hevgerî nebû. Ji ber cudakirina wan ji yektir bi wan çiyayên ku wan ji hev diqetîne, kurdan berdeham bo bidestveanîna pêwîstiyên xwe yên kulturî û aborî berê xwe daye paytextên welatên cuda cuda ku lê dijîn.

Eger ew dewletên ku kurd lê dijîn cureyekî otonomiya navxweyî bidin welatîyên xwe yên kurd û dest ji neçarkirina wan berdin ji bo bibin beşek ji neteweya cêgîrewê (serokî), dibe ku bi ser bikevin bo bidestxistina niştîmanperweriyeke weke ya Swîsraya pirnetewe. Welatên ereban pêngaveke destpêkê di vê warî de avêtine. Siyaseteke bi vî rengî li Îranê, eger destê dereke jê bigerin, dibe ku bibe egerê yekîtiyekî bihêz di navbera her du gelên welêt de.

### **Têbînî:**

Σ Arkî Rozvêltê Biçûk, alîkarê paşkoyê leşkerê Amerîka bû li Tehranê ji adara sala 1946 heta sibata sala 1947an. Di wê demê de lêkolîneke taybet li ser rewşa kurdan pêk anîbû û ji wan çar emerîkiyan bû ku di wê kurtbûna temenê komara kurdan de serdana Mihabadê kir.

(1) Berpîrsên dî yên hikumeta nû pêk dihatin ji: Hacî Babeşêx, rêvebirekî olî bû li wê deverê û serok wezîr bû. Sadiq Heyderî wezîrê kar û propagandayê, Menaf Kerîmî wezîrê perwerdeyê, Mihemed Emîn Mu`înî wezîrê bazîrganîyê, Ehmed Îlahî wezîrê gencîneyê, Seyîd Mihemed Teha Zade wezîrê tenduristiyê û Xelîl Xusrewî wezîrê navxweyî bû. Tenê yek ji van kesan ji damezrînerên Komele bû, yên din gişt ji çîna bilind a civakê, bazîrganên biçûk, fermanber û mulkdar bûn.

(2) Dawiyê Artêşa Sor roja 9ê meha Gulanê ji Îranê derket.

# Hacî Qadirê Koyî û dildarî

Mesûd Mihemed<sup>1</sup>

Li Sablaxê (Mehabad) dibêjin Hacî heyamekê li wê deverê maye. Di wê heyamê de demekê li Mizgefta Rustem Beg li cem Mela Hisên xwendiyê. Navê Mela Hisên jî bi mizgeftê ve hatibû girêdan û jêre digotin Mela Hisênê Mizgefta Rustem Beg. Çend qorên helbestan bi dîwarekî mizgeftê ve nivîsandibûn, heta berî çend salan jî mabûn, lê ketin bin gêça spî.

Bêguman eger xemsarî û bêperosî nebûya, divê ew nivîs di nav boyaxa spî de wek xwe bimaya û bibûya mîna keke dîrokî û wêjeyî û neteweyî ya pir nirxdar. Ez nîz anim ew rêzikên helbestan jî helbesteke wî bûn yan jî ên helbestvanekî din bûn û ketibûn ber dilê wî û li ser dîwarî nivîsandibûn. Li mizgefteke Koye jî karekî wisa hatiye kirin ku vedigere ser biraderekî Hacî Qadir ew jî Keyfî Ciwanroyî ye.

Min bi çavên xwe li Koye li ser dîwarekî eywana Mizgefta Hacî Mela Omer bi xetê gelekî xweş û bi zimanê erebî ev hevok dîtibû (عز من قنع وذل من طمع) anku "Yê bi qenaet serbilind e û yê çavbirçî sernîz e." Ji berê de dihat gotin ev xeta Keyfî ye. Guman li ser vê axaftinê tune, çimkî sedemek tune ku bibe cihê gumanê, belgeyên ku wê piştrast dikin û rastiyê diselmînin jî hene. Di nav kevanê de çarîneyeke farişî bi xetê xweş û mezin hebû, ez jî wê çarîne li vir dinivîsim:

نوشتم این بریان ایوان خانه  
بماند از من مسکین نشانه  
اگر گویندا این مسکین کجا رفت  
بگو بگریخت از جور زمانه

.....  
*Ji Kurmanciya Jêrîn: Hozan Robar*

*Wateya wê çarîneyê bi zimanê Kurdî:  
Ev nivîsa li cywana vê xaneyê  
Ta ku ji min belengazî bi nîşane bimîne  
Eger bêjin ev belengaz bi ku ve çû  
Bêje ji ber zulma zemên revî.*

Guman tune ye ku ev movikên helbestê digel derketina Keyfî ji Koye digunce. Di vê çarîneyê de sê nîşane piştrast dikin ku ev helbest ya Keyfî ye:

Yekem: Xweşnûsî; Keyfî bi xeta xwe ya xweş bi nav û deng bû.

Duyem: Biwêjî; Keyfî di rêza herî pêş a biwêjên kurdî de tê.

Sêyem: Reva ji ber zordariya zemên. Keyfî nimûneyê kesên ku hatine xapandin e.

Gava em van sê nîşaneyan pêkve wek stûnekî bidin ber gotinên zarkî tu derz namînin ku çirûska guman tê de bê dîtin.

Ev xet û nivîs û çarîneya Keyfî jî wek nivîsa Hacî ket bin gêça spîkirinê. Lê xweşbextane me ew çarîne ezber kiribû ji ber wê jî wînda nebû. Bi rêya Mela Emîn Yumnî yê xet xweş çarîne gihîştê min ku ew jî ji Koyê ye û aware bibû; niha jî li Bexdayê akinî ye. Xwedê jê razî be mamoste Sabir Îsmail jî ji min re diyarî kir.

Ji dîwana Hacî, helbesta pesnê ya konê Qerenî Axa, yek e ji çend jêderên kêr û tarîk ku bi nîşan tiştekî radigihîne ji liv û gera Hacî li Kurdistana Îranê da ku hûn bizanibin çawa ye! Ez ji xwêneran daxwazê dikim ku wek min baş bala xwe bidin vê movikê:

*Her wek elfî cane stûnî le sikûn da*

*Nek tabîhî xeyre û (mîteherêk) wekû (hemze)*

*Wateya wê çarîneyê bi zimanê Kurdî:*

*Her wek elêfa di bêjeya (can) de, wek stûnekî sekinî ye*

*Ne wek tebîeta tîpên din û yê dengdêr e, weku tîpa hemzeyê.*

Em dizanin di zimanê erebî de tîpa elêfa dirêj (l) dema deng distîne, dibe hemze (◌). Li vê derê her karê me digel elêf û hemzê ye, cih û dema taybet ji hûrkariyên (de-tay) din ên wê helbestê re heye. Ji ber wê em ê behsa xwe bi tenê di vî warî de bihêlin û bêjin stûnên kon wek elêfa di gotina (can) de ne<sup>2</sup> rawestî û sekinî ye anku ne wek hemzê ye ku tîpeke dengdêr e û sekinandina wê nîn e û her carê li ser cihekî ye. Di vê teşbîhê de şewazek heye ku ji aliyê dirustkirina şewê û xeta geşt û gera Hacî ve çespanî ye.

Em dizanin wê demê li Kurdistana Îranê Hemze Axa serokê eşîra Mengor bû. Bê-

guman ji aliyê nav û deng û desthilatdara êlan ve, ew bi asta serokên êlên Pîran û Mameş û eşretên din ên wê Herêma Kurdistanê Îranê bû. Di vê movika helbestê de ku Hacî Qadir sekinandina (elêf) ji bo pesnê û bizava (hemzê) ji bo zem û şermezarkirinê bi kar tîne, li jêr perdeya (turiye)<sup>3</sup> de ew Hemze Axa dişkîne ji bo pesna xwe bide.

Ez hizir dikim Hacî di geşta vegera xwe de ev helbest hûnaye anku ew piştrast bû ku careke din rêya wî bi wê herêmê nakeve ya desthilata Hemze Axayê Mengorî lê hebe, eger ne wiha be jî Hacî ji wê yekê jîrtir e bi silava yekê re nanê xwe digel mîrekî wek Hemze axa bibirre. Nayê bawerkirin jî ku em bêjin Hacî ji destpêke çûna xwe ber bi Kurdistanê Îranê biryar dabe ew qet neçe Mengorê yan jî li wir nemîne.

Her çend e helbest li ser bingeha pesnê hatibû hûnandin, lê ji bilî têbîniya ne-razîbûna Hemze Axa, meremeke din a helbestê hebû ku bavê Gulê ji Hacî ne razî bûye. Hacî ji pesna binemal û baregeha şahenşahê Erdê zêdetir bi xeml û xeyala Gulê ve mijûl bû û name û raspardeyên evîne ji wê re dişandin.

Reng e ku nazdariya keçê wisa li Hacî kiribe û hestê wî livandibe ku ew gelekî ber bi pesna sade biribe heta ku gihandibe wê radeyê hez û daxwazên xwe bi dizî gi-handine sûra derdora gul û gulzar û bejn û balâ Gulê. Ji vê têbîniyê aşkere dibe ku ev helbest piştî vegera ji Kurdistanê Îranê nivîsandiye ne di destpêke çûna wê deverê de û ne jî dema ku li wê derê dixwend.

Eger em girîngiyê bidin van têbîniyan û bêjin dema ew vegeriya Kurdistanê Îraqê helbesta xwe hûnaye, derhal xizmayetiya wî digel pesna Emîn Axa tê de diyar dibe. Ji aliyê dema hûnana her du helbestan ve, ew dem ji hevdu nêzik in, çimkî helbesta pesna Emîn Axa jî di dema hatina xwe ya bo Koye hûnaye. Ez bawer dikim her di dema vegera xwe ya bo Koye de helbesta xwe hûnabe da ku bi rastî bibe diyariya rêwîtiyê. Gava mirov wan her du helbestan dide ber hev hest pê dike ku hêz û nefesa her duyan wek hêz û nefesa demekê ye.

Rêzikeke din ji helbesta Hacî xuya dike ku wî piştî vegera ji Lacan nivîsandiye, wate zêdebarî vegera wî bo Koye ku mertaleke parastinê ye ji bo Hacî, mertaleke din jî li wê derê dîtiye ku dûrî Lacanê derdê dilê xwe gotiye:

*Her lêre heta deştî beheşt ayînê Lacan*

*Ahîste biro nek weku dêwaneyî herze*

Wate bi Kurdî:

Her ji vir de heta deşta biheştê ayîna Lacanê ye

Hêdî here ne wek dîn û dîwaneyê sinêl be

Diyar e hev der derveya Lacan e. Her çend e nayê zanîn ew der ku der e, lê xuya

dike ku cihêke di navbera Lacan û Koye de ye, ji ber ku me gotibû di dema vegera xwe de bo Koye helbesta xwe hûnabû. Wek em bêjin, Hacî Qadir piştî dîtina Gulê û firîna perpirîkên evînê ji ber dîtina rengê wê gula geş, her di wê rewşa coş û xwîngermiyê de, cezb û bêrîkirin û peroşa xwe bi germ û gurî ji volkana xwe ya derûnî çiniya nav wê helbestê. Piştî nivîsandina helbestê nayê zanîn ku Hacî ew helbest şandiye bo Lacanê bi hêviya hatina xeberekê ji wê derê yan wek her helbesteke bê merem xistiye ser zar û zimanan!

Li ser vê xalê çîrokek heye dibêje: Ew helbest gihîştîye Qerenî Axa û wî jî gotiye: "Eger daxwaza Gulê ji min kiriba min dê dabayê." Ew axaftin jî gihîştîye Hacî û gotiye: "Ez bi çi mal û hal û rewşê amade me da ku daxwaza Gulê bikim!." Her çawa be dema ku Hacî helbesta xwe dihûna nizanîbû ku xizmên Gulê dê çawa pêşwaziyê lê bikin da ku ew bi hêvî li Lacanê raweste.

Bêguman ew helbest li derveyî Lacanê hûnaye, êdfî nayê zanîn ku Hacî ew name şandiye Lacanê bi hêviyeke şiloqe yan bi riya wê helbestê bi tenê hesret û keserên dilê xwe li ser kaxezekê barandine. Ji nav hemû egeran ez hizir dikim di wê helbestê de tu hêviyên Hacî bo dîtina Gulê tunebûn. Çi hêvî heba divê ew girtiba ber ne helbestek ji xwe re bikira lempereke mezin, çimkî helbesteke wisa tijî navnîşanên ciwanîyê ku hinek hêvî jî hebe ji nav dibê. Ev helbest qet nabe xwazgîn û berbûk.

Her çend e destpêk û encam û heng û dema dastana Gulê nayên zanîn, ew jî wek dastana dildariya Hacî ji Sablaxê, tîrêjê dide nav derûniya Hacî Qadir û di geşta nav wê derûnê de cihên pêngavan aşkere dîke. Ji bilî vê yekê çend peyaman bi awayekî ne yekser li ser Hacî û karên wî radigihîne. Divê ew name werin wergirtin û wergerandin bo ser gotûbêjên zimanê me.

Yek ji wan ragihandinan sala hûnandina helbestan xuya dîke:

Li dûtî wê yekê ku eger Hacî dema sefera berve germiyan û çûna Koye û wexera dawî ji Kurdistan Îranê şîrên xwe nivîsandibin, divê sal 1277 be, çimkî pêştir û li gor hûrbîniyeke dûtî û dirêj ku li ba me hatiye piştrastkirin, berî wê demê û li gorî nivîsandinên wî li ser Siyotî, çûna berve germiyan nehatibû. Gava ev şirovekirin rast be, Deştî Lacanê tevî xwedî û gul û kulîlkên wê ve dibin kêlerêya (nîşaneya rê) herî aşkere ku rêça hunera Hacî geş kirine û vejandine, ew qasî aşkere ye, gilopên rengîn jî bi ser ve ne, ku rêya geşteweran nîşan didin û bala sirincderan dikşînin.

Ragihandina din ev e ku divê ew helbest yan di biharê de yan jî di havînê de hatibe nivîsandin, ji ber ku di biharê de li Deştî Lacanê xêwet û kon tene vegirtin. Çêdibe ku biharê li Kurdistana Îranê mabe û piştî bi jivan bû vegere Kurdistana Îraqê, wê gavê hatibe Lacanê û ew qasî lê maye heta ku Xeymeyî şahenşehî Erz balê wî kişandiye û di derfetekê de Gulê dîtîye. Eger rast xwediyê Gulê gotibe: "Ji min dax-

waz bike ez dê bidimê.", divê ew qasî Hacî li cem wî mabe ku Hacî baş nas kiribe da ku wek zavayê xwe qebûl bike.

Ragihandina sêyem ew e, gera Hacî bi Deşta Lacan û Baleketî de berve Koye xwasteke Hacî ji wê geranê xuya dike, ji ber ku me ji destpêkê ve aşkere kir ku Hacî ji Baleketî çûye Îranê anko ji despêkê ve kêfxweşî û xwendin û guzarî li deverên wek Lacan û Sablaxê kirine, piştî çûye Bane û derdora Bêtûş û demekê lê xwendîye, disa ji nû ve vegeyriyaye Sablaxê û li wê derê cara dawî ji Lacanê bo Baleketî û Koye bi rê ketiye. Ev xeta gerê di geşta xwendina Hacî de diyar e. Di wan çend salan de ew li hemû wan deşt û deveran geriyaye û li nav cotyaran maye û hîni zaraveyên wan bûye. Ew li nav wan gund û qesebeyan gerok bû û seferên xwendina kurt encam dane. Ev hemû geşt û ger nexşeya rûpîveke ew qasî pan digrin, bi bizaveke pir û gerê nebe, du caran pê nayê kirin.

Ragihandina çarem, deranîna wê gotinê ye ku piştî vegeyriyaya ji Kurdîstana Îranê Hacî heyamekê li Balekî maye û piştî hatiye Koye. Hatina bo Balekî, peyva Lacan bi bîr tîne, ji ber ku riya Lacanê ya bo Kurdîstana Îraqê bi Balekî dikeve. Ji mandina heyamekê li Balekî tê famkirin ku germa havînê li wê derê borandiye û serê payîzê jî berê xwe daye Koye.

Eger wateya "heyamekê" havînek be, heyama havînekê temam bi destê me de heye, lê eger wateya wê axaftinê ji havînekê zêdetir be, divê em li belgeyan bigerin yan jî bi bê belge bêjin ew gotin rast e, lê wê gavê em nizanin em dê çi qas dem bixîne ser heyama havînê. Divê em aqêdar bin ku eger em egera mandina Hacî heyameke dirêj li Baleketî bidin pêş em dê rastî giriftekî bibin, ku berî sefera xwe bo Tirkîyeyê ew qasî li wê derê namîne û dema wî jî pir tune ye bimîne. Ez wisa dizanim heyama havînekê bêxetir e û hemû dê baştir li ser rêk bikevin û girfîten nû jî peyda nake.

Ew ragihandin encamên raveyê ne û çênabe şahid û belgeyên madî bê gengeşî bêne sepanandin, lê bi serhatiya Hacî û hêmaya helbest û nivîsên wî re gelekî diguncin, wate eger me ev ragihandin ku nû xistine ber çavan, bûyerên rast bin, ne ji aliyê jêderên nivîsandî ve û ne ji aliyê gotinên dev bi dev ve tu dijberî çênabe.

Bi her halî Hacî çûye Kurdîstana Îranê û lê geriyaye û xwendîye, çend salan li wir maye, Gulê dîtiye û vegeyriyaye Koye. Eve bûn û divê yek bi yek berê xwe dabe hemûyan. Helbet ew şêwe û hatina yekî li pê yekî çi qasî digel gotinên dev bi dev û nîşanên nivîsê û rewşê guncawtir be, dê zêdetir bibin çiyê baweriyê. Heta ku ez bikaribim ez dê bûyerên ne diyar digel nivîsandinên li ber çavan û gotinên diyar biguncînim, her ew bi min tê kirin ku tu di pelan de dixwînî. Eger dema zêdetir heba, çêdibû min bikarîba rave û berawird û xeberên zêdetir bi dest ve bianîna, min dê bikarîba rûpîveke firehtir li ser rûpelên tarî yê jiyana Hacî li Kurdîstana Îranê ronî bikirana.

Ez di wê baweriyê de me hûrbûna nefesdirêj di perawêzên Siyotî de û ragirtina wan ji ber awêneya wan şîran ku ji jiya gêncatî û feqitîyê ve nêzîk e, ronahiyê didin rêbaza Hacî û li vir û li wir pêzanînan li ser wî aşkere dikin. Lê ew kar hêviyek e û hin nehatiye bicihkirin.

Helbesta "Xeymey şahenşehî Erz" ku mişt e ji nîşanan, maf heye em beytên wê ji nû ve rêz bikin û destbijarekê di wê tevliheviyê de bikin ku di encama nivîsandinê de çêbûye da ku dariştina helbestê digel zincîra wateya xêzan li hev bînin. Ji nêrîna yekem ve xuya dike ku cihê gelek qoran hatiye guhartin û qor hatine serobinîkirin. Ji wê xiraptir jî hinek jê hatine birîn.

Li vê derê axaftina min li ser wê helbestê ye ku di sala 1969 de li Hewlêrê di dîwana wî de hatiye çapkirin. Ez tu giliyê jî li wê çapê û xwediyê wê jî nakim, çimkî wî wek wergirtiye çap kiriye jî. Bi merema serrastkirina rêza qoran, pêştir ez pêşniyaza helbestvanekî bi nav û deng û cihê baweriyê yê îroyîn û Mamosta Hêmin pêşkêş dikim. Li gor baweriya wî rastiya rêza beytan wisa ye:

*Em xeyme ke şemsiyeyî şahenşahî Erze  
Ta çadirî nîlûferî ser teplekî berze  
Etnabî wekû tûlî emel la mutenahî  
Ewtadî weko kêwî uhud merkezî feyze  
Seqfî wekû gerdûne şakî wekû encûm  
Perdeyî wekû edwarî sema etlesî sewze  
Her wek elîfî cane stûnî le sikûnda  
Nek tabî î xeyre û mûteherîk wekû hemze  
Ewsafî wekû xetî dû zulfe le çep û rast  
Wek marî mutelsem ke telsimî serî kenze  
Wesfî çî bikem nêwenî gul ya binî sunbul  
şayste senaxwaniyî bikem her wekû ferze  
Lay jûrî semen nîwenî gul damenî sunbul  
Lew suret û mehnaye ke sed cennetî lexze  
Fîlcumle wekû xalî ruxî dilberî Hacî  
Dilpeste desa badî seba heste melerze  
Her lêre heta deştî biheşt ayînî Lacan  
A hîsta biro nek wekû dîwaneyî herze  
Ta daxîlî xelwet debî emca be wekalet  
Xakî qedemî maç bike bem terze ke terze*

*Me`izûnî ewende wekû ahim be nezaket  
Ladeyî serî zulfî ne wekû bîxeye lerze  
Lew çeşne gule heldekwê salê le Qernê  
Nek wek gulî bazariye her salî ke sewze*

Ji wê destnivîsa Mela Re'ûfî Selîm Axa, ku ji bo Korî Zaniyarî Kurd şandiye, hinek zêdebûn li gorî dîwana çapkîrî hene. Min bi xwe jî ew destnivîs dîtiye. Li cihê windabûna duyem, qoreke du corî nivîsandiye. Her du jî ji aliyê kêş û qafiyê û wateyê ve wek hev in. Di dîwana Hacî ya çapa Hewlêrê de nîva qorê wisa hatiye nivîsandin:

*Nek wek gulî bazariye her salî ke sewze*

Lê mela Re'ûf bi ser wê de ev nivîsandiye:

*Nek wek gulî bazariye mewcud himu lehze*

Li cihêkî din nîv qoreke bêkêş, lê qafiyeya sererast nivîsiye, dawî jî bi peyva "xemze" tê. Eger em van zêdeyan bikine qor û bixin ser helbestê, risteyên wê dê bin 14 qor. Eger em van aliyan jî li ber çavan bigrin ku helbestvan gelekî ji helbesta ku hejmara qorên wê fer hez dikir çêdibe ku şîr ji 15 qoran hûnabe, lê hinek ji wan qoran winda bûbin.

Min bi xwe ew qor wek ku min dixwast rêz kiribûn. Rêzkirina min hinekî ji ya mamosta Hêmin cuda ye, lê ez tu pêwîstiyê nabînim, piştî nivîsandina wî, ez bikim serbarekî naqola (neadetî) û zeq ji bo binbarê huruhopa yê vê nivîsa dûvedirêj. Hegeker kesek jî bixwaze dikare kopîyeke din ji vê helbesta evînê digel a çapkîrî û çapnekîrî berawird bike û dilxwaza xwe ji nav hilbijêre.

Serhatiya Hacî li Sablax û peyama vê helbestê, mêrxasiya xwezayî û bixwebawerbûna Hacî aşkere dîkin. Her çend e jiyana Hacî ji nimûneyên mêrxasî û serhişkiyê dagirtiye, lê ew nexuya ne ku ji bo dildariyê ne, ku piraniya mêrên Rojhilatê xwe tê de vedişêrin û çî ji destê wan bê kirin da ku dildariya wan aşkere nebe û çîrokên wan ên nihênî deng venedin. Sebarekî bi mela û oldaran jî ji xelkên din zêdetir ji ber evîndariyê nav û dengên wan xirab dibû. Ji bilî çend kesên kê melayan rê nedida dildariya wan bê aşkerekirin.

Dema ku li Sablaxê dildariya Hacî Qadir hat zanîn û wî lez kir, deriya dilê xwe ji Gulê re li ser piştê vekir û gazî mirovan kir da ku çîroka heskirina wî ji Gulê re aşkere bikin. Ew Hacî Qadirê han qet ne wek melayên şermok û serkiz ên sed sala nozdem bû. Te dibêjî qey ew mirovekî zîndankîrî yê sizayê xwe tamam kiriye û di deriyê zîndanê re gava xwe ya dawî berve serbestiyê diavêje.

Hacî bi wê dildariyê di sed sala nozdem de ji qalibê klasîkî û destûrên civakî û

nerîtiya kevin derdikeve û dibe nûbera bilez stewîyayî di nîveka sedsala nozdem de. Ez naxwazim nîşanan qerz bikim û bixime ser wateyê û ragihandinên dildariyên Hacî, lê ez giring dizanim ew qas nîşanên ku di van dildariyan de hene werin aşkerekirin û nirx û cihê xwe di siruştiya Hacî de bigrin. Divê bi riya wan dildariyan em Hacî baştir nas bikin, zêdetir li ser wî şareza bin, ji tewjima derûniya Hacî ve nêzîktir bin ku ew kir yekem dijminê netirs ê şehbede li Kurdistana Jêrîn û yekem feylesofê hizra kurdayetiyê li seranserê Kurdistanê.

Zêdebarî melayetiyê ku bi tenê bes bû da ku bibe rêgir li hember derbirîna daxwazên nefsî ji bo jinê, du rêgirên din jî hebûn ku Hacî hesabên dûr û dirêj ji wan re dikirin da ku arezûyên xwe derbibire. Ew, xerîbî û hejarî bûn. Eger di derûniya melayekî xerîb û hejar de bilîseya xwasteke bi şewat nebe ji bo azadiya kirin û axaftinê û heza ji bo jinê di dil û hinavên wî de wî zîndegorî neke, newêre li ser karekî hesiyar û nazik wek dildariyê zimanê xwe bilivîne.

Fişara hesta zikmakiyê di derûniya Hacî de ji bo azadiya kirin û axaftinê, baweriyek teqandiyê, ew bawerî çî ji dildariyê be yan di asta şehbede de be yan jî ji meydana siyasetê be yan jî bi awayekî giştî ji tevahiya meydanên baweriyê be.

Bila li bîra te be, helbesta dildariya klasîkî ku her biwêjek ji xwe re dike adet û tu bacê li ser nade û helbesta dildariya bi pinc û serêş û dengvedan pir û pir ji hev du cuda ne. Li gorî dildariya klasîkî her gotinek dibe pişe û tu bac li ser tune ye û nav û nûçik tu kesî tê de nayên, lê di helbestên awayên din de heta niha mêrên kurd xwe bi aşkere jê dûrdixin. Piştî borîna sed salî zêdetir bi ser wan dildariyan de tîndêrîneke dûr bi dûr, awa û ragihandin û hêmayên wan dixê pişt perdeyêke stûr û tarîk. Eger kûrbînî jî nebe tîşka wê dildariyê xwe dernaxe.

Çêdibe ku xwendevanekî bilez her hizir neke ku Hacî Qadir bîr li karê seksî kiribe yan na! Dilê wî ji bo seks û jinan çû, piştra çî bû?! Li şûna wî xwendevanî ez axaftinê temam dikim û dibêjim Hacî Qadir li dijî karên nerewayî yên şêx Nebî rawestîya ku bi sed salî berî wî bû- Înca çî bû! Hacî di hemû jiyana xwe de netirsî û ji ber kesî danexwar. Înca çî bû! Lê heman xwendevanê bilez ku ez li şûna wî dipeyivim, ez tu giringiyê nadimê û jê re dibêjim înce çî bû! Gava bihîst hevalê wî Filamurz ji filan keçê hez dike, guh da xeberê û kete pirs û vekolînan û her bi bîra wî nehat bêje înce çibû! Ji xwe ve eger cureke peywendîya xizmayetiyê yan aşnayî digel keçikê hebe dildariya Hacî dê wateyêke nû û taybet werbigre û bikeve rewşeke din û bi dehan car zêdetir giringiyê peyda bike. Ez van gotinan dibêjim da ku dildariyên Hacî bala xwêner (xwendevan) bikşîne û daxwazê jê bike cihekî jê re di wê siruştiya Hacî Qadir de peyda bike ku pêzanîna me li ser heye.

Ev dildariyên Hacî ku li Sablax û Lacanê hestên Hacî livandin û piştra axaftin li ser hatin kirin, gava hat Koye çilmisîn û tu dengvedan çenekirin. Ji tu kesî nehatiye

bihîstin di heyama wan çend salan de berf ku biçê Tirkîyeyê kêman yan pir mijûlî hez-  
kirinê bûbe. Ji ber ku nehatiye bihîstin divê mijûlî nebûbe, çimkî niha em behs dikin  
ku Hacî Qadir dildarî bi tawan nizanîbû da ku veşêre. Eger di heyama xerîbiyê de  
guman bêne kirin ku nedixwast biçê jiyana hevîniyê û bi tenê ew heweseke sinêlane  
bû, teqîye û şermek ji bo dildariya Hacî anî, ew gumanê ji dildariya Hacî nake eger  
wê dema li Koye hez kiriba da ku em bêjin ji tirsî şermkirinê re serpoşî kiribe. Li gor  
heman riftarên şerafekarane yê Hacî ku di du dildariyên wî yê pişt de xuya dikin,  
divê li Koye jî ew rastî dildariyê hatiba. Li Koye nayê zanîn ku Hacî ji dil û mêjî de  
xwe namzadê peywendîya evîn û sewdaya jinê kiribe. Rewşa Hacî li Koye naziktir  
bû, ji ber nazikiya rewşê, xwe ji her tiştî dûr xistibû da ku lomeyeke civakî jê neyê  
kirin, nemaze ku ew bi jivan bû xwe biçespîne û xwe pêş bixe. Di xwendina feqiyet  
û geştê guherîna seydayên xwe de xemsarî û sersariyê heye ji bo dabînkirina debar  
û jiyara xwe, ku divê derbarî dilketin û hezkirinê hesab ji wî re jî were kirin. Ew cu-  
dahiyên di jiyana Hacî de ji dema feqiyetê de ta rewşa Koye, ji xwe ve hesabekî din  
tînin ber Hacî, lê ne ew bi tenê sedem in ku dema li Koye jî dildariyê germ û gur li  
cem Hacî peyda nebe. Sedema herî giringtir li ber dest e.

Wek ez hizir dikim ew girift û keynên mezin in ku piştî xwendinê û vegera Koye  
peyda bibûn û Hacî giringî dabû wan, hemû dema Hacî jî dagirtibûn û derfet jê re  
nehîştibûn li dildariyê bifikire. Me di cihên munasib de behsa wan giriftan kir,  
çênabe em carekî din jî behs bikin; çend rûpelan berve bi paş de vegerin hûn dê  
bibînin. Hacî ji xwe razî bû û bi xwe naz bû, di rewşêke wisa de qet ne amade bû,  
xwe bixe jêr barê jinanînê da ku ew bar jî bikeve ser barê hejariyê. Ev tiştê famkirî  
û çavrêkirî ye ji Hacî Qadir, lê li vê derê têbîniyê nû li ser mijara dildarînekirin û  
jin neanînê ji aliyê Hacî ve tê pêş, fikir û serincê han dide berve behskirinê dikêşîne.

Ev têbînî nayê wateya ku heta dilê te wek dilê Hacî aware nebe û tijî girift û arîşe  
nebe û piştî vegera Koye nebî cot, nebza (rajen) wî tevî nebza xwe nebe, tu reşê  
têbîniyê jî nabî. Ez dibêjim ji wî jî zêdetir bike û ji bo hestpêkirinê bi mijara  
têbîniyê, bi xeyalan de vegere wê rojgarê û xwe bixe rewş û barê jiyana Hacî, eger  
nebêjim xwe bixe derûn a wî û bi çavê wî li dunyayê temaşe bike û bi dilê wî hest bi  
xweşî û nexweşiyê bike.

Di encama tîrîneke dûr û dirêj de, ez wisa hizir dikim, derbarî wî dil û derûnê û  
tengayî û giriftên wê rewşê de, ez bawer dikim piştî heyameke kurt ku Hacî ji Kur-  
distana Jêrîn vegeriya Koye tengayî û arîşeyên wî dest pê kiribûn û heyameke ew  
qasî dirêj peyda nebû ku mirovekî wek Hacî hizra jinanînê û malavakirinê bike. Piştî  
ku vegeriya Koye dûçarî derd û kulan bû. Bilez çêbûna arîşeyên Hacî zêdebarî dest-  
kurtî û nebûna jiyar û debarê, ne hişt dilê wî bi pey dildarî û maldariyê bikeve ne jî  
hizra akincîbûnê bike.

Ez dibêjim ji zû ve Hacî biryar dabû ji Koye û Kurdistanê derkeve, ji ber wê bi yekcarî nehat bihîstin ew behsa jin û jinanînê dike. Ez wisa bawer dikim hizra dûrketina ji welêt demeke dirêj bi Hacî re jiyaye û bûyerên rojane jî ew hizir xurttir dikirin heta ku li dawî hêza rakêşana gel û meften ji aliyekê ve û hêza palpêvedanê ya nerihetî û qiriktehlîyê ji aliyekê din ve şerekî berdewam yê nihênî di derûniya Hacî de dikir. Bi hejaneke rîşhilkir Hacî hêza xwe xiste ser hêza palpêvedan û tamara xwe ji nav wê nerihetiyê kişand ku ne di derheqê wê de şaşî dikirin û ne jî bi dûriya wê dihesiya.

Ev derdên dilê Hacî ji zû ve sedem bûn ku tu hewlê nede ji bo avakirina malê, her wiha Hacî peros peyda nekir ji bo avakirina malê. Ev şirove nîşan dide, dema ku Hacî hatibû Koye Aşê şêx Nebî Mawîlî di kar de bû, çimkî ji nakokiyên di navbera wan de tê famkirin ku ew yarmetîderekî têkrajî ya rewşa nelihev a Hacî be ji ber ku bi bîra wî aniye ew aware bû.

Ji bo selmandina vê baweriyê ji aliyê hizrî ve belgeyên piştrastkirî li ber dest tune ne, lê ne nêrîneke bêbinema ye jî, çimkî gava em bi hûrbînî bala xwe bidinê, em dibînin egereke xurt e ji du egerên din ên lawaz.

Yekem eger ew e: Ji dema ku Hacî hatibû Koye û heta jê derçûbû, ne dildarî kiriye û ne jî hizir kiriye malê ava bike.

Duyem eger ew e: Çêdibe ku bi dildariyê ketibe û xwastibe malekê jî ava bike, lê ew xwast û hêvî li pişt perdeya nepenî man û nehatin belavkirin yan xelkê nekir mijara ser zimanan.

Sêyem eger ew e: Ku ez pêşbînî dikim, ji ber arîşeyan û sedemên din ên girîng di jiyana Hacî de, derfet tunebûn li jinê û avakirina malê bifikire.

Ez egera yekem û a duyem bêhêz dibînim, a sêyem jî cihê bawerîya min e. Çêdibe bûyer zadeya rêkewt (bera tesadufê) be, lê ji jêdera madî peyda bûbe zêdetir bi dil tê nivîsandin, nemaze ku bûyer digel pêdiviyên rewşê bigunce. Bi her hal ji ber vê rûpela jiyana Hacî biryara yekcarî ya wî di destê kesî de tune. Min ew qasî guh ragirtiye û çav gerandiye min ji tu kesî nebîstiye û tu nivîs jî min nexwendine li ser wê rewşê û du gotinan bike, ger hal wisa be diyar e tu ser û sorax li cem kesî peyda nabîn.

Xwendevan jî wek min li ser rewşa jiyana Hacî ya di wê qonaxê de agehdar e. Kîjan eger ji wan egeran bi dilê wî be yan jî egera çarem di dilê xwe de pesend kiribe ku nehatibe hizra min, ew dikare wê ji xwe re bike dilxwazî. Eger belgeyên nû jî bi berdest bikevin ji bo piştrastkirina hizrekî din derfeta guhartinê jî heye.

Li vê derê merem ew e ku tarîkiya li ser jiyana Hacî nemîne, gava tarîkî jî nemîne,

rastî çî dibe bila ew be. Ez bi xwe piştevaniya tu hizrê nakim, eger belgeyên madî û hizirî li ser tune bin. Hewl û bizavên min ji ber wê yekê tên, ku ez hez dikim Hacî wek mirovekî ku bi rastî jiyabe, nas bikim, ne ji fikreyekî rût ku nivîsê ew dirust kiribe. Hacî mirov bû, mîna min û te hest bi xweşiyê dikir. Helbet nedixwast bêpar be ji kameranî û vehesiyê. Ku ne ji ber wan sedeman be, divê ji ber sedemeke hêja be ku ji hezkirin û xwedêhîştina wî bi hêztir be.

Axaftin li ser dildariyê wisa bi dawî nayê, hin tamamkirina wê maye. Heyameke din zelal dibe û behsa li ser dildariyê vedikişê ser hevdiştina hinek aliyên giring hem ji siruştiya Hacî û hem ji bizava berve gihîştina kurdariyê. Dildarî wek neynikeke hertimî li ser rêbaza ademî ye, derûniya Hacî ji me re nîşan dide, lê bila carê em pakaneyekê ji bo evîn û dildariyê di asta wê gunehê de bikin ku ew qasî mirovan dilhişk û bêrihim dikin û tîrên birîndarkirinê lê didin.

Bila em wê yekê piştrast bikin ku evîndarî di navbera nêr û mê de ne şerm e, lê şîrazehona kela civakê ye. Divê em helwêstekê werbigrin da ku hinekî nav û dengê xirap ji dawa dildariyê daweshînin û wisa bikevin ser rêça evdalbûnê li pey dengûbasa Hacî li cîhana dildariyê. Gelek curên evînê hene. Ew qasî pir in çêdibe ku neyên hejmartin. Lê ew curên ku dikevin ser zimanan û tîrên nivîsandin û xelk bi wan mijûl dibe û gengeşeyên xwe li ser digerin, çend curên naskirî û giring in, her wekî, evîna dîn û mezheb û felsefe û nîştiman û huner û xweza û bavik û dayik û bira û xizim û birader û li pişt hemûyan û li pêş hemûyan evîna di navbera regeza nêr û mê de ye.

Bêguman ew evînî hemû bi bandor û giring in û pir caran dibin sedema xwe qurbanîkirin û xwekuştinê jî. Me bi çavê xwe dîtiye û em dibînin nakokî li ser vê rastiyê tune ne. Dibe ku wisa be jî bi awayekî sersam û ne mefhûm canfîdayî ji bo wan evîndariyan hatibin kirin.

Pir caran di xwendina serhatiyên kevin û nû de em dibînin filan kesî di kela xwe de dest ji baweriya xwe bernedaye yan tu gotin bi kar neanîne ku dijminê baweriya wî kesî mifahê jê werbigre yan jî xwe bi qurbanî pêşewayê xwe kir yan di tola axaftineke bêhurmet de kesek kuşt û di encam de xweşiya xwe ji dest da.

Gava ez dibêjim ne mefhûm e, merema min ne ew e ku ev babet ji binaseya xwe ve xwe qurbanîkirinê nayîne, ji ber ku piraniya caran wisa ye, gavê kesek xwe ji bo armanckê dike qurban, ew armanca wî di çavê kesên dîn de nehêjayî qurbanîkirinê ye. Her heman kesî jî haya wî ji armancên mezintir tune û pê bawer nake û guh jî nadê. Bo nimûne, dibe ku mirûdek amade be xwe bike qurbanê şêxê xwe, lê ne amade be gîskekî bike qurbanê welatê xwe.

Naveroke axaftinê ew e ku gelek curên evîndariyê hene û her curekê bere û kesên wê hene ku baweriyê pê dikin. Lê bi fikra kûr derdikeve ku her hemû ji destpêkê ve

dibin du beşên cuda. Beşek ew e ku ji xwe ve di wijdana mirovn de peyda dibe û tu pêwîstî bi mamosta û rêberan nake da ku mirov hîn bibe wek xoşwîstina zarok û bawerî û dayîk û nêr û mê. Beşa duyem, eger ne ji fêrkirin û wanedanê be dilê mirovan bi ser de nakele, wek hezkirina siruşt û mezheb û huner û felsefe û lîsk... htd.

Pir caran mirov xwe ji bo tiştê dîke qurbanî, eger ne ji handanê û mêjîtîjîkirina bi salan be, mirîşkekê jî ji bo wî tiştî nake qurbanî, ne bi tenê wiha eger mamosta wane nedabanê, dibû ku ji wî tiştî hez nekira jî, lê ji bo hezkirina kur û nevî pêdivî bi mamosta tune ye. Axaftineke bi yekcarî ne rast û ne pesend heye ku li gor wê hezkirina bav û dayîkê ji bo zarokan berhemeke civakî ye bi texatîyê ve girdayî ye û ne xwezayî ye.

Wekî ku min li ser wê hizrê jî bihîstîye dayîk û bav zarokan xwedî dikin da ku di pêşerojê de mifahê ji wan bibînin. Hetta ku di hinek nivîsaran de hatiye, perwerdeya li jêr sîbera rejîma burjûwaziyê û di wê civakê de ku ji bir û texên cuda cuda pêk hatiye wisa dîke ku dayîk û bav bi tenê ji zarokên xwe hez bikin û ferq û cîyawaziyê bixin navbera zarokên xwe û yên xelkê.

Tu rastî di wê axaftinê de tune ye û ew bêbinemalî ye. Ji bo piştrastkirina şaşîya wê axaftinê eger em bêjin perwerdeya burjûwaziyê mirovan fêr dîke ku bi tenê ji zarokên xwe hez bikin, baş e kîjan burjûwaziyê anko emperyalîzmê mirîşk fêr kiriye da ku xwe bike qurbana çêlikên xwe yan jî çûkek fêr kiriye da ku xwe ji bo çêlikên xwe biavêje ser mar? Axaftina wisa ne bi tenê berhema sade û serabûna fikrî ye, ku di kûraniya wê de xuya dîke û ji xwe bi qandî tirûkeya çavan jî naweste.

Eger hate gotin dayîk û bav zarokên xwe dixapînin û bi timehiya zordariya pêşerojê wan xwedî dikin, êdî tu bawerî li cem mirovan namîne û baweriyên mirovan dê ji binî ve hilweşin û wêran bibin, çimkî eger me piştrast kir dayîk durû ye digel zarokên xwe, wê gavê divê rêberên siyasî û serokên partiyên û yên welatan rast bin digel xelkê. Bav derewîn be û neqabe rast bike, efsaneyêke sivikpêkirinê ye û tu peywendîya wê bi mirovatî û hiş û rastîyê ve tune ye. Gava rihma dayîk û bav digel zarokan bibe gunch û cihê gumanê, ew ê ku me fêrî wan axaftinan dîke, divê çend caran wî em xapandibin û çî morfîn bi wan axaftinan xistibe serê me.

Çênabe û nayê kirin nêrîna wisa bikeve hişê mirovekî eger morfîn ne pê re be. Eger bawerîya mirov bi hez û evîn û soza dayîka wî nema, wê gavê dê çawa ji xelkên din bawer bike û guh bide mamosta û rêber û feylesofan! Ez wer dizanim ev rastîyek e û pêdivîya wê bi vekolînê tune ye.

Li vê derê axaftina min li ser çawanî û cura peydabûna wan evîndariyan e ku hinek ji xwe ve peyda dibin û hinek jî bi fêrkirinê peyda dibin. Eger em çûn ser mijara xwendin û bihêvîkirin û tirsandinê, wê gavê çî bi xeyal de bê û neyê, derfet heye, bi

berevajî qanûnên xwezayî û zikmakî peyda bibin û xwezayê û qanûnên wê jî binpê bikin.

Tu heyama çend salan mijûlî yekê bî ji wan, bi riya rahênan û tirsandin û bi-hêvîkirin û mêjîşuştinê pêve bê girêdan, tu dikarî kerbê ji her tiştî baş û pak û xweşik bigrî yan jî xwe pê bikî perestê her tiştê xirap û wêranker û kirêt. Dibe ku bi riya wanedanê dayîk zarokê xwe bikuje û yê dîndar bibe kafir û qehremanê xwedî bawer û felsefe bibe kesekî xayîn.

Li vê derê em dê behsa jêdera eslê evîne bikin, wê bulqikê ku ji binê kaniyê ve derdikeve, ne ewê ku li ser ava cokan çêdibe û tevî tiştên biyanî dibe. Bi vî awayî mirov dikare bêje hinek evîndarî hene zikmakî ne û hinek jî hene berhema fêrkirin û wanedan û rahênanê ne.

Hemû evîndariyên zikmakiyê jî ne wek hev du xurtin. Bo nimûne, bi qasî ku dayîk û bav ji zarokên xwe hez dikin zarok ji wan hez nakin. Berî nêzîkî 1300 sal ji pêxember - silavên Xwedê lê bin - hat pîrskirin: Çima hezkirina zarok ji dayîk û bavê, ne wek a wan e ji wî? Di bersivê de wisa fermo: (لأنهم منا ولسنا منهم) ku tê wateya "ji ber ku ew ji me ne, ne em ji wan in." Helbet mirov ji dayîk û bavê xwe pitir ji parçeya dil û cîgerê xwe hez dike ku zarokê wî ye, çimkî dayîk û bav ne parçeyên dil û cîgerê wî ne.

Heta vir jî mesele bi dawî nayê. Taybetmendiyêke evîndariya nêr û mê heye ku wê evîndariyê dike diyardeyêke tekane û ji tevahiya curên xoşewîstiyên din cuda dike, wek du cemsêrên elektrîkê pozîtîv û negatîf, gava digihên hevdu hêza ji hevdu nêzîkkirinê peyda dibe. Xwasta di navbera regeza nêr û a mê de jî du zindiyên ew qasî ji hevdu ve nêzîk dike, her dibêjî belkî bi kartêkira kîmyayî gihîştine hevdu û tevî hevdu bûne.

Gava nêr û mê digihên hevdu, dibin du beşên qora helbestekê; şekil yek in bejin du ne, yek yekî temam dike û kêmasiyên wî nahêle û bi her duyan yekbûn bi temamî pêk tê. Ev yekbûna xurt di encama evîndariya nêr û mê de çêdibe, ku di nav cîhana zîndeweran de hevawaya wê evîndariyê tune ye. Gava di nav wan de jî nebe, diyar e li hemû cîhanê tune ye.

Piraniya curên evîndariyê yekalî ne: Tu ji niştimana xwe hez dikî, lê haya niştiman jî ji te tune ye, tu ji hunerê hez dikî, lê haya hunerê ji te tune ye, tu mezheb û felsefe û siruşt û gul û pepûle dipêrestî, ew jî kerr û lal in û hest bi te nakin. Wêje û folklor û yarî û nizanîm çî bi te xweş e, ji bo telaya heza bi tenê ya dilê xwe govendê digerî. Heta radeyekê hezkirina kur û bavik û dayîk û xizim û birader anko hezkirina mirovan bi giştî, dualî ye, lê qet nagihê asta kartêkirinê û hevdu temamkirinê. Hezkirina di navbera nêr û mê de rastiyêke mezin a cîhanê ye; gelekî xwezayî û asayî ye. Ew

peywendiya ku jiyânê peyda bike û berdewamiya mirovatiyê dabîn bike, hêja ye heta wê radeyê were bilindkirin: Ji vê kêmtir nabe ji bo berdewambûna cura mirovatiyê.

Di vî warî de mirov bi bê rêber û mamosta û tirs û timehî ji xwe ve mijûlî evîn û sitranên evînê dibe û derûna wî pê ve tê girêdan û bi tu mijarên din re ew qasî serê xwe naêşîne. Ji xwe re binêre dema pale paletiyê dike, şivan pêz diçêrîne û xwediyê karwanê di rê de li pey hespên xwe dimeşe, her hemû jî sitranan ji bo bejin û bala gulê û xezalê dibêjin, li ser yarê gotinan hildibijêrin, kêman caran yan jî qet navê wê kesê hilmadin ku sitranê li ser dibêjin.

Min ji sepanekî (pale) nebihîstiyê ku dibêje wey ji ber wê gula genima ciwan, ew gula baxê û nanê qenewize. Te karkerek dîtiye di dema karê heriyê de raweste û bêje tevîrê min baş e û her carê 10 kîlo herî pê hildike. Heta ku sendîka û partî û aliyê siyasî û ayînî û hunerî kesekî bi wane û rahênan fêrî goranî û helbesta niştimanperwerî û çînperwerî û dînperweriyê nekin, ne karker û ne cotyar û ne şivan û ne xwendevan û ne leşker û ne qumarbaz, kes ji wan ji xwe ve sitranan li ser sedemên jiyânê nabêjin û xwe pê mijûl nakin û her hemû dê li ser jinê û bejn û bala bilind û çavên reş û belek sitranan bêjin.

Mijûlbûna mirov bi evînê, ne ji ber şîr û xapandinê û karên dijminên gel e yan jî cîyon e û ji aliyê zordar û dagîrker û burjûwaziyê ve ketiyê hişê xelkê da ku xebat û hêrsa şoreşgêran vemirînin. Axaftinên wisa ku li ser vejandina sitran û goranî û helbestan têne gotin, bi yekcarî ji rastiyê dûr in, çimkî wan kesên zordar û fêlbaz ji nebûnê peyda dikin û dikin mamostayên sitranên evînê. Bi rastî ji ber nêrîna teng û kurtbîniyê ew axaftin têne kirin, kesên ku wê axaftinê dikin neçar in wan arîşeyan ji xwe re dirust bikin û piştî jî li gorî kurtbîniya xwe li çareseriyên bigerin. Teoriya wan wisa ye her tiştê di ser pira girêdayî re derbas be, ne rast û derew e.

Ew hizirên teng, nahêlin serhatiyên wek karker û cotyaran di dema kar û kedê de xema xwe bi sitranên li ser laş û xeml û nazikan derbas bikin, kerb û qehra jiyânê sivik bikin. Ew hizra kurtbîn zêdetir dunyayê bi ser wan de reş û teng dike, wisa lê dike ku qet şik nebin xwe ji wê belayê rizgar bikin. şeytan û Decal û fêlbaz pêkve bûne mamosta û ew wane dane û ew bela ji wan re çêkirine, ji ber wê hizrê karker û cotyar ji xebata rastiya texayetiye û her kesên bi ser hatî ji xebata rastî dûr ketine.

Merema min ji wê nimûneyê ne ew e ku heta hetayê laneta Xwedê û dîrokê li zordar û sitemkar bê. Tu jî rastiyê zanî, merema min her ew e ku di vê serdema zanist û teknîk û rewşenbîrî û huneriyê de em zulmê li evînê bikin û bi awayekî ne dadperwerane navê wê reş bikin. Sitemkar bi tenê li wê meydanê gunchbar e ku lê sitemê dike, gerek nake ji bo gunchbarkirina wî em hesta mirovan a gelekî pîroz gunchbar bikin, wate em xwe û şîretên bav û bapîrên xwe bidin ber tîrên gunchan. Heta

ku em bêjin destê zordar di pêkanîna wê hesta pîroz de heye, ku bi rastî jî tune, mî-faha me di wê de ye ku di vê xalê de em xwe li hember zordar bêdeng bikin da ku em pîroztirîn rûpera dîroka mirovatîyê pîs nekin.

Gava em bi çavekî çîk û bêalîgirî li xwezayê binêrin, em dê bibînin ku gelek ke-reste ji dildariyê çêbûne û ew qasî jî xweşik kirine, tu kes û alî û hikumet û şeytan û pêrî nikare ji bo armanceke xwe wê xweşikiyê rêkbixe û xelkê pê bixapîne û mijûlî evîndariyê bike. Çawa ku tîbûn mirovan bê mamosta ber bi avê ve dibe, dildarî jî mi-rov ber bi hevpara jiyana wî ve têvedide.

Hêza kişandina dildariyê ew qasî xurt e, çî qasî mamostayek bixwaze wê hêzê pûç bike, nikare, çîmkî di dirêjîya dirokê de ayîn û felesefe û exlaq û desthilatan, her hemûyan qeyd û bend û qanûn û siza li ser danîn da ku xwasta zikmakiya xurt a mir-ovan "sêks û jê hezkirinê" kontrol bikin û di çarçoveya berjewendiya civakê de bi-hêlin.

Bi rastî çî qas folklor heye, ne bi tenê sitran û helbest û çîrok, ku bi awayekî xwe-zayî ji derûniya millet bûne û bê mamosta û rêber ketine ser zar û ziman û cihê xwe girtine, sed carî zêdetir digel sikar û efewiya (bêserûber) bûyer û ezmûnên ro-jane yên xelkê diguncin, ne ku digel barebar û pitepita felsefe û teoriya be-rawirdkirin û helsegandina derew û tevlihevîkirinê. Qet ne balkêş e ku cotyarekî evîndar berî du hezar sal sitranek gotibe jî cotyarek wisa sitrana evîndariyê di-bêje, lê qet nakeve aqilê mirovan ku sitran li ser nîştimanperweriyê yan jî tex-perweriyê gotibe.

Eger ne ji fen û fûtan be, qet hesta nîştimanperweriyê û texperweriyê nakeve si-trana sepanekî (pale) medyayî yan aşûrî yan firawûnî. Eger xebat û armanca civakî me neçar neke em xwe bixapînin, bi qandî wîçwîça çûkan û hîrhîra hespan û qeb-qeba kewan mirovan sitran li ser evîndariyê gotine, heta em dikarin li vê derê nimûneyekê bînin ku alîkariya me dike ji bo baş zelakirina mijarê.

Ew helbestên li ser xeyb û armancên dînî hatine hûnandin ji binemayên xwe ve yan ji ber tirsê yan jî ji ber hêviyêke dûveroja pişt mirinê hatine hûnandin, ne ji ber xoşewîstiyê sade ji bo merema ola diyar. Pir kêr mirovên xwedênas gihîştine payeya xwequrbanîkirina xwedê, teqwa û perestina ji bo Xwedê, ji wan û berjêr pir-anîya xwedênasan ji tirsê êşkenceyê û bi hêviya bihuştê Xwedê perestine û pesna wî dane. Her ez jî nabêjim olên asmanî tirs û hêvî ji xwe re kirine amraza teqeweyê û daxwaz ji kesî nekirine bê padaşt werin ser rêça wan. Pêwîst nake ez nimûneyan bînim, bi xwe pertûkên wan ayînan bixwîne û pendan jê werbigre.

Tiştê ku ez ji te re behs dikim li ba min bê xapandin û bê sazandin (şirovekirin) e. Ez dizanim her bere û girûpa ku bi baweriyeke xwe ya taybet ve mijûl e û nikare

xwe ji şovînzîzmê dûr bixe, hewl dide nêrfna xwe piştrast bike û wisa bide xuyakirin ku babeta wî cîhanê dilivîne û tevahiya hêzên diyar û nediyar xizmeta wê babetê dîkin û di xwezayê de tiştek tune ye bêyî hizra ku ew jê bawer dîkin karekî taybet bike.

Ez jî zanim tu jî zanî, her kesê şovînzîzim li ser baweriyekê be, heta ku li ser wê baweriyê be, hewl dide bi belgeyên rast û nerast bawerîya xwe bisepîne. Gava belgeyê hêja jî berevajî nêrfna wî be, ew dê awiran berdê û guh nedê yan jî bi yekcarî înkâr bike.

Heta ku desthilatên dinyayê tevda di destê wî de bin, bi qasî bawerîya wî, wî dil-rehet nakin, ji ber ku bi yekcarî baweriyê bi wê hizrê dike tevî kifir û xiyaret û hemû xirapîyên wê hizrê; li ser wê binemayê jî sizayan dide.

Ev rastiyeke li ber çavan e û hatiye dîtîn, heta demeke dirêj jî her rewş dê wisa bimîne, çimkî di tevahiya asoyên siyasî û felsefî û bawerî de çirûskê xuyan nake ku mizgîniya nemana şovînzîzmê bide. Lê bi ser vê yekê hemû de rastî dê her rastî bimîne, eger heroj bi kotekan jî were hûr û xişkirin. Çiroka Galîlyo bi bîr tê ku dadgeha dêrê ew neçar kiribû xwe derewîn derbixe ku gotibû giloba erdê li dora rojê digere, lê rastî her rastî ma û giloba erdê jî her li dora rojê digere. şirovekirina vê babetê gelekî dixwaze, ez dê li vê derê dawiyê lê binim.

Ji ber vê yekê dildariya Hacî Qadir û ya her mirovekî din, ne şerm û fedî ye û çênabe ji ber dildariyê gilî û gazin ji tu kesî bêne kirin. Li gor nêrfna min nelivandîna hesta siruştî anko nehêlana evîndariyê di mirovekî de valahiyekê dixê derûniya wî ku dibe ku qet neyê dagirtin yan jî bibe nexweşiyê derûnî ya dijwar û ew mirov bigihê wê astê ku ji xêr û xweşiyê hez neke.

Dibe ku bicihnebûna evîndariyê di dilê kesekî de jî bibe sedema nexweşîya sadîzmê di dilê wî de ji ber hêrsa biberdest neketinê. Ez naxwazim li vê derê xwe bikim nûjdarê psîkolojîyê û navê nexweşiyê hildim û şaşîyan tê de bikim, her ez ê di çarçoveya zaniyariyên giştî de dom bikim ku xwendevan jî wek min li ser agehdar e.

Di vê çarçoveyê de ez bê tirs û guman dibêjim nehêlana evîndarî û seksê kiryareke xirap e, çimkî jêdera hebûn û mandîna jîyanê şermezar dike. Xwedênas û xwedênas, ew kesên ku seksê bi karekî kêr didin zanîn, piştevaniyê dîkin zarok bi riya makîneyan werin çêkirin, ji ber ku makîne hest bi xoşewîstiyê û seksê nakin.

Bêguman dildarî anko evîndarî çavkaniya pak û pîroz e, eger bi zanebûn bi karekî xirap neyê naskirin. Lê digel van rastiyan divê em wê yekê jî bizanin ku her çend e ev hesta evîndariyê di derûniya mirovan de diyardeyê xwezayî û asayî be, radeya hêza wê diyardeyê ji mirovekî bo mirovekî din cuda ye.

Evîndariyê jî wek her hesteke din ji aliyê bandorê ve gelek pileyên wê yên jor û jêr hene. Bila em nizanibin sedema wê cudahiye jî çi ye. Em bi çavên xwe dibînin hinek caran mirov rastî sewdaya dildariyê tê û wisa lê tê ber bi dînbûnê ve biçê û biryardan û viyana xwe ji dest bide. Li cem hinek kesên din jî nirxa evîndariyê negihê wê astê û ji radeya nerîtiyê derbas nabe. Her du curên evîndariyê; ya bihêz û ya bêhêz û ya navend jî hatine bihîstin. Ew rastiyeke e, pêwîst nake careke din bê gotin û dubarekirin. Wek wê rastiyeke, dildariya Hacî jî rastiyeke e û pêdivî nake gengeşe li ser bêne kirin.

Lê rastiya sêyem maye em piştrast bikin: Gelo evîna Hacî Qadir çi evîn bû?

Tu dibêji ji wê curê be ku mêjiyê wî şewitandibû û xewa şevan lê herimandibû?

Bi merema aşkerekirina vî aliyê giring ji derûniya Hacî Qadir hemû hizirkariyên ku ji destê min bîn min kirine. Min guh daye tiştên ji hevdu cuda, kûr nûçe û gotin, ji vir û ji wir min kom kirine. Min bala xwe daye şîrên wî û min dane ber şîrên helbestvanên din. Min hest pê kir ku evîneke agirîn di jiyana wî de hebûye. Ji wê zêdetir jî min kiriye, zincîr û serencamên jiyana Hacî min kirine hakem ji bo biryardanê li ser hebûn û nebûna evîndariya kûr di dilê Hacî de.

Piştî şirovekirinên fikrî û vekolîna dengûbaşan û qonaxên jiyana Hacî û helbestên wî, ez gihîştim wê baweriyê ku Hacî kûr bi dildariyê de neçûye.

Bi riya bihîstinê û vekolîna jiyana Hacî, ji bilî keçîka ji Sablaxê, ku dibêjin ji Hacî hezkiriye û keçîka ji Lacanê Gulê ku Hacî bi lez û bez hezkirina xwe jê re derbiriye, nehatiye bihîstin ku li seranserê Kurdistanê Hacî ji keçîkeke din hez kiribe!

Derbarê "Keçîka Sablaxî" de, eger ne ji gotinên dev bi dev ba, tu nûçe li ser wê bi ber destê me nediketin, ne di şîrên Hacî de û ne di nivîsên kesekî din de tişt li ser wê nehatiye nivîsandin. Helbestên Hacî ne bi dizî û ne bi aşkere tu amajeyê nadin ku em hizir bikin li ser "Keçîka Sablaxî" ne. Ew aşkrebûna ku heye jî ji bo Gulê hatiye bikaranîn.

Ew du evîn, eger bi bandor bana wek evînen helbestvanên din ku bûne dastanên ser zimanê xelkê û di helbestan de nimûneyên wan hene, divê di rûpela jiyana Hacî de firehiyeke din heba û di helbest û naveroka wêjeya wî de aşkeretir bana.

Li ser wan dû dildariyan ji bilî gotinên devan û nivîsên bi xamoşî tu nişanên din li ber destê me tune ne; xamoşî bi xwe jî ji "hebûnê" pitir "nebûnê" nişan dide.

Ji ber nebûna belgeyan û axaftinên piştrastkirî, ka em binêrin belgeyên nihênî û nişanên di helbestên Hacî de qala çi curê evîndariyê dikin!

Wergirtina nişanan ji wateya helbestê bi merema piştrastkirina hebûn yan nebûna

evîndariya bi şewat karek e, bi hizir (zihin) û zewqê tê kirin. Di wateya helbestê de tişteke tune ye ku amajeyê bi madeyê dike da ku em bikin belgeya madî û dawî li gengeşeyê bînin. Zihin û zewq jî ji xwe ve bi tenê amajeyê dikin, berî ku dawî li gengeşeyê dawî bînin, çî dibe ku bibin sedema gengeşeyê. Zihin û zewq çî ne heta ku bibin qazî û biryarê li gengeşeyê bidin!

Kî dibêje zihin û zewqa filan kesî ji ya kesekî din baştir e da ku ew bibe hakem? Ew rastî ne bi tenê di helbestan û hunerê de, lê di her tiştê amajeyî de heye, heta ku hakim û pispor biryarê li ser didin, dîsa dibin cihên heman rexneyan.

Bo nimûne dema ku keçikek dibe şahjin yan jî kurek dibe şahê laşciwaniyê yan jî danskarek dibe yekem şah di dansê de, tu pîvanên madî tune ne wan karan rêkbixin û hilibijêrin. Bi tenê zihin û zewq pîvanên karên wisa ne; êdî divê yan em wan karan nekin heta ku rojek tê û komputer dibe hakemê wan karan yan jî divê em ji neçarî bi zihin û zewqa pisporan razî bibin û wan bikin hakem.

Ez li vir nabêjim hizira min a derbarê helbesta Hacî tekane rêgir e li hember bawerîya min rawestîye, çimkî nebûna nîşana piştrastkirî û xamoşîya jêdera nivîsandî ku min nû xistiye rojevê, ji xwe ve rêgira duyê ne. Li gor nêrîna min hinek helbestên Hacî Qadir digel bawerîya min, bi temamî dişepin û diçespin. Ev jî tê wateya ku nêrîna min bi zewq û zihinê wergerîye ne wek a pisporên sîma û ciwanî û huneriyê bi tenê ye.

Li ba min helbestên Hacî zadên (ber) mêjî ne, berhemên hosta ne, hunerên hunermendan in. Dildarî û xoşewîstîya ku di helbestên Hacî de tê dîtin, ji hesteke hunerîya bilind ve diweşin, lê amajeyê bi derûneke şewitî nakin. Lihevkerin û bihevgehîştin û rêkeftin di wan şîran de dixuye, ne îskeîska girî û hesta dilê kizirî.

Ji vî aliyê ve şîrên Hacî dikevin rêzbenda şîrên dildariyên şêx Reza, ne Nalî û Kurdî. Şêx Reza jî rastî evîna bi şewat nehatibû, lewra wî jî şîrên evîniyê kêr gotine, ew ê ku gotine jî ustadiyê tê de heye ne şewatî. Ji wan şîrên dildariyê ên kêr ku şêx Reza li hev anîne, pênc xîştîya ser bi Ateşpareya (Kurdî) ve bi soztirîn parçeyêke evîne ye ku şêx Reza ji dil de gotibin, bêguman li vê derê gur û kilpeya derûniya Kurdî bilê avêtiye nav derûniya şêx Reza:

*Dilê birdim be naz û îşwe dîsan şoxî eyiyarê  
Fîrîbî dam be çawî mestî xoy mehbûbî sehharê  
Le hîcranî teqîm kird ey refîqan kiwa mededkarê  
Eman mirdim îlacî sale rêy pêxembera carê  
Wîsal ya qetil ya teskîn le hersê bom biken karê*

Kesê ku zanayê helbestan û guhdarê muzîka gotinkî be û ji velerzîna risteyê fam

bike, dê zanibe kîjan helbest ji volqana evînê dicoşe û kîjan di encama fikir û felsefeyê de tê nivîsandin. Biwêjekî (goyende) wek Nalî eger bi derdê evîna "Yarê" neketiba, çi qasî şiyana wî ya hûnandina helbetan bilind ba nedikarîbû xwînê ji dilê xwe derxîne û şîran pê binivîse. Nalî û Kurdî her du bi derdê evînê yê pir giran ketibûn, ji ber wê jî qet kilpe û bilêse wan venemrîn. Dilê wan ku di jiya gencîtiyê de bû milkê evînê bi yek carî hat zeftkirin û carekî din nebû malê wan.

Bo nimûne, bêyî bijartin, qorekê dihênim ku tûn û tava evînê tê de diyar dike. Nalî di dawîya helbesta xwe de wisa dibêje:

*Dûr le to Nalî segêkî bêwefa û herzego  
Bo çî bangî nakey em kelbe ke nanî nanî ye*

Bi Kurmancî:

*Dûr ji te Nalî kûçikê bê wefa û herzego ye  
Çima bangî vî kûçikî nakî ku nanî nanî ye*

Li vê derê merema min ne ew e ku ez desthilata Nalî di şîrê de derxim, ji ber wê min xwe ji hûrkarî û aliyên hunerî yên qorê dûrxist. Bi tenê ez dê bandora evînê di şîrê de bînim ber çavan.

Bala xwe bide qorê tu gotineke hurmetkar nabînî, berga arayîşt û eyba gotina "seg" veşêre ku Nalî xwe pê teşbîh kirîye. Gotinên "bêwefa, herzego, kelb, nanî nanî, bo bang nakey" hemû amajeyê bi kêmatî û nizmiyê dîkin. Wek mirov hizir dike divê hatina ew qas gotinên wisa di qorekê de anko kombûna wan gotinan pêkve bîza mirov tîne, lê helbestvan bi gerîma evînê û bilêseya derûniya xwe, ew xwe nizimkirin û xwe kêmkirin wergerandiye ber bi bilindiyê ve û xwe pê gihandiye şeref û hurmetê. Ez dikarim bêjim li vê derê gotina "seg" gelekî giringî wergirtiye, nêmaze tu gotinên çirîskdar jê nebûne ku cil razandine.

Bala xwe bidê, Nalî li gor mezheba evîndaran çi qasî rastgo ye, gava dibêje: "Dûr le to Nalî segêkî bêwefa û herzego" çimkî wê gavê ku evîndar ji yara xwe dûr dikeve, cihê wî ye jêre bê gotin kûçikê bê wefa, rew rew wî jî bi herzego bê zanîn. Eşq wisa li mirovan dike, ji ber dûrketina evîndar ji yare, ew qasî tê kirêtkirin û neşêrînkirin, eger gotineke bê hurmettir ji "segî bê wefa û herzago – kelbî nanî nanî" ku bê hurmettirîn kûçik e heba, dê jê re bihata bikaranîn. Gotinên nizim li vir kom bûne, lê nexşeya bêwefayê berevajî kirine û di qorê de hurmet pê komkirine, Nalî guneh dîkin û dilê min û te pê dişewtînin; hêja ye dilê her evîndarekî jî pê bişewte, eger dilê wî ne wekî kêvir be. Ji ber ku bi rastî li şûna wî kûçikî anko segî bi temamî xwe di asta evîndar de daniye, tu dibêjî belkî ne ew e jê re dibêje: "Bo bangî nakey wek segî nanî nanî?"

Gelek caran di şîrên helbestvanan de gotina seg hatiye bikar anîn û gelek bandor li dilan kiriye. Li vê derê jî du nimûneyên din tînim, bi merema berawirdkirinê û derxistina bandora evînê bi wê berawirdkirinê.

şêx Reza dibêje:

*Merbûte heyatim be Silêmanî û xakî  
Xozgem be "segî" qapiyekey Ehmedî Kakî*

Wate:

Jiyana min bi Silêmanî û axa wê ve girêdayî ye  
Xwezî ez kûçikê ber deriya Ehmedî Kakî bama

Helbestvanekî Faris jî dibêje:

استخوان ریزهء مجنون مفرگن پیش هم  
که تعلق به جناب (سگ) لیلی دارد

Di her du qoran de gotina seg nixek daye wateya helbestê. Dibe ku bi gotina "seg" di wî cihê de ew nix peyda dibe, her du seg li ser texta hurmetê hatine danîn û ketine cihê rêz û xoşwîstiyê.

Di qora şêx Reza de Kak Ehmedî şêx ew qasî seg bilind kiriye û ji "hacib"ê sultanekî pitir ritbe jê re peyda kiriye. Di beyta Farisî de jî peyva "cenab" û pileya Leyla û navê Mecnûn û nirxa manewî ya mel (homa) ji Begê Etlis û toka zêrî û heneya dest û piyan zêdetir kûçik xemilandine. Ew her du qor jî nimûneyên wêjeya giranbiha û nemir in.

Pişti famkirina wateya seg di wan her du qoran de ku dibêjê belkî govenda hurmetê jî wan re hatiye gerandin, pitir zelal dibe ku evîna Nalî çî bandor kiriye, heta ku gotina "seg" bikar aniye.

Pêwîst nake, ji bo derxistina tîna evînê di helbestê de xwendevan bi anîna nimûneyan mijûl bikim, çimkî pêdiviya axaftina piştrastkirî bi piştrastkirinê tune ye. Merema min li vê derê evîna bi şewat di şîrên Hacî Qadir de heye yan na?

Li gor zewqa min dîwana Hacî şahidiyê li ser evîneke wisa nade. Yek ji helbestên Hacî yê evîniyê ku herî pêşkeftî û binavûdeng e "Neqqaşî Demî..." ye. Gava tu bixî ber mizîna helsegandina helbestan ji bo pîvana ustadî û sozê, tu dê bibînî ustadî gelekî zêdetir giran e û diçe nav rêzbenda helbestên evîniya şêx Reza ku binavdengtirîn qora wî ev e:

*Karê ke xem û derdî fîraqî be minî kird  
Serma be hetîw ba be dewarî şîrî naka*

Wate:

Karê ku xem û derdê jihev cudabûnê bi min kir

Serma bi sêwî, ba bi konê peritî nake

Xema min ew e, gava ez dibêjim şîra dildariya Hacî zadeya ustadîn e, xwendevan zewqa min bi hakem qebûl neke, di vî warî de min gotibû dibe ku biryara zewqê ji mirovekî bo mirovekî din were guhartin, ji ber ku nîşanek di helbestên Hacî Qadir de tune ye, hebûn yan nebûna evîna kûr li cem Hacî piştrast bike. Gelo Hacî rojekê ji rojan hest bi evîna agirîn kiribe û rê dabe xwe van gotinan li ser evînê bêje?

*Basî zulfî dirêj û çawî be xew*

*Nebirawe buwe . . . . xusrew*

Li vê derê jî Hacî bi aşkere dijî evîndaran rawestiyê ku dibêje:

*Heyfe bo piyawî sahibî temiyîz*

*Hênde basî mekanî . . . . û . . . .*

Mirovê ku di gencayiya xwe de yan jî di her qonaxekî de ji jiyana xwe evîn kiribe û xwînê dilê xwe pê kelandibe, nikare ta wê radeyê bi sivikî li evîndaran binêre û wisa nake.

Ez wisa bawer dikim wateya van helbestan rîya gengeşeyê digrin. Ez nebûna evîna agrîn di dilê Hacî Qadir de wek diyardeyê varê û veder nizanîm di tevahiya wijdana Hacî de. Li gor nêrîna min, eger nebûna wê cura evînê her di çarcoveya "nebûna evînê" de rawestaba û tu peywendiya wê digel hesta Hacî neba, wê gavê min dê gotiba, windabûna bilêseyê evînê hinekî rengê tabloya wî sipî kiriye, her çend e li gor baweriya min nebûna wê bilêseyê riwaleteke nerênî ye, lê bi yekcarî kara û erênîya xwe di tabloya wî de daye pêş û digel binyada riha kurdperweriya Hacî Qadir serencama xwe gihandiye mêjî.

Ez daxwazê dikim li vê derê xwendevan bi min re bêhna xwe vede û giran giran li ser axaftinên min raweste, sivik di ser re derbas nebe, eger rê jî bide min, ez dê hêviyê jê bikim da ew jî wek min ji dil û mêjiyê xwe ve vekolîne û hinekî xwe pê re mijûl bike, eger ez nebêjim bila pê re bijî.

Ez wisa hizir dikim eger Hacî Qadir di destpêka jiyana xwe de wek Nalî û Kurdî hest û hişê wî yên diyar û nediyar ji hezkirinê bihatana dagirtin, piştî ne dikarî derûn û nefîs û canê xwe bi yekcarî ji wê hestê vala bikirana û ji nû ve bi tek hezkirina niştimanperweriyê dagirtibana. Divê ji volqana destpêka jiyana wî û gurahiya gencayetiye kizotek yan jî çirûskeke êgir di qurziêkeke mêjiyê wî de bimana. Dibe ku dildariya dema sinêliyê bi tenê aliyê madî yê heywanî anîbe ber hişê Hacî, ku ew jî paşmaya asayî ya evîna bêreg e û nîşana xortî û sergermiya rola gencayetiye ye, ji ber wê yekê bê minet dijî wê evînê rawestiya û bi çavekî sivik lê nihêrî.

Eger tîrêjêke evîna kevin bi awayekî dînanê ji sihariya gencatiyê ve pîrşîngêk bida hîvara jiyana Hacî, bêguman dê bi curekî din pêşwazî lê bikra, bi çavekî din lê ni-hêrîba, dengêkî din jê re bilind bikira. Em dizanin ku Hacî Qadir dost û hevalên xwe bi bîr nedianîn, bi ser dar û berên Koye de dinalî. Ca eger di tabloya rabihuriya wî de wêneya firîştêya evînê û soza dildariyê heba, tu dibêjî bi vê çesna yekcarî û bê aştbûn, ji dilê xwe de ketiba dijî wê wêneyê? Qet ev nakeve nav hesabekî bi ser û ber.

Nebûna vê wêneyê di tabloya rabihuriya Hacî de ew berhem anî ku wisa bi sadeyî û bê bakraûnd û qurf û sivik navê evînê hilde. Lê di wê astê de nesekînî, tiştêkî girîngtir berhem anî. Tu dibêjî ew çi ye?

Fermo digel min berê xwe bide vê dîmenê ku dikeve hizra min.

Ez wisa bawer dikim, nebûna evîna bi şewat di rabihuriya Hacî de beşdar bûye ku tiştêkî nayê kirin bi asayî were kirin, rê daye ku tevahiya hebûna madî û manewî û riwalîtî û derûnî û xew û şiyariya Hacî yekser li qebela kurdayetiyê were kirin bêyî ku ew bîranîna dildariyê bibe hevpara yekî ji hezarî ya wê bûnê. Her dibêjî Hacî ku di nav xwe de perestgeheke kurdperweriyê bû, car û dil bê leke wek kaxezê sipî radestî xameya çarenivîsê kir. Kurdperweriyê jî bêyî ku reş tîpek yan jî xaleke nivîsandî biçê ser kaxezê, li ser her aliyêke wê kaxezê meşqa xwe kir heta ku rûpel mişt kir û du car û sê car jî bi ser de çû.

Di vê fikrê de em dikarin bi çavekî rastbîn li kurdayetiya Hacî binêrin û têbigihên ku mumkin bû heta wê radeyê şeydayê kurd û Kurdistanê be.

Hacî wek dîn û dîwaneyan behsa kurdayetiyê dike. Di vî warî de ne bi tenê kurdperwer e, wek Mecnûnê Leyla ye, eger rast be û Mecnûnek hebe, ji xwe ve eger nebe jî Hacî Qadir bû Mecnûnê Kurdistanê. Îhsasa ku di şîrên dildariyên Hacî de hest pê nayê kirin, di şîrên Nalî û Kurdî de ta û tînê tînin dilê hestiyar, ji vê zêdetir wek bilêseyê ji şîrên nîştîmanperweriyê radibe û tamara hesta xwendevan geş dike.

Hacî bi şeydane li pey axaftinê digere da ku hinekî bi wê axaftinê kilpeya nav zikê xwe kêmbike, lê nagihê wê axaftinê ku birînê derman bike û hêrsa wî deyne. Di asta bê-oqreyî (necramî) de çi dibêje kêmbike û çi dike bêmfah e. Volqana nefsi dikele û dipijiqe, dişewitîne û qêrînê pê dixê û helbestan pê dihûne, pêşîra dar û keviran pê dide girtin da ku alafa xulyayê jê re tercume bikin.

Na benc (beng) nabe û oxeyê nake, ji ber teqîn û hilrijanê xeyala agirîn dibe ser her babetekê ku dinivîse, tê re ber bi hildana buta kurdî hildikşe heta ku digihê sînora mubalexê, eger wî qasî şeyda û dîwane nebe, cihê wî jî çênabe. "Le gawan û şîwanî kurdekan yek bes e bo leşkerî sed kere dû lek", lê ew bi tenê peyvek e û axaftinê digel meremê dibire, jîlemoya derûnê şil nake, agir û hêrsa daxwaza wî bi-

lindtir dike. Keştiya Nuh li ser çiyayekî Kurdistanê sekinî, ew jî tê wateya ku mir-  
ovafî di qonaxa duyem a vejandina xwe de kurdayetî ye. Ez bi kurdî pesna Per-  
werdgar (Xwedê) didim da ku nebêjin pesna wî bi kurdî nehatiye dayîn, pesindana te  
ji bo xemla kurdî ye, ez bihuştê pê nakirim.

Ez çi qasî bixwazim bi nivîs û şirovekirinê wêneya evîna dilşewat a Hacî Qadir ji  
bo kurdayetiyê çêbikim, ez nagihêmem kembera wê peykera agirîn ku xava Hacî ji ke-  
risteya hest û wîjdanê sitraye, ji ber wê gerek nake ez xwe bi tiştêkî kêr û kurt û li  
berdest mijûl bikim. Ez dê bi tenê wê bêjim ku evîna Hacî ji bo kurdayetiyê di  
derûna wî de evîneke temam û bêhevpar bû. Ez dixwazim bêjim Hacî hemû dil û can  
û hestê xwe ji bo kurdayetiyê bexşîbû û misqalek ji tiştêkî din re nehîşt. Her wisa dil-  
darî bêpar kir ji kilpeya derûna xwe, jin û mal û zarokên wî jî tunebûn ku zerreyeke  
dilê xwe bi wan ve mijûl bike.

Tekane xulyaya Hacî ji bo kurdayetiyê di salên dawî de ji jiyana wî dîmeneke ti-  
rajîk tîne ber çavê serincder ku çend caran hest û peros û teqdîsê ji bo Hacî zêde  
dike. Piştî jiyana dîr û dirêj, divê ez bi erk û jiyana Hacî re aşna û lê rabêmem, gava ez  
li jiyana wî difikirim eger tanûtê nedim ber xwe cur'eta serincdan û lêhûrbûnê bi min  
re peyda nebe.

Kalbûn, tenayî, xerîbî, hejarî, evîna agirîn a bêhêvî û bêyî berhemeke nêzîk û  
berçav, nebihîstina dengê xebat û bizav ji tu aliyê.

Ji xwe re li vê êşa bi ser û bin binêre!

Sexletiya çend salên dîlbûnê li cem Romê, Ebû Fîras Hemedanî heresan û melûl  
kir heta ku gihîşte wê radeyê bi devê xwe bêje:

أُسجنا و بعدا واشتياقا و غربة  
ونأي حبيب ان ذا لعظيم  
و امرد بيقى و فيا لعهد  
على مثل هذا انه لكريم

Wate bi Kurdî:

Zîndanî û dûrketin û birlêkirin û xerîbî  
Û cudabûna yarê, ev giran e  
Kesê ku di rewşeke wiha de li ser soza xwe bimîne  
Guman tune ku ew camêr e

Ew sexletiya Ebû Fîras li gorî êş û azar a dîr û dirêj a Hacî wek diltengiyêke demî  
ye.

*Hacê ku bi xwe re dipeyive û bersivê dide:*

*Bese Hacî dûsed hezar defhe  
Pê m gutî em qisane bê nefhe  
Bawke her çonî to delêy waye  
Têdegem ew qisane xoraye  
Qurî kam cê bikem beser xoma  
Eme lêm bote îlletî sewda*

Li vê derê Hacî wek çolgerekî bi tenê dike û bi tenê di dema nîvro de, di riyeye bê-dawî de ber bi asoyeke xwêyavî ya serabî jîlemoya xîzê (qûm) bi pêngavên şeket bi rê ve diçe, dizane jî rojên umir derbas dibin û şeveke hertimî li pey tê ku tu ronahî wê napişkivîne, kes jî li pey tune ye heta bi wekalet jî çavê xwe bidê yan jî keserekî jê re bikşîne. Deryaya bê eman laşê mirovan li jêr pêlên xwe yên bêrehm dipêçe û bi yekcarî peywendiyê digel cîhanê dibire û hebûnê bi dawî tîne û ji binî ve hildike. Erê yara wî ku Kurdistan e, her dimîne û nayê tunekirin, lê bi qandî meziniya Kurdistanê jî keser û azar ji dilê Hacî derçûn û dest bi jêqutkirina mezin dibe û talbûna li ber mirinê lê taltir dike.

Bêguman rojên dawî ji jiyana Hacî behiyeye gelekî mezin bûn. Her hêviyê ku ji bo mirovan ronahiyê dide rojê di asoya Hacî ya diyar û nediyar de tunebû; hêvî jî tunebû ku tu hêvî dê peyda bibin. Koş û hembêza xêzan û zarokan jî tunebû jêre sermaya şevan germ bikin. Her wek Hemze ku di cengê Ehedê de şehîd ket û tu kesê wî tunebû bi ser de bigrîn. Gava pêxember bihîst xelk bi ser kuştîyên xwe de digrîn, kelê girî dayî û kerem kir: (لكن حمزة لا يواكي له) waye: kesên Hemze tune ne bi ser de bigrîn.

Her wiha gava Hacî jî gihîşte ber mirin û candanê wek Hemze lê hat. Bila bes be ez li ser mirina Hacî axifîm, çimkî îro jî kesên wî tune ne bi ser de bigrîn. Xameya min ku piştî 75 salan wî bi bîr tîne, li pelefîreya meliya rihî (dema candanê) bi çengela nez'eyê şerafetê ji xwe re ji mîrata manewî ya Hacî kom dike. Li ber şewqa şexsiyet û şuhreta Hacî meşqa xwenîşandanê dike. Di nav toz û kulxana şîwenkirinê de ji bo Hacî xudpesendîya xwe vedişêre. Li gor nêrîna min ezaba rojên dawî yên Hacî xeyala mirovê îro dîtîqîne (bizdandin), dibêje ew ezab çi ezab bû.

Lê ji nav vê hemû eş û ezabê rastiyeke mezin tê ber çavê serincdar heta radeyekê jê re aşkere dike Hacî çawa karîbû xwe li hember eziyeta şewatê û kulên bilêseyê û taliya gelek derdên din ên kujer xwe ragre. Kilpeya soz û peros û evîna dil û derûniya Hacî ya ji bo kurd û Kurdistanê êşa tevahiya derdên din di çavê wî de kêmkirin. Wek çawa tu bêjî Hacî mûmek bû û bi agirê sewdaya kurdayetiyê şewitibû, bi wî şewatê jî bandorên felaketa xerîbiyê û pîrî û bêkesî jî nemabûn. Xiwace (Kilîm) Hemedanî bi farsî dibêje:

Wate bi kurdî: Gava masî ji avê dûr dikeve êdî perwaya wî ji êgir namîne. Hacî jî wek wî masiyî û zêdetir ji ber şewata xwe ya mezin ji bo kurdayetiyê tevahiya êşên din ji bîr kiribûn. Hacî wek masiyekî bû ku di nav alafê (pêt) de bibirije û êdî tirs a wî ji bêaviyê nemîne.

Ez dê hinekî di vê behsê de paş ve vegerim û bêjim piştî vê şirovekirina nû şiyana min heye ez biryarê bidim ku Hacî Qadir ji destpêka gencayetiye ve bi sewdayeke dijwar neket ku perdeya dilê wî biçirîne û agir berde nav zik û mêjiyê wî û bişewitîne. Nebûna ji koteya peywendî û girêdana xurt bi dildariyê ve serbestî û azadî ji koteke (qeydûbend) giran ji Hacî re pêk aniye. Ev koteya giran a evînê eger biba alqe bi dor her du zendê destê Hacî ve, hinek ji wê valahiyê dadigirt ku giran a niştimanperweriyê re pêdivî bû.

Xwendevan bi şaşî ji min fam neke, ez nabêjim evîna yarê û kurdayetiyê pêkve di dilekî de nacivin, lê ez dibêjim eger evîna yarê di wî dilî de hebe cihê xwe digre û tê de dibe hevpar, ne koka wê hevpariya du hezkirinan û ne koka tu cura hêja ya hevpariya evînê di dilê Hacî de tune bû, dilê wî hemû bi tenê yê Kurdistanê bû û ji kolanên kurdayetiyê ve dil bo tiştên din çûye.

Nimûneya wek Hacî Qadir ji nayab nayabûr e, ji wî aliyê ve ku jiyana xwe di ber armanckê de borandiye, nemaze ku ew armanc anko merem dinyayî û siyasî be. Dîtin yan jî peydakirina kesên wek Hacî di nav kesên dîrokî û nû de ne mumkin e û ji estem jî estemtir e. Wek Hacî heta radeya cezbegirtinê şeydayê kurd û Kurdistanê be, kesekî din peyda nabe. Dibe ku mirovên pak û dilsoz û xwe dikin qurban werin dîtin, lê şeyda û xwe qebelkirî û dest ji her tiştî berdayiyên wek Hacî, eger bi şaşî neyên dîtin, bi yekcar yekcar yekcar kêr tene dîtin. Bila kes dubarekirina gotina "yekcar" sê caran balkêş nebîne, Faris dibêjin:

سالها می گذرد شنبه به نوروز رسد

Sal diborin, şemî digihêje Newrozê

**Perawêz:**

- 1- Çend rûpel ji bergeha duyem a pertûke Hacî Qadirî Koyî hatine wergirtin.
- 2- Mebest wek şeweyê tîpa elif di zimanê erebî de, ku ew jî stûn e, wiha ye (l). (Wergêr)
- 3- Turiye: Cureyek ji perdeyên qulqulî ye. (Wergêr)
- 4- Xatir xwastin, oxîr. (Wergêr)
- 5- Helbestvanekî ereb e, di cengekî romê û ereban de hatibû dilkirin.
- 6- Apekî pêxember bû, di cengê Ehedê de korûcax hateşku tin. (Wergêr)
- 7- Ev nivîs di sala 1972 da hatiye nivîsandin ku wê demê 75 sal bi ser mirina Hacî de borîbûn.

# Destpêkek bo venasîna Elî Herîrî

Bedran Ehmed Hebîb

Yek ji kêşeyên nivîsên dîroka wêjeya kurdî, kêşeya kêmî yan nebûna zanyariyên rast û belgedar e. Eger kesek bixwaze di barê helbestvan yan rewşenbîrekî sedsala 19mîn de binivîse, ku sedsaleke nêzîkî me ye, kêmترین zanyarî li ser jiyana jîngeha wan şaîr û rewşenbîran bi dest nakevin!

Sedemên vê jî gelek in, her wekî: Destnivîsên zana û rewşenbîrên kurd ta hey-ameke dirêj nehatine parastin. Ji ber paşketin û nexwendewariya civakê piraniya destnivîsên kurdî piştî demekê ji mirina danerên wan bînîrx mane, wînda bûne. Her wiha kêmiya navendên zanyarî li Kurdistanê ji aliyekî ve û necîgîrbûna siyasî ji aliyekî din ve, sedemên din ên windabûna piraniya destnivîs û belgeyan in yan jî belavbûna wan ku careke din nekevin dest.

Ji bilî vê heta niha ji lêkolerên xwemalî, careke tenê jî, kesî hewl nedaye ku xwendineke hûr û gengeşeyeke zanistî li ser deq û tekstê bike, ji bo venasîna ew çaxa ku nûser yan jî wêjeyan tê de jiyaye; ev jî berî her tiştî ji ber kêmpisporiyê ye. Deqa nivîsandî baştirîn belge ye ji bo nasîna kesayetîya nûser yan jî venasîna ew çaxa ku tê de jiyaye. Wek nimûne, heta van salên dawî wiha belav bûbû, şaîrekî wek Nalî, ku di sala 1856ê de koça dawîn kiriye û jidayîkbûna wî jî sala 1800 dihat destnîşankirin, eger wiha be ev camêr tenê 56 salan jiyaye, lê çend helbestên wî amajeyê bi temenê zêdetir ji 70 saliyê didin. Xweşbextane di vê dema dawî de û li gor pertûkeke çapkirî ji serdema Osmanî de derket ku Nalî heta sala 1873yê zindî bû<sup>2</sup>.

.....  
*Ji Kurmanciya Jêrîn: Hozan Robar*

Baş e, eger halê Nalî û Hacî wiha be, ku her du jî di sed sala 19em de jiyane, halê ronakbîrên sed salên pêştir, bo nimûne Elî Herîrî dê çawa be ku çendîn sed sal berî wan jiyane! Va ye yek dibêje, Elî Herîrî di sed sala 11em de jiyaye, ewê dî dibêje, nexêr, sed sala 15em, yê sêyê dibêje, nexêr, sed sala 16em. Yek dibêje, ew xelkê Hekarî ye, yê duyem dibêje, nexêr, Herîrî ye! Yek dibêje, gora wî li bajarokê Herîrê li bakur-rojhilatê Hewlêrê ye, yê duyem dibêje, nexêr, divê li şamê miribe! Û hene gotine Herîrî qet tunebû.

Helbet ez ne pispor û vekolerekî wêjeyî me da ku ez gotinên şarezayane bikim, lê wek xwênerekî wêjeyî yê kevin û dilxwazê nasîna dîroka milletê xwe me. Wek gelek kesên din berdewam berencamên raman û gotûbêjan li ba min durist dibin û ez nikarim wan binivîsim jî, lê vê carê min hewl da hizirên xwe derbarê Elî Herîrî de li boşiyê nedim û pêşkêşî xwêneran bikim, dibe ku bi sîd be. Ez wiha dizanim ku vî helbestvanî jî nav hemû helbestvanên kurdî yê kevin bêhtir pêwîstî bi vekolînekê hûr û bêhndirêjtir heye.

Eger tu rastiye dixwazî, kêşeya Elî Herîrî kêşeyeke mezin e. Ji bilî kêmiya zanariyan derbarê jiyana wî de, heta niha jimareyeke kêr ji berhemên wî gihiştîye ber destê me û têra vekolînekê têr û tesel nakin. Di vî halî de, divê em destxweşiyê li birêzan Ebdilreqîb Yûsîf, Mihemed Elî Qeredaxî bikin, ku çend helbestên vî camêrî vedîtine, bi vê jî zanyariyên li ser Elî Herîrî dane destê vekolera jî bo gihiştina hindêk rastiyan li ser hizir û jiyana wî.

Derbarê kêmiya berhemên Elî Herîrî de, hişê mirov bi asayî ber bi sedemekê ve diçe ku ew jî dûriya serdema ku tê de jiyaye, sed sala 16em yan 15em yan jî hê zêdetir sed sala 11em. Rast e, ji ber mirov çend berev dûrtir biçe, belge û şûnwar û destavêj (delîl) kêmtir dibin, dîrok reşî û tarîtiya xwe bi ser rêçikan de zêdetir dike. Lê di hişê min de sedemeke din jî heye, ku sedemek bû di zû windabûna helbestên Elî Herîrî de; ew jî ev camêr di deverê de helbest bi kurmanciya jorîn nivîsîne û zorbeya xelkê wê navçeyê bi kurmanciya jêrîn diaxivin. Vê yekê derfeta nivîsîn û parastina berhemên wî ji aliyê xwendevanên wê serdemê û piştî wê serdemê ve kêmtir kiriye. Berhemek ku zorbeya xelkê baş têngihên û çêj û tamê jê nebînin nanivîsin jî.

Ev bi giştî wiha ye, helbet pir kêr be jî kesin hebûn ku di şewezarên kurdî yê din de jî şareza bûn û çêja wêjeyî ji hemûyan werdigirt. Niha di vê dema pêşketî de jî ev barûdoxa her wek xwe berdewam e. Bi puxtî, cihê bajarê Herîrî yê li ser sînorê her du şewezarên kurmanciya jêrîn û kurmanciya jorîn, Elî Herîrî kiriye Elî Qurbanî.

Ji bilî vê heta niha deqa helbestên Elî Herîrî bi şeweyekî rast û durist negihîştîye ber destan. Eger mirov bi hûr li wan çend deqên hindik binihêre, jî wî re diyar dibe, cihê tiliyên venivîserê tekstan li piraniya wan diyar e ku ew jî bi ser şewezarê kur-

manciya jêrîn (soranî) de bûne. Her vê cihê tiliyan jî baweriyek li ba hindê kesan peyda kir ku hikariya şêwezarê kurmançiya jêrîn li ser zimanê helbestên Elî Herîrî di bingehê de hebûye, lê berevajî vê doxê (halet) jî heye; deqin hene hikariya devokê Badînanî tê de tê dîtin. Her wek min got eva hanê hikara karê venivîseran e.

Bi dîtina min, Elî Herîrî bi şêwezarekî helbestên xwe nivîsîne ku mazmazka wan kurmançiya jorîn e û di helbestên wî de eva hanê bi temamî ron e. Her wiha hindê hikariya axaftina kurmançiya jêrîn jî di helbestên wî de tê dîtin, ku ev jî di binaxeyê de hebûye û reng e destkariya Elî Herîrî bi xwe be. Em ê paşê belgeyên vê yekê aşkere bikin.

Barûdoxeke din ya balkêş heye ku rola wê di neparastina berhemên Elî Herîrî hebûye, ew jî ku heta niha tu berhemên Elî Herîrî bi rêka bakurê Kurdistanê negihîştine destê me. Rojhilatnasan tenê berhemên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî ji nav kurdên bakur berhev kirin; qet berhemên Elî Herîrî yê rasteqîne bi dest wan neketin, meger beşek helbest bi şaşî ketibin dest yan wan hindê pêzanînen çewt derbarê jiyana wî de tomar kiribin. Vê doxê wiha kir ku hindê kes bigihêjine berencamekê ku Elî Herîrî di deverên herêma bakurê Kurdistanê de kêmbihête nasîn, lewma derfet nebû ku helbestên wî dest bi dest li nav xwendevanên bakur bigerin û bêne hilanîn. Li gor wê baweriyê, di serdemên berê de ji bo gel pêwîstiya nêzîkahiya cografîk hebû da ku berhemên Elî Herîrî bihatina parastin.

Lê bi berevajî vê ray û boçûnê, Ehmedê Xanî di sedsala 17em de (1650-1706) û li bajarê Bazîdê li devera Hekarî, Elî Herîrî wekî şairê mezin yê berî xwe daye nasîn û di nav Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de rêz kiriye:

Bînavê riha Melê Cizîrî  
Pê hey bikira 'Elî Herîrî  
Keyfek we bida Feqiyê Teyran  
Heta bi ebed bimaye heyran

Her kîjan ji wan rast be jî, çî Elî Herîrî di nav kurdên bakur de bi navûdeng bûbe yan na, derbasbûna serdemên dirêj û necîgîrbûna civakî di Kurdistanê de, roleke mezin di nemana şop û zanyariyan derbarê berhem û jîn û jîngeha vî şairê de listiye. Heta yê Ehmedê Xanî bi xwe jî, Mem û Zîn û Nûbarê jê derxe, hejmareke kêmbihête berhemên wî gihîştîye ber destan. Di vî alî de halê Xanî ji halê Herîrî xweştir nîn e. Bi giştî em dikarin bêjin beşê mezin ji parastina wêjeya kurdî ya kevin vedigere rêkeft (tesaduf) û lêrasthatinê, ne jîrî û jêhatiya civaka kurdewarî.

Di nav kurdan de Hacî Qadirî Koyî duyemîn kes e ku piştî Ehmedê Xanî navê Elî Herîrî hildaye. Hacî, bi kurtî û bi puxtî gotiye ku Elî Herîrî xelkê ku ye! Divê ji zû vê vê belgeyê têrê bikira ji bo qutkirina galegala li ser war û welatê Elî Herîrî:

Dû 'Elîn şa'îr in weku Hesân  
Berdeşan û Herîr e meskeniyan

Ew dîtînen ku li pey cihê Elî Herîrî dikevin û li bakurê Kurdistanê li cihekî bi navê Herîr digerin, xwe dispêrin wê çavkaniyê ku helbestên Elî Herîrî bi şêwezarekî hatine nivîsandin ku zaf dûr e ji axaftina niha ya devera Herîr. Ji xwendina wan çend helbestên ku di destê me de ne, wekî me berê jî got ron aşkere ye ku Elî Herîr bi şêwezare kurmanciya jorîn yê deverên bakurê Kurdistanê helbestên xwe nivîsîne ne bi axaftina devera Behdînana başûrê Kurdistanê. Vê rastiyê jî pirsyarek li ba gelek kesan derxistiyê ku dibêje: Aya Elî Herîrî bi xwe û binemala xwe di binaxeyê de xelkê bakur bûn û wan koç kiriye bo vî cihî? Yan jî ew bi xwe bi ser kurmanciya jêrîn (sorani) de bûye û di wê demê de li wî cihî zimanê wêjeyê kurmanciya jorîn şêwezare Botanî bûye û Elî Herîrî jî helbestên xwe bi wî şêwezari nivîsîne. Di vê barê de mînak Mewlewî heye; bi belgeyan ron dibe ku devera wî wekî axaftin sorani bûye, lê wî bi xwe bi şêwezare gorani helbestên xwe nivîsîne, ji ber ku di serdema Mewlewî de şêwezare gorani zimanê wêjeyê bû. Hindek kes jî dibêjin gelo xelkê devera Herîr di wê demê de bi kurmanciya jorîn nepeyivibe! Ev ray û boçûn hemû hêjayî xwendin û lêrawestaneke ne, lê divê kîjan nêzîktir be ji rastiyê! Em ê bi wan de biçin heta bigihin serî.

De em vegerin cem Hacî Qadir. Her di wê helbestê de ku bi " şahsiwarî Belaxatî Kurdan (şengesiwarê Rewanbêjiya Kurdan)" dest pê dike, berî bigihe behsa Elî Herîrî û Elî Berdeşanî, di cihekî din de jî amajeyê sivik bi Elî Herîrî dide, ew jî di warê navhildana Melayê Cizîrî de:

Le Cizîre yekêke şêx Ehmed  
Sahêbî naw û murşîdî erşed  
Ewî camî gotûwiyetî eme ye  
"Pîrmerdî bidîdê"em 'z Cezîr  
Nîkmerdî bidîdê"em 'z Herîr"

Wateya movikên farisî yên dawî ev e:

Min pîremêrek dît li Cizîrê  
Min camêrek dît li Herîrê

Helbet Hacî Qadir di vê helbestê de ji bo nîşandana mezinahiya şêx Ehmedê Cizîrî, ku wekî Melayê Cizîrî tê nasîn, amajeyê bi movikeke helbesta Camî dike. Nûridîn Ebdilrehman Camî yek ji şaîr û rewşenbîrên mezin yên faris e di sedsala 15em de (1413 – 1492z). Tê zanîn ku Camî sala 1473 çûye hecê. Geştê ji Xoresanê dest pê kiriye û di rêka Hemedan û Kurdistanê re çûye Bexda, Kerbela û Necefê û di

wir re gihîştîye welatê Hîcazê û ji wir ve ber bi şam û Helebê ve hatiye û paşê di rêya Kurdistanê re çûye Tebrîzê. Wek dibêjin Camî 45 rojan li şamê maye û li cihên din jî wek Heleb û Bexdayê gelek rojan maye, zana û rewşenbîrên wê demê serdana wî kirine û diyarî jê re birine û li dorê civiyane û bi wî re li hev rûniştine. Kesên mezin di desthilatê de li her derê rûmeta wî girtine û mazûbaniya wî kirine. Di vê geşta Camî de 300 siwar ligel bûn ji bo xizmet û parastina wî.

Li gorî dîtin û boçûnên Hacî Qadir, Melayê Cizîrî yek ji wan kesan e ku Camî li Cizîrê dîtîye. Cizîr gelek ne dûr e ji Helebê; dibe ku Mela yek ji rewşenbîran be ku li Helebê serdana Camî kiribe yan jî Camî bi xwe di wê geşt û gera xwe di bajarê Cizîrê re derbas bûbe?

Boçûna Aladdîn Secadî di dîroka wêjeya kurdî de, zêdetir bi wî alf de diçe ku Camî çube Cizîrê. Her li gorî boçûna Secadî, Camî di Herîrê re jî derbaz bûye û kesê li wir rastê hatî Elî Herîrî ye. Ev ray û boçûn bi dîtina min cihê balkêşiyê ye û temam rast e û di cih de ye. Hacî jî reng e bi zanebûn diyar nekiribe ew mîrxasê Herîrê kî ye, çunku her bi xwe piştî çend babetan vedigere ser Elî Herîrî û qala wî dike; diyar e wî ev pirs ji têgihîştina xwendevanan re hiştîye. Li gorî gotinên mamoste Secadî, Camî di Hewlêrê re derbas bûye. Diyar e Herîr jî navendeke desthilata wê serdemê bûye û mîrên Soran tê de desthilata xwe gêraye û ne dûr e Camî li Herîrê hêwirîbe û mîrên Soran rûmeta wî girtibin ku wê demê şah Elî Beg şahê Herîrê bû. Ev şah Elî Beg bavê mîrê bi nav û deng Mîr Seydî ye ku em dê ji niha şûn de jê bipeyivin.

Hacî ne ew kes e ku ji ber xwe ve û bêbelge biaxive. Dibe ku ev têgihîştina bi vî rengî ji helbestên Camî li ser zarê xelkê mabe û Hacî jî ji kesine din bihîstibe. Xuya ye Hacî Qadir çî di bajarê xwe de (Koye) û çî li devera Balekayetî û çî li devera Mukiryan ku ders tê de xwendibû û bi salan lê mabû, hevalbendê zana û rewşenbîrê serdema xwe bûye. Paşê jî li Stenbolê ku ev helbest tê de nivîsane (wate "şahsiwarî Belaxetî Kurdan") wî digel rewşenbîrên her devereke Kurdistanê pêwendî hebûye û ji her derê zanyarî wergirtine, lewma nabe em gotinên Hacî bi gotinên bêbingeh û bêbelge binasînin û piştî xwe pê girênedin.

Dema Camî ev yek gotiye, temenê wî nêzî 60 salî bûye. Ê li gorî wê jî temenê Melayê Cizîrî jî - ku pîremêrek bû - divê li dora 70 salî yan zêdetir be. Ew camêrê Herîrê jî li derdorê 30 salî bûbe ku têra wê yekê kiribe di têgihîştin û hişmendiyê de ta radeyekê şaîrekî wek Camî bi wî hijmekar û sersam bibe û piştî di helbestên xwe de navê wî hilde. Guman tê de nîn e ku Melayê Cizîrî arif û mutesewifekî baladest yê serdema xwe bûye. Bi heman rengî jî, ew çend helbestên kêr yên Elî Herîrî ku gihîştine destan jîrî û jêhatiya Herîrî di helbest û hizir de nîşan didin.

Li gorî vê danberhevê û berencaman, divê Elî Herîrî li dor sala 1440î, pêştir-paştir

bi çend salan, ji dayîk bûbe û hevdemê fermanrewayiya şah Elî Beg û kurên wî be ku serdema vegeşbûna Mîrîtiya Soran ji wir ve dest pê dibe. Li gorî dîroka mîrên Soran ya Husên Huznî Mukiryânî, şah Elî Beg di jiyana xwe de birêvebirina mîrnişînê bi ser her sê kurdên xwe de dabeş kiriye. Piştî mirina wî jî kurên wî yek li pey yekî li şûna bavê xwe de desthilat bi rê ve birine. Mîr Seyd Elî yan wek di nav xelkê de dihat nasîn Mîr Seydî, sêyem û birayê dawiyê bûye ku desthilata Soran bi dest xwe de girtibû. Ew mîr bi mîrxasî û camêriyê dihat nasîn û di nav xelkê de dihat hezkirin û ciyê mitmane û baweriyê bûye. Her wiha di serdema Mîr Seydî de devera Soran di aramiyê de jiyaye û gelek pêşketin bi xwe ve aniye û jiyana di hemû waran de hatiye vejandin. Vî mîrî girîngî daye xwendin û binkeyên ayînê daye û zana û rewşenbîr li xwe kom kirine.

Desthilata Mîr Seydî heta dema şerê Çaldêranê û piştê jî berdewam kiriye. Ew bû yê di şerê 1514ê digel Osmanîyan serkeftin bi dest xist û Sefewî şikênandin. Mîrên kurdan her yekî di herêma xwe de êriş birin ser bingehên desthilata Sefewî û ala Dewleta Osmanî bilind kirin. Mîr Seydî jî ji aliyê xwe ve, Hewlêr, Kerkûk û Mûsilê digire ku ew hemû dever di bin kontrola Sefewîyan de bûn. Diyar e, ji ber cudahiya mezhebî kêfa kurdan ji Sefewîyan re nedihat, ji wê zilm û zora Qizilbaşan pê ve (bi wateya xwediyên kumên sor) ku di dîrokê de zaf qala wê hatiye kirin.

Mîr Seydî di sala 1516ê de serxwebûna xwe ragihand û dewleta Sefewî jî ev yek qebûl kir ku bi mercekê ku li dijî wan digel tu kesî peymanê daneyne û harîkariya neyarên wan neke. Vî mîrî heta sala 1525ê desthilat gêraye û di wê serdemê de miriye.

Piştî şerê Çaldêranê, mîrên Kurdîstana naverast û başûr bi azadî û serbixwe jiyana. Mîrnişînên kurdî her yek bi şeweyekî şeklî ser bi dewleta Osmanî ve bûn; ew bi serfirazî rabûn û rûniştine û pêwendî bi wan ve kirine. Piştê Sultan Silêmanê Qanûnî di sala 1534ê de Bexda dagir kir, di Hewlêrê re veqerîya Stenbolê û di rêya xwe de devera Soran jî dagir kir. Di Hewlêrê de Mîr Îzedîn şerê Mîrê Soran kuşt, ku kurê Mîr Seydî bû, çima ku wî pêwendî digel şahê Sefewî daniye. Sultan Silêman her bi wê yekê tenê ranwestiya û mîrê Soran kuşt, tew fermanrewayî û hikumdariya Hewlêrê ji dest wê malbatê stand û daye Husên Begê Êzîdî û Herîr jî xist ser Hewlêrê anku bin destê mîrê Êzîdîyan. Ji ber Sefewîyan berê ji Êzîdîyan kuştibûn, Sultanê Osmanî bawerîya xwe pê anî, bi wê hêviyê ku ew pêwendiyê digel şahê Sefewî daneynin.

Ew gotin gelek di cihê xwe de ye ku dibêje mîrên kurdan di navbera desthilata Îran û Osmanîyan de bi şeweyekî keysperestane jiyane. Helbet ev jî ji bo wê armançê bûye da ku di navbera wan de azadiya xwe misoger û desteber bikin. Eger tu rastiyê jî dixwazî piştî şerê Çaldêranê sepandina desthilata Osmanî li wan deverên nû ku mîrnişînên kurdan ji zilm û stema Sefewî rizgar bûbûn, her neçûye serî.

Mîrmişînên kurdan bi rûwalefî û şeklî ketibûn bin destê dagirkerê nû ku ew jî Osmanî bûn, an na bi kêfa xwe karûbarên xwe bi rê ve dibirin û ferman ji tu kesî wernedigirtin. Bi taybetî mîrên Soran guh nedidan bi çi kesî çi Sefewî û çi Osmanî. Ev, ew serdem e ku Hacî Qadirê Koyî di helbestên xwe de qal dikir û digot: "Kwa ew demey ke kurdan azad û serbexo bûn!"

Wek me got Elî Herîrî di serdema geşbûna yekem ya desthilata mîrîtiyên Soran de jiyaye, wate di serdema şah Elî Beg û kurên wî de, ku divê digel vê geşbûna siyasî de, şîr, wêje û avedanî jî geş bûbe û pêş ketibe û di hemû waran de xelkê xwe li vê wargeha avadaniyê girtibe. Wiha diyar e, şêx Elî jî bi camêrî û nandehî û ayînperweriya Mîr Seydî kêfxweş û hijmekar bûye û helbest ji bo wî gotine û pesna wî daye:

Dilê mehzûn kifaret bît<sup>3</sup>  
Ke îmşeb taze mîhman têt  
Bi mizgînî bişaret bît  
Ke mîhman canê canan têt

Ke mîhman canê canan e  
Li ser çeşmê me mîhman e  
Bi mala cumleyê xan e  
Ke şahê cumleyê xan têt

Were ey şahîdê şîrîn  
Ji 'îşqa te dil êxsîr î  
Bi can menzilgehê mîr î  
Telebkar in ke sultan têt

Heta digihêje ewê ku dibêje:

Bi firyad û bi hawar e  
Ji dest ahan min ew kar e  
Me lazim bendeyê jar e  
Ji Seydiyê çi ferman têt

Seydî heq nezer vêra  
Te îqlîman 'elem gêra  
Qetara gewheran vêra  
Ji niv kana bedexşan têt

Hildana navê Mîrê Seydî 2 caran di vê helbestê de, belge ye ku Elî Herîrî hevçerxê wî bûye û di wê demê de jiyaye. Ev helbest serdanpê jiyana vî mîrî ye û behsa jiyana û rewşa wê serdemê dike. Wek me di serî de jî got, eger bi hûrbînî li deqa nivîsê bihata temaşekirin û digel jiyana civakî bi rêbazeke vekolînê di dîroka wêjeya kurdî de bihata beranberkirin, dê ji zû de ew mij û dûmana li ser jiyana û jîngeha Elî Herîrî rabûya û şêx Elî jî dê bayex û cihê xwe yê hêja werbigirta. Wek nimûne ku dibêje:

Xerca Îsfehan dîsa  
Ji xwacan xalî man kîsa

Li vir xuya ye ku behsa zilm û şêlandina xelkê û bac wergirtina Qizilbaşan dike. Diyar e ew gihiştîye radeyekê ku wan kîsê (tûrê) Xoca Elî jî vala kiriye.

Pirseke din jî heye bala wan kesan nakişîne, ku ji Elî Herîrî dipeyivin, ew rêzika helbesta Hacî Qadir ya bi navûdeng e ku navê Elî Herîrî û Elî Berdeşanî bi hev re hildaye û bi şairê serdema cahiltiyê û destpêka peydabûna îslamê Hesana Kurê Sabît şibandiye.

Tê zanîn ku Hesana di serdema berî îslamê de ji dayîk bûye û heta sala koçî 54ê jiyaye. Di dîroka wêjeya erebî de wekî şairê serbilindî û pesin û pesindanê û giregir û mîrê serdema xwe hatiye nasîn. Dîroknasekî ereb dibêje: Dema mirov bi xwe şanaziya Hesana Kurê Sabît dixwîne pê dihesse ku ew şanaziya wî ji dil û can ve dertê. Şair bi çavekî mezin li xwe nêriye û bi kêrç û tinaz li dijmin û neyarên xwe nêriye û bi halanhildanê ser û guhê wan biriye:

لساني وسيفي صارمان كلاهما  
ويبلغ ما لا يبلغ السيف مذودي

Wate:

Zimanê min û şûrê min her du tûj in  
Zimanê min bo berevaniyê digihê wî cihê şûrê min nagihê

Hesana Kurê Sabît di serdema îslamî de şairekî rûmetgiran bûye û bi helbestvanê pêxemberiyê dihate nasîn. Wî pesna pêxemberê îslamê daye û berevaniya ola îslamî kiriye û êriş biriye ser neyarên îslamê Qureşîyan.

Ev pênase bi temamî li Elî Heriyê me jî têt. Eger mirov wan çend deqên kêma Herîrî bixwîne, digihe wê encamê ku danberheva Hacî Qadir û şebandina şairê me bi Hesana Kurê Sabit gelek di cih de ye; her wiha derbarê Elî Berdeşanî jî heman tişt. Ew helbesta wî ya li ser Awrehmanê Paşayê Baban jî gelek bi nav û deng e. Elî Berdeşanî bi vê helbesta navdar ya bo pesna Awrehmanê Paşa û azayctî û mêrxasiya

wî, bîranîna xwe di bîreweriya milletê xwe de heta hetayê nemir kiriye. Em ê paşê vegerin ser Elî Berdeşanî û qala wê helbesta mêjûyî bikin. Lê niha em ê careke din vegerin ser behsa Elî Herîrî û derxistina berencamên gengeşeya me.

Wekî me got, divê Elî Herîrî li derdora sala 1440î hatibe dinyayê. Li gorî vê yekê, di sala 1473yê de ku Mewlena Camî di Hewlêr û Herîrê re derbas bûye, Elî Herîrî xwendevan û şareza bû û li civata vî rewşenbîrê mezin yanî Camî amade bûye. Ew di serdema geşbûn û pêşveçûna mîrîtiyên Soran de, mirovêkî rewşenbîr û maqûl bûye ku bi tiliyan dihate nîşandan. Di rapêrîna xelkê Kurdistanê de û di serûbendê şerê Çaldêran û Tafî di dema fermanrewayiya Mîr Sedî de ew hîn zîndî bûye. Divê ku di wê demê de êdî pîr bûbe û temenê wî 70ê salî derbas kiribe. Ev yek jî gelek nêzî rastiyê ye, ji ber ku di defter û destnivîsan de navê wî bi şêx Elî hatiye û wî bi xwe jî di hindê helbestan de navê şêx Elî bi kar aniye.

Ev ên li xwarê çend malik ji helbestên Elî Herîrî ne:

Dilê mehzûn kîfaret bît  
Ke îmşeb taze mîhman têt  
Bi mizgînî bişaret bît  
Ke mîhman canê canan têt.

Ke mîhman canê canan e  
Li ser çeşmê me mîhman e  
Bi mala cumleyî xan e  
Ke şahê cumleyê xan têt.

Were ey şahîdê şîrîn  
Ji 'îşqa te dil êxsîr î  
Bi can menzilgehê mîr î  
Telebkar in ke sultan têt.

Telebkar î dilara î  
Me dêm yar î boy şa î  
Le bejna 'er'erîn daîm  
Siyeh mar lê bi cewlan têt.

Siyeh maran kire seyran  
Ku xas û 'am bûbûn heyran  
Li cotê şubhetê ceyran  
Li ceyran 'enber eîşan têt.

Dû zîlfêt 'enber efşan in  
Dû le'lêt şekeristan in  
'Eqîq û dur û mercan in  
Li hewzan abê heywan têt.

'Ecêb birke mirarî têt  
Li sedê qewsê tarî têt  
Siyeh pencîn xumarî têt  
Ji mexmûran dû eslan têt.

Ji mexmûran tu mexmor î  
Bi cê hişt 'eqreba jorî  
Tewafa beytê me'orî  
Li burcan xwîn bi seyran têt.

'Eqarb hat û bêhed hat  
Li wê bircê zeberced hat  
Vebala qewsê eswed hat  
Li teleb mahê taban têt.

Li heyva kewçerîn kamil  
Ve ehlan ra nehêştin dîl  
We cumle da sefên sunbul  
Li hindavê gulistan têt.

Gulistana xweda rist e  
Li çar etraf dilan xweste  
Binefş û nêrgiza mest e  
Cinesrê le'l û reyhan têt.

Reyahîn sewsen û werd in  
Weristê ehmer û zerd in  
Li şêx 'Eliyê xerîb ferd in  
Hero sed car d'efxan têt.

Ji efxanan nemayîm têt  
Bibîne şer dû esleh dêr  
Du'agoyê tu ez bê vêt  
Hetta vî qasidê can têt.

Bibîne rû şemalînê  
Were hindavê balînê  
Ji dest ahan û nalînê  
Çi reng feryad ji 'esman têt.

Bi firyad û bi hawar e  
Ji dest ahan min ew kar e  
Milazim bendeyê jar e  
Ji Seydiyê çi ferman têt.

Seydî heq nezer vêra  
Te îqlîman 'elem gêra  
Qetara gewheran vêra  
Ji nîv kana bedexşan têt.

Bedexşanan ku gewher da  
Bi qentar nextiyan zer da  
Delalet dînê ekber da  
Ji îqlîmê hîndistan têt.

Xerac kir kîşwerê hîndî  
Li keşmîr çavreşê cîndî  
Li mehbûsa Semerqendî  
Hizar reng tuhfeşê îhsan têt.

Hizar reng tuhfeşê nadir  
Her sal ji nû bikin hazir  
.....  
Ji Tebrîz û Xurasan têt

Xeraca Îsfehan dîsa  
Ji xwacan xalî man kîse  
Ji bo şuxak û bilvîse  
Qumaşê kez bi tûman têt.

Qumaşê kez bi sed zêrî  
Li ber bejna perî çêhrî  
Xeber çû hakimê jêrî  
Li rê û bar bi seyran têt.

Dûr e dêhan Herîr qewm e  
Ji zîv û zêr kire kome  
Xeber çû hakimê Rome  
Yekî xerciya wan têt.

Emrê wî hat ji xundkarî  
Li Romî hukmê kir carî  
Xuda cazengiyarî  
Li misriyêd mitawan têt.

Li Heleb şûşeyê dend têt  
Tigel aba ferehmend têt  
.....  
Li bo şahî di şahan têt.

Herîrî ger çe heyran e  
Li medhê te şeş eziman e  
Du'ago û senaxwan e  
Hetta vî qasdê can têt.

Tu şah î cumleyê şah î  
Bi heqê îsmê ullahî  
Nekî men'em li dergahî  
Ku ew mecnûnê asan têt.

\*\*\*

Heçî şêx û mirîdan go<sup>4</sup>  
Dibêjim qet we nakim ez  
Eger ruh-im<sup>5</sup> dikin xaret  
Ji badê tobe nakim ez.

Bila saqî meyê bînî  
Binoşim ez we yaran ra  
Di kerbê cumlê salosan  
Derê kûpan rewan kim ez.

Heçî şemlek li ser pêça  
Laçik û lifke lê berda

Eger singê di xo rake  
Dibê sahb sîwakum ez.

Mekin bawer bi serkeskan  
Eger şaşî li nûrê bî  
Digel kizbê dibit kafir  
Dibêjî eslê pak im ez.

Bi serkeskan mekin bawer  
Di cehlê da dibin kafir  
Dibê ez şêxê Sen'an im  
Bi carek qutbê çak im ez.

Heçî serkeskê dibên  
Hûn bi siwadî serê jake  
Eger waris dîkin de'wa  
Cewabê dê edakim ez.

Ewê şîrê seqa kirdî  
Li dest digirim li meydanê  
Bi serkeskan dicerbînim  
'Elî jêk dî xezakem ez.

\*\*\*

Dîsan ji nû 'îşqa berê <sup>6</sup>  
Pir enderûn im ateş e  
Zilfa mizeyîn 'enber î  
De'wa tigel xala reş e.

Xala li dêmê dilrev e  
Sed ruh û can-im bin fîda  
Sotim gelo çûm tê nema  
Terkim kirin 'eql û heş e.

'Eql û heş-im bûn esîr  
Dinya ku gehgeh tête bîr  
Dêm şibhetê bedra munîr  
Zilfa ji werdê bîn xweş e.

Werdan ji nîv zilfan derîn  
şu'la binefşê tê werîn  
Bala û qedda 'er'erîn  
Hejriyan li ser marê reş e.

Dîsan ku hey têt û tiçît  
Ehyayê emwatan tibît  
Wechan mudam nûr jê tiçît  
Dêm şibhetê şem'a geş e.

şem'a şebistanan ew e  
Werda gulistanan ew e  
Serteyê bistanan ew e  
şoxa Herîrê dilgeş e.

'Ecêb letîf û cindî ye  
Ezman nizan û romî ye  
Ageh ji 'şqbazan niyeş  
Mest û xumar û serxweş e.

Serxweşa camê şerbetê  
Dêm şibhê şem'a zilmêtê  
Horiya tibaxê cennetê  
Serdarê çendên mehweş e.

Mehweş ku westan sef bi sef  
Ew hate der misrî tikef  
Wan got 'eliyo la tixef  
Me pemrinê qewî xweş e

\*\*\*

Ger win bibînin narê 'îşq<sup>7</sup>  
Tên û li bo'm zarî dikin  
Her kes bizane halê 'îşq  
Bexîl û dişwarî dikin.

Bi halê 'îşq bexîl dibin  
Her dem bi dem zelîl dibin

Bê rah û bê delîl dibin  
Her kesê xemxwarî dikin.

Hun bar bikin xemê di zor  
Li hesreta werdê di sor  
Çawê di reş biskê li jor  
Henî ji ber tarî dikin.

Henî şerîf zilf tîn li ser  
Rengîn dibin şems û qemer  
Reşmar li cismê têne der  
Ji 'er'eran yarî dikin.

Xweş 'er'er û şîmşad e qed  
Memsoje dil dest bi kebed  
Dad û meded dad û meded  
Çawan çe xumarî dikin.

Cotî xumar ez bûm hedef  
Tefsîr dikin sun'ê sedef  
Roja 'emel her çar teref  
Bi mîskê tatarî dikin.

Biskê li rojê kirine kom  
Camê meyî hîna li bo'm  
Ewî fikir lazim vexom  
Mestî ji min carî dikin.

Mestê şerabê qend le bîm  
Esîrê badê wê şebîm  
Ger wesfê hendê ez bibîm  
Hun terkê hoşyarî dikin.

Hoşim çûwîn mayim bê hoş  
Herdem bi dem lew tême coş  
Mîran qewî zewq û xiroş  
Pîşeyê xundkarî dikin.

Pîşeyê wan dan û kerem  
Mezîdê 'îşqê dem bi dem  
Xidmet dîkin kurd û 'ecem  
Bi neqşê cebbarî dîkin.

Neqş û nîgarê naqşan  
Sefê dîwanê çawşan  
Hey hey li cotê padşan  
'Ece bi çi serdarî dîkin.

Serdarê şahê rewneqan  
Mu'cîzê remzê ebleqan  
'Eliyo mebêj ehmeqan  
Bazarê înkârî dîkin.

\*\*\*

Mehbûbê destê 'aşîq,<sup>8</sup>  
Sultan Mihemed Mistefa  
Me'şûqê 'îşqê 'aşîq,  
Sultan Mihemed Mistefa  
'aşîq li dînê ekber,  
.....

Nazik siwarê mehşerî,  
Sultan Mihemed Mistefa  
Roja hisêb û wehşetê,  
Qed kesî çavê hilnetê  
Beste dihîne ruxsetê,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Beste di heq daxwaz dika,  
Ez 'îşqê ew perwaz dika  
Geh geh niyazgeh naz dika,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Nazdarê heyî qadir e,  
Tehqîq nebî axir e

Ke wî kemalatî bire,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Heddê kemalî qenc bidîd,  
Zidê betalî qenc bidîd  
Hubbê wîsalî qenc bidîd,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Zan-it xo nuhê çî lê hat,  
Lew bû li tofanê necat  
Dayim li dil qed dernehat,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Narê xelîlê kir digar,  
Lew bû em mêrg û mêrxuzar  
Dayim di dil girtibû qerar,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Yûsif biran avête bîr,  
Lew birde Misrê kirde mîr  
Her bûd lîsan û zemîr  
Sultan Mihemed Mistefa.

Yûsif ku masî xwar û çû,  
Lew hate der salim gelo  
Dayim di dil ew çipe digo,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Xelqo yeqîn e ew xeber  
Behra Mûsay lew bû be ker  
Dayim li dil qet nate der  
Sultan Mihemed Mistefa.

Dil paşî heqê ew kafî,  
Dermanê derdê şafî  
Cumle bi nûrê safî,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Nûrê erzê eflakt in,  
Drefê ew lew la kitin

Nebî ji eslê pakt in,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Bi bê wefa kirdiye neseq,  
Wêre ji hem dersan sebeq  
Her çi kesê nasiye bi heq,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Her çi kesê yarê wî ye,  
Widad li rariyê wî ye  
Bawik tikadarê wî ye,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Bawik yeqîn fîraşê tu,  
Xweş yar û xweş eldaşê tu  
Ruhê 'Elî şabaşê tu,  
Sultan Mihemed Mistefa.

Pirske din, ku me berê amaje pê da, ew e gelo eger Elî Herîrî bi şêwezarê kur-  
manciya jorîn helbest nivîsine, çawa gihîştîye Herîrê ku akinciyên wê bi şêwezarê  
kurmanciya jêrîn diaxivin? Her çend bandora kurmanciya jorîn li ser axaftina xelkê  
Herîrê ji ber nêzîkbûn û têkeliyên wan diyar e, lê axaftina wan ji kurmanciya jêrîn ve  
nêzîktir e. Zêdebarî wê yekê ew kurmanciya ku Elî Herîrî helbestên xwe pê nivîsine  
ne wek kurmanciya devera Behdînan. Ew dever her çend heta biniyê Herîrê dirêj  
bûye, lê em nikarin bêjin Elî Herîrî Behdînî bû, ji ber şêweyê nivîsa wê ciyawaz e.

Ji aliyê min ve bersiva vê pirsê ne gelek dijwar e, berê li nav Kurdistanê de koç û  
gera xelkê û veguhastina wan ji herêmeke heta ya din pir normal bû. Gelek sedemên  
wan koçan hebûn, her wekî nangiranî, kêşeyên di nav eşîr û êlan de yan hatina fer-  
manan bi ser hinek malbatan de. Mîr û serokên êlên kurdan jî her dem ew hewandine  
û li wan bûne xwedî. Bi taybetî ev deverên Rewandîz, Herîr û şeqlawe çeperek bû ji  
bo ew ên ji bakur ve ber bi xwarê hatine. Hetta diyar nîn e aya binemala mîrên Soran  
bi xwe jî ji ku ve hatine, ji bakur yan jî ji rojhilatê Kurdistanê! Serbarî wê çendê ku  
gotinên bê serûber derbarê bav û bapîrê mîrên Soran de gelek in; wek dibêjin koka  
bapîrê wan yê mezin ereb bûye. Li ba min bi tu awayî rê tê re naçe ku erebekî pêx-  
was ji Bexda bê û li Kurdistanê desthilateke weha peyda bike û bikaribe mîrîtiyê  
bike.

Li ser hatina kurdên bakur bo akincîbûnê di devera Soran de, çend nimûneyên  
berçav di mêjûyê de hene. Ya diyartirîn piştî şikestina şoreşa şêx Êbêdîllah Nehrî di

sala 1881ê de, beşek ji paşmaya şoreşgerên wê şoreşê hatine wê deverê û heta niha jî mane; ji van re dibêjin mihacir. Her wiha beşek ji akinciyên Berdereş û gundên dora wê, ku 65 kilometir li bakur-rojavayê Hewlêrê ye, xwe bi Botanî didin nasîn.

Sebarek pirsar Elî Herîrî, reng e çîroka hatina binemala wî jî bo Herîrê, cureyek be ji serpêhatiyên ku di dirêjîya dîrokê de li Kurdistanê rû dabîn. Ne dûr e jî bavê wî melayek be û hatibe li vî bajarî melatî kiribe yan jî yek ji mîrên Soran, wek şah Elî Beg, bavê Elî Herîrî anîbe bo Herîrê. Wek tê zanîn di wan serdeman de mîr û began mela û zana û rewşenbîr li dora xwe kom dikirin.

Em ê veşerin ser wê yekê, eger Elî Herîrî yan bavê wî ji cihekî din hatibe Herîrê, çira navê cihekê xwe yê kevnar nekiriye bernavkê xwe her wekî ku li ba kurdan li kar e!

Wek em dibînin xelkê kurdewarî zêdetir şanaziyê bi war û welatê xwe yê berê dikin ne bi warê nû. Li ba min Elî Herîrî çî li Herîrê ji dayîk bûbe yan jî bi zarokî hatibe wê deverê, ev asayî ye bernavkê Herîrê bo xwe hilibijêre, ji ber ku wê demê Herîr navendeke girîng bû, paytexta mîrnişîneke bi hêz bû. Elî jî wek rewşenbîrekî hest bi girîngiya wê desthilata xwemalî kiriye û şanazî pê kiriye, bergirî lê kiriye. Wek di helbestên wî de tê dîtin, wek diyar e mîrên Soran jî rûmeta wî girtiye û ji wî hez kiriye.

Bêguman Elî her cihekî di kiriba bernavkê xwe wek Herîrê girîng nedibû di wê serdemê de. Ne her wî, kesine di jî li wê serdemê û piştî hingê jî Herîr kiriye nav û nîşana xwe ku reng e li gundên derdorê yan ji dûr hatibin û di esil de ne xelkê Herîrê ne. Paşê em ê behsa wan jî di vî nivîsînê de bikin.

Di vî barê de, her ew Mewlana Ebdilrehman Camiyê ku me berî niha qal kirî, binemala wî ji devera Esfehnan çûne devera Cam li rojhilatê Îranê û Mewlana li wê deverê hatiye dinyayê. Gotiye: Ez li Cam ji dayîk bûme, ji ber wê çendê min ew kiriye paşnavê xwe.

Wek me got, devera Herîr li cihekî wiha ye ku sînorê dabirîna devera Soran jî Behdînan e. Xelkê wê deverê bi şeweyekî diaxivin ku kurmanciya jêrîn e, lê karîgeriya şewezara jorîn jî li ser axaftina wan diyar e. Dûr nîn e, wê serdemê mîrên Soran girîngiyê zêdetir bi wêjeya kurmanciya jorîn dabîn ne ku wêjeya kurmanciya jêrîn û hîç belgeyek nîn e ku li wê serdemê wêje bi şewezarê kurmanciya jêrîn hatibe nivîsîn.

Zêdebarî wê çendê ku heta çend deheyên vî dîmahiyê jî lawik û stran û lavjeyên devera Hewlêrê, bi çiya û deştan wê ve, her bi kurmanciya jorîn bûn. Kawîs Axayê bi nav û deng bi şeweyekî kurmanciya jorîn lawikên dîrokî û evîndariyên gotine, her

çend ku ew bi xwe ser bi kurmançiya jêrîn bû; gelekên dî yê wê Kawîs Axa li vê deverê hene. Heta serê salên heftêyî jî li gundên derdora Hewlêrê, di şevbuhêrk û civatên kesên navsere û maqûl de stran û lawik bi kurmançiya jorîn bûn; tişteke bi kurmançiya jêrîn wate soranî li holê nebû. Paşê stran û besteyên kurmançiya jêrîn bi rêya radyoyê di nav ciwan û gencan de belav bûn. Ji dema zarokatiyê de li bîra min e, şahî û daweta lawên gundê me li ser awaza: "Hey Pê de Pê de Temo Lawo Pê de" bû.

Bi kurtî, ev devera Hewlêrê ji Rewandizê bigire heta digihêje Deşta Qerac, zêdetir di bin karîgeriya kultûra kurmançiya jorîn de bû, serbarî wê çendê ku zimanê wan yê axaftinê kurmançiya jêrîn bû. Ev jî ji ber têkeliya berdewam û mêjûyî ya di navbera xelkê Kurdistanê de bû.

Helkefta bajarê Herîrê ji rûyê zimanê axaftinê ve, bi cureyekî ji her du şêwezaran ve nêzîk e; ji berekî xelkê wê bi soranî diaxivin û ji berê dî bi behdînî. Vê yekê jî wê me got, ziyar bi nav û dengî û berhemên Elî Herîrî gihand yan jî wêkî kurd dibêjin, ew ji her du cejnên maye. Bi xwendina destnivîsên wî xuya dibe, hindêk caran kartêkirina şêwezara xwarê li ser şîrên wî diyar e û hindêk caran şêwezara jorîn. Ev jî belge ye li ser wê çendê ku venivîserên deqên wî ji xelkê her du aliyan hatine.

Vê rewşê sergêjiyêke dî jî durist kiriye; di destnivîsên kevn de navê Elî Aşîq jî hatiye û gelek caran berhemên wî digel yê Elî Herîrî de hatine têkel kirin. Li vir ez dixwazim bi boçûna xwe hindêk cudahiyan di navbera Elî Herîrî û Elî Aşîq de diyar bikim:

A yekem: Wê berî niha bo me diyar bû, Elî Herîrî bi şêwezara kurmançiya jorîn – bi şêwazê Kurdistanê bakur yan Botanê - şîr nivîsine, lê Elî Aşîq li gorî ew şîrên bi zargotin mane yan di defterên kevn de hatine tomarkirin, bi şêwezara mukriyanî şîr gotine ku ew her du şêwazên axaftinê ji hev du cuda ne. Serbarî wê çendê, ne li serdemê kevn û ne li serdemê nû me kesek nedît ji rewşenbîrên kurd ku wiha bi rewşanî bi her du şêwezaran helbestan binivîse, wê çawa ew her du Elî bi ser şêwezaran xwe da zal in.

A Duyem: Wê xuya dibe Elî Herîrî di serdema xwe de kesekî maqûl û xwendeyekî serdema xwe bûye ku bi şêx navê wî hatiye. Jê pê ve aşîq zêdetir bo şaîrekî kêr xwende yê gelêrî digunce ku şîrên wî bi ser zarê xelkê ve bin. Ez bawer nakim şîrên Elî Herîrî li tu serdeman li devera Herîrî û rojhilat û rojava ketibin ser zarê xelkê, ji ber ku pir in ji peyv û têgehên erebî û farisî. Şaîrên mîna Elî Aşîq di nav kurdan de bi "şayer" hatine nav kirin ne ku şaîr, her çend hindêk xwendewariya wan jî hebe. Elî Berdeşanî jî her şayer e û berhemên wî li ser zarê xelkê bûn ne ku hatine nivîsîn.

A sêyem: Elî Herîrî ji Elî Aşîq kevntir e û di sedsala pazdehê û şazdehê de jiyaye

ku li gorî çend belgeyan Elî Aşiq gelek piştî wê mêjûyê rabûye. Li gorî hindêk vekoleran aşkere dibe ku Elî Aşiq li serdema Mîr Silêman Beg û li dûmahiya çarêka sedsala şazdehê jiyabe, wate sedsalek di navbera wan de heye.

Wek diyar e di nav kurdan de navên Elî gelek in; niha jî Elî zaf in. Îcar kengê navê Eliyekî hatibe, gotine ev Elî Herîrî ye. Ne bi tenê di serdemên kevn de ev yek nehatiye safîkirin, tew niha jî weha ye. Mihemed Elî Qeredaxî di pertûka "Tûjandinewey Mêjûwî Zanayanî Kurd" de, behsa Elî Herîriyekî dî dîke ku di destnivîsên wî yê kevn ên kurdî de bi navê "Elî Bîn Mihemed El-Surçî el-Herîrî Mulda, Alluî Neseba" hatiye, wate li devera Herîrî ji dayîk bûye. Ev Elî di sala 1074-koçî (1663-1664z) de li devera Serdeşt li rojhilatê Kurdistanê mamoste bûye û dibistana wî hebûye. Jê pê ve, dibêje li gorî destnivîsan, ev mela Eliyê dawiyê, ji bilî nivîsîna perawêzan li ser hinek pertûkan bi înzeya Sûrçî berhem nivîsîne, lê em nizanin berhemên wî çend bûn û çî pê hatiye!

Mamoste Qeredaxî wê çendê jî dibêje ku vî Mela Elîyî kurek hebûye bi navê Mela Hemze û di destnivîsan de bi Mewlana Hemze Kurê Mewlana Elî navê wî hatiye ku diyar dibe ew û bavê xwe du zanayên mezin yê serdema xwe bûne û heta sala 1110-koçî (1698 - \_ 1699 z) sax bûne. Mamoste Qeredaxî pirsyarekê jî dîke û dibêje: "Erê, dibe ev Elî ku berhemên farisî di keşkulê wî dane Elî Herîrî nebe?" Qeredaxî di gelek cihên dî de jî nivîsiye: "Ez weha dibînim Elî Herîrî û Elî Aşiq her yek kes in." Ew neheq jî nebûye, ji ber ku di tomarkirîne de ew her du nav û berhemên wan bi şeweyekî xirab têkelî hev du hatine kirin.

Mamoste Ebdulreqîb Yûsif jî di pertûka xwe ya bi navê "Dîwana Kurmancî" de qala kesekî dîke bi navê şêx Ehmed Kurê Elî Herîrî, ku bavê wî xelkê bajarê Herîrê bûye û çûye şamê û li gundekî nêzîkî şamê (Dîmeşqê) yê bi navê Gundê Esal akincî bûye. Ehmed li wî gundî ji dayîk bûye û paşê xwendiyê û bûye rewşenbîr û nav û deng daye. Ev şêx Ehmed Herîrî di sala 1638 de miriye. Mamoste Ebdulreqîb dibêje: "Ji aliyê min gelek nêzîk e ku ev Elî Herîrî bavê şêx Ehmed, Elî Herîrî yê şaîr be. Eger wiha be, her Eliyekî devera Herîrê rewşenbîr be û di her serdemê de jiyabe, Elî Herîrî yê şaîr be? Ev karesata boçûnê bê belge ye û axaftina li gor hewayê nefse ye."

Wek min gotî mela Elî û şêx Elî di nav kurdan de gelek in, lê bêguman nabe ewên jidayîkbûna wan li Herîrê bû yan nasnavê Herîrî hebûye, hemû Elî Herîrî şaîrê bi nav û deng bin.

Li vir pirsyarek dihête pêş: Baş e, bo çî wan Eliyan bajarê Herîrê bi cih hişt di demekê de ku ew bajar navendeke desthilata kurdî bû yan wek berî niha me behskirî, ji rûyê serxwebûna desthilatê û hebûna bingehên ayînî û zanyariyên rewşenbîrî ve de-

vereke geş bû?

Berî bersiva wê pirsê bidim, ez dibêjim koçkirina wan Eliyan û derketina wan ji Herîrê û mirina wan li welatên din, ev car li Kurdistanê bin ya li derve, wê rastiye nîşanî me dide ew gora niha li Herîrê ye divê gora Elî Herîrî yê şaîr be. Li ser zarê xelkê hatiye ku ew gora wî ye; ev jî belgeyek e ku Elî Herîrî li serdema tenahî û ewlehiya wî bajarî de jiyaye ne li serdema aloziyê de.

Egera koçberbûna rewşenbîr û zanayan ji Herîrê bo wan aloziyên sala 1535ê û piştî wê vedigere ku li vê deverê rûdan. Wek me gotî, di wê salê de Îzedînşêr Kurê Mîr Seyîd Elî ji aliyê Sultan Silêmanê Qanûnî ve hate kuştin û ew dever bi Husên Begê Dasînî hate dayîn ku mirovekî zordest bû. Tevî zordestiya wî, bi xelkê deverê ne xweş bû êzîdiyê baladest be, ji ber wê çendê gilî nivîsîne û dane destê şandekê giregiran da ku bigihînin Stenbolê. Şand, ji zanayên mezin ên wê serdemê yên Iraqê pêk hatibû; Mewlana şerefedînê Neqşbendî û Mewlana Seyfedînê Sehrewerdî û çar kesên di ku tevahiya wan zanayên mezin û giregirên wê hîngê bûn, lê sultanê Osmaniyan tevahiya endamên wê şandê kuştin. Weha xuya dibe ku sultan ji berfirehbûna desthilata mîrên Soran tirsîyabû û xwestibû bi her şeweyekî be ji nav bibe yan fersenda rabûneveyê nede wan.

Ew Mîr Îzedînê ku me behs kirî ku sultanê Osmaniyan ew kuştibû, mirovekî jêhatî bû di birêvebirina karûbaran de. Biryarên karê xwe piştî wergirtina pesendkirina desteya şewirmendan cî bi cî dikir. Karê avedankirinê di mîrnişîna xwe da kiriye, hin ji wan, dezgeha xêrxwaziye daniye, gûmeza Pêxember Yûnis li Mûsilê nûjen kiriye, li rojhilatê Hewlêrê du mizgeft durîst kirine û fêrgeheke xwendina Quranê vekiriye û mamoste ji Mûsilê ji bo wê anîne. Girîngiyeke mezin daye Kerkûkê û sê mizgeft û fêrgeheke zanistî tê de ava kiriye.

Tevahiya wan karûbaran û hinên din nîşana wê yekê ne ku serdema Mîr Îzedînşêr wek dirêjahiya serdema Mîr Seyîdê bavê wî devera desthilata Soran devereke vejandîbû û cihê zana û rew144enbîr û şaîran bû, lê piştî biserçûna wê sedsala zêrîn, rewşa zanistî û rewşenbîrî şêlî bû û zana û rewşenbîr ji vê deverê bi dûr ketin.

Piştî Mîr Îzedîn, Seyfedîn birazayê wî li Simaqûliye li dijî Husên Begê êzîdî rape-riye û devera Herîrê jê wergirtiye. Hevkarî ji Mûsilê bo mîrê êzîdî hatiye û leşkerê Seyfedîn şikandiye û careke di dest bi ser wê deverê de girtiye. Êzîdiyan kuştar û wêrankariyeke bê hempa digel nişteciyên Soran de kiriye. Mîr Seyfedîn neçar bû bi-reve û xwe li Mîr Bêge begê Erdelan bigire û daxwaza harîkariyê jê bike. Bêge Beg ji tîrsa tûrebûna sultanî newêriye hevkarîya wî bike û ji ber wê çendê Mîr Seyfedîn bi dilşikestî ji Sine vegeheriya Rewandîzê, lê careke di mirovên netirsok lê kom bûn û artêşek saz kir û êriş kire ser Hewlêrê û mîrê êzîdiyan jê derxist. Husên beg gelek he-

wil da vê carê jî bi ser bikeve lê kêr nehat, Mîr Seyfedîn biryara serxwebûna xwe da.

Sultanê Osmaniyan ji wan karên mîrê Soran tûre bû û mîrên Amêdiyê ajotin ku şerî digel bikin, lê ew bizavên wî bi ser neketin û Mîr Seyfedîn bi azadî û serbixweyî jiya. Dawiyê ew bi axaftinên xweş yê Yûsif Begê Biradostî, ku bi navê Xazî Qiran dihat nasîn, xapiyaye û ber bi Stenbolê çûye bo wê çendê ku daxwaza lêborînê ji sultanê Osmanî bike û hevpeymaniyê digel de girêbide û bi wê yekê sultan jî hevkarîya wî bike ji bo şerê li dijî Îranê û xwedêgiravî wê Osmanî serxwebûna mîrnişîna Soran qebûl bikin û balyozan digel de biguherin. Mîr Seyfedîn nizanîbû eva han plan e û her bi ghiştina wî bo Stenbolê dê li stûyê wî bidin. Ev yek di sala 1558ê de bû, êdî piştî wê demê malwêranî û nexweşiyê zêdetir berê xwe da vê deverê.

Serbarî wê çendê, piştî wê demê nakokî û dubendî ket navbera mîrên Soran bi xwe de, bira û bira şerê hev du dikir. Li Batasê Mîr Bodaq û Mîr Silêman begê birayê wî rûbirûyê hev du bûn û şerî dest pê kir. Mîr Bodaq şikest û xwe li mîrên Amêdiyê girt û ji wir leşkerên wan kişandin ser devera Soran, lê di rêkê de berî bigihîje armancê di sala 1577ê de mir. Mîr Silêman Beg piştî wê xwestiyê tola Mîr Seyfedîn mamê xwe hilde, êriş kiriye ser êla Zerza li devera şino li aliyê rojhilatê Kurdistanê, çunku di wê demê wê eşîrê hevkarîya Xazî Qiran kiriye.

Di rastiyê de sultanê Osmanî berdeham xwestiyê wê eşîrê wate Zerza, ku di servaniyê de jêhatî bûn, bo lédana mîrên Soran bi kar bîne çima ku wê mîrnişînê tu carî desthilateke biyanî qebûl nekiriye. Silêman Beg êriş kiriye ser eşîra Zerza û gelek bi xerabî şikandine û jin û zarokên wan bi dîl anîne. Paşê Silêman Beg êriş kiriye ser Tergewer ku pismamê Qobad Beg li wir fermanîdar bû. Silêman Beg tirsîya ku dewleta Osmanî pismamê wî xurt bike û mîrîtiyê ji wî bistînin. Her weha Silêman Beg şerê Qizbaşên Sefewî jî kiriye û gelek ji wan dîl girtine û ew talan û rût kirine, dîl digel diyariyên giranbiha bo Stenbolê hinartine, bi wê yekê jî sultan li wî boriye û aş bûye.

Silêman Beg bi rêya wan şeran bi nav û deng bû; di devereke de desthilata wî hate çespendin bêyî ku tu kes bikaribe hevrikiya wî bike. Serbarî wê çendê ku nexwendewar bû jî lê kêfa wî bi zanist û xwendewariyê re dihat û rewşenbîr û meleyên mezin ji dûr anîn û li xwe kom kirin. Silêman Beg heta sala 1589ê jiyaye. Xanzad Xatûn ya bi navûdeng xwîşka wî bû û piştî mirina Silêmanî heta demê mîrîti kir.

Bi kurtî em dikarin bêjin, rewşa necîgîr ya devera Soran pêncî salan berdeham bû. Nabe di wê nearamiyê de tiştek ji vejandina zanistî û xwendinê hebe, her ji ber wê çendê zana û rewşenbîran ew dever bi cih dihêlan û jê dûr diketin. Ewên jiyana Elî Herîrî dixine wê serdemê de, bêguman dibe ku wan agah ji wê mêjûya tal nebe ku bi tu awayî rê nedaye pêşketina xwendewarî û rewşenbîriyê. Bi kurtî, welatekî wêran û

miletékî perîşan.

Di serdema Mîr Silêman Beg û piştî wî de, sedsala duyem a zêrîn a mîrmişîna Soran dest pê kiriye. Di vî serdemê de wek me gotî avedanî û rewşenbîrî geş bûye û jiyana xelkê careke dî aram bûye. Elî Begê kurê Silêman Beg pêleke mezin a avedaniyê li deverê da destpêkirin; çendîn keleh û pir ava kirine û projeyên xweşikirina rêyan pêk anîne. Yek ji wan, duristkirina rêya geliyê ku heta niha jî ew gelî her bi navê wî tê nasîn: Geliyê Elî Beg. Her weha Elî Beg mirovekî bê arîşe bû û hez ji şerî nedikir; digel Îran û Osmanîyan de jî pêwendiyên wî xweş bûn. Elî Beg gelek paytext jî hebûn: Herîr, Dûn, Xelîfan. Kêfa ji zana û rewşenbîran re hatiye û şêx Heyderê Maweranî, şêxê zanayên wê serdemê bû. Elî Beg li sala 1634 miriye.

Di salên dawî yê fermandariya Elî Beg de careke dî Mîrîtiya Soran tûştî aloziyê bûye û ew jî bi egera êrişên Babaniyan. Elî Beg di wan salan de bi neçarî paytexta xwe ji Herîrê veguhaste Xelîfanê û piştî xwe bi gelî mekin kir. Ji aliyekî dî ve di sala 1625ê de Xan Ehmed Xanê waliyê Erdelan, Rewandiz û Koye û Amêdiyê vegirtiye, bi wê çendê jî desthilata Soraniyan gelek kêr çûye û devera wan berteng bûye. Di sala 1645ê de, Oxiz Begê kurê Elî Beg Rewandiz vegirtiye û paytexta xwe bire wir, lê piştî hingê devera Herîr û Koye, ku ji mêj ve di bin desthilata mîrên Soran de bûn, bi yekcarî ji dest dan û ketine bin destê Babaniyan.

Em dikarin bêjin di nîveka salên bîstana yê sedsala 17ê, wate di dema Elî Beg de devera mîrmişîna Soran bi serdemê nebar de derbas bûye heta digihêje destpêka sedsala 19ê wate heta serdema serhildan û raperîna Mîr Mihemedê bi navûdeng. Ji wir pê ve sedsala zêrîn a sêyê û dawiyê bû ku di geşkirina mîrîtiya Soran de rû dida. Di wê dema me behs kirî de, desthilata mîrên Soran bi tenê li Rewandizê bû û devera Herîrê di destê wan de nemabû. Ji ber wê çendê bi tiştekî asayî tê danîn, rewşenbîr û zanayên wan deverên ne-ewle koçber bibin û wan li cî bihêlin. Wek me dît Elî Sûrçî, Herîriyek e bû ku di salên şêstan yê sedsala 17ê de li Serdeşt jiyaye û li dawiya wê sedsalê de Elî-yekî dî çûye şamê û li wir miriye; êdî ev bû halê Elî-yên piştî Elî Herîrî.

Ew şairê navê wî bi Elî Aşiq hatî di hindê jêderan de digel Elî Herîrî de hatiye têkel kirin. Bi hizra min li çaryeka dawiyê ya sedsala 17ê de wate di serdema Xanzad Xatûn û Elî Beg de jiyaye. Li gorî jêderên zargotinkî yê xelkê deverê, Elî Aşiq feqî bû û li fêrgeheke ser bi mizgefta wê serdemê xwendiyê û dil ketiye keçekê bi navê Perîzad.

Li gorî ku Hisên Huznî Mukiryani di kovara Zarî Kirmancî de nivîsiye, dibe ku Elî Aşiq di serdema Mîr Mihemedê bi navûdeng de jiyabe, lê li gorî paşkoyeke ku di rojnameya Iraq de hatiye belav kirin, dibe di serdema Xanzad Xatûn de jiyabe û bi

xwe jî di binyata xwe de xelkê devera Mukiryana be û bo xwendinê berê xwe dabe wê deverê, ku wisa diyar dibe li wê serdemê de fêrgehên baş lê hebin ji aliyê aborî ve vejandîbe. Helbet her du jêderan piştî xwe bi pêzanînên zargotinkî ên xelkê girêdane û tiştêkî binyatî di rojevê de nîn e, lê terazû zêdetir bi aliyê boçûna Kizel de dişikê. Serdema Xanzad Xatûn û serdema Mîr Mihemed zêdetir ji sed salan di navbera wan de ye.

Ewa ku Mehmûd Qadir Ehmed (Kizel) di paşkoçê de nivîsiye, bi kurtî ev e: Perîzad xwîşka Xanzad Xatûn bûye û keçeke ciwan û şox û şeng bûye. Çavê Feqî Elî bi rêkeftê pê dikeve û tîra evînê xwe li wî digire. Dengûbasên evîna Feqî Elî ya bo Perîzadê kete ser zarê tevahiya xelkê. Xanzad Xatûn jî ew axaftin bihîstine û ji destpêkê ve nerehet bûye û gef lê xwariye çima ku feqiyekî rûtik hetka binemala wan dibe.

Feqî jî ji tirsan û ji eşqê hêdî hêdî ji xelkê dûr ket û xwe li çiyana da, ew jî bo egera dilpêmana xelkê bi Elî ve û ketina xema wî, reng e Perîzad jî ji aliyê xwe ve bê helwest nebe û ketibe dava evîna Feqî, ew jî bo egera wê çendê ku li dawiyê dilê Xanzad Xatûn nerm bûbe û Perîzad xwîşka xwe li Feqî mare bike.

Lê jêderên zargotinkî amaje dikin ku Feqî Elî di yekem çavpêketina Perîzadê bûk de, helbesta "Perîzadê Be Xêr Hatî" jê re gotiye û berî li hev du nêzîk bibin, aşiqê bê çare ji nişke ve giyanê xwe ji dest daye.

Ewa di Zarî Kirmançî de hatî, behsa Xanzadê nake, lê li wir jî bavê Perîzadê, ku kesekî maqûl û navdarê deverê bû, dilê wî nerm bû û keça xwe daye Eliyê Aşiq anku dûmahiya çîrokê heman tişt e, ku bêyî gihîştina aşiq û maşûqan hatiye dawî lê hatiye.

Eva li xwarê deqa helbesta Elî Aşiq e bi şêwezarê Mukiryani:

Perîzadê be xêr hatî  
Be ser çawê demin şalan  
Be çim zanî ke toy hatî  
Be dengî toq û xirxalan.

Be dengî bazin û zendan  
Her çend min got hezar çendan  
Nethêşt eqlî eqilmendan  
Etom çatirî le awalan.

Etom çatirî le Leylayê  
Yûsif legel Zuleyxayê

Mem û Zîn hertik hemtayê  
Be zulfanit kirdim talan.

Le spay zulfan boç natirsî?  
Şîrîn ehwalan depirsî  
Mubarek bê le to kursî  
Rûnê guwê bidêre ebdalan.

Rûnê guwê bidêre wê malikê  
Dû wechet wek çiray zeytê  
Desûtê meclîsî mey tê  
Her wek pûşê le kendalan.

Ne qeqnes bûm ne perwa bûm  
Dexom sed siwênd cuda nabim  
Ger xizêm bim qet têr nabim  
Le dîdarî xet û xalan.

Le dîdarit dey hezîn kem  
Mirdim hendî ruhî tîn kem  
Keser bûm carêkît bîn kem  
Xudane çît û desmalan.

Xudane çît û cebhet bû  
Dîdarî tom be qîsmet bû  
Xeracî erzî qîmet bû  
Be xet û xal û eşkalan.

Be xet û xal û sayey to  
Cîhan cumle 'etayî to  
Dekêşim xakî payî to  
Her wek zêrî be misqalan.

Min ne zêr im min zêw im  
Ke bû çêştîm nebû şêw im  
Be sed hewiya kirdit kêw im  
Xudane doşek û palan.

Xedanî tom seraser kird  
Bezulf-it hêwî seter kird  
Dil min û toy û wêkîra bend kird  
Be'îd û cêjnî sersalan.

Be'îd û cêjn û sayey min  
Ewel 'îd û emanî min  
Ezîz û newcewanî min  
Kesûkar im pêt bûn talan.

Ewel kesûkar-im etoy  
Tebîb û derman-im etoy  
Ger tom hebê bes-im etoy  
Le genc û mal û patalan.

Le genc û mal û qazanc-im  
Kesas-im sahêbî renc-im  
Le bazaran gewher seng-im  
Xeberdar-im be hemû halan.

Xeberdar im bemebûdî  
Dil-im raste le ser Cûdî  
Peşîman nîm le meqsûdî  
Be ser-im hat ew rojgare.

Be ser-im hat le berwarî  
Way got be Elî hejarî  
Tobe bike be yekcarî  
Belku rizgar bibê şalan.

Hatina navê Perîzada xwîşka Xanzadê di vê çîroka evîndariyê de û serederiya jîrane ya Xanzadê li hemberî gurahiya evîna Feqî Elî de wek çawa li ser zaran hatiye veguhastin û dibêjin çîroka evîniyan Las û Xezalê tîne bîra me. Di beyta Las û Xezalê de navê Xanzad Xatûnê di nava çîroka evînî ya wan de bûye aliyekî evîndariyê. Agir bêdû nabe, dibe ku Xanzad û Perîzada xwîşka wê, wek du jinên azad, evîndarî kiribe û çîrok û serhatiyên wan ketibin ser zarê xelkê, çunku xwîşkên Silêman Beg bûn û birayê wan nerm bû û reng e demargîriya eşîrî ya wî kêmbûbe yan Xanzad û Perîzad - eger rast be Perîzad xwîşka Xanzadê ye - ji ber ku xwîşkên Mîr Silêman

beg bûn, azadî û vekirîbûna wan ya civakî ji ya xelkê zêdetir bûbe. Her çawa be, kar-kirin û beşdariya jinan di desthilata birêvebirin û karûbaran de ji wan jinên asayî bêhtir azadî daye wan.

Di deqêke beyta Las û Xezalê de, ku bi şêweyekî axaftina devera Herîrê hatiye to-markirin, Lasê Ehmed Begê Cafî şarezûrî û Xezala Mela Nebiyê Balekî, dil dikevin hev. Las ji devera Cafayetî û Germiyanê ve tê bo revandina Xezalê ji Rewandîzê, lê berî biçe devera Balekayetî li Herîrê dihêwire û dibe mêvanê Xanzad Xatûnê. Xanzad hind bi Las hêbetî dibe, xwe pêşkêş dike û daxwazê jê dike dest ji Xezalê berde û wê mare bike.

Çîrokeke dî jî heye cihê balpêdanê ye, ew jî çîroka Xanzad û Leşkirî ye. Li gorî beyta Xanzad û Leşkirî, ev Leşkir zarokê hêtîm û sêwî bû, li mala Hisên Beg de hate xudankirin ku giregirekî deverê bû. Aysa Hisên Beg bi Mîr Silêman Begî hatiye dan, Aysê, Leşkirî digel xwe de biriye. Leşkir ciwan û jêhatî bû û Ays û Mîr Silêman Beg piştî wî girtine heta bûye yek ji karbidestên mîrîtiya Soran, lê ji ber ku Leşkirî evîndarê Aysê bû, viyaye bi her şêweyekî be Mîr Silêman Beg ji nav bibe heya ku dest bi ser Ays û desthilatê de bigire. Dibe ku her Aysê bi xwe ew gotibe. Li gorî wê beytê, Leşkirî li ba Osmaniyan bi xerabî behsa Silêman Beg kiriye û piştî bi jehr-kirin û dermandanê ew kuştîye. Çîrok dibêje, Xanzadê ji bo tola vê bêbextiyê hilde Leşkirî kuştîye.

Çîrok û serhatiyên dî derbarê eşqbazîya Xanzadê gelek in. Her li gorî wan çîrokên bi zarî hatine veguhastin li ba xelkê deverê, dibêjin: şevê Xanzad Xatûn di nav bajarî de geriyaye û li pişt dîwarê hucreya mizgefteke d guh li axaftina feqîyan ragirtiye. Feqîyan hêvî û daxwazên xwe ji hev re gotine û yekî gotiye: "Ez hêvîdar im Xanzad bibe hevîna min yan carekê digel min razê." Çîrok dibêje, dotira rojê Xanzad dişîne pey feqî û xwe lê mare kiriye û kurek jî jê bûye. Ev gotinên ser zarê xelkê ne, tu nizanî bê kîjan rast e û kîjan lihevanê ye.

Lê hebûna van çîrok û beytan derbarê evîndariya Xanzad Xatûna dotmîra Soran de, babeteke cihê serincdanê û nîşaneyê baladestbûna keçan û jinên binemaleya Soran li hindêk serdemînan de ye, ji ber wê çendê dibe ku çîroka Perîzad digel Feqî Elî de jî rastiyek bo hebe.

Her weha dibe ku di serdemên desthilata wê xatûnê de ew çîrok li ser zaran geriyabin û Xanzad û binemala wê guh lê bûbin.

Va ye li vir deqêke dî ya helbesta Feqî Elî belav dikim, ku Hisên Huznî belav kiriye. Huznî wê çendê jî dibêje ku Elî Aşîq di dema jiyê xwe de gelek helbestên dilsozane gotine, va ye çend jê:

Esîrî mîhnetî hîcranî tom, yarî wefakar im  
 Kujrawî xencerî mujganî tom, mehbûbî nazdar im  
 Îlacêkim bike derd-im giran e, qîbilekey dînim  
 Bike rehmê be firmêskî dilopî çawî xembar im  
 Fîday l'elî lebit bim, bêne yadit şertekey caran  
 Ne wek umr-im be nakamî birwa<sup>9</sup> xulamêkî emegdar im  
 Mela û zahîd û sofî, xerîqî behrî îşqî ton  
 Bizane min le em hale, çi ostadêkî hoşyar im  
 Nexoşêk im be bê dîdarî to, yar şîfa nabê  
 Meger Îsay Meryem bê, bika dermanî azar-im  
 Elî heta weku demrê întizarî qametî yare  
 Le nêw îşq-it qutar nabê heta xoy bê be xemxwar im.

Di "Paşkoşy Iraq"ê de jî deqeke dî heye mamoste Mihemed Elî Qeredaxî belav kiriye, lê ew deq dîr û dirêj e, li vir dê çend malikan jê werbigirim:

Çend şewan mecnûn û mest im, şîbetî perwane ye  
 Daîma mey her be dest-im, çon kiçî baxî xwe ye  
 Çon kiçin çengal be dest in, bulbulan serxoş û mest in  
 Hîndiyan misrî be dest in, jîn le min bê fayde ye  
 Tal debûn weqt û zemanê, sûrgulan perjîn rehan e  
 Her kesê bîn ka ewan e, serxoş û dêwane ye.

Heta dawiyê:

Ey Herîrî her debêjî, aşiqî sewda û gêjî  
 Bê birîn xwîne derêjî, her şewe ta subhe ye.

Ev nimûneyên şîrên Elî Aşiq in bi axaftina devera Mukiryana ku hîç rê tê naçe he-man ew kes danerê wan şîran be ku li ser navê Elî Herîrî hatine tomarkirin û bi şêwezarê kurmanciya jorîn in. Ew şîr hemû nîşana wê yekê ne, ku cudahiyeke mezin di navbera Elî Aşiq û Elî Herîrî de hebûye. Wek di vê şîra dawiyê de derdikeve, dibe vî Elî jî carina paşnavê Herîrî bi xwe bi kar anîbe, çunku ew jî li Herîrê jiyaye û şanazî bi vê wargehê kiriye û an jî ew ên ku ev şîr nivîsîne bûne sedema vê tevliheviyê. Pêdivî ye em amaje bi wê çendê jî bikin, ji ber ku ev şîrên Elî şaîr li ser zarana hatine parastin û kêma hatine nivîsîn, reng e li ber destkariyê ketibin, lê hatibine zêde û jê hatibine kêmkirin yan şêweyê zimanê wan hatibe guherîn, ji ber wê çendê jî rûyê ziman û deqê ve gelek cihê baweriyê nîn in.

Dawiyê ez dixwazim têbîniyeke dî jî derbarê helbesta Perîzadê de bêjim, ew jî ew e: Deqeke dî yê vê helbestê heye ku bi kurmanciya jorîn hatiye nivîsîn, ew deqa dawiyê aloziya di navbera Elî Herîrî û Elî Aşiq da zêdetir kiriye. Wek me dît deqa Mukiryânî bi navê bi Elî Aşiq e, lê kurmanciya wê bi navê Elî Herîrî ye.

Her wekî berî niha min amaje pê kirî, helbesta Elî Herîrî eger venivîsê wan xelkê aliyê yê rojhilatê Zapê Badînan be, ev kartêkirina şêwezara kurmanciya jêrîn çûye ser, lê eger yê aliyê rojava be, wê demê ketiye bin kartêkirina behdînî. Bo giroveya wê çendê jî paşê xwêner dikare temaşeyî wan deqan bikin yên Sadiq Behaedîne Amêdî di pertûka xwe da bi navê "Hozanvanê Kurd" de pêşkêş kirî û hevber bike digel deqên din.

Tiştê balkêş ew e helbesta "Perîzadê Be Xêr Hatî" ya Elî Aşiq wekî helbestên Elî Herîrî lê hatiye, tew zêdetir jî. Wek me got ji ber ku Elî Aşiq û Elî Herîrî kirine yek di destnivîsên kevn de, hindek venivîsên aliyê Badînan deqên Elî Aşiq ji Mukiryânî bo Badînî veguhartine û kirine yê Elî Herîrî.

Eger mirov temaşeyî wan çend helbestên Elî Herîrî bike yên me nivîsîn, dê bibîne ji aliyê ziman û dariştinê ve çendî cuda ne ji helbesta "Perîzadê" anku ji wê deqa bi kurmanciya jorîn ku bi navê Elî Herîrî ye. Wek me got Elî Aşiq feqî bû û di şîrên wî de kêmtirîn şûndesta rewşenbîriyê diyar in, peyvên wî zêdetir ên xwemalî û devera Mukiryân û Herîrê ne û li kurdiya petî (resen) yan beytên şayeran<sup>10</sup> diçin, ku pertûka bi navûdeng a folklorîk ya "Tuhfe Muzeferiye" ya Oskar Man bi wan nimûneyan tijî ye.

Ev jî şêweyê deqa Badînî ye, ku min ji pertûka "Hozanvanê Kurd" veguhastiye:

Perîzadê tu wa hatî  
Li ser çavên di min şala  
Me lew zanî tu wa hatî  
Ji dengê tewq û xirxala.

Ji dengê bazin û zenda  
Nema 'eqle 'eqlemenda  
Hindî min got sî û çenda  
Tu çêtir bûwî ji hevala.

Tu çêtir bû ji Leyalyê  
Şîrîntir bûwî ji Zuleyxayê  
Mem û Zîn her du yek tayê  
Siya zulfê kirim tala.

Siya zulfê tu natirsî  
Ji ehwalê me napirsî  
Mibarek bît te ew kursî  
Tu rûnê guh bide ‘abdala.

Tu rûnê guh bide beytê  
Li pêşî tu wekî zeytê  
Disojît meclisa mey tê  
Wekî pûşê li kendala.

Wekî te vinûs bê perwan im  
Dixom sondê cuda nabim  
Hezînim ez qet têt nabim  
Ji dîdara xet û xala.

Li dîdara te ez Zîn kem  
Heta kengê ruh tê tenkem  
Keser bûm carekî bîn kem  
Xudana tît û destmala.

Xudana tît û cebhet bî  
Xerac û erd û qîmet bî  
Dîdara te bi qîmet bî  
Li ‘îd û cejn û sersala.

Ewil kar û kesê min tuyî  
Yeqîn firna dersê min tuyî  
Kesê min û besê min tuyî  
Li zêr û mal û pir nala.

Li zêr û mal û pir renc im  
Kesad im yahubim genc im  
Li bajêra gewher senç im  
Sefer dûr e heta mala.

Sefer dûr e şebê tarî  
Ey Elî û tu pirr rayî  
Da bikeyn zîkrê cebarî  
Belkî li me xweş bit şala.

Li dawiyê, ez hêvîdar im bi vê nivîsînê min karibe çînek (leke) ji çînên pir û stûr ên li ser Elî Herîrî verevandibe û xizmetek pêşkêş kiribe.

#### Çavkanî:

1. اربيل في أدوارها التاريخية، زبير بلال اسماعيل، بغداد.
2. Kovara Zarî Kirmancî, Mêjûwî Mîranî Soran, Husên Huznî Mukiryânî, Rewandiz 1927 – 1932.
3. Dîwana Kirmancî, Ebdîreqîb Yûsif, Necef, 1971.
4. Bûjandinewey Mêjûwî Zanayanî Kurd Le Rêgey Destxetekanîyanewey, Bergî Duyem, Mihemed Elî Qeredaxî, Bexda 1999.
5. Bûjandinewey Mêjûwî Zanayanî Kurd Le Rêgey Destxetekanîyanewey, Bergî Sêyem, Mihemed Elî Qeredaxî, Bexda 2000.
6. Mêjûwî Edebî Kurdî, Elaedîn Secadî, Bexda 1971.
7. Mêjûwî Edebî Kurdî, Bergî Duyem, D. Marif Xeznedar, Hewlêr 2002.
8. Hozanvanê Kurd, Danan û Tûjandina: Sadq Behaedîn Amêdî, Bexda 1980.
9. نورالدين عبدالرحمن جامي، على زصغر حكمت، ١٢٦٣ تهران.
10. Defterî Kurdewarî, Bergî Yekem, Bexda 1970, gotarek bi sernavê: Elî Herîrî / Dr. Îzedîn Mistefa.
11. Defterî Kurdewarî, Bergî Sêyem, Bexda 1970 gotarek bi sernavê: Hozanvanê Kîlasîkiyê bi navûdeng Elî Herîrî, Sadîq Behaedîn Amêdî.
12. Paşkoy rojnamey Iraq, Jimare 37 Hezîran û Tîrmeha 1980 gotarek bi sernavê: Le barey Serguzeştî Elî Aşîq'ewey, Mihemed Qadir Ehmed (Kizel).
13. Keşkolî Kelepûrî Edebî Kurdî, Bergî yekem, Mihemed Elî Qeredaxî, Bexda 1980.
14. Paşkoya rojnameya Iraq, Jimare 34 Sibata 1980 gotarek bi sernava: Elî Aşîq û Elî Herîrî û asoyekî rûnaktir, Mihemed Elî Qeredaxî.
15. Kovarî Rûnakî, Jimare 8 Salî 1936 Hewlêr, Babetek bi sernavê: Elî Berdeşanî şayerî Kurd.
16. الجامع في تاريخ الادب العربي، الجزء الاول، حنا الفاخوري.
17. şerefname. Wergêrana Hejar.
18. Xanzad û Leşkirî, Mihemed Tewfîq Wehbî, Bexda 1960.
19. Kovara Korî Zanyarî Iraq, Destey Kurd, Bergî 18 û 19. Salî 1988 Bexda, Beytî Las û Xezal, Beşî yekem.
20. Govara Korî Zanyarî Iraq, destey kurd, bergî 20. Sal 1989, Bexda, Beytî Las û Xezal, beşî düyem.

## Perawêz

- 1- *Di vê barê de li 3 bergên pertûka Hacî Qadirê Koyî binêre, ji dahênana Mesûd Mihemed û bibîne nûser ji ber nebûna zanyariyan bi çi çengalan hewl daye di hevraza venasîna jiyana Hacî û kêşeyên civaka kurdewarî ya wê demê de bi ser bikeve; gelek caran jî destvala vegeyriyaye.*
- 2- *Navê vê pertûkê: Osmanî Mûwelîferî ye, dahênana: Bursalî Mihemed Tahir Efendî. Daner sala 1861ê li bajarê Bûrseyê ji dayîk bûye û sala 1924ê li Stenbolê miriye. Pertûk cara yekem sala 1905ê hatiye çapkirin, cara duyem jî sala 1972ê li Stenbolê bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Daner, çêra gelek şair û rewşenbûrên kurd kiriye. Wek nimûne, di rûpela 284ê de ji bergê duyem, derbarê Nalî de dibêje: Sala 1873yê li Stenbolê miriye û di goristana Qerece Ehmed de hatiye veşartin. Ji bo zanyariyên zêdetir binêre: Kovara War, jimare 2, sala 1992yê, gotarek ji aliyê Mehmûd Lewendî derbarê Nalî di wê pertûkê de.*
- 3- *Ev malikên helbestê cara yekem Ebdîreqîb Yûsif belav kiriye. Binêre: Dîwana kurmancî, sala 1970ê û Mihemed Elî Qeredaxî jî sala 1994ê de di Kovara Rewşenbûrî Nuwê jimare 134ê de heman şîr belav kiriye û çend movik lê zêde kirine.*
- 4- *Ev parçe tenê Mihemed Qeredaxî belav kiriye. Binêre li jêdera berê.*
- 5- *Ev cureyê derbirînê: Eger ruh-im dikiş xaret, yan di malikeke din de: Sed ruh û can-im bin fîda, yan: Memsoje dil, her weha gelekên din jî di şîrê Elî Herîrî de, derbirînên şêwezarê kurmanciya jêrîn in. Nayê zanîn bê ev karê wî bi xwe ye yan destkariya venivîserê şîrê ye.*
- 6- *Ev malikên helbestê Ebdîreqîb Yûsif û Mihemed Elî Qeredaxî belav kirine; li jêdera berê binêre.*
- 7- *Ev malikên helbestê tenê Mihemed Elî Qeredaxî belav kirine, li jêdera berê binêre.*
- 8- *Ev malikên helbestê Ebdîreqîb Yûsif û Mihemed Elî Qeredaxî belav kiriye, binêre li jêdera "Bûjandinewey Mêjûwî Zanayanî Kurd Le Rêgey Destxetkaniyanewe." Bergê sêyem. Bexda sala 2000ê, rûpela 360-361ê.*
- 9- *Cihê peyva "birwa (bawer)" vala bû, min bi xwe danî.*
- 10- *şayer, li hin deverên başûr û rojhilatê Kurdistanê (Mukriyan-Pişder) ji şairên gelêrî re tê gotin ne ku edebî. (Wate)*

# Kurd

## û

### Ola Beha`î

Behiye Ferecula Zekiyî Merîwanî

"Heger tu min sed salî zîndan bikî,  
her ez ê hêvî bikim te bibînîm"

(MEM Û ZÎN) <sup>1</sup>

Dîroka me rengdêra zelal a xwezaya gelê me ye. Wisa xuya ye ku di serdemên kevin de kurdan giringî dida aliyên derûnî. Heta niha jî di kultûra kurdî de hinek diyarde hene ku vedigerin demên pir kevin û serdemên dînen seretayî ku ji mêj ve nemane. Ji destpêka serdema tomarkirî ve, gelê me rêbazên vejandina derûnî parastine. Heta ku heger dîroka jiyana derûniya mirov ji mêj ve hatibe hilanîn, kurd gihîştine ola datê jî. Bo nimûne, nêzikayetiî di navbera kultûra gelê me û şîretên (amojgarî) Beha`î de heye; beşek ji nêzikayetiye vedigere perwerdeya vekirî ku ji çend pişt û nifşan ve maye, ji ber ku li Kurdistanê çend bizavên olî di rewşeke aram de pêkve jiyane. Rêberê navdar Sultan Şahak ev axaftin li pey xwe hîştîye ku niha ji her demê zêdetir rastiya wê derdikeve: "*Heger tu zêrevanê ola xwe yî, tu bi xirapî behsa olên din nakî.*"<sup>2</sup>

Bêhnfirehiya (singfirehî) wiha sebarek bi ol û gelên din, di kultûra gelekî nêzikî rêça Beha`î de heye, ji ber ku ola Beha`î bi çavekî li hemû ol û neteweyên din dî-nêre. Her wiha dîroka dût û dirêj a gera serbixwe ya kurdî li pey rastiye digel şîretên Beha`î yekgirtî ye. Li gor wê yekgirtinê erka her kesî ye rastiye vekolîne.

.....  
\* *Wergêrandin ji ingilîzî: Enwer Sultanî \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Hozan Robar*

Li Kurdistanê gelek helbestvanên efsaneyî huner berhem anîne ku tê de hanî vekolînên wisa didin. Hebûna wan helbestvanan dide xuyakirin ku gera bi dûv rastiye de di civaka kurdî de hebû; di serdemên berê de jî şêxan wek rêberên dêrûnî û civakî ew ger û vekolîn bi rê ve dibir.

Wê wêjeya vekolînê û hesta berpirsiyariyê di gelek bizavên olî de serî hildaye, ji ber ku wan bi merema xwendinê xwe dikir qurbanî, sîstema derûnî û serbixwebûna hizirkirinê dipewrandin. Wan derfet dida wê taybetmendiya kesayeti da ku zanist û ola nû were famkirin.

Ji me kurdan re riyek maye ku em bibirin da ku ji kultûra xwe bigihên ola Beha`î, ew jî xirapiya demdirêj a rewşa jinan e li Kurdistanê. Ew tişt anko şîret dê ji bo gelek îroyîn Beha`î danûstandina mêr û jinê sanahî bike û dibe ku sedemek be di serdana navendên kurdî de bersiveke erênî ji bo peyama Quretul Eyîn hatibe dayîn.

## TAHÎRE YA BÊGERD

Ji ber hesteye dadxwazane û riwangeyeye xurt sebarêt bi pêşeroja mirovatiyê û bi hêviya pêşketina jinan bavê min bizav dikirin û rêza wî ji bo handera xwe (Quretul Eyîn) hebû ku bi Tahîre ya Pak dihat naskirin. Pir çaran wî ji min re behsa Tahîreyê dikir; min pir jî çîrokên li ser wê hez dikir û zû bi zû min jê dixwest ji min re bêje. Carekî min jê pirs kir: "Bavo, çima te navê min nekire Tahîre?" Ew qasî çîrokên wê bi min xweş bûn, min ji dost û hevalên xwe re jî digotin, bi taybet dema ku ez keç bûm û li Misirê bûm, gelek konferansên jinan dihatin lidarxistin, bo nimûne digel Hûda şehirawî û kesên wek wê ku min ji wan hez dikir.

Bizavên Tahîre ji bo rizgarkirina jinan ji bendan, ji min û xelkên din re gelekî balkêş bûn, ji ber ku di wê serdemê de li Misirê bizaveke mezin ji bo azadiya jinan bi rê ve diçû. Her tim şêrejîniya Tahîre handerên min bû, çunkî ji destpêka zaroktiya min ve bavê min şîret li min dikirin ji ber ku ez kurd im, divê ez bêtirs bim. Li gorî axaftina kesekî ku jiyannameya Tahîreyê nivîsandiyê, wêrekiya wê pir mezin bû. Wê wek yekem jina hemû cîhana îslamî ya Rojhilat rûpoşa xwe rakir<sup>3</sup>, ew jî ne berevajî pakiyên wê bû. Kesên ku ew bi başî nas dikirin, wek Muftiyê Mezin ê Bexdadê şêx Mehmûd Alûsî şahidî li ser pakiya wê dane. Wê çavnetirsî û bixwebawerî nîşan dida û di civînekê de beşdarî kir ku bi navê konferansa Bedeşt hat binavkirin û tê de roleke mezin lîst û giringtirîn babetên famkirina bê şaşî ji peyama Bab vekolîn. Ew tekane jin bû ku beşdariya civînekê dike û tê de dibe kesayetiyeke serekî.

Bavê min têkestî li ser wê yekê dikir ku Tahîre kesayetiyeke pir xurt bû, kes wek wê tune bû. A yekem: Ji ber ku armançek ji xwe re danîbû û amade bû xwe jê re bike qurban. A duyem: Ji ber ku heta dawîya jiyana xwe ji bo azadiya jinan dixebitî, ew jî

di serdemekê de bû ku li Rojhilata Navîn mafê jinê nehatibû naskirin. A sêyem: Ji ber ku rêbereke fikrî bû di serdemekê de ku mafê jinan tunebû biçe dibistanê û rola xwe di civakê de bilêze. Wê bi xwe, xwe kire xwendevan, helbest gotin, pertûk wergerandin, gotar nivîsandin, çû nav gotûbêjên mêran, bi agahiya serdem û hêjabûna xwe bû rêbereke. Dîrokna dibêjin, Tahîre gelekî li pêş serdema xwe bû. Bavê min li ser esleke mezin ji min re diaxîft: "*Mêr û jin du perên balindeya mirovatîyê ne, ew balinde jî nikare bifire heger her du balên wê ne yekgirtî û bi hêz bin*<sup>4</sup>." Her wiha ji min re digot: "Di hemû qonaxên dîrokê de qehremaneke olekê wek Tahîre tunebû". Şêrejînî, zaniyariyên wê ji Qur`anê û karên wê ji bo rizgarkirina hemû xelkê ji kût û bendên betal ji min re behs dikir.

Di serdema Tahîre de jin rû bi rû bi mêran re nedixivîn, rûpoş datanîn. Bi rastî, heta Tahîre jî ji pişt perdê ve bi mamosta û mela û şexên mezin re dipeyîvî. Di rûyê melayan de disekinî; hinekan heybetiya xwe ji zaniyarî û agahiyên Tahîre yên derbarê Qur`anê û pertûk û şîretên Îslamê re dikir. Lê ew yek jî bi hinekan ne xweş bû. Hetta bav û mêr û birayên wê li hember wê rawestiyên û dixwastin rû bi rûyê wê bin û karên wê rawestînin, lê nikaribûn wê yekê bikin. Wê jî karên xwe dikirin û nedikarî çaverêkirî bimîne.

Dilşadiya wê ew bû ku li ser Babê bipeyîve da ku şaristaniya nû ya aştiyê ji nû ve were û li ser binemayên bangewaziyên wî sistemeke nû were damezrandin. Ji ber çalakiyên Tahîre daxwaza girtina wê hate kirin; di dawiyê de daxwaza kuştina wê jî hate kirin<sup>5</sup>.

Lê ya giring li ba Tahîre ew sedem bûn ku ew xistibûne pêş xelkên din. Pispor û rojhilatansên Rojavayê kesayetîya wê şirovekirine. Bo nimûne, Prof. Êdward G Bi-rawn ji Zanîngeha Cambrige wisa li ser nivîsandiye: "Di her serdemê de, derketina jineke wek Tahîre li welatê min Brîtanya, diyardeyeke degmen<sup>(1)</sup>e, lê li welatekî wek Îranê gotina degmen kême, çunkî wê gavê ew yek li derveyê xwezayê ye. Bi heman awayî ji ber hizra wê ya degmen li ser Xwedê, rewanbêjiya wê ya germ, qurbaniya wê ya geşmerg (şehîd) û serfiraz, ciwaniyeke degmen dabû taybetmendiya wê. Ew di nav jinên hevniştîmanê xwe de wek keseke bi hêz û nemir radiweste. Heger ola Bab tu tiştên din ên mezin ji xwe re nizanîba, bi tenê bes bû ku qehremaneke wek Quretul Eyîn perwerde kiriye.

Gelek pisporên rojhilatnas jî hest bi mezîniya wê kiriye. Yek ji wan dîroknasê Îraqî Elî El-Werdî ye, ku gotibû: "*Tahîre bilîmetek*<sup>(2)</sup> *bû ku bi sed salî li pêş serdema xwe bû.*" Werdî her wiha gotibû: "*Heger Tahîre bi sed salî derengtîr derketiba, dê biba hêjatîrîn jina sed sala bîsta*<sup>6</sup>."

(1) Degmen: Nadîde, nadîr, kêmpyda. (Wate)

(2) Bilîmet: Zorzana, pir zana, dahî.

Ne bi tenê Beha`î li wê dinêrin wek mezintirîn qehremana Babê û yekem jin ku rêça geşmergiyê (şehidî) gerandiye, lê li ba wan Tahîre di nav rêza kesayetiyên wek Sara Asiye û Meryema Pak û Fatîme de ye<sup>7</sup>. Bi giştî ji ber helbestên Tahîre û kesayetiya wê ya mezin û îmana wê ya xurt û zanebûna wê, Tahîre li welatên Rojhilata Navîn û Ewropayê hatiye naskirin û rûmeta wê tê girtin.

Tahîre wek jineke genc bi mêjiyekî avekirî gelek pertûk xwendine, hetta pertûkên li dijî ola xwe jî dixwendin û pê hizra xwe fireh dikir. Ji ber wê xwendinê û perestina giran, serrast kete wê baweriyê ku pir zû nîşanên xwedê yên nû têne cîhanê. Xema wê ya mezin ew bû ku wî kesî anko nîşanê Xwedê binase da ku bikeve ser rêça wî. Her ew jî bû zêdebarî ku tu carî Bab nedîtibû, di xewna wê de rastiya wî jê re derketibû, nameyek jê re nivîsand, tê de zaniyariyên xwe radigihandin. Wî jî Tahîre wekî yekê ji hijdeh hewariyên xwe hilbijart. Tahîre bêpaxav şîretên nû li xelkê dikirin. Bo heyama sê salan li Kerbela û piştre li Bexdadê, ku li wê derê jî çend mehan di mala muftiyê bajêr de maye<sup>8</sup> û xelkên xwedî bawerên cur bi cur, bi jin û mêran ve dihatin da ku li axaftinên wê guhdarî bikin. Piraniya wan şîretên nû qebûl dikirin û baweriya xwe pê dianîn. Tê gotin; muftî bi xwe carekê gotibû: "*Of Tahîre! Ez bi xwedê sond dixwim ku baweriyên te rast û qebûl in, lê ez çî bikim şûrê Osmaniyan di jûrê de bi dar ve ye*<sup>9</sup>." Ew ji binemaleke fermanderên Împeratoriya Osmaniyan bû. Lê Tahîre neditirsiya. Dawiyê ew ji Îraqê hat derxistin û berê xwe da Kirmaşan da ku peyama xwe ji xelkê wî bajarî re jî ragihîne. Heta di dawî de ew girtin û xeniqandin, hîngê Tahîre dora sî û du salî bû.

Ez gelek caran hizir dikim, çawa Tahîre xwe ji bo mirinê amade dikir. Ji ber ku pir bi kûrî ez fêrî tiştan kirim. Gava li mala Gizîr û jina wî govend digeriya, carekê mêvanên wan ên ku hatibûn şahiyê, dest ji muzîk û sitranan berdan da ku guh bidin gotin û şîretên wê ku li ser Babê diaxivî. Di rojên xwe yên dawî de, dema ku xwe ji bo şehadetê amade dikir, ew şadman bû û rûliken bû. Di wê rojê de daxwaz kiribû ku tu kes bêhna xwe teng neke û dilê xwe neêşîne û piştre xwe şuşt, bîn di xwe de û xwe xemiland, çend saetan perestkarî kir. Di dema mirinê de jî bi serbestî got: "*Tu çî gavê bixwazî tu dikarî min bikujî, lê tu nikarî rê li ber azadiya jinan bigrî*<sup>10</sup>"

Evîndara Tahîre, Quretul Eyîn im, di hemû jiyana min de bi min re mabû. Pal bi min ve da da ku ez bixwînim û xwendinê di nav jinan de vejînim; wê yekê jî ez li kesên giring ên ereb û kurd nêzîk kirim. Ji wan dosta min a xoşewîst Fetîne Elna`êb a helbestvan, ku zêdetir bi nasnava Sedûf tê naskirin. Dostaniya min û wê xurttir bû, dema ku ew helbesta xwe ya li ser Tahîreyê, diyariya min kir û înzaya wê jî li ser bû, ez serfiraz kirim. Di wê helbestê de behsa azarên Tahîre yên pir dikir ku ji bo hezkirina Xwedê û wefadariya ola xwe dîtibûn. Dirêjî dida axaftina xwe û gilî li wê milhuriyê (zordestî) dikir ku tê de bi bê guneh jiyanê ji xelkê distînin. Bi mirina

Tahîreyê gelek hêvî winda bûn û neman, ji ber ku ew gupikeke gulê bû, berî ku vebe û bibe gul, bihurî.

Kurdê birêz Tewfîq Wehbî Beg evîndarekî din ê Tahîreyê bû. Ez gelekî bi bavê xwe re li ser Tewfîq Wehbî axivîbûm û awatên me pê re hebûn. Wî bi kurdî û tirkî û farisî dizanî û gelekî li ser zimanê kurdî nivîsandibû, her wekî ferhengeke kurdî-erebî û ferhengeke kurdî-îngilîzî. Hevjîna wî Asiye di warê perwerde û mirovatiyê de çalakvaneke giring bû. Di dawiya sî salên sedsala rabihurî de, wê gava ku ez nû gihîştibûm Bexdadê, kela hevdtîna binemala Wehbî dida min. Piştê di jiyana min de, nemaze dema min behsa arezûya tiştêkî dikir, gelek caran hevjinê min bi serzenîştî ji min re digot: "Tu her demê hêviyên xwe xuya dikî." Ew pêşbîniya mêrê min rast derket, çûnkî piştî ez çûm mala xwe bi demeke kurt, rêzdar Wehbî û xatûna wî ve ez gazî kirim mala xwe.

Nêzikî saetekê berî nanê nivro ez gihîştim mala wan. Ew heyam jî bes bû da ku rêzdar Wehbî pertûkxaneya xwe ya mezin nîşanî min bide. Gava ez çûme nav, çarçoveyeke xweşik destnîşan kir ku bi dîwarî ve kiribû. Helbesteke farisî bi wê-negeriyeke xweşik a îranî hatibû xemilandin. Ji min pirs kir: "Behiye, tu dikarî bixwînî?" Min lê nihêrî, ew bi bîra min hat, çûnkî min ezber kiribû, gelekî pê xweşik bû ku min helbesteke farisî ezber kiriye.

Ew helbesta Tahîreyê bû. Rêzdar Wehbî bi tamezroyî (hesret) behsa Tahîreyê dikir û kopiyeke wê helbesta xemilandi da min. Piştê min wergêraneke îngilîzî ya wê helbestê jî peyda kir. Her ew helbest e ku A.G Arbirî navê "*Xezela Tahîre*" lê kiriyê<sup>11</sup>:

Her katê rûberût debimewe, nîgam<sup>(3)</sup> deçête ser ruxsarit û  
Xefetî xomit wird wird boşî dekemewe  
Bew hîwayewe ke bitwanim bigrim,  
Wek şemal serim be hemû dergayekda kirdiwe  
Mal be mal, kolan be kolan, cade be cade  
Dûriyî to way kirdiwe xwênî dilim birjête çawekanimewe  
Cobar be cobar, derya be derya, feware be feware, coge be coge.  
Dilî pir le xefetim ewînî to le kotalî rohim deçinêt  
Hewda be hewda, rîşû be rîşû, tal be tal, bo bepo  
Tahîre seyrî dilî xoy kird û hîçî cige le to têda nedît  
Lapere be lapere, berg be berg, tarme be tarme, perde be perde.

(3) Nîga: Nêrîn, awir (Wate)

## RÊÇA ŞIROVEKIRINÊ "RÊBAZA TIWÊJÎNÊ"

Wiha xuya ye ku helbest behsa gihîştina hizir û nêrîna sofiyan dike: ``*Mirin ji bo Xwedê ye*<sup>12</sup>. ``Heger wisa be Tahîre ji ber gelek sedeman, ji bilî cih û pêgeha wê di yekdengiya digel jinan de, ew peywendiyek e di navbera kultûra kurdî û ola Beha'î de. Bi azayane û serbilindî ji bo piştevanîkirina rastiye dixebitî; gav bi gav ber bi bi-cihanîna armanca ve xwe diçû. Gava ji Bexdadê hatibû derxistin, çûbû hinek gund û bajarên rojavayê Îranê û li wê derê tevî gelê kurd bibû. Li gor tomarên dîrokî ew li Gundê Sehne mabû, ku akinciyên wî kurd in û peyama xwe ji dil de ji wan re gotibû. Tê gotin li gundekî kurdan, ku sê rojan lê mabû, nêzîkî diwazde hezar kesî piştevaniya wê kiribû<sup>13</sup>. Li Kirmaşanê, ku yek ji navendên serekî ya kurdan e, rêberên olî bi germî pêşwazî lê kirin, û jê re cur bi cur nîşanên rêzê û xoşewîstiyê derdixistin<sup>14</sup>. Li wê derê di tefsîra Sûreta Kewser de helbesteke du hezar rêzîkî got û tê de mijara Babê eşkere dike. Ji xelkê re hate xwendin û wergerandin<sup>15</sup>. Li Bexdadê jî ew helbest hate ragihandin û hizra wan kesan guhart ku li dijî wê bûn. Paşkoya naveroke wê tefsîrê ku zîlamê têgihîştî yê şahê Îranê ji bo lêkolîna amojgariyên nû sandibû û amojgariyên Babê li pêş wî hatibûn eşkere kirin, bi awayekî çêşin wan amojgariyan bandorek lê kir û bi temamî baweriya xwe bi rastiya wan anî û xwe kir canfîdayê wê meseleyê. Ew rêbaza ku wî peyayî girtibû ber, tiwêjîneke sofiyan bû:

*"Di çavpêketina sêyem de bi Babê re, wa li min hat, ji dil de daxwazê jê bikim ku şiroveya Sûreta Kewser a Qur'anê ji min re eşkere bike. Lê min biryar da, wê daxwaziya xwe li hemberê eşkere nekim. Heger ew bi xwastina min wê Sûretê bi awayekî eşkere bike ku li ber çavê min ji pîverên binavûdeng ên nav ravevanên Qur'anê cuda be, di cih de ez dê baweriya xwe bi kesayetiya pîroz a wê peyamê bînim û amade bim wê olê di ji dilê xwe ve qebûl bikim, hembêz bikim. Heger wiha jî nebû, ez dê bi sanahî jê dûr bikevim. Ew qasî rê li ber min xistin, hesteke tirsê hate min, min nizanîbû ew çi bû, ji ber wê jî min ta girt. Her ez gihîştim tezûyekê bi çar pelên min de hat. Ez pir caran çûbûm hizûra şah û tu carî min hest bi biçûkiya xwe nekiribû, lê niha ji ber heybet û tirs û curfê min ta girtiye, ez nikarim li ser pê rawestim. Bav, ez di wê rewşê de hîştim û ber bi min ve hat û ez birim li cem xwe dame rûniştandin, got: 'Tu çi dibêjî dixwazî ji min bipirsî. Ez bi rastî ji te re eşkere dikim.' Ez ji bîr ve çûm û zimanê min hate girêdan. Wek zarokekî ku ne dikare fêhm bike û ne dikare bi-axive. Min hest pê kir ez nikarim lê vegefnim. Li min nêrî û bi ken ber bi min ve hat û got: 'Gelo te divê ez şiroveya Sûreta Kewser ji te re bêjim anko te dizanî ku axaftinên min ji ruhê Xwedê ketine? Gelo tu dizanî axaftinên min wek sihrê tu mêjiyan berçûyî nakin?' Çawa ku min guh li wan gotinan bû, hêstir ji çavên min barîn. Bi tenê tiştê ku ez dikarim bêjim ew*

şureta Qur'anê bû: 'Ya Îlahî, em bê dadperwerane riftarê bi hev re dikin, heger tu li me neborî û neyê rihmê, guman tune ye ku em dê bibin ji wan kesên ku derfeta rizgarbûna wan nemaye.' Dem ne pir piştî nîvro bû, Baw daxwaz ji Hacî Mîrza Seyîd Elî kir, ku pê nûs û kaxezê jê re bîne. Wî, dest bi şirovekirina Sureta Kewserê kir. Çawa ezê bikaribim hesta xwe li ser wê şikoya<sup>(4)</sup> ne çaverêkirî derbibirim? Bi lez ayet ji pê nûsa wî dihatin xwar, li hemberê ez ji bîr ve çûm. Nivîsîna bi lez, xurtî, nermî û hêminiya kontrolkirî û hêza balkêş a pê nûsê, aqil ji serê min bir û ez gêj kiribûm. Heta roj çû ava, ku dawî li şiroveya wê sûretê hat, ew ranewestîya. Wê gavê pê nûs danî û daxwaza çayekê kir<sup>16</sup>."

Rêça şirovekirinê germ û gur bibû, ne ew bi tenê tê de bû, Tahîre jî her bi wê rêçê de diçû. Li gor gotina rojnamevan Marpa Rûp, bi tenê ji bo zêdetir li ser Tahîreyê bizane, li Îranê serdana xizmên wê kiriye. Ev jî wê yekê piştrast dike ku bangewaziya wê ji bo gelê kurd di wê serdemê de hebû û heta îro jî maye. Rûp dinivîse:

"Ciwantirîn nîşana Tahîre ya ku alîkariya cîhanê kiriye, dilsoziya wê bû ji bo serkeftina rastiyê, ku di wê demê de ew bi tenê keçikek bû û heta dawîya jiyana xwe dilsoz bû<sup>17</sup>."

Ev qor ji helbesteke din a Tahîre hatine wergirtin ku di wê rêbazê de behsa bi-destve-anîna hemû tiştêkî dike:

Nûrî ruxsarit direwşeyewe û tîşkî dîdarit le berzan derkewt.

Boğî wişeyî "Gelo min Xîway tom?" deşarîtewe, lê gerê ba welam bi-deynewe û bilên: "Belê ewe behreyî to ye."

Hawarî "Gelo min nîm" lelayan towe, bangî ew teple niye ke "belê" de-ydate bangî xobextkirdin. Min le derwazeyî dilimda hengawî mîwanî bela deparêzim<sup>18</sup>."

Wate bi Kurmancî:

Rûyê te nûr jê dibare û li bilindahiyên tîşke didara te derdikeve.

Çima tu gotina "Gelo ez Xwedayê te me" vedîşêrî, jê bigere bila bersivê bidin û bêjin: "Erê ew behra te ye"

Hawara "Gelo ne ezim" ji aliyê te ve, ne banga wê tepleyê ye ku bêje "erê" ji bo xwequrbanîkirinê. Deriyê dilê min ji xem û kulan re vekiriye.

Yek ji diyardeyên ku kultûra kurdî pê tê naskirin, kurd ji xwe piştrast in û pir caran dibêjin: "Gera li dûv hêvî û daxwazê, her dê rojekê te bighîne wê mirazê, bila rêça jî te estem be." Heta di çîrokên bi şewat de jî wek a Mem û Zînê, serkeftin li ber

(4) Şiko: Rewneqdarî, heybet, bi tirkî görkem. (Wate)

çavan hatiye girtin. Ne giring e çiqasî Mem di zîndandê de maye, qenaeta bê guman peyvek e ku amajeyê dîke Mem gihîştîye miraza dilê xwe:

Çira le dilî da hebûn,  
Nihênîyekan xoyan le berdemî aşkîra kird.  
Awênîyî dilî ronahî dayewe û  
Xeyal, cêgeyî xoy daye rastî.<sup>19</sup>

Wate bi kurmancî:

Çira di dil de vêketin,  
Nihênîyên xwe li pêşberê eşkere kirin.  
Neynika dil ronahî da û  
Xeyalê, cihê xwe da rastiyê.

Ji kurdên xwedî pêşbînî bûn û di pêwenda wê awatê û wedîhênanê (pêkhatin) de bûn, ew in ku Murad behsa bawerîya wan a pak dîke di roja dadweriyê de:

şahê şanaziyê li ser texta desthilatê rûnişt, bangî xelkê cîhanê kir da ku bicivin û di bin sîwana wî de rûnin, berê xwe da Murad û got: "*Me nihênî tev eşkere kirin.*" Xwedayê cîhanê û mezinê hemû kesên ku li wê derê rûniştine, niha li ser texta dadweriyê rûniştîye. Divê niha dadweriyê di navbera gelan de bike û tiştê ku ji bo wan hêja ye bide wa<sup>20</sup>.

Di dîroka Beha`î de navê hinek kurdan hatiye nivîsandin ku li pey rastiyê digeriyan. Bo nimûne, çîrokek li ser derwêşekî bi navê Mistefa Beg heye, ku çav bi Behê`ulla ketibû û di cih de bawerî bi zanayî û hêza wî ya pîroz anîbû. Her çend e em nikarin bi pi163trastî eslê wî binasin, lê guman tune ye ku ew derwê163 kurd bû, çunkî ji xelkê Kurdistanê, ji bajarê Sine bû<sup>21</sup>. Wî, gava Beha`ulla dîtibû û hinekî pê re axivîbû, ew di cih de ji ser xwarina xwe rabibû û çûbû ser bawerîya wî. Navhatî helbestvan bû, wî evîna xwe ya li ser Beha`ulla di helbestekê derbirîbû, ji ber wê helbestê jî xelkên din jî bawerî bi Beha`ulla anîn.

Sîdiq Elî derwêşekî din î kurd e ku bawerî bi Beha`ulla anîbû. Ebdulbeha di pertûke "Bîreweriyên Wefadariyê" de behsa wî kiriye. Birêz Sîdiq Elî, yek bû ji wan kesên pir ku dest ji welatê xwe berdabûn û bi pey Beha`ulla ketibûn û pê re ketibûn zîndanê jî.

Ew derwêş mirovek bû; wî wek hev du danûstandin digel dost û biyaniyan dikir. Ew ser bi Terîqeya Sofîyan bû û nivîskar jî bû. Demeke baş bi cil û bergên hejariyê borandibû, "*şeraba qanûnê*" vedixwar û li ser wê mezhebê diçû, lê wek sofîyên din jiyana xwe ji bo heşîşê terxan nekiribû, berevajî wan, xwe ji xeyalên betal pak kiribû

û bi tenê li dûv Xwedê digeriya, behsa Xwedê dikir, bi rêça Xwedê de diçû. Behreyeke wî ya baş ji bo nivîsandina helbestan hebû. Wî, helbest ji bo sitranan dihûnan da ku ji bo Xwedê werin gotin. Dinya jê re rast nebûbû û piştê xwe dabûyê. Di nav helbesteke wî de ku di zîndana bingeha leşkerî ya Ekka de hûnabû, kopleya yekem a helbestê wisa bû:

*Qiflî daxrawî to sed dil be dawewe dekat û  
Katê ke zulfî be badedey, dilan deşwatewe*

Wate bi Kurmancî:

*Qufla te ya daxistî sed dilan dixê dafikê  
Gava tu zulfê didî ber ba tu dilan vedişo*

Ew ruha azad û serbixwe, li Bexdadê û cihêkî xweş î dûr bandorek hîşt. Hilhatina stêra seherê ji jor asoya Îraq ve bi ber çavan ket û xelat ji wê hetava hilhatî wergirt. Beha'ulla dil revand û şeydayî wî hevalê nazik bû. Her çend e peyakî bêdeng bû, lê bi gelek zimanan peyama xwe radigihand. Gava bawerpêkirên Beha'ulla bi jivan bûn ji Bexdadê derkevin, wî daxwaz kir moletêkê werbigre daku meyteriyê (seyîs) bike. Hemû rojên ku bi karwanê re diçû û şev dadihat ew bi hespan re digihîşt. Ji dil û can kar dikir. Ji bo ku xwe vehesîne bi tenê dema piştî nîvê şevan diçû nav cihê xwe, lê xew pêra dima û digot: "*Seriyê neçe çewalê kayê ye.*" Di heyama seferê de dil ji evîneke tasebar hatibû dagirtin û şîhir digotin. Ew gelekî di ber dilê hevalên xwe re diçû. Ji wî re mirov tê gotin: Çunkî ew rastgo û rastîbêjekî bê şaşî bû. Ew evîn bi xwe bû, ew pakiya dil bû, ew xoşewîstê Beha'ulla bû. Hêviya wî ya mezin ew bû ku bibe meyter, wê hêviyê ew wek padşahêkî dikir, bi rastî wî şanazî axê dikir. Ew dûrî çewtiyê bû û ji dil de çavdêrîkirina Beha'ulla dikir.

Karwana evîndaran pir bi rê de çû, gihîşte Stenbûlê, berev Adiryanopil derbas bû. Di encam de ber bi Zîndana Ekka ve çû. Sîdiq Elî di wê seferê hemû de hebû û bi wefadarî xizmeta fermana wî dikir.

Gava li serbazxaneyan bûn, Beha'ulla şeveke taybet bi navê Derwêş Sîdiq Elî diyar dikir û nivîsand: "*Divê her sal di wê şevê de derwêş cihêkî ji bo civînê bixemlînin, divê di nav baxa gulana de be û li wê derê jî derwêş bangê xwedê bikin.*" Wî di dirêjîya axaftina xwe de got, nabe derwêş wisa bin, şev û rojên xwe bi şer û dijayetiye biborînin, lê bi berevajî wê yekê, divê derwêş kesin bin ku ji bilî Xwedê ji hemû tiştên din cudabûyî bin, destên xwe ji yeksaniyê bernedin, di ola wî de rast û dirust bimînin, li ser peymanê wî wefadar bimînin û di perestîna de berdewam dibin. Ew ne navê wan kesane ku wek Îranî dibêjin, serberdayî û yên nav kolanan ne, mêjiyê wan hatiye biraştin û giraniya li ser xelkê ne, reşokîtir û bêdebe in. Wî der-

wêşê payebilind tevahiya jiyana xwe li jêr sîbera hezkirina Xwedê borand. Wî bi yekcarî xwe ji hemû tiştên cîhanî birîbû. Xwazyarê xizmetê bû û ji dil de xizmeta îmandaran dikir. Xizmetkarê hemûyan bû û wefadarê derganeyê pîroz bû.

Înca dema wê yekê hat ji bo ku ji mezinê xwe dûr nekeve, berga jiyane ji ber xwe bike, li ber çavê xelkê çû sîberê, lê bi çavê hişê xwe çû cihekê wek rojê sakar e û li wê derê li ser texta şanaziya hertimî rûnişt. Ji zîndana vê cîhanê rizgar bû û li erdeke fireh û berîn konê xwe vegirt, bila Xwedê her demê ji xwe ve nêzîk bihêle û di wê cîhana veşartî de digel yekgirtina her demî û riwangeyê tîjî şadî pîroziyê bike. Bila di nûra re te de were pêçandin. Şikoyê Xwedayekî li ser be ku xwediyê hemû şikoyan be. Gora wî li Ekka ye<sup>22</sup>.

Ev jî be 165êke ji wehyekê ku ji aliyê Beha'ulla ve û bi şanaziya Sîdiq Elî hatiye 165kere kirin:

*“... Sonda min bi mezintirîn nav e ku bi çavê min dikeve! Di vê rojê de mirov gelekî keser dike dil bide tiştên riwaletiya vê dinyayê! Raperin, dest bi sebeba Xwedê bigrin. Ji hevdu re xoşewîstir bin. Ji bo xatirê yê ji hemûyan xoşewîstir, perdeya nefsanîyê bi yekcarî bişewtînin, bi rûyên bi ken û geş riftarê bi hev du re bikin. Hemû xisletên heqê we bi çavan dîtine. Min nexwastiye şevê bibore û dilê yekî ji dostên Xwedê ji xulamê we biêşê. Dilê hemû kesên cîhanê bi gotinên Xwedê ronahî bûye, heyf e ew agir nekeve canê we jî. Bi xwasta Xwedê ez hevîdar im ev şeva pîroz bibe şeva yekgirtinê, hevîrtî bin û riftara baş û rêkûpêk danûstandinê bi hevdu re bikin. Bizavên we bila ji bo vê yekê terxankirî bin ku tu girift neyêne ser rastiya me. Di nav xelkê de bi awayekî danûstandinê bikin ku nîşana Xwedê li ser we derkeve. Çunkî hûn di nav mirovan de yekemîn in ku ji ber ruhê wî ji nû ve xuliqîne, hûn yekemîn in ku jê hez dikin û stûyê xwe jê re xwar dikin, hûn yekemîn in ku bi dor texta şikomendiyê ve gew (helqe) girêdidin. Ez sondê bi wî dixwim ku sedemê hebûna min e, her tiştê ku bi wî xweş be ez dê eşkere bikim! Wê yekê bizanin ku akinciyên şahnişîna wî, ji we baştir li ser we dizanin. Gelo hûn bawer dikin ev axaftin pûç û betal in? Xwezî desthilata we heba, we ew tişt fam bikin ku Xwedê wan gelekî bi rehm dibîne û başiyên texa we derdixin, şahidê hêj-abûn û pileya we ya bilind in! Xwedê bike, xwast û hesta we ya her timî nebin rêgirên bicîkirina armanca we.”<sup>23</sup>”*

Bêhnfirehiya (sîngfirehî) Sîdiq Elî hate pîroz kirin û bû yek ji kesên ku dikarin di helbestên kevin ên kurdî de gelek amojgariyan bidin, rastî bi henaseya canê xwe didîtin. Riya wê yekê vekir ku kurdekî din were dîtîn, bi sîngfirehî, ola Beha'î berhemêz dike. Beha'ulla awêneyên sîngfirehiyê didan. Con Êslêmint di pertûke xwe

Ola Beha'î de eşkere kiriye:

*" Heta wan çend pêngavan jî cihên xwe girtibûn û rewşa sîngfirçiya birayane ya dualî di navbera firqeyên olî yên cur bi cur de peyda dikirin. Çi guhartineke balkêş li cîhanê hatibû holê! Lê ji bo ku yekîtiya rasteqîne bi ber dest bikeve, tiştekî zêdetir pêwîst bû. Sîngfirçî ji bo nexweşiya firqexwaziyê (şovînîzmê) azar-revînekî pir bi nîrx e, lê ne çareseriyêke binertî ye û sedema arîşeyê jî ji nav nabe.*

... Di serdemên berê de civakên ku ji olên cuda cuda pêk dihatin nikarîbûn yekgirtî bana, ji ber ku alîgirên her aliyekî, rêça xwe bi baştirîn rêç didan zanîn û qanûnên xwe jî pîroz didîtin. Her pêxemberekî jî gava peyamek dianî, civakê ew bi dijminê xwe yê rastîn û serekî dida zanîn. Firqeyên cuda cuda yên civakê ji ber hevqebûlnekirinê ji hevdu dihatin birîn. Bawerpêkirên her firqeyekê, desthilata bindestbûnê ji hizra ola xwe qebûl dikir û şiroveyêke taybet ya deqa peyama damezrînerê ola xwe wek tekane ola rasteqîne werdigirt û hizrên olên din jî bi şaş didan zanîn. Xuya ye jî heta ku bi vî awayî karên xwe bi rê ve bibin, tu yekgirtina rasteqîne bi wan re nagunce. Ji aliyekî din ve, Beha'ulla wê şîretê dike ku her pêxemberekî di serdema xwe de bilindtirîn peyama rasteqîne aniye û ragihandiye, her hemû jî di esil ve yekdeng in û beşek in ji bernameyêke mezin ji bo perwerdekirin û yekkirina mirovatîyê. Navhatî, banga hemû xelkên mezhebên din dike, bi riya terxankirina jiyane ji bo bidestve-anîna wê yekgirtinê ku tevahiya pêxemberan jî ji bo wê armancê hewl daye, rêzeke mezin ji bo pêxemberê xwe jî bigrin<sup>24</sup>.

Şêx Mihêdîn Sebriyî Mişkanî<sup>25</sup> (1860-1940), meseleyên hezkerinê yên hemû ol û gelan balê wî kişandibû, mîrxasiya wî hebû da ku biçê nav cîhana nû ya zanîne û kirdariyê. Çîroka wî têkilî ya bavê min dibe ku nêzîktirîn biraderê bavê min jî bû.

Wek ku biraderan digot şêx Mihêdîn xelkê Bakurê Kurdistanê<sup>26</sup>, sune û ji binemaleke birêz û zengîn bû. Di hijdeh saliya xwe de xwendina olî bi dawî anîbû, ji ber hişyarî û zanistîya wî ya pir bi çavekî bilind li wî birêzî dihat seyrkirin. Di jiyêke biçûk de ji mala xwe derketibû, çûbû Stenbolê, ji wir jî çûbû Zanîngeha Ezherê ya olî li Misrê.

Hevalê bavê min bû; heyamekê jî li çapxaneyê bavê min kar kiribû. Ji ber xweşnivîsa wî jîbernivîsîna pertûkan karek ji karên wî bû li çapxaneyê. Ew yek di destpêka sedsala bîstem de bû. Car caran wî biraderên Beha'î didîtin, bavê min hest pê dikir ku ji ber wan li çapxaneyê maye. Di heyameke dirêj de zaniyarî li ser ola Beha'î bi dest xistibûn û bibû alîgirekî bi coşê wê olê.

Dawiyê çû Tûnis û Sûdanê û li wan deran jî gelek dost û birader ji xwe re peyda kirin, peyama Beha'ulla gihande wan û ew hatin civaka berbelav ya cîhanê ya

alîgirên wê. Di dirêjîya wê heyamê de şêx Mihêdîn mêrxasî, yekperestî, serbixweyî û hizir û fikirîneke mezin nîşan dida. Wî rêz ji hemû mezhebên îslamê re digirt, ew qasî di wê mijarê de xwe dida pêş heta radeya ku hinek caran li Misirê bi dengê xwe Qur'an ji bo hinek civakên şî'eyan dixwend. Heta ji ber meseleya sîngfirehiya li hember xelkên ser bi aliyên cuda cuda yên îslamê kete ber çavdêrî û dûrxistinê. Ew bi xurtî û qayîm li ser bawerîya xwe ma û ji bo xelkên ku piştevaniya wî dikirin bû nimûneyekî nû yê jiyânê.

Di serdema şêx Mihêdîn û bavê min de li çiyayên kurdî yên Îranê û li Sine û wan gund û bajarên ku kurd lê dijîn, xelk bi rêbaza ger û lêkolînê de diçûn û amojgariyên ruhî û civakî yên Beha'îyan werdigirtin. Rêkxistina ruhî damezrandine da ku zarokên xwe perwerde bikin û pêşkeftina ruhî ya civaka xwe dabîn bikin. Niha jî di bizaveke cîhanî de ji bo berhingarbûn û kontrolkirina gelek arîşeyên sedsala bîst û yekê de beşdar in. Hinek xizmetkariyên giring ên mirovatiyê derdikevin rojevê, destpêka wan vedigere kurdan.

Yek ji wan Elî Ekber Firûten e, îmandarekî temam ê rêça Beha'î ye. Ew li ser psikolojiya zarokan û felsefeya perwerdeyê pispore. Firûten hemû şiyânên xwe pêşkêş dike da ku yekîtiya mirovatiyê bibe rastîyeke cihgirtî. Karên wî ji perwerdeya nav gundan ve heta amadekariya bernameya gotaran li ser radyoyên seranserî welat û hetta karûbarên heveng ên navneteweyî pêk tî. Wî di gelek waran de xizmet kiriye, çî di warê rêvebiriyê de, çî di warê perwerdeyê de, bi berdewamî jî teblîxa zanîna xwe kiriye tew hemû jî bê pozbilindî û rûmeta wê yekê jî bi wî hatiye dayin wekî "*Destê Sebebê Xwedê*" bê naskirin, ku di dîroka Beha'îyîtiyê de çend kesan ev rûmet wergirtiye ku xizmetên bêhevtî kirine.

Firûten giringî da kultûra kurdî û bi wê yekê jî mezin bû. Bavê wî ji hoza kurdî ya ferhad xanî bû. Bavê wî Beha'î yekî pêbend bû. Dayîk û dapîra wî ji aliyê bavê ve ku di heman malê de dijîyan, ji destpêkê ve dijî ola nû bûn, lê piştê her du bûn beha'î yên dilsoz. Heger ew bi tenê nîşaneyek be, bûyereke balkêş e jî, çûnkî di jiya sinêliyê de Firûten bo heyama çend mehan li deverêkê jiyaye ku akinciyên wê kurd û ermenî bûn. Piştî wan salan, ciwanî û xeml û xêza çiyayên Qawqazê ku li dora bajarên Bako û Gence û Tiflîsê bûn, her di bîra wî de mabûn. Ew der bûn heman cih jî ku ji bo wanegotinê lê digeriya<sup>27</sup>. Bi kêmanî wî du caran serdana Bexdadê jî kiriye.

Vî xizmekarê mirovatiyê nivîsandinên Beha'î baş xwendine; yek jê axaftinên Ebdûl. Wî, di axaftinên xwe de karîbû bi zimanekî sade û zelal behsa babetên estem<sup>(5)</sup> bike. Di vî warê de hêjabûna hişê mirovan û amojgariyên bilind radigre, guhdar hest bi dilxweşî û dilrihetiyê dikin. Hinek ji hevalan bi bîra wî tî, ku çawa behsa mandina Beha'ulla li çiyayên Kurdistanê û di nav gelê kurd de dikirin.<sup>28</sup>

(5) Estem: Zehmet, dijwar, sext. (Wate)

Bi rastî Firûten gelek babet xistine ber şirovekirinê û hinek jî di pertûka xwe ya bi navê Dastana Dilê Min de anîne ziman. Di babatekê de ku sebarek bi şadî û xoşhaliya xwe nivîsandîye, axaftina Ebdulhadî aniye ku tê de dibêje: "*Divê her dostek bi qasî ku dixwaze, hewl bide şadî, dilxweşî û xoşhaliyê bixe dilê kesên ku di peywendîya wî de ne*<sup>29</sup>." Wî û hevsera xwe û hevalekî wan, di jiyana xwe de amojgarî û dilgeşiya biraderên xwe yê delal bilind dihiştin, nemaze ya zarok û sinêlan ku dilê wan tijî şadî dikirin<sup>30</sup>.

Di wê pertûkê de Firûten li ser zarê zêrevanê ola Beha'î dibêje:

*"Herdem melayên Zanîngeha Ezher dixwast ziyane bighînin ola Beha'î, lê bi berevajî daxwaza wan, di encama êrişkariya wan de ola Beha'î li Misirê hate azadkirin." Her wisa ku ``Çiqas êş û azar hebin jî nabe Beha'î ji bûyerên wiha bitirsin, çunkî guman tune ye ku di encam de ew yek dê di qezenca wan de be*<sup>31</sup>."

Ew biraderê birêz bi zanebûn behsa qurbanîkirin û serîxwarkirina ji dil de ji bo rêxistina olî dike. Her wiha camêrî, hêminî û serbixweyî û azadbûnê di fenatîzma xwe de radigihîne. Yê ku guh dane vî mamostayê mezin, wateya nefsbîçûkiyê (poznebilindiyê) fam kirine û bi wê rastiye hesîne ku hemû tişt bi Xwedê ve girêdayî ye û "*ew jî wan tiştan dike ku bi xwe dixwaze*."

Rêberên desthilatdar û melayên xwedî rêz, ku her ji destpêkê ve dijayetiya ola Beha'î kiribûn, qet hêviya bersîveke wiha nedikirin, ji ber ku kurd bi mêvandariyê hatibû naskirin, bi şiyana xebat û alîgirên serhişk ên wê olê dihatin naskirin ku ji ola piraniya xelkê cuda ne. Lê her çawa be, ewê li jêr bandora vî tundûtîjîyê de be, hesteke perwerdekirî û pêşkeftî heye, evîneke wî ya kûr û rast heye, pêbendîyeke wêrek nişan daye, ku wiha kiriye ji destpêkeke zû ve gelê kurd ji bo vî olê vekirî be, hetta ji serdema Baw ve ku pêşengê Beha`ulla bû.

Hejmareke mezin ji şî'eyên Îranê ku hembêzê xwe ji bo ola Beha'î vekiribûn -ev ol rêbaza Baw jî vedigire-, wiha li desthilatdaran kirin, li deverên kurdên une mezheba Bawîyan zîndanî bikin, ji ber ku nedixwastin xelk bi ola nû bihese. Baş fam nekiribûn ku dilsoziya wan ji bo îslamê ye, ji bo rêbaza Beha'î jî xwe amade kiribûn. Çîroka Elî Xan, zêrevanê kurdê Qelayê Mako, wê cihê ku Baw lê hatibû zîndanî kirin, bi tenê nimûneyek e.

Her çend e awaya karên Elî Xan bi şiklî hişk bû, lê ji derûnî ve mîhrebana bû. Şevkê Hezretî Muhemed di xewna xwe de dîtibû û li gor ezmûna piştra her wê xewnê ew hîdayet kiribû û bi temamî bawerî bi hêza ruhaniya Baw anî<sup>32</sup>. Ji wê demê û pê ve Elî Xan bi temamî xwe ji bo Baw kire qurban. Akinciyên derdorê bi gîştî kurd bûn û wan jî xwe ji bo Baw kirine qurban. Têgihîştina ji rastiya kesekî ku pêştir bi

yekcarî ne wek wan bû, nîşana rastgoyî, têgihîştina baş, dilêrî û sîngfirehiya wan e, her wiha hêza ruhî ya Baw e jî.

Li derdora Makoyê xoşewîstiya Baw çû nav dilê pir kesî. Elî Xan jî hesta xwe ya dilsozane derdibirî gava wan kesan serdana Baw dikir. Rewşê wisa dom kir heta ku ferman hat, Baw bo zîndaneke din bê veguhastin. Zîndana nû li kelayeke çiyayî li Cehrîq (Çarî) bû. Wek ya berê zêrevanê zîndana nû jî kurd bû, navê wî Yehya Xanî bû û wî jî xwe ji bo Baw kire qurban. Yehya Xanî destûr dida xelkên xerîb û biyanî serdana Baw bikin. Di nav wan de derwêşek hebû ku ji Hindistanê hatibû. Di cih de bawerî bi ola nû anî û şahidî da ku dema ew li Hindistanê bû û bawerpêkirê NE-WABê bû, Baw li wî xuya bûye, li wî nihêriye û dilê wî biriye, di encam de hewl daye bigihê wî. Baw bi çavekî tijî wate lê nihêriye û jê re gotiye: *"Dest ji cil û bergê xwe yê bi xeml û xêz berde, ji welatê xwe derkeve, bi lez, bi peyatî were, min li Azerbaijan bibîne. Li Çarî tu yê bigihê miraza dilê xwe."* Wî jî şopa wî gerandiye û gihîştîye armanca xwe<sup>33</sup>.

Ew bûyera balkêş li Gundê Çarî li nav gelê kurd qewimîbû ku gelek ji wan li ser rêça terîqetê bûn. Derwêşek jî ji riyeke dûr ve tê û digihê miraza dilê xwe. Kurdên Çarî ne bi tenê sîngfirehî li hember Baw û xelkên li ser rêça wî nîşan da, rêzeke mezin jî ji Baw re girtin; rêzeke ji adetê der li wî digirtin. Her roj daxwaza du`aya xêrê jê re dikirin û baweriya xwe bi xurtiya wî ya ruhanî dianîn.<sup>34</sup>

Peywendiyên gelê kurd û Ola Beha`î gelek in, bi awayekî ku nayêne jimarê. Ez dê vê behsê bi giringtirîn peywendiyê bi dawî bînim ku ew jî wek yê din koka wê di xwezaya vekirî û sîngfirehiya kultura kurdî de ye. Ew li gor giringtirîn rûyê Olî ye, wate: Beha`ulla. Ew peywendî di encama zincîrek bûyerên diltezîn de bû, ku ji dema Bawê ve dest pê kiribûn.

Çavnetirsiya neasayî ya Tahîre nî169an dide ku rêberê wê, wate Baw, bawerpêkirên rêça xwe li ser mezheba xurt û zêrevaniya serdema xwe hîn kiribûn û guhartineke gelekî giring bi ser wan de anîbû. Wî, rê jî ji wan re xweş kir ji bo zanîyariyeke nû û soz da wan di sala 9 de ji bo mirovatiyê were pêşkêş kirin. Bi vî awayî Baw erka xwe kurt kir, lê wek stêreke rijyayî ronahî da.<sup>35</sup>

Dema ku desthilat gihîştin wê baweriyê, tu tişt nikare hezkirina xelkê ji bo wî rawestînin, ne zîndana yek kesî ya Makoyê û ne ya Çarî, biryar dan ku divê ew bê ku169tin. Ferman ji bo waliyê Azerbaijanê derçû, Baw bibe bajarê Tewrêzê û li wê derê jî li ber çavê xelkê wî bajarî bide ber guleyan. Berî ku navhatî di roja 9 ya Tîrmeha a sala 1850î de li ber çavê xelkê bê kuştin, bûyereke balkêş rû da.

Baw û alîgerekî wî bi werîs bi dîwarê serbazxaneyekê ve hatin girêdan û fewcekî 750 kesî ji çekdarên ermeniyên îsayî anîn da ku teqeyê li her duyan bike. Kerenêlê

Fewcê ku navê wî Sam Xan bû nedixwast fermana teqelêkirinê bide, ditirsî ku xezeba Xwedê lê bibare. Tê gotin Baw bawerî dabûyê û jê re gotibû: "*Fermanê bicî bike, heger niyeta te pak be, Xwedayê mezin dikare te ji xembariyê rizgar bike.*"

Gelek şahidên wê bûyerê dibêjin:

*"Dema ku fewc bi rêz sekinî û 750 tiving pêk ve teqîn, dûmana tivingan perdeyêke reş bi ser meydanê de berda. Gava dûman vekî 170î, xelk ma şaş û metel, ji ber ku bala xwe dane hevalê Baw li ber dîwêr rawestiye û Baw bi xwe jî wînda bûye! Ew werisê ku her du jî pê hatibûn girêdan qetiyaye. Piştî lêgerînê derket ku Baw her li wê odê ye ku şeva pêştir lê hatibûn ragirtin, bi hêminî fermûdeyên dawî yên pertûka xwe dide.<sup>36</sup>"*

Ev deqa wan axaftinan e ku ew girtî li ser daxwaza Xwedê hatiye parastin, digel derketina feraşbaşî<sup>(6)</sup>, jê re got:

*"Hevdîtina min bi Seyîd Husên re bi dawî hat, tu dikarî fermana xwe bîncê.<sup>37</sup>"*

Di cih de feraşbaşî ji wê derê çû, Sam Xan jî dest ji berpirsiyariya gulebaranê berda. Kerenêlekî din hate pêş. Bi heman awayê berê Baw û hevalê wî bi dîwarî ve hatin girêdan. Vê carê piştî teqekirinê laşên wan şerpeze bû, lê tişt bi rûyê wan nehat. Axaftinên Baw yên dawî ev bûn:

*"Of, ey nifşa bêpaxav (sersar)! Heger baweriya we bi min heba, we dê ev kur ji xwe re bikira nîmûne, ku di rêza serî de rûniştiye û bi serbestî serê xwe ji bo rêbaza min ditewîne. Rojek dê were, hun dê min nas bikin, lê wê rojê ezê ne di nav we de bim.<sup>38</sup>"*

Ji bo em vegehin ser meseleya xwe, piştî nêzîkî sê salan ji şehîdbûna Baw û di sala nehemîn a rêvebirina ola wî de, peyama Beha'ulla eşkere bû. Diyar bû ku navhatî erka peyamnêriya şêx Ehmedî Ehsayî bi rê ve dibir, naveroka wê jî ew bû ku du derketinên bilez û li pey hev tînin<sup>39</sup>. Ji destpêka wê olê ve peywendiyêke tijî remz û raz di navbera Baw û Beha'ulla de hebûn. Nîşanên wê peywendiyê gelekî ji wê yekê mezintir in ku di vê nivîsandinê de werin destnîşan kirin, lê Beha'ulla yekser li pey Baw rabû, bû giringtirîn zêrevanê hizra wî. Baw bi navê nû yê Beha'ulla bang dikir, gelek nivîsên wî hatin eşkere kirin, tê de "*bi kesekî bi nav dike ku Xwedê bi xwe dê wî eşkere bike.*"

Ji ber dilhişkiyên berî şehîdbûna Baw û berevanîkirina xurt a Beha'ulla li alîgirên xwe ku pêştir Bawî bûn, piştî du salan ji bûyerê rewş gihîşte wê astê, zîndan kirine Siyaçal anko şikefteke gemirî, ku embarekî bajarê Tehranê bû. Zîndanîkirina

(6) Feraşbaş: Ew kesê li dam û dezgehên xizmetkariyê dike.

Beha'ulla di çalê da, di serdemekê de ku hewla terorkirina şah hatibû dayîn, Tahîre û gelek ji Bawiyân tevî ku bêgunch bûn hatibûn girtin û kuştin.

Di germa havînê de Beha'ulla bi zincîrê girêdan û bi serrûtî birin wê derê, li wir jî zincîr bi stûyê wî ve kirin. Zincîrê ew qas kar tê kiribû heta dawiya jiyana wî jî paşmaya wê her xuya dikir. Di wê kuna bêderî, bêronahî û genî de, yekem nîşana namêya wî eşkere bû:

*"şevkê di xewnê de ev axaftinên şikodar ji her aliyekî ve hatin bihîstin: Bi rastî divê em serkeftina te ji te û qelesa te daxwaz bikin. Te ne xem e, çî bi ser te de hatiye, ji ber wê ez li ser te natirsim, tu di selametiye de yî. Berî ku Xwedê gencîneyên erdê bilind bike bi demeke dirêj, ew mirovên ku ji bo rêbaza te û navê te alîkariyê dikin, Xwedê dê dilên wan kesên ku ew nas kirine bi çî vejîne.<sup>40</sup>"*

Piştî çar mehan di çala genî de Beha'ulla hate rizgarkirin. Lê mulk û malên wî hatibûn zeftkirin û destûra mandina li Îranê jê hatibû standin. Di çileyê zivistanê de tevî jin û zarokên biçûk û çend dostan ve ber bi Bexdadê bi rê ketin. Tarawgeyê<sup>(7)</sup> ji welatê wî dûr bû. Tendirustiya wî ji ber eşkenceyê û perîşaniyê têk çûbû, şiyana wî kêm bibû bi hawara paşmaya civaka Bawî de biçûk û peyama wî jî ji bilî wî li cem tu kesê din nehatibû naskirin. Piştî çend mehan ji seferê di çiyayên rojavayê Îranê re ew gihîşt axa kurdan, di qonaxekê de ew li Gundê Kirind vehesî, hakimê wê deverê Heyatqulî Xanî yê ser bi ola Elyelaî bû. Wî hakimî mêvandariyê germ li surgûnkiriyân kir, Beha'ulla jî bi dilxweşî û xoşewîstî bersiva wî da.<sup>41</sup>

Di qonaxekê din de, akinciyekî bajarê Xaneqînê ku nêzîkî sînora Îranê ye û jî Gundê Kirind ve jî ne gelekî dûr e, mezintirîn karên sofîyên Beha'ulla wergirtin. Li vê derê ez behsa wê bûyerê nakim, ezê balê bikşînim ser hevdiînen wî yê din ên digel gelê kurd, rast li nav dilê Kurdistanê. Her yekî ji pêxemberên Xwedê berî ku peyama Xwedê aşkere bikin, cihek ji xwe re hilbijartibûn da ku lê bi tenê bimînin û kûr hizir bikin. Mûsa diçû biyabana Paran, Îsa çil rojan û çil şevan li biyabanê maye. Bûda gelek salan li bakurê rojhilatê Hindistanê digeriya. Muhemed di şikeftên Çiyayê Hera de akincî bû.

Cihê ku Beha'ulla jî ji xwe re hilbijart ji bo ku lê bi tenê bimîne û hizir bike, bajarê Silêmaniyê bû. Nayê zanîn jî çima Beha'ulla Kurdistan ji bo wê meremê hilbijartibû. Lê wek ku bûyer xuya dikin, xelkên wê ta radeyekê têgihîştî bûn û hêza ruhî di axaftinên wan de hebû, heta ji wan dihat jê ve nêzîk dibûn û ji wê jêderê nû yê zaniyariyan ku ketibû berdestê wan gelek zaniyarî werdigirtin, ji ber vê hindê jî, di dîroka Beha'î de giringiyê Kurdistanê ya mezin heye, her lewma jî Beha'iyên cîhanê rêzê lê digrin.

(7) Tarawge: Welatê xeribîyê, nefîgeh, ciyê sirgûnê.

Çiroka mandina Beha'ulla li Silêmaniyê berevajî wê baweriyê ye ku dibêje di warê zaniyarî û aloziya bîrkirinê de Kurdistan devereke paşketî bû. Rast berevajî wê yekê ye: Heger xelkên Kurdistanê bi tenê bi riya du yanê sê xetên nivîsandina wî bi girîngiya kesayetîya mirovekî dihesin, çawa tê gotin, Kurdistan ne çiyekî pêgihîştî ye? Heger her ew xelk biçin çiya û li kesayetîya wî ya giring bigerin û bi xweşî hizir û nêrînên wî vekolînin, kî dikare rêza wan ji bo zanist û fêrbûnê înkâr bike? Bi ser wê yekê de jî, çawa kesek dikare mêjîvekiriya wan bide aliyekî, ku qîmet didan axaftinên wî, di demekê de ku ew axaftinê digel kultûra xelkê ya berê cuda bûn.

Xelkê helbestên wî digel ên nivîskarên mezin ên klasîkî berawird dikirin û daxwaza şirovekirinê dikirin, sebarek bi pirsên felsefî yê kevin û nêrînên olî û bêhtir li axaftinên wî guhdarî bikin. Bi rastî tiştek tune ye were hizirkirin da ku şiyana rûhî ya mezin a wan pir mezin nîşan bide, wek em dibînin, Beha'ulla li ba wan berî ku helwêsta xwe eşkere bike di cihê pêxember da bû.

Girîngtirîn taybetmendîya gelê kurd dema ku bersiva Beha'ulla dayî, ew cudahiya ye digel xelkên din, ji ber amadeyî û camêriya wan, divê ew bikaribin bi heman riwangeya ruhî ya ku gihîştîbû wan, raperin yan jî bi kêmanî bi dadperwerane bizavan bikin. Lê piştî wê hevdiîna dilxweşker digel xelkê Silêmaniyê, ji ber êş û azarên zor û netebayîya dijwar, wî bi yekcarî xwe ji civakê dûr xist.

Di wê xem û qisawetê de bû ku di wehî QILÛ'ET TU'AM de nivîsî

*"Deryayeke ji xeman ez girtim, ku tu kes nikare dilopekê jê vexwe. Qisaweta min jî bi awayekî ye ku hinek maye ruhê min ji laşê min cuda bibe". û " KEMAL guh bide dengê vî tenê yî, gêrikê şûnde mayî û xwe di kuneke reş de veşartîye, dixwaze ji nav we here û ji ber çavên we winda be, ji ber tiştên ku destê mirovan kiriye. Bêguman Xwedê bi xwe 172ahidê di navbera min û xizmetkarên xwe de ye.<sup>42</sup>"*

Beha'ulla piştî ku gihîşte Bexdadê bi salekê, di roja 10 meha Nîsanê (1854) de çû Silêmaniyê. Tu kesî, endamên mala wî jî nizanîbûn ew dê biçe û biçe ku derê. Bi cil û bergên derwêşekî gerok, nasnameya xwe bi yekcarî veşart. Xwe bi navê Derwêş Muhemed da nasîn, li biyaban û çiyayan jiyana bi tenê (xelwe) ji xwe re hîlbijart û werzêran<sup>(8)</sup> "di salê de bi tenê carekî yan du caran ew dihat dîtin, ew jî demên çandin û komirina dexil û danî bûn."<sup>43</sup>

Beha'ulla bi xwe li ser wan rojan nivîsandiye:

*"Em bi xwe çûn çiyayên Kurdistanê û li wê derê me heyamekê jiyana bi tenê borand. Stargeha me li serê çiyayekê bû ku bi dûriya sê rojan rê ji*

(8) Werzêr: Pale, sepan (Wate)

*cihê akincîbûna mirovan ve dûr bû. Bi giştî pêdiviyên jiyane tunebûn. Em bi yekcarî ji peyajoyn xwe qut bûbûn...*<sup>44</sup>

Ev yek ji nizayên (dua) Beha`ulla ye ku di heyama jiyana xelweyê de nivîsandîye: "Xwedêyo! Dilekî mezin di laşê min de û wijdanekî aram di derûna min de bixulqîne. Hêvîdar im bi riya hêza ruhî min di riya xwe de pesend bikî. Ey mehbûbê min, di rêbaza xwe de şiko bixe serê min. Ey Xwedê mehbûbê min! Bi hêza xwe ya ji radeya têgihîştina me der, di biheştê xwe ya pîroz de jiyane bide min. Ey çavkaniyê hebûna min, ku Xwedayê minî, bi nefesa hertimiya xwe min şad bike! Bila awaza te hertimî bexteweriyê ji min re bişîne. Ey hevalê min, bila samana rûyê te yê dêrîn, ji bilî te min ji hemûyan dûr bixe. Ey serwerê min, bila pêla eşkerekirinê cewherî ya ji fewtanê nehatiye şadiyê ji min re bîne. Ey bûnê hemû bûnekê û veşartiyê hemû veşartriyekê!<sup>45</sup>

şevkê şexekî Silêmaniyê ku xwediyê mulkeke nêzîkî çiyana bû, Hezretî Muhemed di xewna de dîtibû û jê re gotibû: "*Li Derwêş Muhemed bigere.*" şêx fermana wî hezretî bi cî anî û Beha`ulla dît. Wê bûyerê bi yekcarî jiyana bi tenê ya Beha`ulla bi dawî anî. Piştî wê hevdiîtinê bi heyameke kurt, rêberê Terîqeya Xalîdî serdana Beha`ulla kir.

şêx Isma`îl hêvî jê kir li bajarekî nêzîk wate li Silêmaniyê bimîne; "*navendeke fêrbûnê*" ku bi behra zikmakiya pir û bi tekiyeyên nûkirî dihat naskirin û ji ber peywendiyên digel Selahedîn Eyûbî û bav û kalên wî" ku wê derê gelek ravevanên nasdar ên Îslamê Suncê derketibûn û peyrewa wan jî bi wane dihatin gotin<sup>46</sup>...

Serincê şêx Isma`îl û 173êxên din ên terîqeta Neqîşbendî bi şewq ew ber bi Beha`ulla kişandin, dema ku Beha`ulla li Tekiyeya Mewlana Xalîdî dijîya şahidekî bawerpêkirî, hate Silêmaniyê û şahidî da ku ew şêxên naskirî û alîgirên wan yên pir xwe kirine qurbanên wî. Xoşewîstiya Beha`ulla, dilrifên, riwange, têgihîştina wî li ser tiştên nediyarên olî û felsefî;

*"gelek zana, mamosta, şêx, doktor, kesên pîroz û beg, ku li Silêmanî û Kerkûkê di kor û civînan de beşdarî kiribûn kirine bawerpêkirên rêça wî*<sup>47</sup> *û dixwastin biçin cem wî û mifahê ji zanist û aqilê wî werbigrin, rêz jêre digirtin ta radeya ku hinekan ew bi yekî ji kesên xeybî da zanîn û hinekên din jî wek zanayekî biwarê kîmiya û xemil lêdanê hesab jêre dikir. Ew ên din jî pileya Tewera Ka`înatê didayê, hejmara alîgirên wî ne kêmtir bû ku bawer dikirin cihê wî ji yê pêxemberan ne kêmtir e. Kurd û ereb û îranî, xwendevan û nexwendevan, bilind û nizm, genc û pîr, yên ku ew nas dikirin bi heman awayê rêzeke mezin jêre digirtin"*<sup>48</sup>.

Bersiva rind a xelkê ji bo Beha`ulla piştî xweşiktirîn nivîs û daxuyaniya wî ya bi

nirx hat. Wê lehiya eşkerekirinê li Kurdistanê dest pê kir û li Bexdadê jî dom kir. Rojekê ku hîn Beha`ulla li Silêmaniyê bû, şêx Isma`îl û feqîhên wî daxwaz jê kirin hinekî ji beşa estema pertûka "*El-Fitûhat El-Mekiye*" a sofîyê bi navûdeng Endelosî (*Ibn El-Erebî*) rave bike. Di çend derfetan de aloziya de hinek beşên estem ên pertûkê ji wan re şirove kirin. Zaniyariyên wî sebarek bi sofîtiyê, bandoreke ew qasî mezin li ser sofîyan kir ku daxwazê jê bikin helbestekê wek a "*El-Ta`iye El-Kubra*" ya Ibn El-Farêz sofî û şairê binavûdengê ê Misirê bihûne, ku ta wê demê hizir dikirin tu kes nikare karekê wiha berhem bîne.

Beha`ulla helbestek bi zimanê erebî ya 2000 rêzikî honand, lê bi tenê 127 rêzik hîlbijartin û dan sofîyên Silêmaniyê. Piştî xwendina helbesta Bulbulê Biheştê, sofîyan têkest kir ku ji aliyê xeyal û belaxet û naverokê ve ew helbest ji ya El-Ta`iye El-Kubra baştir e.

Di çameyê de Beha`ulla wisa behsa êş û azarên xwe dîke:

*"AvaTofana Nûh bi tenê rêjeyeke rondikên ku min barandine, agirê Îbrahîm alafê canê min e, xemê Yeqûb ne tişt e, dibe ku bi tenê qandî tîşkên xemên min bin û karesata Eyûb jî beşeke ji ziyarên ku gihîştine min."*<sup>49</sup>

Ev helbest tê naskirin ku têde Beha`ulla gotûbêjan digel firîşteyê asmanî dîke, azebekî biheştî, ku bi rastî ew ruhê Xwedê ye. Bi berûvacî Ibn El-Farêz ku çêdibe hizra xwe ji Wehdet El-Wicûd wergirtibe wate bawer dikir ku Perwerdgar bi xwe hemû ji yek madeyê xulqandine, Beha`ulla têkest dîke Xwedê ji asta "*mewda*" فرمانê derketiye, ku xaneya pêxemberan e.

Piştî ku Beha`ulla vegeriya Bexdadê, xelkê Kurdistanê ku xwe kiribûn qurbanê wî, piraniya wan jî rêberên olî bûn, hejmareke mezin ji zana û sofîyên bi regez kurd ji herdu terîqetan qadîrî û xalîdî bi pey wî ketin<sup>50</sup>. Canfîdayiya wan bala kesayetiyan mezin ên Bexdadê kişand, wek Ibn El-Elûsî muftiyê Bexdadê, şêx Ebdulselam, şêx Ebdulqadir û Seyêd Dawûdî. Ji bilî ku zanistiya Xwedayî û kesayetiya Beha`ulla zêdetir û zêdetir bandor li wan dikir, di encam de gelek welatîyên binavûdeng û rêberên wî bajarî bûn alîgirên Beha`ulla. Her hemûyan dixwastin deng wî bibihîzin û çî pirsiyara wan jî hebe jê bikin.

Ji kurdên ku wê demê peywendî bi Beha`ulla re kiribûn, du kesan ew qasî pirsiyar jê kiribûn û bersiv wergirtin, qet nayên ji bîr kirin. Di Çiwar Dol de Beha`ulla bersiva şêx Ebdurehmanî Kerkûkî<sup>51</sup> dida û behsa sefera wî ya bajarê Sine dîke û navê wî jî eşkere dîke ku ew xelkê Kerkûkê ye ji Kurdistanê. Tê gotin ku bi kêmanî sed hezar alîgirên şêx Ebdurehman hebûn ku rêberê terîqeta qadîrî bû.<sup>52</sup>

Navhatî xwediyê ruheke perwerdeya vekirî bû ku Beha`ulla gelekî jê hez dikir, di

wê serdemê de ku Beha'ulla li Silêmaniyê bû stûyê xwe jê re xwar kiriye. Mihrebanî û şikoyî û xoşewîstî û hesta nazikî tevî hişyariya Beha'ulla li hember şêx Ebdurchman, gelekî digel navê kesê ku di nameyê de hatiye digunce.

Beha'ulla di nivîsa xwe de ya bi navê Heft Dol de, bersivê şêx Mihêdîn dawerê bajarê Xaneqîn dide<sup>53</sup>. Şewqî Efendî di pertûka xwe de ya bi navê "*Xuda Bêreda Têper Debêt*" "de dibêje: "*Divê wek hêjatirîn nivîsa Beha'lla li vê nameyê were seyrkirin*". Di Heft Dol de Beha'ulla şiko dide pêgeha Muhemed û agehdariya wê yekê dike ku riya çûnê berve bi tenêbûna sofîtiyê bi hinek kes ve nehatiye girêdan ku li ber çira derketina Xwedê ne. Ew bi mihrebanî û hinek caran bi gotina;

*"ey cih bilind", hinek caran jî wek "ey xoşewîst" û carcaran jî wek "ey bira" berê xwe dide şêx Mihêdîn. Beha'ulla jê re dibêje ew ezmûna sofîtiyê ku dixwaze peyda bike ji famkirina Xwedê pêk tê: "Ey paye (cih) bilind ji te eşkere ye, rêwî di qonaxên sefera xwe de hemû rengên cuda yên hebûnê dibîne, lê bi rast tu ji ruwangeya xwe ve dibînî."*<sup>54</sup>

Ew hemû û têgihîştina rastiya aqilî ên din jî ji rewşa mirovatiyê têne naskirin, Xwedê ew keresa balkêş daye me ji bo ku em wî nas bikin. Lê Xwedê ji gewherê xwe de pîroz e, li jor bineçe û newe ye, cihê wî jûr û derva ye, ew bi hemû ezeliyekê de derbas bûye û tiştên ku mirov dixulqînin jêra gerek nakin, ew dê her demê jî wiha bimîne. Heta niha tu mirovî ew nas nekirîye, tu canî riya hebûna wî nedîtiye. Tevahiya rêzan di biyabana naskirina wî de winda bûn<sup>55</sup>...

Tiştê balkêş e ew e, çima Beha'ulla axaftinên ku berî wî hatine gotin dûpat nake, li ser wê yekê mirov dikare bêje, biçûkiya xwe dide xuyakirin û girêdana xwe ya temam bi Xwedê ve pesend dike:

Merema me derbarê dûpatnekirina axaftinên wan ne di rûyê şanazî û xirûrê de ye, lê nişana wehb û wefadariyê ye.

Heger Xidir di nav deriya de belema (qayik) xwe şikandiye,

Di wê şaşiyê de jî hezar rastî hene.

An na, ev xizmetkar xwe wekî kesekî dide naskirin ku bi yekcarî navê wî windabûye û nemaye, heta ji aliyekî xoşewîstekî Xwedê ve, ew yek çî qasî kêmtir e ji hizûrê wî yê pîroz. Mezinî ji bo Xwedê Tebarek û Tu'ale ye!<sup>56</sup>.

#### **Perawêz:**

1- *Ehmedê Xanê, Mem û Zîn (dêra 1798), li gor wergera Firensî, Mem û Zîn, l 233. di wergera Elêksî û Hesen da hatiye:*

*Si tu memprisonneç cent années./ Je ne perdrais pas l'espoir de tatteindre.*

- 2- Ebdelah Sehîh Froş, Îstdlaliyey birayî Ehlî Heq (1966) "Behaîyanî grîngî serdema Behaula legel hendek pêşîneyên dîrokî" (1985), 1 318 da hatuwe.
- 3- Marpa Rûp, "Tahîreya Pak" çapa piştî pêdaçûnê (1981), p 45.
- 4- Binêre: Ebdulbeha, nivîsên Ebdulbeha yê helbijartî, hejmar 227, p 302.
- 5- Nivîsa Marpa Rûp p 65-66.
- 6- Çawpêda xişandinek ji aliyê civalên mêjûyî yê nû li Iraq (pi\_tre wek belavokekê bi navê "Quretû alcyneyn awa kuşt" belav kiriye), beşê 2 (Îrşad, Bexda, 1971), 1. 190 temaşeyî paşkoya 6 vike.
- 7- şewqî Efendî xuda bêreda têper debêt p 75.
- 8- Ebdubeha, Yadeweriyên Wefa 1971 z, p 194.
- 9- Wek Marpa Rûp veguhastiye, p 62.
- 10-şewqî Efendî xuda bêreda têper debêt p 75.
- 11- şêx Mihemed Îkbar, Cewadname, ji farsî hatiye wergerandin bi pêşgotina û bîranînên A. C. Arbrî, (1956), p 92.
- 12- Behaolsn Hewt Wadî p 41.
- 13- Perawêz 2, ku amaje bi (hezretî) Mihemed Mistefa dike, p 111, ji kitêba "نبيل الأعظم" (Mihemed Zerendî) bi navê şebec şikênan (1974) \_ p 272 yekem car di sala 1932 de çap bûye.
- 14- şebec şikênan p 272.
- 15- Boçûnên balyoz derbarê Tahîre di wê serdemedê ku li Bexdayê bû yek ji wam tabloyan ghiştibûyî (Bab, Peyamberî rojî rojan (1973), p 163.
- 16- Perawêz 3, ku amaje bi (hezretî) Mihemed Mistefa dike, p 272, ji şebec şikênan
- 17- Marpa p 60.
- 18- Wek Marpa Rûp destnîşankiriye p 121-122
- 19- Ehmedê Xanê, Mem û Zîn (qorê 1822-1833) ji tercemeya Firensî hatiye wergirtin.
- 20- Behaîanî Nawdar, p. 321 (Dibê Mistefa Begê kurdî şairê navdarê kurd û birayê Salimî Sine be. wergêr).
- 21- H. M. Balyozî, Behaûla: şay şkodar.
- 22- Birîanên Wefaî P 36 – 38.
- 23- Nivîsandinên komkirî yê Behaûla çapa duyem (1976) p 316 – 317.
- 24- Marpa Rûp p 62.
- 25- Herwiha bi şêx Mihîdîn Sebrî sinindicî Kanîmişkanî jî dihat naskirin.
- 26- Kanîmişan û Sine li Rojhilatê Kurdisatnê ne, ne li Bakur in.
- 27- Çîrokî Dil-im p 29.
- 28- şîzû Fûta, beha`iyeki Kenedeyî ew hizir girtiye.

- 29- Çîrokî Dil-im p 200.
- 30- Heman jêder p102.
- 31- Heman jêder p \_ 60.
- 32- şebq şikênan p 255 – 259.
- 33- Heman jêder p 305.
- 34- Heman jêder p 302.
- 35- şewqî Efendî xuda bêreda têper debêt, p 3.
- 36- Wîlyem S. hacr û Cey. Daglas Martîn, Aynî Behayî: serhldanî aynî cîhanî (1985) l 18 -119
- 37- şewqî Efendî xuda bêreda têper debêt, l 53.
- 38- Heman jêder
- 39- Heman jêder p 92.
- 40- Heman jêder p 101.
- 41- Heman jêder p 108.
- 42- Heman jêder p 118.
- 43- Heman jêder p \_ 120.
- 44- şebq şikênan p 585.
- 45- Doa Û Xeluey Behaula, girdukoyî û wergêranî şewqî Efendî, çapa dawî pêdaçûn (1938) jmare 155, p 248 .
- 46- şewqî Efendî xuda bêreda têper debêt, p 122 .
- 47- şêx Sultan, Bavê zavayê Axayî Kelêm p 121.
- 48- Heman jêder p 123.
- 49- Heman jêder p 124.
- 50- p 118.weku di heman cihî de destnîşan kiriye
- 51- Heman jêder p 128 – 129.
- 52- Çêdibe ku Hacî şêx Ebdurehmanî kurê şêx Ehmedî Zengene be ku sala 1858 yan jî 1859 wefat kiriye.
- 53- Heman jêder p 122.
- 54- Heman jêder p 28.
- 55- Heman jêder p 22-23.
- 56- Hemna jêder, p26. ew qorên şîhir yêna Celaledîni Romî ne.

# Cilê Kurdî

## Hem Kelepûr e Hem jî Nasname ye

Mihemed Ferîq Hesên

Cil û berg ne tenê çend parçe qumaşên rengareng in ku laşê mirovan dinixumînin, tew ew ji bo bejn û bal û rûyê mirovan dekor in jî. Tevî ku ew mirovan ji serma û germayê diparêzin laşê wan jî vedişêrin û dadipoşin. Cil û berg beşek ji hunerê millî ne jî. Nasnameya gelan in, gel bi wan jî hev têne cihêkirin û têne nasîn; ew bûne marka û ewêti<sup>1</sup> gelan. Her weha ew tevî selîqe, çêj û hîlbijartina reng, neqş, nîgar û temamkerên wê, gelek kitekîtan jî bi xwe ve digirin. Regeza jinan nîvê dema xwe ya ku ji bo hîlbijartina destek cil terxañ dike, nîvê wê bi hîlbijartina xwarina danekî mijûl nabe. Ew cilê xwe diguhere, lê kêr û zêde dike, dibe ser firoşyar û cildirûyan.

Dîzayn û birîna cil û bergan bi serê xwe huner û afirandin e; her wekî dariştin û afirandina kevalê (tablo) şêwekaran. Cil komêk fîger in ku di jiyane de pêdiviyên mirovan pê heye. Çîn û neqş (saw), reng bi tonên xwe ve, xêz bi cureyên xwe ve tê de roleke girîng dilîzin. Em dikarin bêjin cil kelûpelê millî ne û taybet bi gelekî diyarkirî ne. Ev jî tê wê maneyê ku cil çavkaniya xwe ji wîjdan, hest û arezûyan (mîgêz) werdigirin. Wan çavkaniya xwe ji encama berhevbûna tecrubeya nîfşan wergirîye û gihîştine forma xwe ya îroyîn. Tiştin lê hatine zêdekirin an jî jê nehatine kêmkirin. Yanê cil û berg ji ber xwe ve û bi ços û xiroş nehatine pê.

Em nîfşa nû jî wekî bav û bapîrên xwe hîni wan bûne û dilê me pê xweş e. Di van cilan de em hest bi wê çendê dikin ku em milletekî xwedî mêjû ne û em xwe bi tiştêkî dihesibînin. Ez dikarim tekeziyê li ser wê yekê bikim ku piraniya kurdên li

.....  
*Ji Kurmanciya Jêrîn: Eşref Sîdar Doxan*

derveyî welêt cilên kurdî hene. Kurdên li derve, her çend cilên xwe yên kurdî her sal li Newrozê li xwe dikin jî, ev yek ji bo wan girîng e û ciyê kêfxweşiyê ye. Ji ber ku ev cil millî ne û ji wî aliyê ve mirovên koçber bi niştîmanê wan yê resen ve girêdidin.

Cil hindêk caran sembol û dirûvên pîroz jî bi xwe ve digirin. Bo nimûne, bi bawerîya gelek kesan gava kurdek sê girêyan li piştîna (şûtik) xwe ya qumaşîn dide, armanca wî pûtedayîn e bi hevotên zerdeştîyê û ev yek çavkaniya xwe ji Avestayê werdigire. Zerdeşt di Avestayê de ji dilxwaz û tagirên xwe dixwaze li gorî sêyaneya "hizra baş, gotîna baş û kira baş" tevbigerin. Yanê ew sê girêyên piştîna kurdewarî ne bêmane ne; ji ber xwe ve peyda nebûne. Tew rîç û rîşalên wê yên kevin û dînî hene. Dibe ku ev yek bi hezaran sal berî niha hatibe. Gelo çima kurd piştîna qumaşîn girêdidin? Gelo sûda du guhên "kulebal<sup>2</sup>"ê Hewramiyan ku ew bi xwe jê re dibêjin 'ferenci' çi ye û ji çi hatiye? Cihê gotinê ye hewramiyan herdem cil û solên xwe bi xwe çêkirine.

Em niha jî derbarê piştîna kurdewarî de tiştêkî bêjin. Piştîna kurdî ji bo masûlkeyên pişt û zikê mirov dibe palpişt, nemaze di dema pêkanîna karekî giran de pişt û zikê mirov radigire û diparêze. Her weha ew bi kêrî hilgirtina xencer û rext jî tê; demançe jî li ser wê tê girêdan. Jê pê ve tu dikarî wê raxî û li ser nimêjê bikî. Ger li hev hat, tu dikarî birîna xwe jî pê bipêçî. Erka wê ya xemilandinê jî heye. Her weha tu dikarî kelûpelê xwe pê werpêçî û bide ser milê xwe. Em dikarin bêjin piştîna temamkerê cilan e û nav û navtenga mirov jî germ dihêle, nemaze di werza zivistanê de. Her weha ew doxîna şerwal û şelûşapikê vedişêre. Diyar e li ba şervanekî xuyakirina doxîna şerwal û şelûşapikê ne tiştêkî pesend e.

Cilan her wekî ku naverokeke civakî heye, wan dirûv û amajeyên aboriyê jî bi xwe ve girtine. Ew ji amajeyên kulturî jî ne bêpar in. Mirovê kurd di nav van cilan xuyanî dibe. Bejn û bala û rûyê wî şêwe û teşe digire. Bi ciwanî tê dîtî û xwe nîşanî derdora xwe dide. Yanê cilûberg jî beşek e ji nasnameya niştîmanî.

Dema ku tu wekî bînerêkî van cilan li ber mirovan dibînî, tu li cografya û mêjûya Kurdistanê jî difikirî, ji ber ku ev du têgehên pêkve girêdayî ne. Cil, çinîn, zexrefe û xêzên kevanî, xil û xwar û rast li xwe vedihewînin. Rengên cur bi cur hildigirin, nemaze cilên jinan. Neqş, nîgar û endazeyî tê de ye yanê ew ji zîrekî û hunerê jî ne bêpar in. Wek diyar e cilê kurdî bedenfireh in ne ku bedenteng in. Cilên bi vî awayî beşek in ji şaristanî û taybetmendiya gelekî.

Digel van cilên xwemalî, cilên ewropayî yên jinan û mêran jî hene. Lê em ku hêj ne gelekî serbixwe ne, pêwîst e cilên me wek dirûv û sembolekê bo netewe û rîş û rîşalên me li ba me girîng bin û em wan li xwe bikin.

Carna cure û babetekî cil û kincan dîroka serdemeke zêrîn ji me re dibêje, dema

navê serkirdeyekî dîrokî hildigire û dibe pêgîrê nav û dîroka wî-wê. Ji ber ku di dema xwe de hostayên baş yê cil û bergan bi taybekarî, ji bo çûna ser text û wer-girtina posteke bilind ku li ser wî nehatiye tapokirin. Wekî ew destê cilan ê taybet ê şêx Mehmûdê melîk ku heta niha jî kêfa xelk pê tê û girîngiya xwe ji dest nedaye. Dema ku kurdek li şêxan, şengal û Deştê Mûsilê nikare dest ji cilên erebî hilgire û cilên bav û bapîrên xwe li xwe bike ku kurdî ye, ev helwesta wî wiha tê ravekirin ku qaşo ew nikare dest ji wê şikl û bergê berde ku dagîrkeran li wî/wê ferz kiriye. Di rewşê wiha de ew kes nikare jî bi kurdane nefikire, tew ew wekî xwediyê resen ê cilên lê difikire. Ji ber ku ew di zarokatiya xwe de çavtirsîyayî bûye. Wêrekî û azayîya wê çendê ji dest daye ku ji bin nîra dagîrker bifilte. Liberxwekirina cilên millî û neteweyî mafê her mirovekî ye. Lê her çend îro ro jê re li hev hatiye jî, ew hêj her nikare bibe xwediyê yek ji mafên xwe yê sereke. Ev tak (ferd) di zarokatiya wî de çavtirsîyayî kirine yanê tepeser kirine, pêwîst e niha gelek hewl digel wî bê dayîn da ku dest ji vê pêç û girêdana nelihevhatî berde ku ji binyada dîroka wî nayê. Çimkî ew bi wî halê xwe takekî wiha ye ku binyada wî hatiye têkdan.

Cilên kurdewarî ji berbanga mêjûyê ve heta niha digel pêşveçûna hestê statîkî, migêz, dîn û pêdivîya jîyanê ya li ba takê kurd, gelek guherîn bi ser de hatiye. Her weha eger tu cilên îroyîn û cilên sedeyên 16ê û 17ê yê kurdan bidî ber hev, ku rojhilatnasên jêhatî portreyên wan çêkirine, tu dikarî wiha rave bikî ku guherîn bi ser nêrîn û kesayetiya mirovê kurd de hatiye. Wek guherîna nêrîna wî ya li ser bedenê jin û mêran û çawaniya xuyabûna wî bedenî li hember yê din.

Digel guherîna di dîn de, guherîn bi ser cilên mêr û jinan de jî hatiye. Çawa ku duyaneya heram û helal, tesîr li ser jîyan, rabûn û rûniştin û xurakê tak kiriye, her bi wî awayî tesîr li cilan jî kiriye, nemaze piştî qebûlkirina îslamê ji aliyê piraniya kurdan ve. Her weha cudahî di navber jinên qerwaş û jinên azad de hebûye, ji ber ku civakê guh nedaye wê yekê ku beşek ji bedena qerwaşan xuya bike. Bo nimûne zêde guh nedane ku qerwaş rû û ser û gerden û pêyê xwe ji mêran veşêrin. Di nav mêran de jî bi cilên ku li xwe kirine mirovê azad û kole ji hev hatine cihêkirin.

Peyvên "*serrût, devrût, çêprût û ... hwd*" nav û nûçikên kirêt in, armanc ji wan ew jin û mêr in ku hijmeta xwe neparêzin, leçik an mêzerê nadin serê xwe. Heçî jin in ser û gerden û pê û paqên wan xuya dikin. Bi vê çendê jî kêmasî dikeve kesayetiya wan. Xuya ye nêrînen bi vî rengî yê bo cilan niha guherîne.

Me berê jî amaje bi wê çendê kir ku cil li gorî serdemê diguherin, wekî ku di wan fotografên di serê sedeya bîstê de xuya dikin; gava em wan digel cilên îroyîn bidin ber hev emê guherîna tê de bibînin. Tew sinêlan (nûhatî) jî, ji bo ku ji aliyê formê ve bibin xwediyê kesayetiya xwe ya kamil, hatine lewendî (feqiyane) û şaşik girêdane. Lewra peyva "*serrût*" ji bo jin û mêran wek dijûn û çêr bûye.

Cil bedenê mirov ji serma û germa diparêzin. Wî dinixumînin, şikil û peykerê mirov berceste nîşan didin. Cilên jinan û mêran li ba her grûbeke etnîkî ji aliyê şêwe û reng ve xwedî taybetmendiyeke cihê ne. Nabe mêr cilên jinan û jin jî cilên mêran li xwe bikin. Her ew yek çêdibe; eger jin li ser kar û nav gund cilên mêran li xwe bikin gilî nayê ser wan, lê tu carî nabe mêr cilên jinan li xwe bikin. Ji ber ku ew tişt yekser "*jinkirina mêr e bi riya cilan*" û ev jî hema bêje wekî kêmkirina bihayê mêran e ku ew bi xwe sermiyanê civakê ne. Her wiha bi riya cilan asta çînayetî û statûya civakî ya mirovan jî tê nasîn. Cilên jineke cotkar û jineke axa gelekî ji hev cuda ne.

Ji herêmekê bo herêmeke din a Kurdistanê dîsa awayê pêç û girêdanê diguhere. Hindek parçeyên cilan hene ku dibe sedema bercestekirina pitirî beşek ji bedena mirov. Wek piştîna jinên Seqizî ku bejn û bal, navteng û simtê jinê dixê ber çavan û piçek tehrîq jî tê de heye. Mirov dikare zêr û zeber û xişr jî wek temamker, ciwankarî û xemlandina zêdetir a cilên jinên kurd bi nav bike. Wek "*taskilaw*"<sup>3</sup> yan piştîna zêr ya di vê serdemê de.

(الجسد والمجتمع) dibêje, (صوفية السحيري بن حثيرة)، Di pirtûka xwe ya bi navê

"Cil yek ji şengisteyên (esasên) kesayetîya neteweyekê ne. Cil neteweyekê ji neteweyên din cihê dikin û mohreke taybet didin wan. Bi giştî rewş û rû û rûçik, rabûn û rûniştin, taybetmendiyan civakî û exlaqî, bawerî û şaristaniyan wê li ser xuyani dibin. Cil, helwesta civakê ya li hemberî beden diyar dikin. Cil, ji aliyekî ve bedenê mirov vedişêrin, ji aliyekî din ve jî statûya civakî ya beden jî aşkere dikin. Her weha alîkariya me dikin da ku em xwe bişibînin yên din; em bi riya cilan li yên din diçin. (Rûpel 118)"

Niha dema em li wan ezîzên Deşta Mûsilê difikirin, em dimînin heyirî. Em nizanin gelo em baweriya xwe bi kîjan aliyê wan bînin. Bi cilên wan ên ku erebî ne yan bi zimanê wan ê ku kurdî ye? Em ji neçarî dikevin nav gêjgerînkî pirseke gumanbar. Çima zimanê vî kesî digel cilên wî nagunce? Gava ji min re li hev hatiye ez geriyame, lê min heta niha diyardeyeke bi vî awayî li ba tu gelên din nedît.

Di dema xwe de di pirtûka "*Mêntelêti Xêl (Mantelîteya Eşîran)*" de, di beşa "Ewêti takekesan kom dike" de min bi kurtî amaje bi vê çendê kiribû:

"Heye mirov ker û lal be, lê cil ne kerr û lal in. Cil xwedî ziman in, bal û çavê pê dikeve. Cilan têkilî bi çavê me re heye ne ku bi guhê me re. Cil ne bêalî ne. Eger mirovekî çefî û egalek da serê xwe, ew ewêtiya xwe ji me re aşkere dike. Yanê ew mirov ser bi civakeke erebî ve ye, lê bi kurdî diaxive. Di rewşeke wiha de bi kêmanî divê em bêjin, wî kesî ewêtiya xwe di navbera du grûbên etnîkî de dabeş kiriye, yanê mirovekî dureh e; xwe-

diyê ewêtiyeke nivê wê netamam e! Wî ne ku her tenê xwe, tew kesayetî, ewêtî û hemû ew navend jî ku lê dijî parçe kirine. Yanê ewêtiya gelemperî jî parçe kiriye."

Endam û dilxwazên mêr ên komên îslamî yên usulî û radîkal dixwazin di awayê girêdan û cilan de jî xwe ji hev û dû cuda bikin. Yek kewayî<sup>4</sup> dirêj dicibîne, lê yê din ya kurt. Qaşo ger cilên mirovan fireh bin, ew dikarin rehetir rabin û rûnin. Ev jî digel hevotên dinê îslamê nagunce. Derbarê pirsê e'wretiya zîlam û jinan de cudahî di navbera ravekaran de heye û gelek tişt jî di vê yekê de hatine nivîsîn. Wek em dibînin hin jinên musulman tenê çavên wan xuya dikin; li Efxanistanê çavên jinan jî xuya nakin, ji ber ku hin îmamên wê derê çavê jinan li ser me bi e'wret dihesibînin. Naxwe divê jin hin cilan li xwe bikin ku çav û rûyê wan bigirin.

Li gorî (صوفية السحيري بن حنيرة):

"Cil di nav xwe de bo kesên din peyamekê dihewînin. Bi vê yekê helwesta xwe ya li hember civakê, rêbaza xwe ya di jiyandê de û daxwaza xwenasandinê aşkere dikin. Rewş<sup>5</sup> û dîdara mirov navnîşana wî bi xwe ye, di vir de ew giwêrayel<sup>6</sup> yan bi ser vê neteweyê ve ye yan bi ser ya din ve ye, bi ser vê eşîr û çînê ye ne ku bi ser yê din ve ye.

Her vê meseleya cilan kiriye ku îro ro li welatê Misir û li Ewropayê gelek devjenî û liberhevdan pêk bînin. Li Misirê arîşe li ser wê çendê bû; zanîngehan qebûl nedikir ku xwendkar bi peçeyê bikevin nav zanîngehê yan hola ezmûnan. Ev mesele mezin bûbû. Tevgerên dînî xwe lê kirin xwedî û ew gihandin ber dadgehê. Di dawiyê de mesele di berjewendîya wan de hate çareserkirin. Gerçî li ba Zanîngeha Ezherê peçe û burqe girîng nebû, ji ber ku li gorî Ezherê Xwedê fermana poşîna peçe û burqeyê nedaye. Di vê yekê de hikumeta Misir û Zanîngeha Ezherê xesirîn, grûbên dînî jî wan bir. Lê li Fransayê encamê vê meseleyê bi hinceta ku azadkirina rû ji bo pêkvejiyanê merc e, bi beravajî Misirê dawî lê hat. Hate gotin ku jin bi peçe û burqe wek girtiyekê dixuye. Bi vî awayî di tîrmeha sala 2010ê de Parlamentoya Fransayê biryara qedexekirina poşîna peçe û burqayê di cihên giştî de erê kir. Bi vê biryarê Fransa bû welatê yekem ku peçe û burqa bo jinên musulman qedexe kir.

Cil li gorî dem û cih diguherin. Goristan cihê têkelbûna jin û mêran e. Li ba me jî serdana goristanan rê û rêzana wê heye; her weha roja xwe heye. Ji bo jinan ji bo ku di van boneyan de li xwe bikin cilên hinekî cuda jî hene. Sedema gelek devjenî û arîşeyên navbera jin û mêran li ser awayê lixwekirina cilan e, nemaze di dema çûna sûk û ser kar de û di dema serdana meriv û lêziman de. Sedema arîşe jî zêdetir yan kurtî yan dirêjî yan jî tengî û firehiya cilan e. Aya di cî de ye an ne di cî de ye, şerm e an ne şerm e, guncan e an ne guncan e, şerîet rê pê dide an nade?

Di binyada xwe de cilên mêran cilên mirovên şervan in. Mirovê kurd hîn bûye ku di şahî û Cejna Newrozê de cilên xwe yên millî li xwe bike. Her weha cilên kurdî yên jin û mêran bo nimêjkirinê jî dest didin, ji ber ku hemû bedenê mirov dipoşin. Em dikarin bêjin, cilên millî ji bo kurdan rola dûrişm û nasnameyê dilîzin. Her çend di fermangehan (daîreyên resmî) de cilên ewropî têne lixwekirin, lê ew cilên cîhanî nekarîne girîngiya cilên kurdî kêmbikin. Her çiqas guherîn di cilên kurdî de pêk hatiye, lê bingeha wan her wekî xwe maye.

Kurdên li derveyî welêt tenê li Newroz û ahengên xwe yên daxistî de cilên kurdî li xwe dikin. Ew kurdên ku li cade û cihên giştî şal û şepikek li xwe dikin gelekî kêmbin. Dibe ku kurdên li derveyî welêt ji bo hest bi xwekêmdîtîninê dikin vê parêzê digrin. Lê hindêk ji wan jî li ku derê dinyayê bin bila bibin, bo wan şanazî ye bi cilên xwe yên millî derkevin cihên giştî. Wan dinya fêrî dîtina cilên xwe yên millî kiriye. Di rastiye de cilên wan jî wek yên kurdî xweşikiyeke balkêş heye. Li ser cilên jinên wan neqş û nîgarên taybet bi wan hene.

"Sarê" cilê bûkaniyê ye jinên Hindistanê ye; cilekî millî ye û heta niha jî tê bikaranîn û bûk bi wê têne guhastin. Sarê ji hevrişimê tê çêkirin. Jixwe ger sîmê zêrînî têkelî wê bikin, buhayê wê zêdetir dibe. Niha li şûna karê destçînî, Sarê ji aliyê kargehan ve tê çêkirin. Heçî japonî ne, ku gelekî zindî û jêhatî ne û dinya bi wan dimîne hijmekar, di hilkeft û boneyên xwe de cilekî bi navê "*Kîmono*" li xwe dikin û dest ji vî cilê xwe yê millî bernadin.

Îro ro serê salê li gelek bajarên mezin ên dinyayê pêşangehên cilên millî têne vekirin. Em carinan dibînin û dibînin, kurdên li derveyî welêt jî li Ewropayê pêşangeha cilên kurdî vedikin û xelkê resen ê Ewropayê jî dawet dikin. Jinên destbikêr û pêşekar ên li derveyî welêt vî karî dikin. Di rastiye de cilên millî bi şêwe û rengên xwe beşek ji kulturê gelan pêk tînin. Lewra di vê sedeyê de careke din pûte pê dane û veqeriyane ser wan û wan ji nemanê diparêzin.

Çavkanî:

- صوفية السحيري بن حنيرة، الجسد والمجتمع، الأنتشار العربي بيروت، الطبعة الأولى، ٢٠٠٨.
- محهمه فريق حهسن، مینته لیتیبی خیل، دهنگای ناراس، ههولیر، چاپی بهکهه، ٢٠٠٨.

### **Cil û bergê kurdî di gernameya rojavayîyan de**

Ji sedeya 16ê heta îro, rojhilata îslamî careke din bûye ciyê balpêdana gerok û gerîdeyên ewropayî. Hindêk ji wan derbarê mirovên deverên ku serdana wan kirine de birhatiyên xwe nivîsîne, hindêk ji wan lêkolîn amade kirine û hindêk ji wan jî pirtûk û destnivîs kirîne yan wêneyên wan girtine. Warê kurdan di cerga wan deveran de bûye ku hatûçûya gerîde û gerokan gelekî tê de

çêbûye û li ser nivîsîne. Em dikarin di nav gernameyên rojavayîyan de çendîn serhatî, bîrhatî, agahiyên li ser jiyana eşîrtî û şariştaniyane ya kurdan peyda bikin û bikin çavkanî ji bo lêkolînên li ser dîroka jiyana wan dem û dewranên welatê me. Yek ji wan jî wêneyên destkir in ku ji bo nasîna civaka kurdî ya di wê serdemê de nirx û buhayê wan nayê hesêb; bi taybetî cil û bergên deverên cur bi cur ên welatên kurdan. Me di vê jimarê çend wêne hilbijartin û bi hêviya tamjêwergertin û bo bîstekê balpêdanê em wan pêşkêşî xwendevanan dikin.

### **Pewêz:**

- 1- *Ewêfî: şûnas, nasname, dirûv. (Wate)*
- 2- *Kulebal: Ew êlek û qutikê kulavîn ê hewramîyan ku serê milên wî tûj in. (Wate)*
- 3- *Taskilaw: Êlegekî bi neqş û nîgar.*
- 4- *Kewa: Ew ew entarî û xeftanê dirêj ku mêr li xwe dikin. (Wate)*
- 5- *Rewş: Ev peyva hanê li vir beranberî zahir (dîş görînûş) hatiye bikaranîn. (Wate)*
- 6- *Giwêrayêl: Îteatkar, kesê ku gora tiştêkî-kesekî dike. (Wate)*

گهوارنامهی کتیب



*Şerê Kurd û Farsan*



*Kurdekî Sablaxî*



*Zilamekî eîra Cafê*



*Efserekî kurd di serdema Mîrnişiniya Baban de. Silêmanî*



*Zilamekî êzdî û jina wî*



*Malbateke Nestûrî*



*Kurdên navçeya Herzoyê*



*Nêçîrvanekî kurd bi baz, tajî û cewrik*



*Derwêşekî kurd li Rihayê*



*Kurdên Ermenistanê*



*Dilan kurdî ya piştî temambûna şer*



*Keçikeka kurd li tembûrê dide*



*Siwar û şervanên kurd*



*Dilana jinên kurd*



*Yarî û cirîdbaziya kurdan*

# Ziman

## Çawa Dimrin?

**Tore Janson**



Tore Janson sala 1936ê li Stockholmê ji dayîk bûye. Di zimanê latînî û zimanên afrikî de profesorê xanenişin e. Wî, li zanîngeha California û Los Angeles û li zanîngehên Swêdê kar kiriye. Li ser zimanan bi dehan pertûk nivîsandine û lêkolînên zanistî encam dane.

### MIRINA ZIMANEKÎ


Gaylî (Gaelic) ku zimanekî Gêltî (Celtic) e, heyameke dirêj zimanê Scotlandê bû. Di sed salên borî de gaylî her tim kêmbû û îngilîzî cihê wî dadigirt. Li piraniya deverên Scotlandê zimanê gaylî bi yekcarî ji nav çûye. Ew zarava Gêltî ya ku li East Sutherlandê axaftin pê dihat kirin, piştî hate dokumêntkirin çi bi ser hat?

Heta dawiya sedsala 18ê jî piraniya nişteciyan bi gaylî dipeyvîn. Li ser wê axê ta radeyekê nivîsandin tunebû û xelk mijûlî çandiniyê bû; piraniya wan jî zevî bi kirê ji begên îngilîzî wergirtibûn.

Lê wan began xwest dest ji çandiniyê berdin û zeviyên xwe ji bo xwedîkirina pezî bi kar bînin, çunku bazara hirî û goştê berxan gelekî germ bû. Bê pirs û minet pir-

.....  
\* *Wergêrandin ji swêdî: Rizgar şêxanî \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Hozan Robar*

aniya kesên ku zevî bi kirê girtibûn, ji karên çandiniyê hatin dûrxistin. Ji bo xwedîkirina pezê jî xelkê îngilîzaxêv jî başûr anîn. Kirêdarên berê yê zeviyan li kenarên derya niştecî bûn û bi rêya nêçîra masiyan jî deryayê jiyana xwe bi rê ve birin. Heta niha jî li gundên kenarên derya neviyên wan wek nêçîrvanên masiyan jiyana xwe bi rê ve dibin. Lê ew hejar bûn û hejar jî man. Pêwendiyên wan jî digel kesên îngilîzaxêv ên li derdora wan kêmbû.



Di heyama sedsala 19ê de îngilîzî zêdetir berfireh bû; zimanê dêrê jî bûbû îngilîzî. Gava dibistan jî hatin vekirin, îngilîzî bû zimanê xwendinê. Tenduristî, bazirganî û veguhastin û hemû pêwendiyên din ên digel cihana derve ya gundan, pêdiviya wan çalakiyan hemû bi zimanê îngilîzî bûn.

Ji destpêka sedsala 20ê ve, bi awayekî giştî her kesî bi du zimanan dizanî; gaylî zimanê xelkê yê yekem bû, îngilîzî jî zimanê duyem bû. Ji ber ku îngilîzên ku hatibûn nav gundan jî kêman xwe fêrî zimanê gaylî dikirin, gava kesekî gaylî bi îngilîzekî re têkildar dibû, îngilîzî zimanê axaftinê bû. Êdî wiha lê hat zarokê ji dayîk û bavên gaylîxêv û îngilîzaxêv her tim li malê guh dida zimanê îngilîzî heta ku îngilîzî bû zimanê serekî.

Bi vî awayî li wan gundan piştî çend neviyan ziman hate guhartin ku berê hema hema ziman bi tenê gaylî bû, êdî hema hema bi tenê bû îngilîzî. Ew kesên ku ji dayîk û bavên xwe wek zimanê yekem fêrî gaylî bûne, niha gelekî kal û pîr in. Ciwanên ku tiştêk ji wî zimanê, ji kal û pîran fêr bûne, gelek caran ne amade ne zarokên xwe yan neviyên xwe fêrî wî zimanê kevin bikin. Di çend deh salan de ew ziman dê wek zimanê axaftinê bi yekcarî ji nav biçe - eger tiştêkî derasayî û seyr rû nede û wî zindî neke - û ji ber bîranîna çend zimanzanan ew şêwezarê taybet dê bi tenê di nivîsandinê de bimîne.

Bi vî awayî mirov dikare bêje du sed sal û nîv (250 salî) dom kir, heta ew ziman li devera ku lê serdest bû, ket bin egera jinavçûnê. Pêvajoyê wê demê dest pê kir, dema

ku zimanaxêvên wî welatî ji bo berjewendiya zimanaxêvên desthilatdar hatin piştguhaxistin. Piştî zimanê desthilatdar bi berdewamî bandor û hikariya xwe kir; hêdî hêdî berfirehtir bû. Erkên zimanê civakê yek li pey yekî wergirtin, heta gihîştê wê radeyê ku di nav malbatê de jî îngilîzî bi ser zimanê gaylî de zal bû. Çarenûsa wê qonaxê diyar bû dema ku zarok ji dayîk û bavê xwe bi wî zimanî wek zimanê yekem fêr nebûn anku dest ji wî zimanî berdan wek zimanê dayîkê. Piştî wê demê jî ew ziman bi lez ji nav çû.

Lêkolera amerîkî, Nansî Duryan bi dehan sal li East Sutherland, ji nêzîk ve çavdêriya pêvajoya guhartina zimên dikir. Di nav gelek tiştên balkêş de, ev yek destnîşan kir ku bi neviyên neviyan re ziman bi lez dihate guhartin, ne ji ber bandora zimanê îngilîzî bi awayekî serekî ku wisa tê zanîn, lê ji ber guhartina asayî ya di nav zimên de, dema ku axêfkerên wî zimanî gelekî bi lez kêr dibin.

Nansî Duryan dema ku li ser zimanê gaylî li East Sutherland dinivîsand, biwêja "Mirina Ziman" (Language Death) bi kar dihanî da ku eger bûyer çêbibe "Mirina Ziman" ji bo pertûka wê baş be. Ez bi xwe li ser bikaranîna biwêja "Mirina Ziman" dudilî me ku niha ta radeyekê jî deng vedaye. Ew gotin bi awayekî zelal û eşkere dide xuyakirin ku jiyana ziman heye. Eger ne wiha be, nedihat ber mirinê. Ev hevcuriyeke siruştî ye digel jiyana mirov, lê ev serêşandin e. Mirov ziman bi kar tîne, heta ku ziman jî were bikaranîn dê bimîne. Gava nehat bikaranîn, namîne. Her wê gavê jî ziyaneke mezin a kultûrî çêdibe, lê tiştê ku ji nav diçe zanyarî û şiyana çandekê ye, ne organeke zindî ye.

Mirina Ziman qet nayê wateyê ku tevahiya mirovên bi wî zimanî dipeyivin ji nişka ve dimirin yan têne kuştin. Tiştê ku çêdibe, ew mirov li şûna zimanê ku ji dayîk û bavê xwe fêr bûne bi zimanekî din dipeyivin, bi vî awayî jî zarokên wan hînî zimanê kevin nabin anku serûbinê wê bûyerê, zimanguhartin e.

Cara yekem di dehan salên borî de lêkolera bi kûrahî lêkolîn encam dan ku çawa zimanek lawaz dibe û ji nav diçe. Bêguman ev diyarde ne nû ye û ne cara yekem jî rû dide. Lê niha ji her demê ziman zêdetir ji nav diçin.

## ZIMANÊN BÊAYINDE

Niha li rûbarê dinyayê bi nêzîkî pênc hezar zimanan axaftin tê kirin, lê axêfkerên piraniya wan zimanan kêr in. Niha zêdetir ji pênc milyar mirov hene û piraniya herf mezin ji wan bi zimanekî ji zimanên mezin dizanin. Zêdetir ji çar milyar mirov axêfkerên şeş zimanên herf mezin in. Xelkê din jî bi ser zimanên din de hatine parvekirin; axêfkerên her zimanekî ji wan ji deh milyon kes kêmtir e. Axêfkerên gelek zimanên biçûk jî bi lez kêr dibin û tirs a jinavçûna wan di heyameke kurt de di roj-

evê de ye. Nîşana lawaziyê jî li ser gelek xuya ye û dibe di paşerojê de dîr de bi-kevin bin tirsên rastekî.

Wek ku xuya ye tu carî ziman aram û hêmin nebûne, hertim zimanekî nû geş dibe û zimanekî din ji nav diçe. Lê niha bi awayekî gelekî berfirehtir rû dide. Di destpêka pertûkekê de hatibû nivîsandin, reng e ku çaxê kevîrîn hejmareke mezin ji zimanên biçûk hebûn, lê zimanên mezin tunebûn. Ji berî sê hezar sal ve rewş ber bi vejandina zimanên mezin diçe, lê hertim bi hezaran zimanên biçûk jî hebûn. Niha jî ne tevahiya zimanên biçûk, lê piraniya wan di bin bandor û fişara zimanên mezin de ne; ev bûyer jî bi berdewamî zêde dibe. Di encam de jî her ji niha ve ziman bi lez ji nav diçin. Hemû pêşketinên di vî warî de didin eşkerekirin ku ew lez zêdetir dibe û ta çend neviyên din jî ziman dê gelekî ji yê niha kêmtir bibin, her çend ku hejmar mirovan zêde dibe.

Axêfkerên her zimanekî biçûk ew qasî ne pir in, di piraniya barûdoxan de jî ne bandora wan a siyasî û ne ya aborî heye. Ji ber wê yekê jî piraniya caran jinavçûna zimanekî biçûk li qurziyê cihanê nayê bihîstin. Hinek zimannas bala xwe didin vê yekê û hewl didin raya giştî li ser vê çendê agahdar bikin, lê li cihên dîr ew yek rû dide, ji nêzik ve tu kes jî pê nabihîze.

## LIHEVKIRINA ŞÊWEZARAN

Ewê ku li East Sutherland ji nav çûye formeke zimanê gaylî bû, ne ku tevahiya zimanê gaylî bû. Lê gelekî ji gaylî yê din cuda bû, ji ber wê mirov dikare bipirse: Gelo ewê ji nav çûyî, zimanekî serbixwe bû yan şêwezareke serbixwe bû?

Bi her hal, eger forma zimanekî li hember formeke din a wî zimanî ji nav biçû yan jî zimanek li hember zimanekî bi yekcarî cuda ji nav diçe. Ew forma li East Sutherland jinavçûyî, eger zimanekî serbixwe be yan jî şêwezareke gaylî be, axêfkerên wê formê çûne ser zimanê îngilîzî ne ku ser şêwezareke gaylî ya din. Ev pêşkeftineke girîng a ziman bû. Wisa jî tê pêşbînîkirin, hemû formên gaylî li hember îngilîzî ji nav biçûn. Ger ew jî rû bide, wê gavê zimanek yan jî çend zimanên nêzikî hev, li hember hevdu ji nav diçin.

Tiştêkî din jî heye, bi awayekî berfireh rû dide, ew jî şêwezarên zimanan in ku gelek rênivîs û axêfkerên wan jî hene, her wekî frensî û swêdî û hinek zimanên din, pir caran wek zimanên standard dibin. Hinek car jî bi yek carî ji nav diçin. Şêwezarên swêdî yê deştî bi awayekî berçav rûbirûyê vê yekê bûne. Beşek ji şêwezaran gelekî ji zimanê standart dûrketin, mînak: Êlvdalsmol û pîtêmol "Elvdalsml & Pitêml" û di forma xwe ya rast de nemane. Piraniya şêwezarên deştê beşeke mezin ji gotinên xwe yê taybet ji dest didin û li şûna wan gotinên zimanê standart bi kar tînin. Lê dibe ku

hîn fonetîka wan gelekî ji zimanê standart ve dûr be.

Dema ku şêwezar gelekî nêzîkî hev dibin, ta radeyekê ji ber heman sedema ku ziman ji nav diçin ew jî ji nav diçin. Ev yek jî zêdetir bi xwendin, zêdebûna çalakiyan, başbûna pêwendiyên û hinek tiştên din ve girêdayî ye. Digel wê yekê jî gelekî kêr bi awayekî dramatîkî mirov şêwezara xwe diguhere û li şûna wî zimanekî bi yekcarî cuda bi kar tîne, lê di vê barê de fêrbûn jî pir pêwîst e.

Her çend mijara zarguhartinê babetê gelekî balkêş e jî, lê ez ê li vê derê dawî lê bînim. Bi tenê ez ê xuya bikim ku ne bi tenê şêwezar ji nav diçin, lê bi berdewamî şêwezaren nû jî durist dibin. Lê ew babetê pertûkeke din e. Ev babet bi tenê li ser ziman-guhartina bi yekcarî ye.

### ÇI LI ŞÛNÊ DIMÎNE?

Dema ku zimanek ji nav diçe, çî li şûna wî dimîne? Pir caran nîşanên kêr li şûnê dimînin. Di sedsalên dawî de gelek ziman ji nav çûne û paşmayeyên venasîna wî li pey nemane.

Lê niha bi awayekî giştî zimanê ku ji nav diçe, formek yan nivîsek li pey wî dimîne, kêr caran, eger ew jî nebe navê wî zimanî dimîne. Reng e ku bi xêra karên misyonerekî jî teksteke nivîsandî bimîne, ew jî, yan wergerandina beşekî ye ji pertûkeke pîroz yan jî rêzimanekê sade û ferhengê e.

Eger navnîşanekê baş û teksteke nivîsandî ya dewlemend hebe, wê gave, her kesê bixwaze dikare fêrî wî zimanî bibe û ji nû ve axaftinê pê bike. Ew zimanê ku gelek paşmayan li pey xwe dihêle, bi yekcarî ji nav naçe, belgêyên wî zimanî hertim li ber dest in, ji bo neviyên kesên ku pê dipeyivîn, ji bo lêkolêrên ziman û her kesê ku hez bike fêrî wî zimanî bibe. Ew belge gelekî bi nirx in, ji ber wê hindê divê ew zimanê ku li jêr egera jinavçûnê ne, bi awayekî bêne arşîvkin, lê mixabin tîrsa mezin ew e ku neyên arşîvkin.

Piştî ku zimanek demkê nayê bikaranîn û ji nû ve careke din axaftinê pê tê kirin, gelekî deng vedide. Mînakêke pir naskirî heye, reng e ku bi awayekî bihête belavkin. Ji berî du hezar sal zêdetir ve, zimanê îbranî yê Încîlê wek zimanê axaftinê ji nav çûbû, lê di sedsala bîstê de careke din hate zindîkirin û niha li Îsraîlê ji bo axaftinê û nivîsandinê tê bikaranîn. Ew zimanê ku axaftinê pê nayê kirin, lê bi nivîsandî maye, şaş e bi zimanekî mirî bê hesibandin. Eger ew ziman niha nayê bikaranîn, lê sermayeya wî ya kultûrî jî qet ji nav naçe.

Zimanê ku tu nivîs li pey namînin bi yekcarî ji nav diçe. Dibe ku bi tenê navên çend deveran bi zimanekî wisa bimînin yan jî zimanekî jê ve nêzîk çend gotin jê

wergirtibin yan jî bi kêmanî hikariyeke taybet li ser fonetîka çend neviyên destpêkê yên kesên ku pê dipeyivîn bike.

Nimûneyek li ser kartêkirina ku zimanekî jinavçûyî li pey xwe dihêle û şiyar heye lêkolîn li ser bêne kirin, swêdnîşînên Emrîkayê ne. Di dawiya sedsala 19ê û destpêka sedsala 20ê de nêzîkî şeş sed hezar swêdiyan koç kiriye Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA). Di heyama koçkirinê de û heta çend deh salan jî piştê, li Minnesota û Chicago zimanê swêdî gelekî dihat bikaranîn, lê zarokên koçkiriyan bi lez û bi awayekî berfireh zimanê îngilîzî ji xwe re kirine zimanê yekem; niha jî zimanê swêdî bi yekcarî kêmtir tê bikaranîn. Helkeftên zimanzanî ku di axaftinê de mane, navê gelek cihan in, wek: Stockholm, Uppsala û cihên din, her li Minnesota bandora fonetîka Scandinavia li ser navê pir kesan û şêwezara îngilîzî jî baş xuya ye. Lê "Swêdiyê Amerîkî" bi nivîsandî maye. Di heyama gelek salan de gelek rojname bi zimanê swêdî dihatin belavkirin; koçkiriyan jî berhemeke wêjeyî ya mezin nivîsandiyê. Eger em wê yekê bidin aliyekî ku li Ewrûpayê zimanê swêdî bi axaftin û nivîsandin zindî ye, li Amerîkayê datayeke mezin li pey xwe hiştiye.

## ZIMAN ÇAWA JI NAV DIÇIN?

Li her devereke cîhanê ziman ji nav diçin, di her derê jî pêvajoyek wek hev e. Zimanê ku li devereke teng tê bikaranîn, axêfkerên wî zimanî dev ji wî zimanî berdidin û li şûna wî, zimanekî din bi kar tînin ku axêfkerên wî gelek in û devera wê berfirehtir e. Sedem wek hev in. Eger li hemûyan nebe, li piraniya welatên cîhanê xwendina dibistanan berfirehtir dibe, gelekî kêmtir jî bi zimanên biçûk perwerde tê kirin. Roj bi roj bazirganî û pêwendiyên cur bi cur zêde dibin, ew jî pêdiviyê bi zimanekî hevbeş digel jîngeh û derdoreke mezintir, zêde dikin. Xizmetguzariyên tenduristiyê, bazara darayî û diravê, bac û xizmetguzariyên civakî çend diyarde ne ku axêfkerên zimanên biçûk fêrî wan dibin û bi xurtî pê ve têne girêdan. Ew tişt hemû pêwendiyê digel xelkê din çêdike, ku ne ji deverê ne û bi zimanê deverê jî nizanin.

Ji bilî wê yekê, pir caran axêfkerên zimanên biçûk ji wergirtina zevî û pêdiviyên din bêpar dibin, wek ku li East Sutherland rû dabû. Ew kêmtir caran dikarin yan jî qet nikarin bi zimanê xwe digel desthilatdaran biaxivin, divê ew xwe hînî zimanê desthilatdaran bikin da ku bikaribin mafê xwe biparêzin.

Lê rewş ji welatekî ta welatekî din û ji zerya û kîşwerekê ta kîşwerekê din pir cuda ye. Bi awayekî giştî em dikarin bêjin taybetmendiya rewşa her kîşwerekê heye.

Di vî warî de divê mînak girava Guinea ya Nû (New Guinea) serbixwe were dîtin, çûnku ji her devereke cîhanê zêdetir ziman li wir hene. Rûbera giravê hindekî ji ya Swêdê mezintir e, hejmara nişteciyên wê jî ji pênc milyonan kêmtir e, lê wiha

tê zanîn ku nêzîkî hezar ziman lê hene anku rêjeya zimanên ku li wê giravê axaftin pê tene kirin ji tevahiya zimanên cihanê yê zindî, yek li ser pênc e. Ji aliyê siyasî ve girav wisa hatiye parvekirin: Beşa rojhilat welatê serbixwe "Papua Guinea ya Nû" ye, beşa rojava; bi navê "Irina Jiya" bi ser Indonesia ve ye.

Deşt û çiyayên Guinea ya Nû bi yekcarî asê ne, heta berî çend deh salan jî pêwendiyên di navbera xelkê wê de gelekî kêr û xirab bûn. Xelkê wê ji grûpên biçûk û serbixwe pêk dihat. Jiyan xwe jî bi çandiniyeye sade û bazirganiyê pir sîndar di navbera civakan de bi rê ve dibirin; bi kultureke madî ji demeke zû ya kevirînê tî zanîn. Bi rastî her gundekî wê giravê xwediyê zimanekî bû û parastiyê jî. Piraniya wan zimanan gelekî biçûk in, dibe ku axêfkerên her yekî ji wan, ji sed kesî kêmtir bin û nayê pêşbînîkirin di tu serdemê de ji wisa mezintir bûbin.

Di sedsala bîstê de nemaze di deh salên dawî de, piraniya civakan pêwendiyên bazirganiyê pêk anîn û derfetên xwendinê, peydakirin û pêwendî digel mîsyoner û kesên din jî danîn. Rewş bi awayekî balkêş û ji binî ve tê guhartin. Di encama vê serdema nû de zarok û ciwan wek lehiyê dest ji zimanên xwemalî berdidin.

Zimanekî ji wan zimanan hildibijêrin da ku bikaribin li derveyî gundên xwe jî pêwendiyên pê bikin. Zimanê "Papaw Guinea ya Nû" ne zimanekî cihanî ye, ew Tok-Pisin e (Tok-Pisin ji "Talk Pidgin" hatiye, wate: kokteyleke zimanan), zimanekî ji cureyê "Kriol" e, pêştir pê hatiye axaftin. Gencîneya wî ya gotinan ji îngilîzî ye. Destpêkê li kêlgehê (çewlik) giravên Melanesian li derveyî Guinea ya Nû wek zimanekî "pidgin" dihat xwendin, lê bi lez bû zimanê pêwendiyên li seranserî deverê. Di sala 1975ê de dema ku Papaw Guinea ya Nû serxwebûna xwe wergirt û "Port Moresby" bû paytexta welatê nû, li wê derê nirxeke baş ji wî zimanî re hate dayîn. Ji piraniya xelkê re bû zimanê dayîk û wek amraza hevbeş a neteweyî, wî zimanî cihê xwe girt.

Dibe ku niha li Guinea ya Nû çend sed ziman di berjewendiyê Tok-Pisin de di pêvajoya jinavçûnê de bin. Mixabin ne hêsan e, bê zanîn ku niha li wê derê çi çêdibe.

Di sedsala hejde û nozdehê de li kîşwera başûr li Awustralya ewrûpiyan bi awayekî hovane danûstandin bi Ebor-Guinean re dikir. Niha rewş cuda ye. Dawiyê delîve ji bo Ebor-Guinean hate peydakirin heta ku dengê wan bê bihîstin û bizavên tunekirina wan jî rawestiyên. Lê wek grûpekê ji aliyê aborî û civakî ve hatine dorpêçkirin, ketine ber reftara nijadperestî û kultura resen û awayê jiyana wan ji nav diçe. Gelek sedem hene ku wan han didin zimanê îngilîzî bi kar bînin, ku zimanê piraniyan e, sedemên kêr jî hene da ku ew zimanên xwe bihêlin. Her tişt nîşan dide ku heta çend neviyên din zimanên Ebor-Guinean dê ji nav biçin.

Li DYA û Kanada jî rewşa zimanên hindî yê ku mane, ta radeyekê wek hev in. Her çend e bizav têne kirin da ku beşek ji wan zimanan zindî bimînin, lê têtê pêşbînîkirin heta nîşekî yan du nîşên din piraniya wan ji nav diçin. Tê hizirkirin dema ku ewrûpî hatibûn, nêzîkî sê sed ziman hebûn, heta sala 1960î jî zimanzanan pêşbînî dikir axaftin bi nêzîkî du sed ziman tê kirin. Lê piştî bi çend deh salan bi lez ew ziman kêmbûn, çunku ew kesên herî dawî ku bi zimanekî dizanîn, dimirin, zarokên wan jî zimanê xwe dikirin îngilîzî.

Pêşketinên ziman li Amerîkaya Navêst û ya Başûr jî gelekî wekî hev in. Ne ji demeke zû ve ciwan bi awayekî berfireh diçin ser zimanê spanî û portugalî, lê heta niha jî çend sed ziman mane.

Li Asya û Ewrûpa rêjeya zimanan kêmtir e, çunku pir zû û ji mêj ve zimanên mezin vejîne û piraniya zimanên biçûk daqurtandine. Lê heta niha jî hinek tişt rû didin. Di sedsala nozdehê de Rûsyayê hemû Sîbîrya xist bin desthilata xwe û kontrol kir. Li wir gelek milletên biçûk hebûn. Niha piraniya kesên ku li Sîbîrya dijîn bi rûsî dizanin, gelek zimanên biçûk jî di bin tîrsa jinavçûnê de ne yan jî her neman.

Li Ewrûpayê bi tenê çend deh zimanên biçûk mane, eger rewşa beşên din ên cîhanê li ber çav bê girtin, tu girîngiyekê wan a heja tune ye. Lê li cem me jî ziman ji nav diçin. Mînak, li Swêdê zimanê samî yê başûr, samî yê lulê û samî yê bakur hene, ji wan Samî yê lulê lawaz e, samî yê başûr jî li ber jinavçûnê ye. Lê li Norwecê hinekî xurtir e. Reng e heta çend nîşên din ew her sê ziman ji nav biçin.

Li Afrîkayê rewş cuda ye; li wê kêşwerê nêzîkî hezar ziman hene ku piraniya wan jî biçûk in. Li gorî lêkolînên dawî nêzîkî du sed ziman jî wan zimanan di bin gefên rastekî de ne yan jî wek zimanên axaftinê ji nav çûne. Li wê derê jî wek li kêşwerên din hejmara zimanan bi lez kêmbû.

Ewê ku li Afrîka cuda ye, axêfker bi giştî naçin ser zimanekî ewrûpî yê mezin, wek îngilîzî yan frensî yan portugalî, ku heta asteke baş li Afrîkayê hene û zimanên kolonyalî yê berê bûn û wek zimanên fermî têne bikaranîn û zimanên hemû xwendina bilind in, rojane bi sedan milyon afrîkî bi wan zimanan diaxivin û dinivîsin. Lê axêfkerên zimanên biçûk naçin ser yekî ji wan zimanan. Sedema yekem: Kêmbûna kes li Afrîkayê hene, ji bilî Başûrê Afrîka, zimanê wan yê dayîkî zimanekî ewrûpî be. Sedema duyem: Zimanên biçûk ne li bajarên in, ku zimanên ewrûpî xurt in, lê li deştan in, li wir zimanê biçûk dikeve jêr zimanekî jê ve nêzîk. Hinek çaran axêfkerên zimanekî biçûk diçin ser zimanekî hinekî mezintir ku li heman deverê girîng e. Lê pir çaran zimanekî hildibijêrin ku li welêt û deverên cuda cuda baş berfireh bûye. Li Tanzania û Kenya ziman sewhêlî ye, li Zimbabwe ziman çîşune ye, li Botswana ziman setswana ye, li Negeriya sê ziman hene: hawse, yoruba û igbo ne. Bi vî awayî

gelek ziman ji nav diçin û çend zimanên xurt jî xurtir dibin.

Piştî wan têbîniyan em digihên vê encamê, heta çend nîfşên din, herî kêr, hezar ziman ji 5 hezar zimanên ku niha li ser rûyê erdê hene dê ji nav biçin. Eger merc neyên guhartin û rewş wisa dom bike, heta sed salê din reng e nîvê zimanên ku niha hene ji nav biçin.

Ne hêsan e bi hûrdikî were zanîn çî dê rû bide. Geşbûna hemû zimanan ne wek hev e. Gelek tişt bi axêfkeran ve girêdayî ne. Şiyan heye ev cudahî di navbera du zimanên biçûk ên afrikî de bêne dîtin.



## ŞIYÊYÎ Û TÎMBUKUŞÛ

Li bakurê Botswana, zongaveke balkêş heye. Ava Çemê Okavango dikeve nav beyabana Keleharî, lê rê tune ye jê derkeve, li wê derê di dukereke (dalta) mezin de kom dibe û di hewayeke germ û hişk de dibe hilm. Deşta duker gelekî xak û siruşt xemilandiye, mirovan jî kêr destkarî di wê siruştê de kiriye. Li wê derê fil û şêr û zerafe û gamêş dijîn. Çend gundên biçûk jî hene ku xelkê wan bi nêçîra masiyan û hincê çandinî jiyana xwe bi rê ve dibin. Li xweştirîn cih jî xaniyên biçûk ên nayab û super bo geştyariyê hene. Niha wê dukerê ew dever parastiye.

Xelkê ku li dukerê û derdora wê dijîn, bi ser çend grûpên etnîkî yê zimanên cuda ve ne. Hejmara grûpa wayeyî ji yê din zêdetir e. Tê texmînkirin ew 25 hezar kes bin; ew bi zimanê shiyeyî diaxivin. Hambukushu grûpeke din a mezin e, ew ji pênc hezar heta deh hezar kes in; zimanê axaftina wan jî Thimbukushu ye. Her li wê deverê pir kes hene bi zimanê setswana jî diaxivin, ku li Botswana zimanê serekî ye. Grûpa bi zimanê serekî diaxive geş dibe, grûpên din jî biçûk dibin.

Eger em ji dût ve li wan seyr bikin, rewşa shiyeyî û ya thimbukushu gelekî wek hev du ye. Her du li goşeyêke dûtî welat in, her yek ji wan kêrîneyeke biçûk pê diaxive. Hîç zimanek ji wan li dibistanên ku zarokên wan kêrîneyan diçinê, nayê xwendin. Di çend salên destpêkê de ji xwendinê hemû tişt bi zimanê setswana ye, di

polên bilindtir de jî xwendin bi zimanê îngilîzî ye. Ji bilî çend carên gelekî kêr, tu zimanên biçûk wek zimanê nivîsandinê nehatine bikaranîn.

Ew her du ziman wek hevdu nayên guhartin, axêfkerên shiyeyi bi lez kêr dibin. Êdî zarokên gund wî zimanî wek zimanê yekem fêr nabin, lê wek zimanê duyem û ew qasî baş jî fêr nabin. Bi rastî ji wan 25 hezar kesên ser bi grûpa wayeyî ve, nêzîkî nivê wek zimanê yekem bi zimanê shiyeyi diaxivin. Ewên din zimanê wan yê dayîkê setswana ye, shiyeyi jî li ba wan zimanê duyem e yan jî her pê naxivin.

Lê wek ku xuya dike, zêdebarî ku hejmara hembukushu kêmtir e, ew naxwazin dest ji zimanê xwe berdin, tu tirs jî tuneye ku zimanê wan ji nav biçê. Zarokên wan li malê fêrî wî zimanî dibin ji ber ku dayîk û bav pê diaxivin.

Bandoreke ji derve cudahiyê naxe navbera wan her du grûpan, lê ew yek bi kultûr û dîrok û hestên wan ve girêdayî ye. Viyana civakî ya grûpa wayeyi ne xurt bû û wan zû xwe bi rewşa nû re li hev anî. Di sedsala nozdehê de ew duker ji aliyê siyasî ve ket bin destê betawan ku ew jî grûpek in bi zimanê setswana diaxivin. Ji kultûra xwe ve ew gerok in; li vê derê û li wê derê kar wergirtine. Niha jî nêzîkî nişîngeha wan karên geştyariyê bi destê wan dikeve. Zewac û hevsergîrî ji derveyî grûpê jî berfireh bûye. Berî çend deh salan derfeta xwendinê jî wan re hate peydakirin, ew jî ji bo zarokên wan baş bû.

Hembukushu di birêvebirina jiyana xwe de xwediyê ezmûneke xurt in, li çend deveran dijîn û pêwendiyên wan yê jiyane jî bi hev re xurt in. Lê van jî wek yê din bi çavekî baş li dibistanan nenihêrî, ji aliyekî din ve ew baş bi kultûra xwe ve girêdayî ne. Ew zêdetir di nav grûpa xwe de dicivin û pêwendiyên wan digel cîhana derve kêr e.

Ew cudahiya wiha di navbera du civakan de dibe sedema berdewambûna zimanekî û jinavçûna zimanekî din. Ne bi tenê zext û fişarên derve û wê cudahiyê yekalî dikin, di encamê de divê ew zanibin kîjan zimanî hilbijêrin û bi kar binin, lê têgihîştina wan ku çî ji wan re girîng e û ji nijad û eslê xwe ve ew çî ne. Ew têgihîştin rola baştir distîne ji bo destnîşankirina wê cudahiyê.

## **JINAVÇÛNA ZIMANAN, BAŞ E LÊ XIRAB E?**

Gava ev pirsyar ji ciwanekî wayeyi tê kirin, ka kîjan zimanî zêdetir bi kar tîne? Ew dibêje zêdetir setswana û hinek caran jî îngilîzî, hema hema shiyeyi qet bi kar nahîne. Lê eger pirsyar jê bê kirin nêrîna te li hember zimanê shiyeyi çî ye, xuya dibe ku gelekî rêzê ji zimên re digire û bi girîng dide zanîn ew ziman bimîne, çunku beşeke girîng e ji ferhenga wan. Ya rastî ew ên ku zimên xirab dizanin, dibêjin em

gelekî rêzê jê re digirin.

Dibe ku ev reftar durûtî be yan jî ne karekî bi aqilan be, lê di rastiyê de ne wisa ye. Ciwan xwe didin naskirin ku ew û dayîk û bavên wan ji grûpa wayeyî ne, ev jî asayî ye çî kes be dê wisa bike. Ew dizanin ku ziman yek ji nîşanên taybet ên grûpê ye, ev jî her siruştî ye. Bi zimanê bav û bavpîrên xwe naxivin, ne gunehê wan e, ji ber rewşa ew tê de wisa li wan kiriye, ew rewş jî wan dirust nekiriye.

Yek ji taybetmendiya rewşê ew e ku dayîk û bavên wan li malê zêdetir bi zimanê setswana axaftinên xwe dikin, dibe ku ji ber hêsanbûnê be yan jî ji ber neçariyê, lê dibe ji bo berjewendiya zarokên wan be jî. Reng e têgihîştin û dîtina wan jî li ser zimanê shiyeyî baş be, lê wisa hizir kiribin, ya girîng ew e, zarokên xwe fêrî zimanê dibistanê bikin. Di encamê de jî eger gelek dayîk û bav wisa bikin, derfet zêdetir dibe ku ziman ji nav biçê, lê ev nayê wê wateyê ku dayîk û bavan yan jî zarokên wan dixwest ziman ji nav biçê.

Dibe ku gelek caran bi vî awayî be. Zimanek ji ber sedema borî ji nav naçe, eger axêfker nexwazin ji nav biçê, belkî kesin hebin dixwazin ji nav biçê. Dibe ku axêfker bi xwe jî heta qonaxeke pir dereng, ku nîfşên wan ên nû tîr, hindik dimîne ziman ji nav biçê, hest pê nakin ku zimanê wan di bin tîrsa jinavçûnê de ye. Reng e ku niha zimanê shiyeyî ketibe wî halî. Niha wayeyî komeleyek ji bo kesên ku bi ziman nizanin damezrandiye. Erkê wê komeleyê ew e, rênivîsê rêk bixe û tekstan belav bike û karên wê yên din jî hene. Hêviya wan ew e bandorekê bikin û tiştê ji ziman mayî biparêzin.

Eger axêfkerên zimên ji her demê zêdetir hizir dikin, ne baş e zimanê wan ji nav biçê, lê kesên din hene dixwazin zimanê wan ji nav bibin, ji hin aliyê ve di gelek baran de wisa ye. Lê piraniya hikumetên welatên cîhanê baş dibînin ku grûpên etnikî û zimanên kêr li welatên wan hebin.

Ta radeyekê ji ber wê ku pir kes li cîhanê hizir dikin ku dewleta neteweyî, bi yek netewe û yek zimanê neteweyî baştirîn yekîtiya wê ya siyasî heye. Ew hizir li Ewrûpa gelekî pêşketibû û di wê rêçê de jî gelek welat pêşketî bûn. Lê li gelek beşên din ên cîhanê rewş bi yekcarî cuda ye. Carnan hikumet dijî pirzimanî û giriftên pêre ne, ji ber ku zehmet e yan jî qet şiyar tune ye xwendin bi gelek zimanan were dabînkirin, qanûn bi gelek zimanan were nivîsandin û gotûbêjên parlamentoyê pê bêne kirin, her wiha polîs û karmendên tenduristiyê bi gelek ziman zanibin.

Ji ber wê jî piraniya caran rika desthilatdarên dewletan ji bilî zimanekî yan du zimanan ji tevahiya zimanên din yên welatê. Bi her hal rewşa kêrîmneyan ne xirabtir e, lê rewşa piraniyan ne, çunku ji aliyê siyasî ve tirs ji wan dibe. Lê reng e gelek caran jî kêrîmneyên biçûk werin piştguhixistin bêyî ku metirsiya wan a siyasî jî hebe.

Ji mêj ve li Ewrûpayê dewletên neteweyî xurt bûne û gelek zimanên biçûk ji nav birine. Piraniya metodan hişk bûn. Mînak li Swêdê, li Trundle tê bîra pir kesan çawa ku kesê li dibistanê bi zimanê finlandize, trundle biaxiviya dihat siza kirin. Di çend deh salên borî de, li piraniya welatên Ewrûpayê rewşa kêr zimanan baştir bûye. Dibe ku ji ber zêdebûna toleransê be, lê ya rast ew e ku êdî metirsiyeke axêfkerên wan zimanan nemabe.

Li Botswana ku axaftin bi shiyeyî tê kirin, zimanekî piraniyê jî heye, ew setswana ye; nêzîkî bîst zimanên din jî hene. Axêfkerên piraniya wan gelekî kêr in. Heta ku hikmet bixwaze jî nikare bi wan hemû zimanan xwendinê dabîn bike yan jî xizmetguzariyên din pê bike. Ew ziman li derveyî guhartinên civakî yê xurt in, çunku li derveyî axêfkerên her zimanekî tu kar bi wî zimanî nayê kirin. Tu dijayetî li hember tu zimanî nayê kirin, wek ku çawa li Swêdê hatibû kirin, lê alîkariya tu zimanî jî ji wan nayê kirin. Eger bi xwe jî ji nav biçin guman tune ye ku giriftên îdarî yê hikmetê dê kêmtir bibin.

Ji bilî axêfkerên zimanan û hikmetên welatan, nêrîna xelkê din jî li ser vê pirsê heye. Tevahiya lêkolêrên zanistî yê ziman û mirovnasan bi wan ne xweş e ku bi sedan ziman ji nav diçin. Ji ber ku her zimanekê berhemê kulturekê ye, ezmûna jiyana gelek nîşan hilgirtiye û hêza zimanzaniya dahêneran ne. Lê nêrînên cuda hene ku pêdivî ye çi bê kirin. Li gorî hinek lêkolêrên divê li her welatekî kar li ser raya giştî û axêfkeran bi xwe bê kirin da ku wejandina ziman ji nû ve dest pê bike. Hinek jî wisa hizir dikin, ew erkê lêkolêrên e, ku tiştê rû dide tomar bikin û heta dikarin belgeyan li ser zimanên ku ji nav diçin, kom bikin û biparêzin û arşîv bikin, lê divê xwe tevî pêvajoyê nekin.

Ew qas ne girîng e lêkolêrê dê çi bikin û çi nekin. Heta ku pêwendiyên civakî û aborî wek niha bimînin, bi berdewamî ziman dê ji nav biçin, ji aliyê kêr ve wek ku niha ji nav diçin. Bi rastî kêr mirov hez dikin tiştê ku niha rû dide, rû bide, lê ziman-guhartin ji zimanekî biçûk bo zimanekî mezintir, ji bo paşeroja kesê ku wî karî dike, gelekî bi sûd e. Bi her guhartinekê jî ew dem nêzîk dibe ku kes nikare bi wî zimanê biçûk biaxive.

*Jêder:*

*Tore Janson, Sprken Och Historien Norstedts 1997*

# Li ser şerefa Fadîmeyê

## kuştin û şerm

**Unni Wikan**

Unni Wikan, mamostaya beşa antropolojiya civakî ye li Zanîngeha Osloyê. Wê, çendîn pirtûkên weke "Li Pişt Serpêçê ve Li Erebestanê", "Reftarkirina Digel Dilên Tofanê", "Sibê", "Bi Heviya Xwedê" û "Xiyaneta Dilketinê" nivîsandîye û hemû ji aliyê çapxaneyê Zanîngeha Chicago ve hatine çapkirin. "Li Ser şerefa Fadîmeyê", pêdaçûn û beşek ji, ji nû ve nivîsandina pirtûka wê ya bi navê "Sky Id For Rents" e ku cara yekê sala 2003ê bi zimanê norwecî hate çapkirin.

*Navê pirtûkê bi inglîzî wiha ye:*

*In Honor of Fadime: Murder and Shame / Unni Wikan, The University of Chicago Press 2008: All rights reserved*

### **Pêşgotin**

Sedema wê yekê çî ye ku dihêle zilamek zaroka xwe ji ber namûsê bikuje? Çima dayîkek bi qezenca zilamekî şahidiyê dide ku wî zaroka xwe ji ber namûsê kuştîye?

Ez wisa bawer dikim we ji min fêhm kir. Ez dixwazim şiroveyekê derbarê diyardeya namûs û cinayeta ji ber namûsê bikim. Mijara ku ez teşwîq kirim da ku wê yekê bikim, kuştina jinekê bi navê Fadîme şahindal di 21ê kanûna duyem a sala 2002ê de bû li Swêdê li bajarê Upsala. Çarenûsa Fadîmeyê tu aramiyek ji bo min nehîştîye. Ew ku bi binyada xwe kurd bû, ji 7 saliya xwe heta dema ku mir - wê

.....  
\* *Wergêrandin ji inglîzî: Ehmed Eskender \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Sasan Kendal*

demê 25 salî bû - li Swêdê jiya. Fadîme, ji aliyê kesayetiye ve serbixwe û serwer bû. Wê ji her kesekî zêdetir hewl dabû ku nîşan bide siyaseta modern a Swêdê li hember bav û dayîka wê şkestiye. Wê dixwest bi mirovan bide fêmkirin ku "namûs", dikare bibe bikuj, her wekî di hinek welatan de wisa ye. Fadîmeyê hişyarî dabû, ji ber ku wê evîndarê xwe - Patrik Lîndêxyû yê îranî-swêdî - bi dilê xwe hilbijartiye, dibe ku ew were kuştin. Lê Fadîme wê demê bin ket dema ku wisa zanî çar sal bi ser gefa kuştina wê de derbas bûye, lewma ew gef lawaz bûye.



Mirina Fadîmeyê trajediyeke swêdî bû, tramwayeke swêdî bû. Dema min li merasîma definkirina wê temaşê dikir, li Dêra kevin a Upsalayê - ku bi zindî di televîzyonê de dihat weşandin - min fêmkir ku tu riyê min a din nîn e. Divê ez vê mijarê fêmkim, divê ez heta dawiyê vê mijarê vekolim ka gelo ev çi ye. Çima ew jin rizgar nebû? Rûmeta vê kuştinê çi bû? Dê çawa pêşiya trajedî û cinayetên wiha bê girtin?

Helbet ne cara yekem e ez dest davêjim karekî wiha. Ji ber ku min bi salan li Rojhilata Navîn derbarê "namûs û şerm"ê de lêkolîn kiribû. Lê çarenûsa Fadîme şahindal û yên ku beriya wê, weke Sara û Pêla ku her du jî xelkê Swêdê bûn, bi vî awayî hatibûn kuştin, digel asta fêmkirina min nakok bûn. Min di hemû lêkolînên xwe de li Rojhilata Navîn tiştekî wiha nedîtibû. Ji ber ku min jî weke piraniya pisporan digot, cinayetên namûsê dab û nerfêke paşketî ye û çanda gund û civakên paşdamayî ye. Lê dema di hewşa min de li Skandînavya derket, ez perîşan bûm.

Her tim serhatiya Fadîmeyê dihat bîra min. Diviya min fêmkir, çima ew ji nav birin û mebesta xelkê çi bû dema digotin, "Bavê wê neçar bû, tenê riyek hebû."

Çawa dibe, kuştina keçekê bibe "riya dawî" ya bavê wê yan dema bavê wê di dadgehê de got, "Ez neçar bûm, ji ber ku tu riyê min a din li pêşiya min nebû."

Ez hêvîdar im, hûn jî vê çîroka bêwate û tirsnak fêmkim û têbigihên ku çi li pişt vê yekê heye. Ev axaftin ji aliyê kesekî xerîb ve nayê gotin, tew jî aliyê bavekî ve tê ser ziman. Zilamekî di bêhêvîyeke kûr de, wiha difikire ku ji aliyê civak û "vê keça vî" ve xiyaret lê hatiye kirin. Ev, ew kes e ku Fadîme derdê dilê xwe jê re digotin. Şeva ku Fadîme hate kuştin, sê caran wiha got, "Bavê min ê bêçare".

Em di vir de, zilamekî dibînin ku heta ruhê yekê jê nestîne, nikare ji şerm, hetîketî û bêrûmetiya xwe bifilte. Ev zilam, wiha di hîzîre ku li ber çavên hemû cîhanê bûye

pêkenî. "Hizr û raya giştî ya cîhanê" ji bo vê serhatiya li xwarê biryarder e.

Di roja îro de, şerm û bêhurmetiyê bo jin û mêrên rojava wateyeke din heye. Heke carina em hest bi bêrûmetiyê bikin, wisa baş e ku em deng nebin xwe. Êriş û bêhurmetî ji bo piraniya me tiştêkî nas e, lê her kes aşkere nade xuyakirin yanê şikestinê qebûl nake. Hemû tişt di vê de kom dibe ku kontrola jiyana te destê te de be yan bi kêmanî divê tu wisa nîşan bidî.

Mirov dikare di cîhanê de civakên wisa peyda bike ku di nav wan de, bêwîjdanî, bêhurmetî û şerm di navenda jiyânê de ne û gelekî girîng in. Li hinek deveran şerm têgihêke lawaz e û bêşerefî şeytan e û bêhurmetiya herî zêde ye. Bêşerefî, xala hat û nehatê ye, ji bo tu vê li ser xwe rabikî, divê tu gav bavêjî û tola xwe hildî. Bikujê Fadîmeyê ji ber vê yekê ew kuşt.

Serpêhatiya Fadîmeyê alîkariya me dika ku em bi hêsanî ji vê yekê fêhm bikin ku di civakê de wateya bênamûsî û şermê çî ye. Fadîmeyê dest avêt karekî bizehmet, dema ku xwest li cem kesên weke dayîk û bavê xwe têgihîştinekê biafirîne. Ev pirtûk jî bi heman giyanê û ji bo heman armancê hatiye nivîsandin.

Ez dixwazim bi vê nivîsa xwe ronahiyê bixim ser jiyana û mirina Fadîmeyê û hurmetê jê re bigirim. Her wiha ez dixwazim bi nivîsandina vê pirtûkê alîkariyê bikim ji bo fêmkirina namûs û cinayetên namûsê û hewl bidim ku bo çî bingehêk nîn e ku mirov kuştina bi navê namûsê bi îslamê ve girêbide. Kuştina Fadîmeyê bi çar mehnan piştî bûyerên 11 îlona 2001ê re li ber vê yekê vekir ku kêmkirina namûsê bi îslamê ve girêbidin.

Lê ji aliyekî din ve, cinayetên ku bi navê namûsê tênê kirine, bingeha xwe ji fikr û baweriyekê digirin ku di nav wan de komeka baweriyên dînî û her wiha kesine ku baweriya wan ya dînî nîn e rû didin. Li gorî lêkolînan cinayet û kuştina namûsê di nav xirîstiyana, musulmana, hindû, cihû, bûdî û konfûçyusiyan de rû daye, lê tenê bi devereke ve sînardar bûye. Ev yek, ji bawerî û dîn zêdetir dab û nerî e. Lê belê dîn dikare ji bo berjewendiyên xwe bi kar bîne û bi kar jî tîne.

Kuştina ji ber namûsê, di wan civakan de ku reh û rîşê xwe berdaye, bi hêsanî nayê çareser kirin. Gelek kes hewl didin pêşiya vê yek bigirin. Çendîn alternatîf û rêk hatine pêşniyarkirin ji bo derçûnê ji şermezarbûnê û dûrketinê ji tundiyê û jidestçûna jiyânê. Ez dê çend rêkên ji vî cureyê bidim nasîn û her wiha ez dê balê bikşînim ser xem û bêhêviya mirovên nêzîkî qurbanîyê di dema rûdana "çareseriya dawî" de.

Kuştina ji ber namûsê di nav wan civakan de tê nixandina ku ev yek beşek ji çand û şerefa wan e. Gelek kes, bi awayekî aşkere yan veşartî, bi awayekî aktîf û çalak hewl didin jiyana mirovan rizgar bikin û nixên mirovahiyê biparêzin. Ev yek di ci-

vaka ku Fadîmeyê tê de dijî jî wiha bû. Kuştina wê, ji bo dayîk û xûşkên wê û gelek kesên din ciyê dilêşê bû, lê dayîka wê di dadgehê de piştî bavê girt. Ez hêvîdar im ezê bikaribim rewşa dayîka Fadîmeyê ronî bikim.

Kuştina keçekê ji bo xatirê namûsê di dîroka Ewropayê de nebûye qanûn û teqalîda jiyane. Lê mixabin vê gavê kuştina endameke malbatê ji bo xatirê namûsê, ji bo parastina namûsa giştî bûye beşek ji rastiya Ewropayê. Fadîmeyê beşeke berfireh a jiyana xwe ji bo têkoşîna li dijî nerîtên wiha û hişyarîdan bo swêdiyên lîberal terxan kiribû. Ji ber ku ew ji metirsî û xetera mijara kuştina ji ber namûsê bo ser mafên mirovan û dadperweriya civakî haydar bû. Pêgeha Fadîmeyê li Swêd û cihên din nîşan dide ku wê wê li pêş serdema xwe jiyana dikir. Dibe ku tundî û kuştina ji ber namûsê, ji bo ku zindî bimîne û bidome, hatibe Ewropaya nû û pirçandî. Lê heke em vê yekê baştir fêhm bikin ku ev hemû behskirina derbarê namûsê de çî ye û mirov çawa dikare wateyekî nû bidê û di warê mafên mirovan de sûdê jê wergire, wê demê mirov dikare jiyane rizgar bike û êşên ku nepewîst in jî ji holê rake.

Fadîme, li Swêdê bûye têgehkek, sembolek bo keseke azadîxwaz û hemû tiştên xwe, tew jiyana xwe jî ku gelekî jê hez dikir, fîda kir. Fadîme ji vê jî bi nirxtir bû; ew miroveke têgihîştî bû, hest dikir ku neçar e riyêke nemirovane hilbijêre û di wê riyê de bimeşe. Ew jî dihat wê wateyê ku xwe ji malbata xwe veqetîne û ligel zîlamê ku jê hez dike, bijî. Dema zîlamê wê piştî saleke di mir, heta bêjî bes ew tenê bû. Hevalên wê bûn endamên malbata wê ya nû, lê wan nedikarî cihê dayîk û xûşka wê ya biçûk bigirin ku dayîkekê lê dibû xwedî. Lewra Fadîme vegeriya malê da ku ligel wan be û jiyana xwe jî di vê riyê fîda de kir.

Piraniya mirovan dibêjin, ji ber ku Fadîmeyê ji Patrîk hez dikir hate kuştin, lê ez wiha nafikirim. Li gorî min, mercên din di vê bûyerê de diyarker bûn. Em nikarin xwe ji pirsiyaran bidin paş ku derbarê dema bûyerê de têne kirin. Sedema wê yekê çî bû ku 4 salan piştî mirina Patrîk di qezeyêke trafikê de (1998) rê bi Fadîmeyê hate dayin ku bijî? Ew nasnameyêke veşartî nebû, qet xwe veneşartibû û bi awayekî vekirî jiyana dikir. Fadîme, hefteyekî beriya biçê Kenyayê û li wir şeş mehan bimîne, hate kuştin. Çima li wir hat kuştin? Çima kuştina wê ewqas dereng ket?

Bersiva van pirsiyaran tenê bikuj û şîrîkê wî dizanin. Lê li gorî lêkolînên min ên li ser destnivîsên rapora polîs û notên du dadgehan û hevdîtina min a digel endamên malbatê û her wiha zanîna min a giştî ya li ser etnografîyê ya derbarê şerm û namûsê de nîşan dide ku rola gelek mercan di vê bûyerê de hebûye. Fadîmeyê qayîş bi malbata xwe re dikêşa ku ev yek her tenê ne li ser evîn û hilbijartina serxwebûnê bû. Her wiha wê guh neda wê ultîmatomê li ser jiyana wê dabûnê; mirin an sirgûn. Sirgûn û xerîbî, rê û çareyek e û ji mêj ve li ba hinek civakan ku yek ji wan Kurdistanî Turkiyeyê ku welatê malbata Fadîmeyê bû. Heke reftara te malbatê bêhurmet bike, tu

neçar dimînî biçî sirgûnê. Ev jî endamên din ên malbatê ji wê erkê "rizgar dike" û dihêle te nekujin.

Ji ber ku Fadîme bibû Swêdî, bi zehmet wateya sirgûnê fêhm dikir, ji bilî wê nikarîbû sirgûn û xerîbiyê qebûl bike, lewra pir tê ve neçû vegeriya cem dijminê xwe. Ew ji cihê xwendina xwe yanê cihê sirgûna xwe, çû bajarê Upsala da ku bi awayekî veşartî dayîk û du xûşkên xwe bibîne. Fadîmeyê wiha pîlan kir ku di salên dawî yê jiyana xwe de beşdariyê di beşeke jiyana malbata xwe de bike.

Lê ew bi êgir dilîst. Ew kesên ku hatibûn dûrxistin, dibê ku dilê wan bi wê şewitîbe, lê ew nikarin doza mafê xwe bikin. Fadîmeyê gefeke wiha dikir ku sîstem ji hundir ve ji hev bixe. Fadîmeyê hemû qanûnên lîstikê binpê dikirin, hetta ew ên ku bi hurmeta seksî û hîlbijartina hevî jî ve eleqedar bûn. Wê, piştî malbata xwe kir ber bêhurmetî û rexneyên medyayê, zêdegavî li ser sirgûna xwe jî kir. Fadîme ji çend aliyên ve bûbû êrişkarekî çend alî. Mirov nikare bêyî van rastiyan di trajediya Fadîmeyê bigihê. Ev ji bo kêmkirina mijarê nîn e, tew jî bo wê ye ku em bi hêsanî têbigihên.

Şirovekirina çarenûsa mirov bi awayekî hêsan, dibê sedema çêbûna bandoreke dramatîk a bihêz û derfeta fêmkirinê jî zêde dibê. Dram di vir de, tawanbar û qurbanî ye, xweşikî û kirêtî ye. Şewaza nasandina bûyera Fadîmeyê di medyayê de bû sedema bandoreke dramatîk. Ji ber vê yekê di wê em ji bîr nekin û dê di pêşeroj de jî bê bîra me; weke jineke genc û xweşik ku di şerekî qehremane de jiyana xwe ji dest dide.

Em li ser tiştên ku wê kir kêmkirin, ji ber ku dê ji bo me diyar bibe ku Fadîmeyê di wî şerî de êşeke giran gihande kesên ku ew dorpêç kiribûn. Serpêhatiya Fadîmeyê, her wiha çîroka wê malbatê ye ku xwe di dorpêçê de dibîne û di rastiye de ji ber bikaranîna mijara Fadîmeyê ji aliyê medya ve di dorpêçê de ye. Fadîmeyê xwe da ber çavan, ji ber ku hizir dikir ev şewaz dê jiyana wê biparêze. Ew, her wiha hêvîdar bû, di riya axaftin û şiroveyeke mirovî bo mijara xwe bikaribe alîkariya wan keşan bike ku di rewşeke weke rewşa wê de ne. Lêkolîna min vê yekê nîşan dide ku stratejiya Fadîmeyê bû sedema lawazbûna derfeta jiyana wê. Di gelek civakên etnîkî de karê herî xerab ew e ku sirên malbatê werin aşkerekirin. Heta dema ku kes pê nehesiyabe şerm zirarê nagihîne namûsa malbatê. Bêhurmetî heta ku "hemû kes pê nehesin" nabe sedema kuştinê. Di mijara Fadîmeyê de malbatê wisa hest pê dikir ku bêhurmetkirina wê li parlamentoyê jî ketiye rojevê. Fadîme di avahiya kevin a parlamentoyê de, roja 20ê mijdara 2001ê axivî û piştî wê bi du mehan jiyana xwe ji dest dabû.

Sedemên aloz ên vê kuştinê rê nade mirov ku li vê tawanê bibore, bêhtir wisa dike

ku baştir were fêmkirin. Têgihîştina vê yekê ku gelo çima hinek mirov ji ber xatirê namûsê hinek mirovên din dikujin? Di vê yekê de taybetbûn û aramiya jiyana malbatê elifba ye. Ji ber ku jiyana û rûmeta malbatê di pileya yekem de ye û gotina sirên malê bo xelkên biyanî bêhurmetiya herî mezin e li hember malbatê. Trajediya Fadîmeyê me neçar dika em wê yekê fêm bikin ku di nav civaka me ya pirçandî de hinek mirov hene ku dixwazin bizanin çima malbat "taybet" e da ku mecbûr bimînin xwe biparêzin û aşkere nebin. Şerm, heta dema ku veşartî dimîne, mirov dikare çareyekî jê re peyda bike, helbet tenê di nav malbatê de. Arîşeyên malbatê têne çareserkirin, lê belê tenê li pişt deriyê girtî û di riya navbeynkariyê de. Di mijara Fadîmeyê de ev yek pêk nehat, ji ber ku kesek nebû vê rolê qebûl bike û xwe bide ber vê berpirsiyariyê. Piştê hinek vekoler û endamên civaka kurd diyar kir ku diviya bi vî awayî reftar kiribana. Qanûna Swêdê ji aliyekî ve gelekî taybet e, raporên polîsê derbarê bûyerê de li ber destan in. Dema ku min derbarê mijara Fadîmeyê de lêkolîn dikir, min digel hemû şahidên bûyerê axivî. Hetta min digel şahidên ku nexwestin li dadgehê amade bibin û yên ku ji bo dadgehê nehatin bangkirin jî hevdfîtin pêk anî. Min karî bi alîkariya van belgeyan, ku nêzîkî 300 rûpelî bûn, ji gelek aliyên ve rewşê binirxînim û ev ji bo min bû çavkaniyeke gelek giranbûna bo têgihîştinê.

Hinek caran, min li hember hinek mirovên ku diviya hevderdî bikira, hevderdî dikir. Vê yekê ez dixistim nav dudiliyê. Min dixwest ez ji dil û bi yekcarî alîgiriya Fadîmeyê bikim, lê ez ne di wê baweriyê de bûm ev yek dê ji min re bibe arîşe. Ez heta niha jî ji dil û can alîgirê Fadîmeyê me. Helbet bi fêmkirineke berfirehtir ji rewşa hinek dost û dijminên wê. Min bi vê nêrînê, gaveke mezin ji bo têgihîştina namûsê û kuştina ji ber namûsê avêtîye.

Di destpêkê de, min wiha dizanî ku dema yek ji bo parastina namûsê zaroka xwe dikuje, pêwîst nake yên din vê mijarê fêm bikin. Ji ber ku dema tu bixwazî rewşê fêm bikî, divê tu jî endamê wê civakê bî. Ev nêrîn û baweriyên min bû. Zêdebarî vê yekê ku ez antropolojîstek im û min nêzîkî 30 salan li ser çand û ferhengên cur bi cur li Rojhilata Navîn û Asyayê lêkolîn kiriye. Wê demê û niha jî, ez di wê baweriyê de bûm ku dema tu dixwazî aliyên hestiyarî yên tiştêkî bizanî, ew fêmkirin bi sînor e, ji ber ku tenê aliyê wê yê teorîk têrê nake. Piştî ku xebatên nivîsandina vê pirtûkê dest pê kir, min karî ez kuştina ji ber namûsê fêm bikim. Ez hêvîdar im ez bikarim hizr û nêrînên xwe ji xwendevanan re jî bidim xuyakirin. Lê belê pêwîst e em hêdî hêdî biçin pêş. Ji bo ku nirxandî û nêrîna min derbarê vê mijarê de, bi hev re bibin yek û ez encamekî berbiçav jê wergirim, ez dê we jî gav bi gav bi xwe re bibim nav mijarê. Hinek caran em dê li dora xwe bizivirin û tu pêşveçûnek dê nebe, carna jî em dê li dijî xwe baxivin. Lê rê û çareyek heye û dema her tişt hatibe gotin û kirin, hêviya min ew e ku tu bi min re werî: Erê em li pey vê yek çûn û me qezenc kir.

Min ji nivê sala 2002ê ve dest bi nivîsandinê kir û nivîsa min a yekem di 4 mehan de xilas bû. Wê demê ez di rûniştinên dadgehkirina bavê Fadîmeyê de amade bûbûm. Rûniştina yekem di dadgeha navçeya Upsala de bû ku di navbera 12-15ê adara 2002ê de hate lidarxistin. Rûniştina duyem jî di Dadgeha Bilind a Stocholmê de bû ku di navbera 22-25ê gulanê de pêk hat. Ev gelekî girîng bû, lê belê ji bo karê vekoler ew qasî ne girîng bû. Dadgeha pêdaçûnê (temyîz) hemû nêrîn û nirxandinên min ên derbarê dadgeha destpêkê de pûç kirin. Ji ber ku min didît ku hinek şiroveyên min dijî yên din derdikevin. Bikuj poşman bû û jina wî jî her wekî wî kir.

Lewra min biryar da ez bûyeran weke ku heye tomar bikim û rê bidim xwendevanan digel pûçbûn û werçerxana nêrîn û raman min be. Ev beşek ji serpêhatiyê ye û derbarê çareseriyê de ye. Yanê ew şêwaz û materyalên ku dihêlin em çêtir ji sîstema yasayî fêhm bikin. Qanûna namûsê li hember deshîlata yasayê radiweste.

Dibe ku hinek wisa bifikirin ku ez gelekî hişk tevdigerim. Gelo nedibû ez şiroveyeke berfirehtir bikim yan min zêdetir rê nîşanî xwendevanan bida? Dibe wiha jî be. Lê tirsê min ew bû ku xwendevan pir bi hêsanî bigihîje encamê û nirxandina gav bi gav ji dest çûba. Heke xwendevan encamên çûda ji şiroveya min wergirin, wê demê em tiştêkî wenda nakin, berovajî wê yekê girîng ew e ku bi dengê xwe mijarê bibihîsin û li hêviya dengê min nemînin. Rastî her tim di pirtûkê de hatine nivîsandin û kesek nikare xwe jê dûr bixe.

Min ji nêrîn û axaftinên hinek kesên ku bi awayekî pir şexsî û hestiyarî li cem polis axivîne, sûd wergirtiye. Dibe ku ev yek nakokiyek be. Ji ber ku dema wan agahiyên xwe derbarê bûyerê de ji polis re gotine, fikra vê nekirine ku rojekî dê gotinên wan ji bo her kesî aşkere bibin û kesên weke min jî dê jê sûd wergirin. Ev nakokî, pir girîng e. Ligel vê yekê min dîsa mafê xwe dît ku ez li ser vê belgeyê kar bikim. Li gorî min ev belge tekane ne û dihêlin mirov bikeve nav arîşeyên bingehînan namûsê û kuştina ji ber namûsê, ji ber ku ev belge li cihêkî din yan di beşekî din ê wêjeyê de nîn in. Mînak, şahidiya xûşka biçûk a Fadîmeyê ye. Ev yek berovajî tiştên ku min dîtine û behsa wan hatine kirin, hilgirê peyamekê ye derbarê çarenûsa zarokêkî ku dema kuştina endameke malbata xwe, birîndar dibe. Ew zarok, bi dilekî kul, dixwaze fêhm bike û bawer bike ku bavê wê bikuj e. Dayîka wê, di nav bahozekekê de diçe û tê û dinyaya wê pir aloz bûye, birayê wê dibe ku şîrîkê cinayetê be - gelo tiştêkî wiha mumkun e? - û her wiha xûşka wê ya mezin ku ew qasî dihat hezkirin, ew qasî bavê xwe diêşîne ku mecbûr dimîne keça xwe bikuje.

Vîda Das, hevkarê min e û dibêje, nabe di dema kuştinên ji ber namûsê de, jin li wir amade nebin. Das, antropologeke Hindistanê ye û şaş dimîne li hember kuştina Fadîmeyê li ber çavên dayîk û xûşkên wê. Li gorî Das, li Hindistan û Pakistanê heta niha tiştên wiha rû nedane.

Xûşka 13 salî ya Fadîmeyê jî, şaş dimîne ku bavê wê li ber çavên wê, xûşka wê kuştiye, lê ji aliyekî din, kêfxweş e ku wê demê bavê wê hay jê nebûye ku ew li wir e. Ew di wê baweriyê de ye ku wê dikarîbû pêşiya kuştina xûşka xwe bigire. Ew jî weke piraniya zarokan, pirsgerêkên mezinan cidî digire û hest dike li hember wê yekê berpirsiyar e. Her wiha ew jî wê yekê ditirse ku dema Fadîme bê kuştin tenê bimîne û dema dayîka wê jî direve da ku daxwaziya alîkariyê bike, ditirse û di dilê xwe de dibêje: "Dayîka min niha xwe nekuje gelo?"

Ev zarok her tiştî dibêje polîs; gelekî aşkere û ron û şahidiyeke bê mubalexe û bi zimanekî sade. Ew jî vê yekê dilgiran e ku dezgehên ragihandinê ji bûyera Fadîmeyê sûd werdigirin û her wiha ji Fadîmeyê jî aciz e ku çîroka xwe ji medyayê re gotiye û jî polîs jî aciz e. Ew ne di wê baweriyê de ye ku polîs gotinên wê binirxînin û wiha dibêje: "Ez dizanim wiha ye. Ez dizanim wiha ye. Ev ne fikra min e, belkî ez bi rastî dizanim dê wiha be." Li ser vê yekê têkez dike û bi tundî nerazîbûna xwe nîşan dide li hemberî şêwaza nîşandana malbata wê di dezgehên ragihandinê de. Ew dixwaze bizanibe ku çima kesekî guh neda axaftinên wê û nêrîna wê derbarê bûyerê de ne-pirsî?

Fadîme bûye hizr û baweriyek, bûye hêmayek, lê ew gelekî jî vê jî mezintir e. Ji ber ku gelekî mirovanî û dilovan bû. Fadîme di ferqa wê yekê de bû ku dema mesela xwe ji dezgehên ragihandinê re gotibû, çi qasî malbata xwe eşandibû û ew tengav kiribû. Lê wê tenê ji bo zindîmayîna xwe ew yek kiribû. Piştî pê dihesa û poşman dibe ku karekî wiha kiriye. Ev yek jî rewşên taybet bi Fadîmeyê ye. Gelek kes bûne qurbanî, ji ber ku ew kesên ku di ragihandinê de hatin nîşandan, hest dikirin hatine biçûkkirin.

Her nêrînek, ristê ji metnê vediqetîne û bi vî awayî, ew tiştên ku em derbarê xwe û yên din de dibêjin di rewşeke taybet a jiyane de dest pê dikin. Peyvên ku Fadîmeyê di dezgehên ragihandinê de bi kar dianîn, di demekê de bû malbata wê hetta dayîka wê jî ew ji nav xwe avêtibûn û bav û birayê wê jî gefa kuştinê lê xwaribû û di dawiyê de wisa lê hat ku nekarî pêşiyê bigire. Gelekî dereng poşman bû. Dezgehên ragihandinê, di warê vê yekê de ku çi hatiye gotin û taze hatiye gotin gelekî bê rehî in. Diviya dayîka Fadîmeyê ev yek qebûl kiriba ku ji zarokên xwe re gotibû keçên Swêdê hemû qehbe ne. Xûşka Fadîmeyê ya biçûk didît ku gotegota wê li rojname û televîzyonan de tê belavkirin. Awayê nerazîbûn nîşandanê ya vê keça genc, hêjayî guh-pêdayîne ye. Lewra di vê pirtûkê de cihekî berfireh girtiye.

Fadîme, ji bo me gelekî girîng e, ji ber wê divê em bûyera kuştina wê baş şirove bikin ku çima malbata wê, ew "kirêt" daye nasîn. Ji ber ku navên wiha, mirovên bêguneh birîndar dikin. Divê tundî û sîtema li dijî takekes wisa were şirovekirin ku zirarê negihîne hurmeta civakê. Helbet, emê di vî karî de, bi giyan û nefesa Fadîmeyê

rabin û rûnên. Ew alîgirê tevlêkirinê bû û li dijî qewitandinê bû. Wê dixwest li hember desthilata ku dijî mirovan e, xebat bike, bêyî ku kesekî mehkûm bike û ji wan re bêje hûn bûne qurbanî û beşdarî sîstemê bûne.

Di dawiyê de, wê dixwest vegere nav malbata xwe û digel bav û birayê xwe li hev were, her çend e bav û birayê wê gefa kuştinê lê xwaribûn.

### **Beşa Yekem- Jiyanên Swêdê**

#### **1- Ji bo bîranîna Fadîmeyê**

Di meha sibata 2002ê de, termê Fadîme şahindal, piştî merasîmekê li Dêra kevin bajarê Opsala ya Swêdê hate veşartin. Di merasîma veşartina termê Fadîmeyê de, Prensesa Swêdê Viktoriya, Serokê Parlamentoya Swêdê, Wezîrê Dadê, Qeşeyê Mezin û gelek kesên navdar amade bûn. Malbat û mirovên Fadîmeyê ku nêzîkî du sed û pêncî kes bûn, di wê roja sar û baranê de, li derve sekinîbûn da ku ji bo cara dawî, serê xwe li hember wê bitewînin. Merasîm, bi zindî di televîzyona Swêdê de dihat weşandin.

Qeşeya Dêra Mezin Tûlîkî Koyvonên Bîllond, merasîm bi rêve dibir. Wê diyar kir, malbata Fadîmeyê daxwaz kiribû merasîma veşartina termê wê, di cihekî pîroz de bê lidarxistin. Fadîme, evîndara bajarê Opsala bû û dilê xwe xwestibû di Dêra Mezin a bajêr de were marekirin û dema mir jî, li wir de were şûstin. Sedema vê merasîmê jî ev bû, zêdebarî wê yekê ku Fadîme endama dêra Swêdê nebû.



Hevalê Fadîmeyê Patrîk Lîndeşîw, roja 3 tîrmeha 1998ê di bûyereke trafîkê de canê xwe ji dest dabû. 4 salan piştî mirina wî, Fadîme ber bi mirinê ve çûbû. Ew ê ji bo evîndariya xwe li hember Patrîk û mafê hebûna jîyanekî li ser xwesteka xwe rawestîya û ji aliyê bavê xwe hate kuştin. Ji ber ku Fadîme "qehbe bû" û piştî kuştina wê, bavê wê ji polîs re wiha got, "êdî arîşe nema."

Gelo ev kuştina ji ber namûsê bû yan kuştina bi navê namûsê bû? Qeşe Gunnar Stolsêt, vê bûyerê weke "kuştina rûreşkar" bi nav dîke. Ew dixwaze vê yekê bêje ku divê têgiha namûsê ji tundî û tirsê were veqetandin. Cîhanê, pêwîstî bi şerefeke rastîn heye û dibêje, werin em rêzê li vê yekê bigirin û wiha jî bijîn.

Mîrovek ku digel qeşe di vê mijarê de hevnerîn e, di Zîndana Lorênskuk de li derveyî bajarê Osloyê ye. Wî jina xwe kuşt û niha jî cezayê xwe yê 23 sal zîndan dikşîne. Ew dibêje ku her di zarokatiyê de, ji zarokên kur re gotine, heke jinekê di nav malbatê de bêşereffî kir, divê bê kuştin. Vêca, te divê bila keça wî be, xûşka wî yan jî dotmam û jinmama wî be û wiha didomîne, "Me pêwîstî bi têgiheke nû derbarê şerefê de heye."

Divê ev têgih, têgiheke wisa be ku nîrxên tak bi fermî nas bike û hebûna wê jî her tim diyar be. Ev yek, di gelek bingehên çandî de li nav û derveyî çarçoveya kartêkirina rojavayî de tê dîtin. Yek ji mebestên min ji nivîsandina vê pirtûkê ew e ku ez nîşan bidim têgiha şerefê ji aliyê mirovên civakên cur bi cur ve, bi awayên cuda tê şirovekirin. Di nav hinek civatan de, kuştina jinan bi navê namûsê, weke mînaka Fadîmeyê û gefên kuştinê li dijî gencên ku naxwazin bi zorê bizewicin, tiştêkî gelekî kirêt e û nayê qebûlkirin. Ev yek, ji bo musulmanan rast e, ji bo hindûyan, bûdayyan, mesîhiyan û her wiha xelkên ku li ser her sê dînen cîhanî nîn in jî rast e.

Zêdebarî vê yekê, mirov nikare kuştina ji ber namûsê înkare bike û bêje nîn e. Ev di rastî de, kuştina bi navê namûsê nîn e. Em dikarin weke Qeşe Stolsêt, nav lê bikin "kuştina rûreşkar." Ev tê wê wateyê ku em kirdarên wiha şermezar dikin. Mixabin, cinayetên wiha ku gelekî kirêt in, bi navê exlaq û namûsê jî tên kirin. Em hêvîdar in ku bikaribin li dijî tawanên wiha derkevin.

Têgiha şerefê, di cîhanê de gelek wateyên cuda heye û din nav destê û komên cur bi cur de şiroveyên cuda li ser tên kirin. Ez ji qesta xwe peyvên weke "çand" û "civak" bi kar naynim. Ji ber ku kesên ku di nav civak û çandekî de dijîn, bi awayekî diyarkirî karvedana wan li hember vê mijarê çêdibe. Lê tiştê ku ez behsa wê dikim, wiha nîn e. Heta di cihên ku tê de kuştina ji ber namûsê weke çandekê ye jî, mirov nikare bêje dema zilamekî keç, xûşk yan hevjinê xwe kuşt, ew "lekeya" ku li şerefa wî ketiye paqij bibe. Dilovanî, rehm û evîn mirov ji kuştinê dûr dixin. Lê ew rastiya ku di hinek civakan de, kuştina jinan ji ber xatirê namûsê beşek ji çanda wan e; di-

viya Fadîme jî ji vê yekê agahdar bûya.

Mirina Fadîmeyê, kuştineke ji ber namûsê nebû ku mirov jê re bêje kuştina "bi navê" namûsê, ji ber ku bikujê Fadîmeyê hest dikir hatiye dereceya bêşerefiyê. Lewra gelek caran gefa kuştinê li wê xwaribû. Sala 1998ê, bav û birayê wê lêdabûn û gefa kuştinê jî lê xwaribûn. Wê jî polîs agahdar kiribû û bav û birayê wê hatibûn cezakirin. Piştî ku birayê wê, ji bo cara duyem lêdabû, 5 salan cezayê zîndanê ji bo wî hatibû birîn. Fadîme, her tim di bin siya mirinê de dijiya. Ew ferqa vê yekê de bû ku li hember çend hêz û aliyan şer dike. Ne tenê kumreşî û serxoşiya dînanê û tundiya bêser, tew baweriyêke wiha hebû ku heke ji aliyekî taybet ve were şirovekirin, te digot meqûl û di cih de ye. Ji vî aliyê hat ve, kuştina keç, xûşk, dayîk û hevjinê dikare şermê bişo û paqij bike.

Cemawerek li bendê ye şermek "were şuştin" û şerefek were zindîkirin. Civakek ji te re li çepikan dide û piştgirîya te dikin û te misoger dikin. Ev jî şahidiya kuştinê û namûsa ku bûye qanûn di nav wê civakê de. Bavê Fadîmeyê ji vê grûbê bû. Gelek belge hene ku nîşan didin gelek mirov û xizmên wî diçûn ew gij dikirin. Wî jî bêhtir hest bi şeref û hurmetê dikir. Jê re digotin çareserîya vê yekê her tenê kuştin e.

Kuştina kesekê ji ber xatirê namûsê, tawaneke wisa ye ku tu nikarî jê biberî. Hinek kesan digot, kuştina ji ber xatirê namûsê ji dilpîsiyê tê. Lê ev encameke şaş e. Dibe ku kuştina ji ber namûsê ji ber dilpîsiyê be, lê sedemeke gelek girîng nîn e û zêde pê re eleqedar jî nîn e. Mercên sereke ji bo ku kesek ji ber xatirê namûsê were kuştin, hebûna cemawereke îtirafker e. Dema hinek kes bikuj xelat dikin, dibe sedema wê ku kuştina namûsê cuda bê şirovekirin. Di rastiyê de, ji aliyekî ve civakê ve pîlanê kuştinê dadirêje û bikuj jî pêk tîne. Tu dikarî barê şermê ji ser milê xwe biavêjî, ev jî pêwendîya digel cemawerekê de digunce. Dibe ku mirovên derûdorê zêde bi êşa te nehesin û tu hest bi şermeke giran bikî û birîna te jî kûr be. Lê di çarçoveya pîverên ku em li ser diaxivin, tu tenê wê demê dikarî namûsa xwe paqij bikî ku her kes bi vê yekê hesiyabe. Şerma ku em li vir behsa wê dikin, diyardeyêke "cemawerî" ye. Şerm bi wê "bê-avrûbûnê" ve hatiye girêdan ku bûye rastiyek ji bo "kesên derve". Bûyera kuştina Fadîmeyê jî ji ber vê yekê bû.

Wê, berê xwe da cemawerê û pîrsgirêka xwe ji her kesekî re got. Wê, li ser mafê jiyanê azad û bi dilê xwe rawestiya û xwest digel hevalê xwe Patrîk bijî, heta piştî mirina Patrîk jî. Wê behsa zext û gefên kuştinê ku lê hatibûn xwarin, kir. Bav û birayê wê hatin darizandin û ceza li wan hate birîn. Vê yekê agirê hêrsbûna malbatê hîn gurtir kir. Cezakirina bav û birayê wê sivikatiya herî dawî bû. Belgeyek bû ku nîşan dida zilaman nekarîne wê kontrol bikin.

Fadîme, hêvîdar bû ku bi aşkerekirina pîrsgirêkê, xwe ji mirin û kuştinê biparêze.

Lê, vê yekê kartêkirinek nerênî li ser zilamên ku diviya ji wê dûr bikevin, kir û mebest berovajî bû. Ji ber ku namûsa wan di nav xelkê de hatibû hetikandin û lewitîbû, lewra ji ber şerma de nikarîbûn serê xwe bilind bikin. Wê demê tu ji bo ku namûs û şerma xwe biparêzî, dest davêjî kuştinê. Bo zivirandina kontrolê divê tu nîşan bidî ka kî serwer û axa ye.

Wê demê diyar bû ku mesele ne dilpîsî ye, belkî mebest di vir de desthilat û kontrol e. Ji ber wê, kuştina li ser dilpîsîyê ji kuştina li ser namûsê cudatir e. Her wiha, vê li ser evîndariyê bersiv nedaye yan têkiliyên jin û mêrekî jî nîn e. Gotina me li ser mafê civakê ye, li ser tak û erka tak li hember civakê ye. Em li ser pêkhate û sîsteman, astengiyên civakî diaxivin ku dikevin xizmeta vê baweriyê.

Bavê Fadîmeyê jî, qurbanî ye, qurbaniyê "çandekê" ye ku wî mecbûr dike divê bibe desthilat û her tim fermanan bide, kontrol bike, ceza bike. Divê ew nahêle kesek li ser namûsa wî biaxive, ji ber ku ew li hember namûsa beşek ji namûsa eşîra xwe berpirsiyar e. Ew jî weke endamên din ên eşîr û komê divê namûsa xwe biparêze. Grûbê, karîna wî ya takekesiyê jê standiye.

Ev tişt ji bo dayîka Fadîmeyê jî rast e. Dayîka wê, di doza ku Fadîmeyê meha pêncem a 1998ê de kiribû, piştî mêrê xwe û kurê xwe girtibû. Vê jî hişt keça wê bêhêvî bibe. Dayîk Fadîmeyê jî qurbaniya zihniyeta civakê ye. Fadîme, 2 meha beriya ku were kuştin, li avahiya dêrîn ya Parlamentoya Swêde derbarê mijarê de ji bo cemawer axivîbû: Lome li dayîka wê hatin kirin gava ku Fadîmeyê têkiliya xwe bi wê re birî. Pêwîst bû vê yekê bike, ji ber ku dixwest bi xwesteka xwe bijî.

şerma zarokê, şerma dayîkê ye jî. Ji ber ku erka ser milê dayîkê ye ku emîn be nix û çanda bav û kalan vedîguhêze bo zarokan. Keçanî (dûşîzeyî) ji bo keçan heta bêjî pir girîng e. Her cure pêwendiyên seksî yên beriya zewacê yan piştî zewacê bêşermiyê mezin e. Peyva "seksî" gelek wateyên wê yên cuda hene. Civakîbûn ku ji aliyê piraniya rojavayîyan ve tiştêkî bêguneh tê dîtin, lê di vê civakê de wekî mijareke "seksî" tê nihêrîn. Heke li nav xelkê bibe dengî ku keçek digel kurekî axiviye, têra wê yekê dike ji bo ew keç bênamûs bê hesibandin. Ji ber ku dengî ji rastiye girîngtir e. Gelek jin û keçên ciwan li ser dûşîzeyiyê canê xwe ji dest dane. Heta derfeta xweparastinê jî nedane wan.

Lê di mijara Fadîmeyê de, belge hebû. Bavê wê li kolanê ew digel Patrîk dîtibû. Roja 9ê îlona 1997ê bû. Êdî wê nikarîbû vegere mal. Diviya yan ji Patrîk yan jî ji malbata xwe veqete.

Fadîme, heta piştî mirina Patrîk jî, li ser biryara xwe mabû. Patrîk, di roja 3 tîrmeha 1998ê de, roja ku biryar bû êdî digel hev jîyan bikin, di bûyerek trafîkê de canê xwe ji dest da. Termê Fadîmeyê jî, her weke wê xwestibû, li kêleka gora Patrîk

li goristana kevin a Opsalayê hat veşartin. Bûyer di demeke wisa de qewimî ku te di-got, beşek ji bûyerê ji ber êrişên 11ê îlona 2001ê li New Yorkê bûye.

Ji ber ku di wê roja girîng de Fadîme li New Yorkê bû. Ew ji bo bêhnvedanê çûbû wir, lê piştî bûyera 11ê îlonê, demildest zivirîbû Swêdê. Ji nişka ve, mirina ku nedihat hêvîkirin û dûrketina wê ji her kesî, bû ezmûneke rasteqîn ji bo Fadîmeyê ku demeke dirêj di bin tîrsa kuştinê de jiyabû; wê Patrîk jî, di bûyereke neçaverêkirî de ji dest dabû. Wê dixwest xwe kar bike. Lewra piştî bûyerên 11 îlonê dema vergeriya Swêdê, digel hevalên xwe axivîbû û gotibû, ew dixwaze piştrast be ku dema wê jî hat ew li kêleka Patrîk were veşartin. Dem pir girîng bû, ji ber ku li gorî ola îslamê, divê termê miriyan beriya hilatîna rojê were veşartin. Hevalên Fadîme yên nêzîk, dest bi kar bûn. Merasîma veşartina Fadîmeyê di asteke pir mezin de hate lidarxistin. Bû bûyereke gelekî bi heybet û xweşik. Lê tiştê herî girîng ji bo wê ew bû ku termê wê li kêleka gora Patrîk veşêrin da ku vehese.

Gelo em heta çî astekî ji kuştina namûsê fêhm dikin? Dayîk, çawa dikarin vê yekê qebûl bikin? Ev tişt gelek caran rû dide, helbet di bûyera Fadîmeyê de wiha nebû. Bi salan e ev pîrs ji min têne pîrsîn, ez jî mijûl im ku bersîva wan bidim. Gelo mirov dikare ji kuştina namûsê fêhm bike? Bi çî wateyekî? Encamên ku ez gihîştimê ev in:

Na, em nikarin ji vê yekê weke "ezmûna ku rû daye" fêhm bikin. Bi bawerîya min, heke em dixwazin baş ve mijarê fêhm bikin, divê ew kes beşek ji vê çandê be da ku bikaribe çîroka kiryarên wiha bîne zîman. Heta dibe piştî bûyerê jî rewş aloztir bibe. Ji bo ew kesên ku nêzîkî jinê ne, gelekî zehmet e ku qebûl bikin endamê malbatê ji ber xatirê urf û edetan hatibe kuştin; digel ku vê yekê jî qebûl dikin ku "divê wiha be". Lê di wan babetan de ku meseleya mirin û mayîne ne, li gorî mercan, bijareyek bi rêketinê tê dîtin. Kuştina ji ber namûsê tu carî çareseriyê hêsan nîn e.

Ji ber ku ez ne ji vê civakê me, karê herî baş bo min ew e ku ez hewl bidim ronî bikim ka di kuştina ji ber namûsê de nakokî û pîrsgirêk li ser çî ye? Ez vê jî dizanim ku di navbera ronîkirin û têgihîştinê de qutbûnek çêdibe. Ev jî rast e. Di haletên weke ya Fadîmeyê de, yekdilî nîşandan sînordar e. Vê gavê hinek kes dixwazin propagandeya ve bikin ku "tu tiştêkî mirov digel min girîng nîn e". Lê girîng nîn e çî rû dide. Tu kes nikare ji perçeyekî zêdetir ji çawanî û curecûbûna bêdawî ya mirovahiyê xwedî derkeve.

Zêdebarî ve yekê, em dikarin gavekî ji bo fêmkirina ve yekê bavêjin ku rê li ber kuştina ji ber namûsê vedike. Kesekî ku kuştina Fadîmeyê şermezar dikir, di heman demê de hevderdiya xwe ji bo bavê wê jî xuya kir û wiha got, "Bavê wê mecbûr bû, ji bilî ve yekê tu riyek din nebû." Em divê ji vê têbigihên ku mirina zaroka wî dibe "çareya dawî" û heta dibe "çareseriyek" ji bo pîrsgirêkê.

Di nav vê behsê de, hestek şermkirin û xwebiçûkdîtîne xwe veşartîye. Ji ber ku êrişî ser te hatiye kirin û bêhurmetî li hember te hatiye kirin, bi te keniyane û li ber çavên xelkê henekê xwe bi te kirine.

Paşê em dê werin ser mijara darizandina bavê Fadîmeyê. Di dadgehê de, bavê Fadîmeyê hewar dike û dibêje: "Binêrin ka Fadîmeyê çi aniye serê min. Ez nizanim çawa ji we re bînim ziman." Ew li dadgehê gazî û hawar dike û hemû hewla xwe dide da ku biselmîne karê wî rast e. Berê xwe dide dadwer û wiha dibêje "Fadîmeyê wiha digel min reftar dikir ku heke keça te jî wiha reftar kiriba, te jî dê keça xwe kuştiba." Piştî çend deqeyan dibêje "Na! Na! Helbet ez nexweş bûm. Ji ber ku heke bavek nexweş nebe keça xwe nakuje."

Ev şereboks nîne, ev hewl û têkoşîna zilamekî tirsîyayî ye ku dixwaze tirs û dilgiraniya xwe ji çandekî bo çandek din wergerîne. Ew vê yekê dizane ku çiqasî hevderdiya swêdiyan ji bo wî pêwîst e. Xelkê Swêdê, dizanin ku zilamek bi xwesteka xwe zaroka xwe nakuje. Ew, divê ji vê jî fêhm bikin ku bavê Fadîmeyê ber bi tundiyê ve hatiye rakişandin. Digel vê jî, ew nexweş bû, ev tiştê gelekî mirovane ye.

Em tev hewl didin digel yê dîtir xwe biguncînin bi awayekî ku bikaribin efmosfera ku pêk hatiye nerm bikin. Ew jî di çarçoveya ezmûn û hest de cî digire ku ez bawer im li ba me hemûyan hevbeş e. Arîşe di vir de ye ku peyvên me, me girêdidin. Peyvên me, di heman demê de dikarin hem rêgir bin û hem jî di projeyan de alîkar bin. Bavê Fadîmeyê hinek peyv bi kar dianîn ku dîsa ji wî vedigeriyan. Wî cemawera xwe xelet fehm kiribû; yekê ji "me" nedikarî qebûl bike ku heke keçeke me ya weke Fadîmeyê hebûya, me jî dê kuştiba.

Lê belê em bersiva wî mirovî didin ku li pêşberî me ye û tirseke mezin ew di nav hev de pêçaye. Ji ber ku ew wiha fêhm dike ku ew mecbûr kirine xwe biparêze. Ji bo ku em bikarin mebest ji kuştina ji ber namûsê çi ye û şiroveyekî rast li bara wê de bikin, divê em aliyên din ên peyvyan bibînin û hûr bin li ser wan û hewl bidin xwe digel rewşeke tengav û mirovî de biguncînin. Ev ji bo têgihîştina çandê jî wiha ye. Pêwîst nake em li ser peyvyan rawestînin, ji ber ku hinek caran xwe îfadekirinek baş vê rastiyê vedîşere ku jiyaneke me ya hêjayî nirxandinê heye. Em ji landikê heya gorê digel kêşeya hebûna lêkçûyî de dixebitin û ev yek ji bo me xuya dibe ku jiyana hizr û nêrînen me, şewaza jiyana me, kesayetîya me û rewşa me ya madî ji hev cuda dike. Ev jî bi awayekî me aram dike.

Helbet ev dikare bibe sedema wê ku bo çi hinek di wê baweriyê de ne ku kuştina ji ber namûsê ji berê ve hebûye yan di vê baweriyê de ne ku kuştina ji ber namûsê digel kuştina ku ji ber dilpîsiyê qewimiye, yek e. Pêwîstiya me bi têgihîştinê heye. Cudakirina kuştina ji ber namûsê ji vê yekê, herî kêr dihêle ku em "yê din" weke veder

(koşegîr) nebînin. Ji ber ku ew "ji me ye", kesek e ku tu wî nas dikî. Me jî dilê xwe pîs kiriye, heta hinek caran ew qasî em dilpîs bûne ku em li kuştinê bifikirin.

Rûberhevkirin di vir de bi dawî tê, ji vê zêdetir nabe. Ji ber ku mijar li ser kuştinê ye yan xwe amadekirin e ji bo kuştina zaroka xwe ji ber xatirê namûsê. Dema jin dibin qurbanîyê namûsê, ev tawan piranî ji aliyê lêzim û merivên jinê ve tê kirin, jin jî aliyê merivên xwe ve tê kuştin.

Kuştin, ji ber berjewendiyên tê kirin. Berhema wê jî qezenckirina nav û deng û heybeta malbatê ye. Nirxa malbatê bilind dibe û dizivire asta berê.

Malbat, dema bênamûs be, her kes pê dikene û henekê xwe pê dike. Keçên wan di bazara zewacê de bînirx dibin, her kes kurên wê malbatê weke mirovên lawaz û "nemêr" dibîne. Malbat jî aliyê civakî û siyasî ve dikeve rewşek gelek şepirze.

"Em niha dikarin bi serfirazî biçin nav xelkê", ev gotinên Emela 18 salî bû dema ku birayê wî yê 16 salî xûşka xwe kuştibû. Ji malbateke filistinî bûn. Dayîka wan wiha digot, "Malbata me pir bi nav û deng bû. Êdî şerefa me nemabû. Heta bira û mala dayîka min jî digel me nedixivîn. Kesekî serdana mala me nedikir; tenê digotin divê hûn keça xwe bikujin."

Navê wê keçê Basme bû. Bi zîneyê di hate tawanbarkirin. Ji ber ku ew jin, ji vê ditirsiya ku bikujin, digel kesê ku hevalê wê bû, reviyên. Hevjînê wê, ew telaq da û bi nihênî digel hevalê xwe peymanê hevjmîyê girêda. Bêhurmetî li hember malbatê, di nav hemû gundên filistinîyan de li Urdunê belav bû. Dema dayîka Basme çûbû pey keça xwe, tifingek digel xwe biribû. Di dawiyê de, guleya kuştinê ji aliyê birayê wê yê 16 salî ve hate berdan; ew birayê ku dema xûşka wî reviya tenê 10 salî bû.

Di nav hinek civak û çandan de ku piştgiriyê didin kuştina ji ber namûsê, hemû weke hev nîn in. Jin tu caran nikare ji malbata xwe azad be, heta piştî zewacê jî wiha ye, yanî wê demê jî dikare malbatê bixe nav bêşermiyê kûr de. Heke tu birînê dax nekî, dê çilk bike û her ku diçe mezintir û kujindetir bibe.

Fadîmeyê 4 sal di bin tirs kuştinê de borandin. Ev keça cihêl û nazdar weke "hêzeke tirsnak" li malbatê tesîr kiribû. Ji ber ku wê Patrîk hilbijartibû. Qet derfet nedît digel wî bijî. Her wiha ji ber ku rîjd bû li ser wê ku bi dilê xwe bijî, 4 salan pişt mirina Patrîk, berdêla wê da. Gelo dibe em vê yekê fehm bikin?

Malbata Fadîmeyê 20 sal li Swêdê jiyabû. Ew kurd bûn û ji bajarê Elbistanê, nêzikî bajarê Meletiyê bûn. Nêzikî sê sed endamên eşîra wan li Swêdê bûn, lê piraniya endamên eşîrê li welatên din ên Ewrûpayê akincî bûbûn. Hinek jî li Tirkiyeyê bûn. Li welatê wan kuştina ji ber namûsê tiştekî anormal nîn e. Xalê Fadîmeyê, yekem endamê malbata şahîndalan bû ku koçberî Swêdê bûbû. Bavê wê sala 1981ê çû

Swêdê û sala 1984ê jî endamên din ên malbatê çûn ba wî. Wê çaxê Fadîme 7 salî bû. Li Tirkiyeyê, malbata şahîndalan bihêz bûn û gotina wan dihate guhdarîkirin. Dayîk û bavê wê, dotmam û pismam in. Xûşka bavê wê digel xalê wê zewiciye, du xûşkên wê yên mezin digel du kurmamên wê zewicîne û du xûşk û birayekî wê jî zigurt (azeb) in.

Li Swêdê, bavê Fadîmeyê, heta sala 1998ê yanê 16 salan kar kir û xwedan kar jê razî bû. Wî hinekî zimanê Swêdî dizanî û mirovekî civakî bû. Beriya ku ew bi tawana gefa kuştina li Fadîmeyê bê darizandin, tu arîşeyeke wî digel qanûnê nebû. Ev yek diselmîne ku wî Fadîme kuştîye. Dema Fadîme hate kuştin, ew 25 salî bû.

Heta merivên nêzîk ên Fadîmeyê jî hewl didin bersiva vê pîrsê bidin, bavê wê çawa karî karekî wiha bike? Pêwîstiya xelkê bi vê heye ku fêm bikin. Ne tenê "em" yanê yên ku li derveyî malbatê ne, heta mirovên nêzîkî Fadîmeyê dixwazin vê yekê fêm bikin. Bavê wê çawa qebûl kir wê bikuje? Li gorî axaftina xûşka Fadîmeyê ya mezin Fîdanê, carekê bavê wê dibêje: "Êdî dema lêborînê hatiye."

Fîdanê wiha digot, "Bihîstina vê yekê em gelekî vechesandin. Bavê min got êdî dema lêborînê hatiye. Wî nîşan dida ku gelek şaşî kiriye û biryarên nerast dane. Min di xeyalê xwe de dihanî ber çavê xwe ku di sa endamên malbatê hemû li dora hev kom bûne."

Xûşka din a Fadîmeyê Elmas, gotinên Fîdanê piştrast dikir, "Em malbateke normal in. Yekî ji me bawer nedikir bavê me tişteki wiha bike."

Dema Fadîme mir, dayîka wê li wir bû û hewl da xwe bixe navbera bikuj û wê de da ku pêşiya mirina keça xwe bigire; xûşkên biçûk ên Fadîmeyê Nebîle û Songul jî li wir bûn û ji tîrsa şoke bûn.

Dayîk û xûşkên wê hatibûn xatir jê bixwazin. Biryar bû Fadîme hefteyek din ji bo xwendinê biçe Kenyayê. Wan bi nihênî hev didîtin. Beriya wê jî sê-çar caran hev dîtibûn. Lê ev nehat zanîn ka kê ji bavê Fadîmeyê ra gotibû ku ew li mala Songulê li beşa kevn a bajarê Opsalayê ne. Cara yekem dema bavê li derî dabû, kesekî derî ve-nekiribû û bavê wê jî ji wir çûbû. Gelekî tirsîyabûn. Dema Nebîle û Fadîme dixwestin biçin derve, Nebîle di kuna dêrî re li derve nihêrî, kesek nebû û rewş aram bû, lê bavê wê vegeyabû. Bavê Fadîmeyê derî dada û ew da ber guleyan û hawar kir: "Ey qehba pîs!"

Xûşka Fadîmeyê ya mezin digot, mêjiyê bavê wê nexweş e, endamên din ên malbatê jî ev yek piştrast dikirin. Bi bawerîya wan, tenê mirovekî nexweş karekî wiha dike. Wî nikarîbû li hember vê yekê berpirsiyar be, ewqasî bêkêf û bêmoral bûbû ku nikarîbû bi awayekî rast bifikire. Hinek endamên malbatê vê şiroveyê qebûl dikin ku

maqûl û qabilî têgehiştinê, bi kurtî mirovane ye.

Hinek jê jî digel vê yekê nîn in. Çend koçberan ji medyaya Swêdî ra gotibûn ku diviya ew were kuştin, ji ber ji bilî kuştinê tu riyek din tunebû. Mirina Fadîmeyê trajedî ye, lê divê neyê şermezarkirin. Di rastiyê de babeteke li ser mirin û jiyane bû. Bavê wê pir tengav bûbû.

Fadîmeyê sala 1998ê gotibû, "Min jiyana hemû malbata xwe wêran kiriye. Êdî kesek digel keçên malbatê nazewice. Hemûyan mohra qehbetiyê xwariye."

Di merasîma bîranîna Fadîmeyê de, tacegula hikumet û parlamentoyê jî hebû. Ew jî nîşanderê wê girîngiyê bû ku bi wê mirova laş biçûk, lê mezin dihate dayin. Merasîma veşartina wê gelekî şerefmend bû û nêzikî merasîmeke fermî bû.

Di merasîmê de, Qeşe Koyvonên Billund wiha axivî, "Fadîme, şehîda serdema me bû. Em spasiya xwedê dikin ku Fadîmeyê bi wêrebûna xwe, hêz û şiyana û evîna jiyane xist nav dilê mirovan." Fadîme, piştî mirina Patrîk dilê wê şikestibû, lê teslîmî wê şikestê nebûbû. Xwe bi ser hev de anî û amade bû ji bo şerkirina li ser mafên tak. Qeşe digot, "Çima mirin peymanî evîndariyê têk dide? Çima mirin dijî jiyane kar dike û tiştan ji hev vediqetîne?" Di dawiyê de got ku bersiva yan pirsan li ba me nîn e.

Dayîk û xûşkên Fadîmeyê beriya merasîma veşartina wê bi kûrekûr digiryan. Piraniya hevalên wê û hetta hinek cewawera nav dêrê jî digiryan; Prensê Vîktoriya jî digiriya. Rojnameya Dagênz Nihêr wiha nivîsand: "Di dema veşartina Fadîmeyê de asman jî giriya." Dema termê wê dixistin nav gora wê ya li kêleka gora hevalê wê Patrîk baranê xurt barî.

Gelo Fadîme musulman bû? Ev pirsîyar gelek çaran bûye rojeva medyayê. Encumena Îslamî ya Norveçê ragihand, ew ne musulman bû. Gelek kes jî vê yekê dibêjin. Lê hinek kesên nêzikî Fadîmeyê tiştên cuda ji medyayê re gotine: Em musulman in. Songula xûşka wê dibêje: Hemû endamên malbata me û bavê min jî musulman e, lê bi qasî ku ez dizanim di jiyana rojane de îslam pêk nayê." Peyamenêrê ku merasîma veşartina Fadîmeyê bi zindî rapor dikir, wiha şirove dikir, "Malbata wê musulman in, lê nimêj nakin." Xwendekarekî gote min "Bawer bike malbata şahîndal ne musulman in, ew êzîdî ne ku ew jî olekî gelekî cuda ye." Xwendekarekî din wiha got "Heke musulman bûna, çawa dihîştin merasîma veşartinê li dêrê were lidarxistin?" Kesekî din dengê xwe bilind kir û wiha axivî "Wan li dêrê, dua ji bo xwedayê me dikir, ma dibe ew musulman bin?"

Gotûbêj derbarê baweriya Fadîmeyê, heman derdê wan gotûbêjên ku piştî mirina wê di nav civakê de hatibûn kirin, heye. Bersivên ku li Norveçê ji bo wan pirsîyaran

hatibûn dan, digel bersivên Swêdê cuda bûn. Raya giştî ya Norveçê, kuştina ji ber namûsê tenê bi îslamiyetê ve girêdida. Li Swêdê, bal dikişandin ser vê ku hem di vê haletê de û hem di du haletên beriya wê de bikuj kurd bûn. Emê paşê li şiroveyên guncan bo van helwestan binêrin. Hêjayî gotinê ye, sala 1994ê jî li Swêdê, keçek filîstînî ku mesîhî bû, ji ber ku nedixwest bi destê zorê bizewice, bi destê bavê xwe hatibû kuştin.

Roja merasîma veşartina termê Fadîmeyê, keçek xelkê Fasê (Magrîb) ji min ra got: "Li Swêdê rewşa kurdan xirab e, ne ya musulmanan." Piraniya kurdan musulman in, wê keçê li ser vê yekê jî têkez dikir ku bala raya giştî ber bi urf û rola jinan di nav hinek civakên etnîkî de tê kişandin. Hinek ji kurdan, şermezariya xwe li hember kuştina Fadîmeyê ragihandibû. Kuştin dibe sedema bêhurmetiyê û dê her wisa jî bimîne.

Gelo Fadîmeyê bi xwe çawa derbarê van nêrînan de fikir dikir? Ev hemû arîşe li ser wê bû ku ew çî ye û çî nîn e. Çima divê mirovekê wiha lê bê? Tu kesî nizanîbû di dilê Fadîmeyê de çî baweriyek heye. Heke musulman bû, tenê wê dizanî. Li gorî îslamê, her kes li hember xwedê berpirsiyar e. Kesekî din nikare li ser vê yekê bi-axive û biryaran bide.

Malbata Fadîmeyê, li hember xwesteka wê hurmet nîşan da û merasîma veşartina wê li Dêra Mezin a Opsalayê hate lidarxistin. Dibe ku ji ber wê jî qebûl kirin ku zext li ser wan hebû û tu riyeke din nebû. Ji ber ku di merasîmê de, rayedarên hikumetê, endamên malbata paşayê Swêdê amade bûn. Lê helbet em bi hinek tiştan dizanin.

Fadîmeyê, dixwest hemû astengîyan bişkêne û pîrekê durist bike. Wê alîgiriya hizrekî cîhanî dikir ji bo hemû mirovahiyê. Fadîmeyê dixwest vê yekê bi parastina mafên tak bike. Wê nûnertiya azadî û wekhevîyê dikir, bêyî ku cudahiyê bixe navbera regez, ol û nijadan. Ew dijî hizreke tengbîn û dogmatîk bû û wê dixwest di navbera aliyê şerker de aşî hebe û ew aliyên ku wisa bawer dikin ku her ew parêzvanê rastiye ne, rastî heta hetayê li ba wa ne. Fadîme, hambêza xwe ji bo hemû tişt û kesekî vekiribû. Di merasîma veşartinê de, her cure mirov ji her nijad û ol û regezekê amade bûn. Mûzîk û stranên ku di merasîmê de hatin gotin, ji hemû çand û her serdemekî hatibûn hilbijartin.

Mûzîka merasîma veşartina Fadîmeyê, hem sekûler bû û hem ayînî bû: "Rondikên Bihuştê" bi dengê Êrîk Klaption, "Pira Bahozê" bi dengê Sîmon û Garfonkêl bi zimanê Swêdî, sirûdên ayînî weke "Xak Dilgîr e", "Ji bo bîranînê", helbesta "Gelo ez dikarim te di rojê havînê de bibînim?" ji helbestên William Şêkspiyêr, straneke kurdî bi navê "Fatme" û di dawiyê de jî strana "One" bi dengê You Too ku Fadîmeyê pir jê hez dikir.

Qeşe Koyvonên Bîllund, hewl dida hinek peyvan peyda bike ku pê cemawerê aram bike; peyvên ku hev girtin û piştgirî tê de hebin. Wê anî bîra her kesekî ku çawa di demên berê de, mirovan beriya ku biçin dêrê, çekên xwe li derve dihiştin. Wê di berdewamiya axaftina xwe de, ji hemûyan xwest, dev ji hemû hestên xwe yê nebaş berdîn û bi hev re pêş ve biçin. Qeşe, gotinên xwe diguhertin da ku musulman vê fikarê nekin ku pir li derve mane û xwe xerîb bibînin. Di destpêkê de, duaya sêhebûnê ya "Bi navê bav, kur û ruhulqudûs" nehat xwendin, ji ber ku digel ayîna îslamê de nakok e. Di îslamê de, hemû ji bo xwedayê "me" nimêj dikin. Baweriya musulman, xirîstiyên û cihûyan bi yek xwedayî heye û musulman jî ji wiha bang dikin, "Rebbê me".

Dema darbesta Fadîmeyê ji Dêra Mezin derdixistin, şeş jin ên ku serên wan rût bûn û cilên reş li xwe kiribûn, hatin pêş. Ew dotmam û hevalên wê bûn. Ji yekê pê ve, yê din hemû kurd bûn. Li gorî şerîeta îslamî, divê darbest ji aliyê zilaman ve bê rakirin, lê qeşe dît jin derketin pêş û xwe dane naskirin û pêşniyaz kirin ew darbestê rakin. Qeşe ji wan re got, divê ew digel zilaman biaxivin. Ew digel zilaman axivîn. Cara dawî qeşe ji wan jinan pirsî "Darbest ji bo ne giran e?". Jinan bersiv da, "Dê xwedê quwetê bide me". Bi vî awayî dîrok xuliqandin.

Rojekê wisa bû ku qet nayê jibîrkirin. Dema darbesta Fadîmeyê hildan, jinekê wê neyêke mezin a wê hildabû û bi gulên sor xemilandibû. Fadîmeyê gelekî ji gula sor hez dikir. (Dêra Mezin bi pêncî hezar gulî hatibû xemilandin). Darbest, di nav mij û baranê de birin. Ev dîmen a ku gelek jin bi cilên reş, serqot û bi her cure çand û ayînan amade bûn, nîşandana nerazîbûnê bû. Ev ne tenê hurmeta li hember Fadîmeyê bû, tew peyameke pir girîng bû: "Hê jî ew ya me ye, we xiyamet pê kir." Endamên mêr ên eşîra Fadîmeyê jî li wir bûn ku di wan 4 salan ku di bin tîrsa mirinê de dijîya, piştî wê negirtibû. Birayê wê hewl dabû wê bikuje, lê nekarîbû. Yê din jî gotibûn bila Fadîme bê kuştin.

Darbesta Fadîmeyê li ser destên jinan ber bi otomobîlê ve hate birin. Fadîme dê li "Goristana Kevin" de vehesiya.

Dema malbata Fadîmeyê jê ra gotibû, divê tu venegerî bajarê Opsalayê û gef lê xwaribû ku heke vegere dê bikujin, wê jî wiha bersiv dabû, "Ji bo min, ev der welatekî azad e. Mafê min heye her cihê ku hevalê min li wir e, ez jî biçimê."

Fadîme vegeriya malê.

## Nesir Hamid Ebuzeyd

*Çemka "re'yet" li ser vê yekê hatiye danan ku musulman daxwazkarê  
vê yekê ne ku her tim kesek wan biparêze; di heman demê de ew yek  
çemka deshilatê ye jî. Ev çemka Re'yetê ye, ne ku ew welatîyên azad  
ku hêz û şiyana hizrkirinê heye.*

### Hevpeyvîn: Nazim Eseyid

Di vê hevpeyvînê de em digel Nesir Hamid Ebuzeyd, ji gotûbêja hizrî diçine nava gotûbêja siyasî, her weha ji sîstemê dewleta nû a erebî ve bo Îslama siyasî û tundra wiya ayînî. Her weha ji fiqih ve ji bo dîroka dawerî (doz) û zordariyan, ji ravêkirinê ve bo şîrovekirinê, em bi ser projeya ronensansê de derbas bûne, ku heya niha jî her berdewam e, lê li ser astê çend destbijêrekê.

Ebûzeyd di vê hevpeyvîna xwe ya germ û gurr de, - bi raya min - paşxaneyên aliyê din ê dozê eşkere dike, bi taybetî yên ku pêwendiya wan bi Dr. Ebdulsebûr şahîn ve heye, bi balpêdaneke li ser kêşeya gendeliyê de ku li bin perdeya şerîetê de yek ji şîrketên berhemîner pêket. Ji wir ve jî bo gendeliya giştî ku tevahiya Misrê vegirtiye. Hevpeyvînek balkêş e û xwendevan di vî warî de dibine çend beş, bi taybetî ku Ebûzeyd bi cesaret û netirsiya xwe û bi axaftina zelal û kûr, dibe hêdmeyek(derb) ji bo yên ku tenê baweriyê di ayîn de dibînin.

Di cihê xwe de ye, ger em vê rastiyê bînin ser ziman ku şêwaza axaftinê Ebûzeyd piştê ji axaftina kesên din hiltîne û risteyên wê liber-rabûnek pê ve diyar e. Ew yek jî şêweyek e û kesayetiya wî wek mamostayekî li zanîngehê bi başî derdixe. Ji ber vê hindê min gelek hewl daye ku di dema veguherîna vê hevpeyvînê ji deqêke serzarkî ve bo ser deqek nivîskî, vê şêwazê biparêzim. Ez dudil jî nebûm di hiştina hinek gotinên wî de ku rasterast wateya xwe digehînin. Lewra reng e xwendevan hest bi vê hindê bikin ku ew hevpeyvîn bi awayê serzarkî hatiye nivîsandin. Lê bi raya min ew

.....  
\* Wergêrandin ji Erebî: Sebah Îsmail \* Ji Kurmanciya Jêrîn: Hoşî Mûrad

şêwe baştir e, ji ber ku germiya axaftinê diparêze û ji "wergêranê" dûr dixê, yanî zimanekî din li axaftinê dike.

*Tu ji "dîn vegeryayî" hatî tawanbarkirin, li ser bingeha wê şikayeta Ebdulsemmed Hemîde, biryar li ser te hate dan. Çima dadgehîkirin li dadgeha "malbatî" de bi rê ve çû? Gelo wate û delaleta dadgehîkirina te di dadgeha "malbatî" de çi ye, dîgel vê biryara ku dadwer derbarê cudakirina te û hevjiña te wate Dr. Îbtîhal Yunisî mamostaya wêjeya Feransî derkir?*

- Yê ku dawa (şikayet) li ser min tomar kirin, komeke parêzer û rawêjkarê dadweriyê bûn; li raserî hemiyar jî serokê pêşîn ê Civata Dewletê. Di qanûna dewleta Misrê de boxtan yan tawanek nîn e ku navê vegeryana ji dîn (elrede) li ser be, lewra dadgeh nikare kesekî bi vê tawanê dadgehî bike. Wate heke tawanek tunebe, dadgeh jî tune ye. Tenê rê ji bo selmandina vegeryana min ji dîn û piştê derkirina min ji zankoyê - ku ev jî armanca yekemîn bû ji dadgehîkirina min - ji rêya pirsê jinanînê ve bû. Yanî dixwestin weha nîşan bidin ku dixwazin jinekê musulman ji destê kesekî ku ji ola Îslamê vegeryaye, rizgar bikin,

(Bi kenî ve) Bo rizgarkirina hevjiña min, vî karî wek mafê Îzedî (xwedayî) bi nav dikin. Wate dixwazin jinek musulman ji destê nemusulmanekî rizgar bikin. Di rastî de armanca ji vê şikayetê li hember dadgeha warê kesayetî de selmandina vegeryana ji dîn nebû, bêhtir cudakirina jin û merekî bû ji hev ji ber ku di warê şer'î de ew zewac betal bûye. Her ji vê yekê jî bû ku dadgeha destpêkî (dadgeha yekem), dawa bi sedema zêdegaviya li dijî qanûna rêvebirina qanûnên sîvîl ret kir, ji ber wê hindê ku xwedyên şikayetê tu berjewendiyê wan di vê şikayetê de nîn e, wate bi awayekî rasterast tûşî zirarê nebûne, bi vî awayî berjewendiyê rastrast bi dest naynin.

Piştî retkirina vê şikayetê ji aliyê dadgeha destpêkî ve xwe gihandin dadgeha pêdeçûnê (Isti'naf) li Qahîrê, li wir bi hûrgilî behsa şermezariya wê dadgehê hate kirin. Dadwerê pêdaçûnê bi awayekî şeklî ew dawa pesend kir. Di qanûnê de dibêjne vê yekê qebûlkirina şikayet (dawayê) bi awayê şeklî, ew jî bêyî ku li naveroka dawa binêrin.

Naxwe şikayetkaran mafê wan nebû bikevne navê wê dawayê de, ne ji riyaya dadgeha "malbatî" be.

*-Ya ku li dadgehîkirina te de cihê tirsê bû, ew bû ku ew dadwerê ku daxwaza te qebûl kir, bawerî bi vê yekê anîbû ku tu ji Îslamê vegeryayî, wate li ser vê bingehê bi te re reftar dikir ku ew belgeyên ku li ser te hene, şahidiya vegeryana te ji ola Îslamê didin, îca çavkaniya wan raport û bîr û*

*rayan her ku der be? Ew kes e kî ye ku dikare sîfeta bawer yan Îslamê ji kesekî bistîne?*

-Bêguman ew yek ew arîşeya fiqhî û qanûnî ye ku dadgeh tê ketiye. Ez li wir de bi rastî bi awayekî babetî (objektîf) diaxivim. Dadwer weha zanî ku belgeya wan zanayên rêzdar (li gorî wan rûpelên li pêşberî xwe) nivîsên Nesir Hamid Ebuzeyd bi xwe ne. Dadwer bi xwe tu tiştek nexwendibû, wî pişt bi şahidiya wan kesên qahîm kir. Lê her kesî ew maf heye ku gumanê li şahidiya hinek kesên jî bike. Lewra min şîroveyeke din hebû bo ew tiştên ku rû dane. Diviya ez ji van hûrdekariyan de derketibama û min realîteya Misrê ya li salên nodî a sedesala bîstemîn de dîtiba. Vê realîteyê ji zanîngê ve dest pê kir; ji wê bêşiyaniya ku di nav lijneya zanistî de hebû, ji mêzekerina akademîk ya wan dersên zanistî ên berbijarekê ku bo serkeftinê pêşkeş kir (wate ew Nesir Hamid Ebuzeyd e), piştî divêt biryarê bide gelo ew madde wek belge pişt bi wan bê qahîmkirin yan jî berevajî?

*Çi weha li wan mamostayan kir ku tûşî vê tirsê bin, her ji ber wê ku tawankirina dînî tê de ye?*

- Heke vê yekê di destpêka salên heftêyan de rû dîba, ew helwêst dê cudatir ba, lê ew rewşa giştî li welatê Misrê di salên nodî de cureyekî tirsê ji bo hemiyên tede hebû. Hîngê teror gihîştibû Qahîreyê. Zanîngê jî ji nêrîngê rejîmê ve çavkaniya terorê bû. Ev yek arîşeya cîhana hevçerx a ereban e. Arîşe di ku de ye, heke qurbanî bi mamostayekê bê dan yan mamostayekî zanîngê neyê berzkirin? Baş e, jixwe piştî salek yan du salên din dikare payebilind be. Girîng ev e ku Îslamî nabe bêne tûjîkirin, îca çî mamosta bin yan jî xwendekar, wate di rastî de rewş rewşeke bi xof û tirsak bû. Tirsek giştî ku pêwendî bi gotûbêja ayînî ve hebû, bê şik û guman di vî warî de gelek belge hene ku rastiya vê diselmînin.

Gelek ji rexnegirên ereb û bi taybetî ew misriyên ku min bi xwe jî ew nas dikirin, - Sadiq Celal Ezim ne tê de - romana Selman Roşdî Ayetên şeytanî nexwendibûn, lê dîsan jî bi vî awayî dest bi gotarên xwe dikirin: "Rast e ku min ew roman nexwendiyê, lê Selman Roşdî weha ye û ...". Li vir de pirs pêwendîdar e bi tometbakirina di warê ayînî de. Min berevanî ji romana Selman Roşdî nekiriye, lê min rexne li vê tirs û qutifnê girtiye ku ji ber romanê heye. Binêre ev e rewşa giştî. Bîne ber çavên xwe ku mamostayekî hêja û naskirî raporekî zanistî û erênî derbarê nivîsên Nesir Hamid Ebuzeyd de nivîsand, lê dema ku rapora giştî wajo kirin, wî Nesir Hamid Ebuzeyd wekî kafir da zanîn.

*Baş e, Dr. Ebdulsebûr şahîn li ser bîngê wan lêkolînan ku te bi armanca berzbûnê pêşkêş kirine, li ser wê baweriyê ye ku tu ne hêjayî berzkirinê yî*

- *piştire ew lêkolîn di pirtûkekê de bi navê "rexne ji gotara ayînê" hate çapkirin – piştî ku pirsar akademî guherî bi pirsar ragehandinê?*

- Ew rapora ku ez tê de vegeryayî ji ola Îslamê hatim tawanbarkirin hate belavkirin. Ew kesek e ku hêz û şiyaneke zaf di devlêguhartinê de heye, wî lewra ew axaftin kir, ji ber ku hatibû şermezarkirin.

*Ew axaftinên Dr. şahîn ji hevpeyvînekê hatine veguhastin, ez wisa bawer dikim ku rojnameya " Elmisrî Elyewm" bi wî re pêk aniye?*

- Pîvan bi raporê bi xwe dest pê dike; rapora tometbarkirina bi kufrê. Wê raporê ji sedî yek jî akademiye tî de tune. Komê gotinê kirê û bêhurmetîpêkirin û tometbarkirin e. Raporeke zanistî a sifr e. Raporeke sed jî sedî tawanbarkirin e. Ew lewra wan gotinan dike ji ber ku di her konferansê de ku beşdarî kiriba tûşî şermezariyê giran dihat.

Ew kes e - ez gellek gellek daxwaza lêborînê dikim - rûmeta peyvan nagre, rûmeta xwendekarên xwe nagre. Bo nimûne, wan destwajeyên nizm înkâr dike ku piştî hukmdana min gotibûn. Bi xwe nizane ku ew axaftinên wî hatine belav kirin, her kes dikare wan axaftinên wî bîne û wekî neynikekê deyne pêşberî wî. Hêz û şiyana mirovekî wek Ebdulselam şahîn li ser xwe-tunekirinê şiyaneke bênimûne ye.

Wî hewl da ku here cem lijneya giştî da ku hinek risteyan rake, lê di vî karê xwe de serkeftî nebû. Min bi xwe berî dawê jî û berî raporê jî ew dît... Carekê min ew li nav zanîngê de dît, wî gote min:

- Dr. Nesir heke em bixwazin te berz bikin, tu ji çî warekî hez dikî?

Min jî gotê: Edebiyata erebî û lêkolîna Îslamî. Gelo wateya vê gotinê çî ye?

Xwendekarên wî gotine min: Tu di nameya wî negihîştî.

*Gelo ew name çî ye?*

Daxwaz ji min kir ku di mala wî de serdana wî bikim û diyariyekê jê re bibim. Wê demê dab û nerît bi vî awayî bû; diviya te serî li lijneyê xistiba û diyariyek pêşkêşî wan kiriba. Helbet min ew hûrdekarî bi başî dizanîn, ji ber ku ez li nav civatê de dijîm ne ku li Birca Ac de. Lê ez ji wan pirsan hez nakim, ez naxwazim bi vê mijarê de biçim. Hemû xelkê Misrê agehdarê pêwendiya Ebdulsebûr şahîn in bi şîrektên pareyan ve. Dema ew şirketa ku wî wek rawêjkar tê de kar dikir, eşkere bû, ji cemawerê re axivî û got: "Min di xewa xwe de pêxember dît, ew mêr jî (xwediyê kompaniyê) kesekî pirr baş e".

Ev gişt bi vîdeoyê hatin tomarkirin.

*Arîşe, dizîna pareyê danayî ye yan jî pareyê berheman e?*

- Bêguman ew yek hetikçûyinek e ku her kes pê dizane ku di salên heştîyan de rû da. Hîngê vê şîrketî qazancekî zaf dida ku digihîşt ji sedî 25. Welatîyên Misrê dîtin ku ew rêje çavkaniya dahatekî baş e li gorî rêjeya ji sedî 6 ku bankayan dida. Gelo tu dikarî çî bibêjî dema ku şîrket şer'î be û pareyê wê jî helal be? Lê piştî heyamekê pareyê ku bi şîrketê hatibû sipartin hate xwarin û heya niha jî li wan nehatiye vegrandin: Gendelî, gendelî... Gendelek piştevaniyê li yê din dike. Heke kesekî pak bi dîzdaşeyekî spî (kirasê ereban) bikeve nav dilê gendeliyê, divê wî bilewitînin. Naxwe ev yek tê wateya hetikçûnê ku ji pirsra berzkinê boriye. Serpakê civakên bi serkirdayetiya siyasî ve jî, wî kesî nas dikin, lê xwedanê şîrketa navhatî piştî wî girt. Îro tu li encamên sala 2010 binêre, heke tu bala xwe bidî nûçeyên Misrê – ez naxwazim ku behsa cîhana erebî bikim - wê demê dê bizanibî ku asta gendeliyê gihîştîye ku derê; lehiyek ji gendeliyê.

*Reng e li welatê Misrê de arîşeya gendeliyê digel arîşeya mîratgiriye kêşeya herî girîng be, lê bihêle ba ez te vegeirînim ser pirsra daweriyê (dawayê), ku te ew xiste çarçoveya tundûtûjiya di salên nodî de ku me gava dî jî qala wê kir. Daweriyek bi vî awayî heye ku li derdora sala 1918 digel Ebuzejd de hate encam dan. Dema ku daxwaza cudakirina Ebuzejd ji hev jîna wî hate kirin gava ku di warê pêxemberiya Adem jî nivîsandibû, ji ber ku wî weha danabû ku belgeyên li ser pêxembertiya Adem pêşbînî ne, ne ku safîkar in. Her bi rastî dadgeha destpêkî a "Demenhur" hukmek derkir, dadgeha pêdaçûnê li Eskenderiye jî ew hukm derkir. Pirsra min a yekem ew e, gelo heya çî qasekî ew arîşeyên behslêkirî dişibin hev? A duyemîn, em behsa qonaxa berî Îslama siyasî û berî tundûtûjiya Îslamî di kin ku Misr û welatên erebî li qonaxên cuda di sedsala bîstemîn de bi xwe ve dîtin. Gelo tu weha dibînî ku terora hizrî pirsek e reh û rîşe dakutayîbe di rewşenbîriya Îslamî de li ber ronahiya mînakên cuda cuda, ji kêşeya Loys Oze bi sedema pirtûka bi navê " Fî Fiqho Elloxetol Erebiye- Di Fiqha Zimanê Erebi de" û Mihemed Ehmed Xellefella ku têza wî " Elfeno Qisesî Fil Quran -Hunera Çîrokê di Quranê de" ku bu sedema wê ku mamostayek li zanîngehê neyê wergirtin. Serbarê derkirina Emîn Elxulî, mamosta li vê lijneya ku li pirsra dosyeya min dinêrî. Berî vê jî Necîb Mehfuuz ku bi riya romana bi navê " Ewlado Haretina - Zarokên Taxa me" ve Ezhcer bêzar kir. Her weha Teha Husên di pirtûka xwe de "Fî şê'ro Cahilî - Li Helbesta Cahiliyê de" ji bilî dadgehîkirina Ebdurezaq li sala 1926 li ser*

*pirtûka " Elislam We Usulol Hukm – Îslam û Binghên Dêhilatdariyê",  
dûr nîn e ku ew rêzband me bibe bo serdemên Îbnî Ruşd û Beşar Êbn  
Bord û Helac, bêyî ev ku em ji bîr bikin ku kesin li ser bîr û raya xwe ji  
nav hatine birin? Gelo tu weha dibînî ku terora hizrî di Îslamê de, di  
praktîkê de kevnar e û reng e di deqê ayînê de jî hebe?*

- Ez bawer nakim, heke em vegerin bo nav kûrahiya dîrokê, heke em vegerin bo Helac û ên wek Ce'd Kurê Dirhem ku li serdemê Emewîyan de hate kuştin, her weha Xêlan Dîmesqî û Cehnî, ên ku gotin ji tawanbarên herî mezin bigerin, wate ên ku li dîroka xwendeghên hizrî ên Îslamî de bi navê "Elmerciet" hatine naskirin.

Bêguman tundûtîjî heye, lê wê tundûtîjîyê dewlet bi xwe pêk tîne. Bo mînak, dadgehîkirina Helac di pileya yekem de siyasî bû. Helac digel hêzên neyarê dijberî dewleta Ebasî di pêwendiyê de bû. Ji vê yekê re tê gotin, pasawa (hincet) ayînê ji bo dadgehîkirineke siyasî. Nabe em dawayeke bi vî rengî bi sistema hizrî a Îslamî ve girêbidin. Dewleta Ebasî hewil da biryara siyasî û biryara ayînê di nav lepê xwe de kom bike. Dest ji me bikêşe, bila em bi ser vê bîrokeyê re derbas bin, ku Meimûn Eqlanî bûye û "Beytol Hikmet" ava kiriye. Her dêhilatdarek di cihê wî de ba, dê ew "Beytol Hikmet" ava kiriba. Me' mûn kêşeya Mu'tezile kêşa stûyê xwe ku digot Quran hatiye xuliqandin. Li ser vê binghê jî hukim bi ser dawer û helbestvan û zanayan kir. Dixwast ku bi hêza dewletê vê baweriyê bi cî bike, piştî du nifşan Mutewekil hat û berevajî wî rabû û rûnişt. Henbeliyên kir li dijî xwediyên rewten din. Gelek kesayetî hene ku ji gotinên Helac zêdetir gotin, lê nehatin kuştin. Bêguman Sehwerdî li ser destê Selahedîne Eyûbî hate kuştin. Divê em di van giştan de li faktora siyasî bigerin

*Dewleta Emewî jî li ser bingeha bîr û baweriyê hinek kes kuştin. Te di pirtûka xwe a "Eletecatol Eqlî Fî Tefsîr- Rewta Eqlî Di Ravekirinê de" û berî wê jî Edonîs pirtûka xwe a bi navê "Esabit Wel Motewil- Statîk û Dînamîk" jî bo vê armancê daniye?*

- Helbet dewleta Emewî ew yek kiriye.

Gelo tu weha dibînî ku terora hizrî yan jî qedexekirina ramanên kesên din, digel Omerê Kurê Xetab de ji seqîfeya Benî Saîd ve dest pê kir, dema ku Ebubekrê Sidîq wek yekemîn xelîfê Îslamê hate danîn? Gelo bîr û boçûna te li ser şerê ku dibêjnê "Erede" û di serdemê Ebubekir de rû da çî ye? Gelo bi rastî ew şer dijberî vegeyriyana ji dînê Îslamê bû yan jî berberiyêke eşîrî bû li ser pîrsa xelafetê bi riya retkirina bacan û serane nedane hin-

dek hozan ji bo xelafeta Ebubekir bû, her wekî ku şîî behs dikin?

- Bêguman ez di vî warî de bi te re me. Rikeberiya siyasî hebû, bi taybet di navbera Ensar û Muhacirînan de. Rikeberiyek hebû ji bona pawankirina deshilatê û beşdarîkirina tê de. Ensaran digot: "Mafê me ye ku xelîfe ji nav me bê diyarîkirin." Ji ber ku wan piştevanî li pêxember û li wan kesan kirin ku bi pêxember re koç kirin û heke ne ji piştevaniya wan ba, dûr nebû ku ew kom li Mekê de tûşî jînavçûnê bihatiba. Hetta Quran jî di cihekî de pesna wan dike. Nakokî hebû li ser wê ku piştî pêxember kî deshilatê bigre destê xwe ku deshilateke sivil e ne ku ayînî. Çîroka kuştina Se'd Bin Ebade naskirî ye. Wê demê gotin ku cinan ew kuştîye.

*Mebesta te serkirdeyê Ews e?*

- Belê. Hetta Omerê Kurê Xetab derbarê desthilatwergirtina Ebubekir de gotiye: "Ajaweyek bû û Xwedê em ji şerê wî parastin". Piştî wê Ebubekir, Omer pêşniyaz kir ji bo xelafetê. Her weha Omer jî her bi vî awayî reftar kir dema ku encumenek şeş kesî ji bo hilbijartina xelîfe piştî xwe danî. Dûr ji ravekirina şîî'yane ji bo vî karî, tevahiya rûdanên ku piştî mirina pêxember rûdan biryarên siyasî bûn. şerê Erede şerekî siyasî bû, şoreşek bû ji aliyê hinek hozan ve li dijî deshilata Ebubekir. şoreşa wan li dijî Îslamê nebû, bêhtir li dijî piştgiriya siyasî bû, lewra wan hozan dana bac û serane ret kir, ji ber ku li gorî dab û nerîta hozên ereb dana bac û serane cureyekî ji serane bû ne ku baca ayînî.

Quranê jî di ayetekê de bi awayekî din behsa bacê kiriye, " Ji darayiya wan ku heye sedeqeyê ji wan wergire da ku bi vî awayî wan pak bikî, nizayekî (dia) baş ji bo wan bike, nizaya te ji bo wan aramî ye". Xelkê ser bi hozan gotin: Pêxember dikare pêşnimêjiyê ji bo me bike û me pak bike, lê Ebûbekir ew deshilata ruhî û me'newî nîn e ku wî hebû. Ku weha ye çima dibe em pare bidinê?" Ez wê yekê jî bêjim ku wê demê gelek dijwar û zehmet bû ku bi bêrehendê dînî şoreşek bê çêkirin, lewma ên ku bi pêxemberên derewîn hatine naskirin peyda bûn, her wekî Misyaleme. Bi vî awayî dîroka wê dîrokek siyasî bû, hetta ew dawayên ku me behs jê kirin heke tu bi awayekî kûr lê bifikirî, dawayên siyasî ne, wek dawaya Elî Ebdulrezaq ku ew pirs li şa Foad têk da, dûr jî nîn e ku eva bê armanc bûbe. Pirsyara şerekî ya Ebdurezaq ev bû ku gelo xelafet wekî sîstemeke siyasî, sîstemeke Îslamî ye yan jî sîstemek e ku musulmanan hilbijartiye? Zanayên olî li Enqerê pirtûkek bi navê "Elxilafet We Soltetol Omey - Xilafet û Desthilata Neteweyan" derkirin ku bi raya wan xelafet hilbijartine, ev jî berî pirtûka Ebdulrezaq "Elislam We Isulol Mohakimet - Îslam û Binemayên Daweriyê". Her weha dadgehîkirina Ebuzeyd jî rehendekî siyasî bi xwe ve giritiye. Her wekî min behs kir, hokarê rasterast a dadgehiyê û belge li ser

pêxemberiya Adem pêşbînî tê de ye, ne ku safî û safîkar bin. Lê pirtûkeke bi navê " Elhidayet Wel ʿrfanfî Tefsîrol Quran" ku hinek locîkên siyasî bi xwe ve girtine, behs dike ku hukmê takekes digel Îslamê yek nagre, ev jî li gorî vê ayeta Quranê a ku dibêje " Ey xwedî bawerno! Di bin fermana Xwedê û pêxemberê Xwedê û karbidestên xwe de bin". Wate di vir de ferman û biryar di dest karbidestan de ye, ew jî bi awayê bi komî ne ku takî.

*Wate bi raya Ebuzyed deshilat divêt bi komel be?*

- Ew ravekirin wek lêdanekê ye li hewl û têkoşana şah Fuad ji bo hilweşandina destûrê û takrewîkirina di deshilatdariyê de. Her heman tişt bi ser Teha Huseyn de jî hate sepandin, heta digihêje min.

Nesir Ebuzyed hukim bi ser de hate dan ne ji ber ku gotibû, Quran deqekî dîrokî ye yan jî tişteki din. Ev pasaw (hincet) bûn ji bo dozê. Nesir Ebuzyed ji ber wê yekê hate hukm dan çima ku di " rexneya li gotara ayînî" de gotara siyasî û ayînî ya navincî (mamnavend) û tundrew di ber şirovekirina wan binemayan de ku bûne sebebê terorê pêkve kom kirine. Di nav kûrahiya vê şirovekirinê de gotara siyasî, êdî ew gotara serkomar be yan jî a wezîran be, ew gotara xwe bi xwediyê rastiyan zanîn e.

Gotara ayînî ya mamnavendî jî her xwe bi xwedanê rastiye zanîn e. Heçî gotara tundrew e, ew jî yek wiha ye û hewlek e jî ji bo bi destê zorê xwe sepandin bi ser realîteyê de. Her wek Dr. Cabir Isforî gote min, " Di vê pirtûkê de te derfet bo kesî nehêlaye ku berevaniya te bikin. " Bîngeha pirsê di vir de ye. Her gotareke rastqîne ya rexneyî eger ji aliyê îdeolojî ve nebe alîgir - wate min şiyana wê hindê hebû bo piştgîriya deshilatê terorê rexne bikim; hîngê ezê bibama şeker û hingivîn - Her gotareke rexneyî ya rastqîne dûçarî wê yekê tê ku bi serê min de hat, ji ber ku tiştê tê xwestin ew e ku mirov alîgir be. Ev jî di rastiye de karesata cîhana erebî ye. Tu bîrmendekî serbixwe bî û hêz û şiyana te bo rexnegirtinê bi awayê bêaliyane bî, ew yek qet nayê qebûlîkirin. Xelk hey ji te dipirsin, gelo tu bi tevahî çî yî? Rengê te çî ye? Divê tu piştqahîm bî bi aliyekî ve, gelo tu komunîst î, sekolarîst î, Îslamîst î?

Dema ku tu alîgir jî nebî, êdî, her wekî xelk behs dikin, wê demê tu bêhtir nêzîkî nefretê yî. Hîngê tu dibêjî: Ez mêrek im û hewl didim; wate ez bîrbirina bi zanistî ye. Bêguman bi awayekî reha zanista bêalî nîn e. Ez li gorî şiyana xwe dixwazim nebim alîgir, lê ew yek nayê wateyê ku ez bêlayan bim, ez alîgir im, lê ez ne alîgirê siyasî yan hizbî me. Cihê şik û gumanê nîn e ku ez di gel pêşketinê me û li dijî zordariyê me, îca çî li welatê Mîsrê de be yan jî li derve be. Ji ber vê hindê jî bû ku mîsrî di şerê Lubnanê de winda bûn (mebest şerê Yolyo ya sala 2006).

Bo nimûne, ez digel bergiriyê me, lê ew yek nabe rêgir be ji wê yekê re ku ez rex-

neyan li wan îdeolojiyên ayînî bigrim ku vê bergiriyê (muqaweme) pêk tînin. Eger tenê her tişt bi dirûşm be, ez nikarim piştgiriyê li dirûşman bikim. Dema ku min ev gotin kirin hinek li min tûre bûn. Hema bi awayekî seyr û ecêb li min hêrs ket û êriş kire ser min. Hew mabû navê sîyonîst bi pey min bixin. Çima? Ji ber ku tu hêzek nîn e ku li hemberî rexneyan bêhnfirê be.

*Bibore ku ez gotina te dibirim, te bi xwe qala wê mijarê kir. Gelo çima te rexne li Hema girt gava ku desthilat wergirt, lê di hema demê de te pesna Hizbullahê da?*

- Min rexne li Hema negirt ku li ser desthilatê ye, lê min got heke opozisyon (muxalefet) bûya çêtir bû.

*Lê Hizbullah?*

-Hizbullah ne li ser desthilatê ye.

*Lê di desthilatê de beşdariyê dika û çend wezîr û nûner di hikumet û parlamantoyê de hene?*

- Tiştê min kirî lomekirin û pesindan nebû. Ez welatîyekî ereb yê Misrê me û piştevaniya bergiriyê dikim. Bi taybetî ew bergiriya ku kuştina xelkê sivîl û bêtawan tê de nebe û li nav welêt berê çekan nedabe hev. Bergiriyê (muqawemet), mafê xwe ye ku çalakiyan bike, ez naxwazim ku destêwerdanê di karûbarên Lubnanê de bikim, lê ew nakokiya ku di navbera wan de heye hez dikim ku tê bigihê. Reng e ne-razîbûn li ser şewazên birêvebirina bergiriyê hebe, ku nabe ew yek bê veşartin, jê bêhtir divê ew yek bikeve ber gengşeyê. Niha ew tîrsa xelkê ji gihîştina ser desthilatê a Îxwan El Elmuslimîn (Bîrayên Musilman) û hêzên din ên li Misrê de û encamên wê tirseke rewa ye, lê nabe rê li ber çalakiya wan bê girtin. Ew yek nayê wateyê ez alîgirê Îxwanê me. Ez digel azadiya her civînekê me ku rûberekê ji bo çalakiya siyasî di nav civakê de bibîne. Nabe li ser vê bingeşê kar bê kirin, ku aliyek bêje ez bextewer im ji ber ku min tu veder kirî. Dema ku îro Nazim veder bikin û sibê jî Se'd û piştre Ebas, piştî wan jî dê dor û nobeya min bê.

*Ez dixwazim ku te vegehrînim bo ser hevpeyvîna hizrî berî ku dîsan ez vegehrim ser siyaseta. Krokîya karê te yê hizrî bîrokeya (fîkr) şîrovekirinê (te'wîl) bû li ser metoda şîrovekariyê. Çima hin kes ji vê metodê ditirsin?*

-Serbarê vê ku şîrovekirin (lêkdanewe) di dirêjahiya dîrokê ji hêla zimanzan û za-

nayên ayînê ve hatiye bikaranîn. Di nava wan de Teberî xwediyê kitêba " Camiol Beyan En Te'wîl Eyel Quran" ew yek bi kar aniye. Her weha pênaseya zanayên ayînê û zimanzanan di warê "lêkdanewê" te ber bi kufrê ve nabe. Wek pênaseya Zerkeşî "Vegerandina ayetê bo ser koka wê û parvekirina wê bi ser pêştir û paştir de, bi mercekê ku digel Quran û sunnetê de dijber nebe. Bi awayekî ku ji hukmê ayetê derneçe, di çarçoweya vekirina kiloma (qifl) daxistî ya wateyê de be, yanî ew pênaseya "lêkdaneweya vekirina kiloma daxistî ya wateyê ye. Her weha li gorî pênaseya Bicî, "Ravekirin girêdayî vegêranê(vegotin), lêkdanewe jî girêdayî pêzanîne ye." Li gorî pênaseya Amedî jî "lêkdanewe barkirin e ji armanca derveyî wateya wê ya aşkere." Heta digihê Seyid Qutb ku di pirtûka xwe ya bi navê "Wênayê Hunerî di Quranê de" behs ji hezkirina Quranê bi riya diya xwe dike gava ku zarok bûye:"Heke ciwaniya xwendina wê ji dest çû, ez bi hêvî me ku ciwaniya lêkdaneweya wê neboribe."

*Bi raya te cudahiya di navbera ravekirin û şîrovekirinê de çi ye?*

-Di binyad û delalet û praktîkê de di dîroka zû ya ravekirinê de ravekirin bi şîrovekirina peyvan ve, bi şîrovekirina goteyên giran û nenas ve girêdayîbûye ne ku geryana li pey wateyê bi awayekî rohn û zelal. Riste (hevok) yekîneya herî biçûk e ku gote, lê riste wateya wê eşkere nabe tenê ne ji rewtekî berfirehtir be, wate di navbera vê risteya pêş û paşîya xwe. Naxwe di vir de me ji riste ve veguhast bo ser gotarê. Gotara herî nizim jî komeke risteyan e ku behsa warekî ma'newî yê yekane dike.

Ebdulqadir Curcanî bi awayekî dilgîr ew pirs xiste berçavan. Lê gelo çi bû sebeb ku peyva "lêkdanewe(şîrovekirin)" bête kirêt kirin? Di vir de ezê vegerim ser siyasetê û listikên wê. Di sed sala çaremîn a koçî de (qemerî) Îsmâîlîzmê wekî gefeke fîzîkî xwe kar kir. Çend karên kuştinê jî rû da; di nava wan de kuştina Nizamilmulk hebû ku bû sedema pêkhatina qeyranekî hizrî li cem Xezalî. Şî ji vê têrmê hez dikin, her weha sofîger jî, ji ber ku digel kulturê rê dikirin. Bo nimûne gotinên Teberî bi wan destwajeyan dest pê dikir, "بِسْمِ اللّٰهِ، تَأْوِيلُ قَوْلِهِ تَعَالَى..." Pênaseya Amedî jî ji bo lêkdanewê ko min her niha navê wî anî ne rast e. Ew pênasê reng e yek ji amrazên lêkdanewê be ku guzarîştê metaforî û mecazî û yê din jî bi xwe ve bigre. Lêkdanewe hewlek e ji bo dozîna wateyê ku armanca axaftinkar e. Di vir de tê gotin, (ال، يؤل) wate vejeriya. Veger bo dozîna wateyê. Ew jî li gor çemka klasîk. Axaftinkar her dem ziman bi kar tîne ji bo nîşandana mebesta xwe.

Bîrdoziya lêkdanewe a hevçerx ya " Hiyomintiks" asoyekî berfirehtir ji bîrdoziya me ya klasîk dide. Heke têrmê lêkdanewe tûşî tu nerazûbûnekê nehatibe, heya mirina Teberî di destpêka (310 a koçî), sed sala çarê a koçî, heya peyva ravekirinê heta

vê serdemê wateyên wê sînordar bin û heke goteya "rave" carekê di Quranê de hatibe, di demekê de ku goteya "lêkdanewe" 17 caran hatiye ku pêwendî heye bi lêkdaneweya rûdaw û xewn û xwarinê. Quran teksteke gelek girîng e di dîroka rewşenbiriya erebî de. Ku weha ye çima ew hinde ji vê peyvê ditirsin? Sebeb jî ev e ku goteya "lêkdanewê" bi wateyekî nerênî dane fehmkirin. Ev jî ji songeya (sedem) rikeberiyên siyasî ve ye çima ku lêkdanewe sepandina çemka lêkderewe ye bi ser deqê de. Ji ber vê yekê tometbarkirina hinek ji grûpên ayînî di Îslamê de bi batinîbûnê, wek şîî, îsmâîliye, elewî, zeydî û... hate holê, çawa ku batinî redkirina wateya xuyanî be ji bo wateya veşarî. Lê di rastiyê de retkirina îsmâîliye bû. Retkirineke siyasî bû û tê de mekanîzmeyên birêvebirin û zimanvanî û îlahî û sofîgerî hate bikar anîn.

Helac û Sehrewerdî û Xezalî û ew ên di jî ji sofîgeriya sunne ve ew yek ava kirin ji bo lêvegerandina tevgerên hizrî û siyasî ên batinî yan jî lêkdanewegerayî. Naxwe gote û zarava di bin bandora qayîşkêşana mirovan de wateyên erênî û nerênî werdigrin.

*Ji hêla dîrokî ve te behsa tirsê kir. Ew jî xwendina deqên ayînî bi xwendineke takrewane bû, lê te di xwendina xwe de ya di warê deqên ayînî de ji vê yekê borand. Te weha kir ku deqa ayînî stûxwarê tîkiliya diyalektîkî be wate ya di navbera deq û xwendevanan de. Bi vî awayî jî te weha kir ku deq ne tenê her stûxwarê kesên lêkder be, jê pê ve stûxwarê xwendevanan jî be. Te weha kir ku tîgihîştina ji deq tîgihîştineke zemenî be, wate te deq ji deqekî yezdanî ve – wekî ku bawermend dibêjin - kire deqekî mirovî. Ev li aliyekî, ji aliyekî din ve te teksta Quranê stûxwarê metodên rojavayî kir, her wek hinek kesan di vî warî de tu rexne kir?*

-Di rastiyê de dabeşkirina di warê lêkolînê a zimanvanî û geşekirina epîstomolojiya zimanvanî û geşekirina epîstomolojiya şirovekirina deq bo ser rojhilat û rojava, nabe bê qebûlkirin, jê bêhtir divê divê em li dijî wê yekê rawestin.

Bo nimûne, Ebdulqadir Curcanî yan jî Farabî yan jî Zemexşerî yan Îbn Cinî bi vî awayî nedidîtin, eger karlêk-kirin digel lêkolînên zimanî de nebûya, ne tenê yên yunanî hetta yên hindî û îranî jî.

Heta xwendegeha zimanvaniya Besrî pişt bi lojîka Arîsto ve qahîm kir li çarçovebendîya rêzimanî bo ziman.

Di navbera ekola Besrî û Kofî de nakokî li ser teoriya rêzimanvaniyê de heye. Lê ya ku dixwazim bêjim ew e ku lêkolîna zimanvaniya Erebi ji vê hindê derbas bûye ku di bazineya gotinên nelihev û galegalê de bimîne. Dema ku bo mînak kesek pir-

tuka "El Eyn" a Xelîl Ehmed Ferahidî dixwîne, dibîne ku wî tîp li gorî derketina wan ji devê mirov, li pey hev rêz kirine. Rêzkirina fermanan (lêker) bo ser "sêyîne" û "çarîne" şêweyek bû ji şêweyên lojîkê. Her weha pîvan jî di ziman de wekî ku tu şêweyekê bipîvî di ziman de û hebûna wê tunebe bi ser şêweyêke pêşîn de. Her weha pîvan di fiqih de, beşek e ji bînaya lojîkê li cem Arîsto.

Ev pîvan li cem me di ziman û fiqih û zanista axaftinê de û yê din de jî hatiye bikaranîn. De bizane metodekî îslamî heye pêwendî nîn e bi epîstomolojiya mirovî ve. Lêkolîna min a zimanevanî a di warê kultur û metoda lêkolîna zimanevaniya kulturî ew qas ne karekî sanahî ye, lê wek lêkolînerê ez nikarim wek rehîneyê sedsala pêncem a koçî bimînim, ji ber ku îro ez di sedsala bîstûyekê de dijîm. Zanista ziman bi şêweyekî berbiçav ber bi pêş ve çûye, ne tenê ev yek, jê bêhtir zanista zimannasiya nû wiha li min dike ku ez zanista kevn a zimanî bi şêweyekî baştir bixwînim, lewra dema ku dibêjin metodên rojavayî, amajeyê bi hewlekê ji hewlên pîskirinê dide. Gotinên bi vî awayî kenîya min tînin û min naçar dikin ku bêjme ên ku wan gotinan di-kin: "Here li metodên nû bigere."

Zêdekirin di kuderê de ye? Di vir de ye ku Îbn Erebî - dûr ji zanista nû a ziman û hermînyotîka û dîroka hermînyotîka - dibêje wateya derxistî pişt bi radeya ezmûnê girêdide. Her bawerdarekî asayî ku bi nav kêrahiya çemka rojhilat û rojavayê de neçûbe, dibêje deryaya wateyê di Quranê de bêqerax e. Naxwe pêwendîya di navbera raveker û deq de çî ye? Wate jî kû ve fêr? Gelo wate (mana) parzemînek e di deqan de? Heke wate parzemînek be di deqan de wê demê ew mana binecî (cêgîr) ye, di heman demê de bo cara yekemîn û dawiyê tê dîtin.

Heke tu binêrî dîroka ravekirinê ji Îbn Ebbas ve heya Seyîd Qutb, biyavên "mana"yê çî ne ku perde ji ser wan hate hildan? Berî Mu'tezîle û berî Hesen Besrî, yekî ji musulmanan arîşeyek nedît da ku hewcehî bi çareserkinê hebe. Lê ji nişkê ve hinek pirsên derketin holê, wek karkirin û berpirsiya mirov di warê kirdar û zulm û hwd. Wate êkolên hizrî ên îslamî wek Qederî û Cebrî û Murcîe. Di rastiyê de deq bi tenê nikare wateyê (mana) bîne pê, her deqekê hewcehî bi xwendevanekî heye da ku wateyê bîne pê. Xwendevan jî tak nîn e, bêhtir takekî ser bi komêkê ve ye û helwêst û pileyek di warê zanyariyê de heye. Rast e, tak dikare manayê bîne pê, lê qebûlkirina manayê yan jî vederkirina wê girêdayî civakê ye. Ew gotina Îmamê Elî bi nav û deng e, ku di şerê Sefên digel Muawiye de, li ser rewta qayîşkêşanê derbarê wê wateyê de gotiye. Helbet ew şerekî moralskên bûye bo her du aliyan, her wekî ku pirtûka Nesir Kurê Muhazim behs kiriye. Bêguman artêşa Elî hew mabû ku di şer de serkeftinê bi dest bixe, ji ber ku di serbazgeha Muawiye de wan Quran bi serê rîman ve kir û bilind kir, xelkê nedizanîn kî hêjayî xelafetê ye, Elî yan jî Muawiye. Çima ku Quran pirsê bi vî awayî naxe rû, ji ber hindê Nesir Kurê Muhazim dibêje, nakokî

divê bi şêwra dadperwerane û guncayiyê sunneyan bi dawî bê. Wate negotiye sunneta pêxember (s.x), ji ber vê yekê çîroka Ebî Mûsayê Eşerî, ku got: Ezê Elî ji ser hukm hildim, her wek çawa ku vê gustîla xwe ji tiliya xwe dertînim." Di demekê de ku Merwanê Kurê As dibêje: Ezê Muawiye li ser hukm deynim, her wekî ku ez vê gustîlê têxim tiliya xwe de." Wek şîî behs dikin ew yek ne firt û fêl bû. Hukmek bi vî awayî nîşaneyê mandîbûna xelkê bû. Lewra Nesir Kurê Muhazim ku di sala 150 a koçî de miriye, ku ji çavkaniyên pêşîn e, got: "Ji bo ku qureşiyek heta hetayê bi ser me de hukmê neke." Wate kesin hene ku hukmê Elî ku Haşimî ye û hukmê Muawiye ku Emewî ye red dikin. Her du jî ji qureş in. Helbet Elî di vê yekê gihîşt, hîngê got "Quran di qalibê pirtûkekê de bi xwe nikare biaxive, zêdetir xelk dikare Quranê neçarî axaftinê bike." Dema ku navbeynkarî neçû serî, Îbn Ebbas çû bo gotûbêja bi Xewaric re, Elî gotê : "Tu Quranê neke navbeynkar, ji ber ku Quran dikare bi gelek şêweyan bê şirovekirin, zêdetir sunnet bike navbeynkar".

Di vir de armanc ji sunnetê, sunneta pêxember nîn e, bêhtir dab û nerît e. Naxwe berhemanîna wateya deqan - dûr ji rave û lêkdanewê ye - girêdayî wan civakan e ku wan deqan dixwînin.

*Bila em li ser gotara te baxivin. Dema ku tu dibêjî "Quran berhemekî rewşenbîrî ye" yan "Quran diyardeyêke dîrokî ye" yan "Quran berhemêke zimanevanî ye" ev wesîfîkirina zanistî me ber bi ku ve dibe?*

- Na, ne ku me ber bi ku ve dibe? Ev ne pirsyar e, pirs ev e: Tu çawa gihîştî vê encamê? Ev yek girîng e, ne ku me ber bi ku ve dibe? Dema ku tu dibêjî me ber bi ku ve dibe, wê demê tu behsa tirs û xofê dikî, tu behsa tirs û qutifîna ji epîstomolojiyê dikî. Gotûbêja vê pêşekiyê nehatiye kirin, ku ez gehandime vê encama ku haşayê ji çavkaniya yezdanî ya Quranê nake, ew tirs ku me digehîne encamek bi vî awayî, ew tirs e li ser bawer û sansor e li ser bawer. Bila em bêjin ku axaftina min li cem hinek kesan wek kufr tê hesabê. Bila em weha danîn ku ez ne sansor im li ser baweriya xelkê. Ev pirs me ber bi ku ve dibe, ji vî tirsê çavkaniya xwe wergirtiye, ku dibêjinê parastina bîr û baweriya giştî. Ew axavtin me dibe sedsalên navîn. Wekî ku ez ji bo komek xelkê nezan binivîsim ku hewceyî wê yekê bin ku tu wan ji axaftinê biparêzî. Ez li zanîgehê ders didim. Karê me ye ku em xwendekaran hîn bikin ku çawa bifikirin bêyî ku fikirîna wan bê sînoordarkirin. Tevahiyan wan gotûbêjan ku derbarê hizrên min de hatin kirin, ji ber kerb û bêzariya ji encaman bû, ne ku ji gotûbêja li ser pêşekiyan. Ey Se'd hêştir bi vî awayî nayê av dan. Li pêxema rexnegirtina li encamê, divêt destpêkê rexne li pêşekiyê bê girtin. Divêt rexne jî rastgoyane be. Erebi ji pêxember razî nedibûn, heke çemka sirûş di rewşenbîriyê de cih negirtiba. Quran çavkaniyêke xwedayî be ev pirs bawerê ye.

Ez jî di vir de li gorî baweriya bi cîhana rewşenbîriya Îslamî dest pê dikim. Ez dixwazim bêjim hinek kesan tenê pêşekiya pirtûkê xwendibû û gelek bi dilê wan bû. Nemaze di pêşekiyê de êrîşa bo ser Îslamiyên tundrew û paşvemana êqil dîtin. Ev pêşekî heta radeyekê zor çiyê gengeşiyê ye. Hinek kesan li Qahîreyê destxweşî li min kir. Yekî ji wan rewşenbîran, ku pirtûk nexwendibû, gote min: Doktor, ew pirtûkeke dilgîr e, lê çima tu du dil î?

Min jî gotê: Xêr e, dudiliya ji çi?

Wî got: Te çima negotiyê ku Quran ji aliyê Mihemed ve hatiye danan?

Min jî gotê ev raya min nîn e. Ez wisa bawer nakim ku Mihemed derewker, teşqebez û beredayî ye. Heke tu wiha dibînî, ku pirtûka Quranê Mihemed danaye, tu bi xwe pirtûkekê di vî warî de binivîse.

Tu heya vê astê jî xelkê weha dibînî ku nikarin bi sererastî te fehm bikin, ji ber ku zirava wan ji encaman qetiyaye. Hin kesên weha jî hene ji encaman pîrr hez dikin û gelek bi dilê wan in bêyî ku kitêb xwendibin.

*Lê te di pirtûka "Çemka Deq" de gotiyê ku "Peyamberî diyardeyeke metafîzîkî nîn e". Her weha te behsa wê yekê kiriye Mihemed bi awayekî kûr bi sêwîtî û vederiya xwe hesiyaye. Xwedêgiravî ew ku ew dengê peyama jêre anî gelek ji wî dûr nebûye, tew nêzîkî realîteyê bûye. Piştî tu dibêji ku Quran zarokê jîngeha xwe ye. Tu çawa dixwazî ku xwendevan vê gotina te fehm bikin?*

- Dema ku ez dibêjim helbestên Mehmûd Derwêş yan helbestên Edonîs yan şekspîr yan Ebûelayê Me'errî yan hwd. Ew helbestek e ku ser bi jîngehê ye. Ez nikarim di helbestên Me'errî bigihêm bêyî ku Me'ereya Ne'man binasim û her weha ew rewşa ku helbestvan têde jiyaye, digel rewta helbesta erebî. Lê em li gora yê ku bawerî pê anîne behsa deqekî yezdanî dikin. Tu kes nikare înkara vê bike ku helbestên Ebûelayê Me'errî, di wê demê de hatine nivîsîn. Heya îro jî helbestên navhatî yan jî deqekî şekspîr nemiriye, çima? Ji ber ku dema em van deqên dîrokî dixwînin, em her carekê wateyekê tînin pê.

Niha jî em herne ser deqên mirovî û xwedayî. Gelo cudahiya di navbera wan de çi ye? Gelo ji bo ravekirina vê deqa xwedayî divêt metodekî yezdanî hebe? Pirsyarên lahutî (ilahîyat) û ayînî gelekî sade ûsakar in û hewcedarê şirovekirinê nîn in. Li gorî wan, perwerdîgar bo xwe weha hez kiriye, her tiştêkî bi daxwaza yezdanî rû daye. Ev bersiva lahutiyane. Ev bersiv kûrahiya baweriyê derdixe, lê tu tiştî şirove nake. Teksta xwedayî, çavkaniya wê yezdanî ye, lê navenda wê de mirovî ye. Peyam maneya wê berdewamî ye, berdewamiyeke nezimanevanî. Quran dibêje "Me bi mîşên

hingvîn spart" yan dibêje "Me gote diya Musa ku şîr bidê" yan:

(ان الكفار لا يوحى بعضهم الى بعض)

Naxwe di vir de navenda mirovî ew dengê yezdanî tê de ye ku min û misilmanekî nebihîstiye. Ewê ku bihîstiye tenê kesekî bi navê Mihemed e. Me jî bawerî bi rastiya wî kesî aniye. Her lahtiyekî xiristyan dibêje: "Musa Tewrat li pêşberî tevahiya Benî Îsraîliyan wergirtiye." Dema ku em behsa zimên dikin, em behsa peyv û ferhengê nakin, tew em behsa sîstema rewşenbîrî bikin. Ziman li cem civakê jî çemkine seqamgîr û binecî pêk hatiye. Min behsa wan hemû kodan kiriye ku di Quranê de hatine. Wergirê yekem heye, pêrageyîner, peyamber, namehilgir. Her wek tu dibînî, ev amajeyên dînî ne. Min bi xwe Xwedê nedîtiye û wî bi min re qise nekiriye. Yezdan – digel daxwaza lêborînê ji ber wê lêşibandîne - nameyek ji peyamber re şand, lê ew name tenê serzarkî bûye, lewma ew zimanê nameyê ne zimanê Xwedê ye, zimanê pêxember e. (وما ارسلنا من رسول الا بلسان قومه) ( Wate: "Me tu pêxemberek neşand meger bi zimanê gelê wî bi xwe." Dema ku pêxember bi zimanê neteweya xwe diaxive, wate li gorî rewşenbîriya wan diaxive. Ziman amanceke vala nîn e, tew binyateke tijî armanc e. Cenabê te dibîne? Naxwe: A yekem, yekemîn mirov heye ku peyam wergirtiye.

A duyem : Zimanê mirovî heye.

A sêyem: Name bi taybetî ji Mihemed re nehatiye şandin; Mihemed navendek e bona gihandina vê peyamê bo neteweya xwe.

A çarem: Ew name bi tevayî ji tîpa yekem ve heya dawiyê bi carekê de nehatiye xwarê, tew di qonaxên zemenî re derbas bûye. Ayet dihate xwarê û civakê jî li hemberî wê helwestek nîşan dida, piştî ayeteke din dihate xwarê û bersiva civakê dida.

*Bi dirêjahiya 23 salan?*

-Belê. Quran li kafiran vedigerîne gava ku pêxember bi wê yekê tohmetbar dikin ku helbestvan e yan jî sihêrker e yan keşîş e yan ecemek jê re ayetan çêdike yan jî ew hemû efsaneyên pêşîyan in û ew jî wan dinivîse. Dab û nerîta wê demê weha bû, pêxember divê pirtûkek di dest de hebûya. Ev cudahiya di navbera kesên xwendewar û nexwendewar de bû. Dema ku cihûyan gotine pêxember: "Ka pirtûka te.", wî jî got: "Ev, ew pirtûk e." Vê behs û gengeşeyê weha kir ku ez destewajeya "Diyardeya Quranî" hilbijêrim. Ji ber ku vê diyardeyê gotûbêj û gengeşe û qayilkirin û bersivdan bi xwe ve girtiye.

*Gelek "mana" di Quranê de hene, wek wateya ruhî, akarî, gerdûnî, civakî*

*û qanûndanîn. Berevajiya çemka selefîyan a ji bo Quranê li ser manaya wê ya aşkere?*

-Wateya aşkere û diyar li cem Ebuhezme cuda ye . Ya ku tu bi xwendina selefî bi nav dikî, xwendin nîn e. Ew piştî xwe bi xwendina kevn girêdidin û vê yekê bi rastî dihesibînin. Ew xwendinên klasîk hildibijêrin ku digel hêvî û xwestekên wan diguncin. Her weha cangiran in bo têgihîştina rewta wan xwendinên klasîk. Piraniya ravekirinên wan jî ji şirovekirinên Ibn Kesîr û Qutbî ve tên. Hizra ayînê hetta di şêwazên xwe ên navincî de jî dubarekirina dîrokê ye. Tew zanayên mîna şafîî li dervey dîrokê bûn. Lewra dema ku min pirtûkek li ser şafîî

(الامام الشافعي وتأسيس الأيديولوجيا الوسطية) derkir, kêşeyeke mezin ji min re çêkirin. Gelo çawan şafîî wek Quranê pîroz be.

Çima ew şoreşa li dijî Edonîs nehate kirin ji ber pirtûka "Statîk û Dînamîk", ku bi tenê beşek rexneyî bo şafîî terxan kiriye. Te di pirtûka xwe de heya çî astekê ji zanyariyên Edonîs mifa wergirtiye derbarê şafîî de?

-Bêguman, min mifa ji Edonîs û Mihemed Abîd Cabirî û berî wan jî mifa ji zanayên misrî ên warê fiqhê de wergirtiye, her wekî Semhurî û Ebûzehra.

*Gelo tu natirsî ku ji ber wan boçûnên xwe yê derbarê dîroka Îslamê bi-kevwî aliyê kêmnê ye, çawa ku Edonîs ku ji ber pirtûka " Statîk û Dînamîk" dûçar bû, ew jî di demê de ku bi gîştî boçûnên te kêmayetiyanê ne?*

-Kêmnê be ya na, ev boçûneke siyasî ye. Şêx Emîn Xulî dibêje: "Bîra ateîzmê kafirane ye, piştî serdemek diguhere û dibine komek boçûn ku jiyana wan diguhere." Ez bêjim xelkê bi awayekî rasterast ez nexwendime, ew bi çavê Ebdulsebur şahîn li min dinêrin. Binêre, kesekî wek Mistefa Mehmûd got: "Şêx Ebdulsebur weha got." Mihemed Xezalî jî got: "Şêx Ebdulsebûr gotiye: 'Mezintirîn nîşaneyê hejariya rewşenbîrî ew e ku mirov bikine çavkaniya biryardanê bi ser rastiyan de, ne ku mirov li gorî deqên qanûnê hukim bi ser wan de bê dayin' "

Yek ji endamên parlamentoya Kuweytê (selefiye) derbarê min de got: Ew di pirtûka xwe ya "Çemka Deq" de dibêje Xwedê tune ye. Te bi xwe pirtûka Çemka Deq xwend, te tiştekî wiha tê de dît? Di vê tengasî û bextreşiyê de nabe tu fikra zorîneyê (piraniyê) hebe ji bo tu vê tengasiyê biborîn?

*Sala 2009an te xwest bona beşdariya di boneyekê de biçî Kuweytê û li vir du waneyan bêjî, her çend tu gihîştibûyî balefirgehê, lê nehîştin tu herî wir. Tu çawa hatiyî wisa jî vegere! Tu neçar mayî, te ji bo 1500 kesî tenê bi riya deng axavtinek kir, tevî ku cih ji bo 150 kesî hatibû amadekirin. Di sala 2008an de jî tu tûşî arîşeyekê bûyî dema ku çend alî û kesan red kir li Qahîreyê mazûbanîyê ji te re bikin. Hîngê te xwest tu wê waneya xwe ya bi navê "huner û gotara heramkirinê", ku te li Bêrûtê li şanoya Dewaro şems gotiye, li Zanîngeha Emrîkî ya li Qahîrê de bibêjî. Lê saloneke biçûk ji te re terxankirin û xelk neçar bû ku li li derveyî holê bisekinin; her wekî ya Kuweytê. Gelo tu niha jî di bin barê nefreta jiyanê de yî? Em di sîstemêke siyasî a emnî (polîsî) û li welatekî emnî dijîn. Asayiş bi tevahî xelkê kontrol dike. Kesekî gote min ku tu dikarî daxwaz bikî ku daxwaza lêborînê ji te bikin. Min jî gotê ma ev rejîm daxwaza lêborînê ji kê û kê bikin. Ez kesekî naskirî me. Her zext û zoriyek li ser min ji aliyê medyayê ve tê ragihandin, lê gelo em çi bêjin derbarê zordestiya li ser xelkê asayî?*

-Lê tuyê li ser kuştina rojane a welatiyan di beşên polîs de û xwendekaran di waneyan de çi bêjî?. Dema ku tu di dema dersgotinê de dibêjî kurekî: "Hiş be!" Heke mamostayekî zanîngehê bi vî awayî biaxîve û bêje xwendekarekî ku xwe ker neke, ev jî şêweyekî çewsandinê ye.

Ez naxwazim xwe bikime şehîd yan qurbanî, lê ev civak behsa rewşenbîriyekî kilol(nesererast) dikin, rejîmên dîktator jî seqettir in. Tekane şewaz jî ji bo parastina wan rejîmên dîktator ev e ku tundrewan beşdar bikin di şopandina rexnegiran de. Ji ber ku her hizrekî rexneyî gef e bo ser deshilatê. Hizra rexneyî tenê behsa dîrok û kulturê nake. Heke armanca hizra rexneyî rizgarkirina xelkê be ji desthilata tekstan, va ye yekemîn deshilat dîktatorî ye.

Ez nefretê ji van desthilatan dikim, her çend ez weha nahesibînim ku ev siyaseta rasterast dijberî min in. Ev deshilat ji roman, honrawe, ji tablo û stranên ditirse. Arîşe di wir de ye ku hikumetan berî komên tundrew vederkirina rewşenbîriyê ji xwe re kiriye kar. Rewşenbîriya hejar rewşenbîriya dijminkarane li dijî her şêweyek ji şêweyên bexteweriya mirovî ye. Beşek ji bexteweriya mirov di wir de ye ku tamê ji zanist û muzîk û stran û honrawe û xweşî û ciwaniyê wergire; ciwaniya xelk û ciwaniya siruştê. Kûçe û kolanên me gemarî ne, medyaya me bi giştî kirêt e û her wiha gendeliya siyasî, gendeliya aborî û gendeliya civakî heye.

*Gelo tu serbarê vê gendeliya ku heye hez dikî ku vegerî Misrê?*

-Ez li Holendê de dijîm, lê vê dawiyê serdanên min bo Misrê zêde bûne. Niha jî ez gihîştme temenê xanenişîniyê (bi henekî).

*Tu xanenişînê destê Misrê yî?*

(Dikene) Mebesta min xanenişîniya fermî ye li zanîngehê. Dema ku di sala 2008 de ez ji bo merasîma salvegera sedemîn ya avakirina Zanîngeha Qahirê hatim vewendin, ez heyrî mam dema ku min dît çalakî di hotêlekê de li dar ket. Gelo ma dibe rê û resma sedsaleya zanîngehekê li Misrê di hotêlekê de li dar bikeve ? Gelekî şerm e ji bo vê zanîngehê.

*Te gilî û gazinde ji zankoyê hene. Gelo sedem ev e ku ya hate serê te di zankoyê de hate serê te?*

- Ne ku gilî û gazinde, tew ji gilî û gazinde jî tûjtir. Zanîngeh li Misrê bûne mizgeft, helbet mizgeft bi wateya xwe ya nerênî.

*Te daxwaza azadiya mirov kiriye, ne tenê ji destê deshilata deq, ji destê wan hemû deshilatan ku di cîhana me de rê li ber karwanê mirovahiyê digrin. Divêt em yekser û her niha li hemberî vê lehiyê rabin, berî ku em av û av biçin." Gelo ev gotina deqê Quranê jî bi xwe ve digre?*

- Ji min bigere, bila ez rohtir behs bikim. Bêguman min di pirtûka xwe de ew gotin derbarê şafiî de gotiye. Wê pirtûka min gelek helwest li hember de hatin girtin. Îmam şafiî bû deq û deshilat. Hetta Quran jî çawa dibe desthilat? Bi riya ên ku bawerî pê hene ku ev deqê Quranî çavkaniya wê ye. Lê ya ku di dîrokê de rû dide ev e, ya rast pişt bi boçûnekê ve girê bide û ew ên din gotinên pûç û bêbingeh in. Ev karê li gorî xwendineke tenê deqê dike deshilat. Lewma ew ên ku bi navê tekstan ve diaxivin, ew deshilat in, deq bi xwe xwediyê tu deshilatekê nîn e. Heke musilman tunebûna û tenê çend rûpelên Quranê mabûna, hîngê wan rûpelan tu deshilatek nedima. Lewra rizgarbûna ji destê deshilata deq ji vê destewajeya ku te di pirsra xwe de aniye ber behsê, azadbûn e ji deshilata lêkdaneweya (şirovekirina) deshilatdarane ya deqan ku dest bi ser lêkdaneweya deqê ayînî de digre.

*Di heyama vê karwanê xwe ya hizrî ya dirêj de bi raya te li ku derê şaşî kirine û li ku derê tu bi xwe de çûyî?*

- Helbet ewê ku bala xwe daye berhemên min werçerxanê dibîne. Ew werçerxan

nayê wê wateyê ku ez di serî de şaş bûme, lê piştî rast. Lêkolîner ji pirskirinê nakeve. Lêkolîner gava ji ber pirskirinê westiya, hema bila kifinekê li xwe bike û li hêviya mirinê be baştir e. Ez tenê behsa pirtûkên xwe nakim, her wiha gotûbêjên min ên digel xwendekaran û konferansên min ên ciddî. Ez rojane hîn dibim, dema ku ji ber hînbûnê bisekinim, weha hest dikim ku ez nexweş ketime.

*Doktor, rewşa ronansa takekesî di cîhana erebî de hatiye kirin?*

- Ji sedsala nozdehem ve ya ku wek ronansa yekem û duyemîn tê hesabandin, ji destpêşkeriyê pê ve, ronansamêz nebû; kenargîr bû. Serbarê wê yekê ku gelek ji ronansxwazan hatin dadgehîkirin: Tehtewî hate dîr xistin, Mihemed Ebde hate vederkirin, Elî Ebdurezaq hukim bi ser de hate sepandin, Teha Husên naçar kirin ku hinek boçûnên xwe yê di pirtûka "Fî şe'ro Cahilî" biguhere, heya digihê Loys Oz û Necîb Mehîfûz û Emîn Elxulî û Newal Se'dawî jî ne ya dawî nebû.

*Gelo tu texmîna vê hindê dikî ku bi dûreperêzî û vederkirinê dawî li hizra Nesir Hamid Ebuzyed bê an jî berevajî wê yekê dixwazî?*

- Di serî de ji min bigere, ez vê yekê rohn bikim ku ev kes, her çend bi tevahiya civakê negihîştine, lê damezranvan û bingeh bûn. Ronansa bi takan çêdibe, heke dezgehên rewşenbîrî ên navendî hebin, hizra wan kesên tak wê bo astekî berfirehtir jî bê veguhastin. Piştî emrazên navendî ên din hene wate medya. Navgînên ragihandinê li ba me vê rolê pêk naynin, lewma em nikarin takan bi destbijêr tohmetbar bikin. Bo nimûne, min li zanîngehê ders digotin, wate ez berpirsê 500 xwendekarî me. Ev jî armanca dadgehîkirina min bû wate derkirina min ji zanîngehê bû. Riyek nebû ew vê yekê bi cih bînin, tenê ew ma ku min bi wê yekê tawanbar bikin ez ji dîn vegeriya me. Medya vî karî nake ku bi zanîngehê çêdibe. Dema ku ez ji hêla platformeke medyayî ve tême vexwendin, pirsên bi lez û dereveyî ji min têne kirin.

Medya rola rewşengeryê nalîze, ji ber ku me hewcehî bi tevgerê gîştî ya rewşengeryê heye. Helbet hewla takekesî ya di warê medyaya dengî, rengî û nivîskî de darî çavan e, lê ew rewtekê durist nakin. Ez dixwazim bêjim ku hizr qet namirin, lê pirsyar ev e: Civak çawa dikare henaseyekê bide wan hizran? Pirsyar ev e.

- Ayetên bi Kurdî ji "Qurana pîroz" wergerana mamosta Hejar hatine wergirtin.
- Ev dîmane (hevpeyvîn) di kovara "Keşkol" a Erebi de hatiye belavkirin.